# SERDEMA NÛ YA ŞOREŞAN
# ŞOREŞA AZADIYA ROJAVAYÊ KURDISTANÊ

**PİRTÛKA DUYEMÎN**

# CIZîR

**MEHMET EMÎN MUTLU – ERSÎN ÇELÎK**

# NAVEROK

**PÊŞEK**
**DESTPÊK**

**BEŞA YEKEMÎN: RIZGARKIRINA BAJARÊN HERÊMA CIZÎRÊ**

1- Berî Şoreşê-Piştî Şoreşê
2-Li Herêma Cizîrê Roja Rûmetê: 19’ê Tirmehê
3-Rizgarkirina Girzîro
4-Rizgarkirina Rimêlan, Çilaxa û Tirbespiyê
5-Amûdê: Bajarê ku Dîrok Tê Ziman
6-Li Hesekê û Til Temir Şer û Alozî
7-Rewşa Dirbêsiyê

**BEŞA DUYEMÎN: ŞERÊN SERÊKANIYÊ**
1-Destana Lehengiyê Destpê Dike
2-Çeteyan Piştî Provoqasyonê Êrîş Kirin
3-Çeteyan Derbeke Giran Xwarin
4-Plansaziya Şerê Serêkaniyê Li Tirkiyê Amade Kirin

**BEŞA SÊYEMÎN: DI SALVEGERA 19`Ê TÎRMEHÊ DE ÊRÎŞÊN BERFIREH LI SER CIZÎRÊ**
1-Serêkaniyê: Dîsa Şer, Dîsa Lehengî û Serkeftin…
2-Rizgariya Serêkaniyê!
3-Şerê Dijwar Li Gundewaran
4-Kêça Leheng a Êzîdî Bêrîvan, Fermandar Şîlan û Şêrê Serêkaniyê Hemze…
5-Li Ser Derî Êrîşa Mezin û Piştgiriya Gelê Bakurê Kurdistanê
6-Êrîşa Dijwar Li Ser Gundên Alok û Cafa
7-Êrîşên Li Ser Xeta Rimêlan û Çilaxa
8-Dijmin Tu Caran Nikare Me Bişkîne
9-Serkeftineke Stratejîk: Rizgariya Til Koçer
10-Pêngava Xeta Navîn: Tirbespiyê
11-Pêngava Navbera Hesekê û Til Temir

**BEŞA ÇAREMÎN: ÊRÎŞÊN DAIŞ’Ê Û BERXWEDANA HERÊMA CIZÎRÊ**
1-Komkujiya Şengal’ê, Destwerdana YPG-YPJ û Vekirina Qorîdora Rizgariyê
2-Li Cezaa Destaneke Lehengiyê
3-Pêngava Mezin a Tolhildana Til Hemîs û Til Berak
4-Berxwedana Keleha Til Xenzîr
5-Pêla Rihê Apogerî Gihişte Çiyayê Kizwana!
6-Ber Bi Mebrûka Ve…
7-Bîryara Girtina Girêspî
8-Têkçûyina Dewleta Sûriye Li Hesekê
9-HSD Hêza Parastinê ya Netewa Demokratîk e
10-Rizgarkirina Holê û Xatûniyê

**PÊŞEK**

Li warê şoreşê, cihê ku me ewilî dîtiye Cizîrê bû. Her tiştên destpêkê xweş in û li ser mirov tesîrên cuda diafrînin. Dema me ew sînor qutkirin û em derbasî binê xetê bûn, weke ku em çûbûn dinyayeke din li me hat. Çîroka me ya rê, bi serê xwe mijareke vegotinê ye, lê em vê yekê niha ji xwe re dihêlin. Em bawerin ger, we sedema wê zanîba, dê we jî maf bida me. Ger em dubare vegerin mijara xwe, jixwe di ev cîlta pirtûkê ku di destê we de ye, hem berdewamiya pirtûka "Serdema Nû ya Şoreşan Şoreşa Azadiya Rojava" ye, hem jî bi serê xwe ji bo naskirina Cizîrê û pêşketinên şoreşgerî yên li wê derê çavkaniyeke bingehîn e. Ji aliyê erdnigariyê û pêşketinên siyasî û cîvakî ve bajar bi bajar, roj bi roj pêşketinên di nava şoreşê de çêbûne vedibêje. Ji ber vê yekê em di vê derê de nakevin kîteyên wê. Em tenê dixwazin hin agahiyên ku me çavdarî kirine û lêkolîn kirine bi we re parve bikin.

'Cizîr' ango `Cezîre` peyveke bi zimanê Erebî ye ku tê wateya "girav"ê. Dikeve hêla rojhilatê Rojavayê Kurdistanê. Di navbera çemên Dîcle û Xabûrê de ye. Lewra jî li ser nexşeya cografîk wek giravekê xuya dike. Li rojhilatê Cizîrê navçeya Endîwerê heye. Endîwer cihekî dîrokî ye û di dema xwe de navendeke girîng bûye. Strana bi navê "Endîwerê paytext e" jî wateyek xwe dîrokî heye.

Li vê navçeyê bermayiyên dîrokî hene. Yek ji wan jî "pira Romanî" ye. Ji vê pirê mixabin tenê yek çav li ser piyan maye û ew jî wek sembola Cizîrê ye. Endîwer cîranê Cizîra Botan e û berê xwe li çiyayê Cudî ye. Ji Endîwerê ber bi hêla rojava ve li pey hev bajar û navçe weha rêz dibin: Dêrik, Girkêlegê, Rimêlan, Çilaxa, Tirbespiyê, Qamişlo, Amûdê, Dirbêsiyê, Serêkaniyê. Ji derveyî van li aliyê Başur jî bajarê Hesekê û navçeya Tiltemir heye. Herêma Cizîrê fermî û îdarî, bi vî navî tê nav kirin.

Kantona Cizîrê ji her alî ve dewlemend e. Erdeke xwe ya rast û berhemdar heye. Ji aliyê çandinî û berhemên xwe ve di asteke bilind de dibe bersiva pêdiviyên Rojava û Sûriye. Mînak, salane genimê ku ji axa Suriyê tê rakirin % 40'î xwe berhemê ji Cizîrê û herêmên din yên axa Rojava ye. Bi giştî çandinî jî digihêje ji % 45'yê giştiyê Suriyê. Cizîrê bi petrola xwe jî dewlemend e. Petrol zêdetirî xwe li navçeyên Dêrik-Rimêlan û Tirbespiyê heye û beriya bûyer li Suriyê derkevin hilberîna rojane ya petrola vî welatî ji % 60'î xwe dîsa ji axa Cizîrê bû.

Mirov dikare bêje her aliyê Kantona Cizîrê dîrokî ye. Endîwer, Herêma Aliya, Qamişlo, Amûdê, Dirbêsiyê û Serêkaniyê, ango ji Dêrikê heta Tirbespiyê, ji demên kevnare ve warê jiyanê ne. Serêkaniyê bi navê xwe yê dîrokî "Waşukanî" (xweşkanî) beriya zayînê ji 1500 şûn de bûye paytextê Mîtaniyan. Şopên vê dîroka kevnare îro jî bi hemû dewlemendiya xwe, di milê civak, çand, ziman, bawerî û hwd de dijîn. Lê li ser Cizîrê ji sala 1962 û şûn de hindek siyaset û stratejiyên kûr yên dewleta Suriyê hatine meşandin. Siyaseta Erebkirin û asîmîlasyonê destpêkê bi projeyên polîtîk weke Kembera Erebî, ji sala 1973 şûn de jî bi pratîkî hatiye meşandin. Sîstemê bi van projeyan xwestiye Cizîrê ji gelê Kurd vala bike. Di encama van siyasetan de li Rojavayê Kurdistanê bi dehan gundên Ereb hatin ava kirin û piraniya erd û axa Kurdan ji wan hate stendin.

Îro serhejmariya Kantona Cizîrê tevî koçberên şer nêzîkî mîlyonek û nîv e.

*Nexşere-4*

## DESTPÊK

Weke ku ji berê ve hevkiribin, ji aliyekî Rojava heya seriye din hemû kesên ku em pê re rû bi rû mane, axifiyane û me guh dayê heman peyv dianîn ziman; “li vê erdnigariyê kedeke mezin a Rêber Apo heye.”

Bêguman her kesek dizane ku heya 9’ê Cotmehê 1998’an Ocalan li Sûriye bû. Lê tiştê ku kêmtir tê zanîn; tesîra Ocalan ya li vê erdnigariyê, ji Serokatiya gel û partiyeke zêdetir e. Ocalan ne tenê di Kurdan de, di hemû gel, bawerî, jin, kal û zarokên vê erdnigariyê de guhertin û veguhertineke mezin çêkiriye. Her derdoreke ku ketiye bin tesîra vê guhertinê, zêdetir bi serbilindî, bi hêvî û pêroj di nava çanda xwe de ji nû ve zayinek jiyan kiriye…

Dibe ku ji bo hinekan weke nepixandin jî were dîtin, bi îfadeyeke wêjeyî em dikarin bibêjin; di ev xaka ku bi faşizm, dîktatorî û zîhniyeta deshilat zivirandiye çolekê, kulmek tov çandiye û ava vê tovê jî bi mistê destên xwe daye… Gelê Rojavayê Kurdistanê jî demeke birçî mayin daye berçavan, lê berhemên vê tovê ji nû ve avêtiye xaka xwe. Niha ev tov, vegeriyaye berhem û bêndereke ku di hemû cîhanê de kelacaniyê diafrîne, ango vegeriye şoreşê…

Li ser tiştên ku me li Rojava dîtine û em axifiyane gelek tişt hene ku werin ziman, lê di dema ku me redekte û dîzgiya vê pirtûkê dikir de me pêwîst dît ku em vê mijarê keseke ku vê mijarê dizane û di dema ku Ocalan li Sûriye bû de şahidiya wan rojan kiriye bipirsin. Da ku em vê valatiyê dagrin û vê mijarê zelaltir bikin, di dema ku em difikirîn ka em vê mijarê kê bipirsin de, Faraşin Adar ji me re hate pêşniyarkirin. Em gihêştin wê hevalê, wê jî got, “ez ê bi kelecaniyeke mezin vê mijarê bibersivînim.” Me jî guncav dît ku em bersivên wê hevalê weke nivîsa destpêkê ya cîlda duyamîn bigrin dest. Jixwe bersiva hemû pirsên me, ango tiştê ku em lêdigerîn jî, “ev keda mezin” ku her kesî/ê qala wî dikir bû.

***Wêne-1***
***Suriye’de Önderlik sahasından bir foto***

**Şoreşa Rojava Bêndera Tovên Ku Rêber Apo Çandî ye...**

Ji bo me jinên Kurd, Kurdistanîbûyin; jinbûyin, mirovbûyin, hezkirin û wateya xaka xwe zanîn, xwebûyin û azadbûyinê ve girêdayî ye. Ji ber vê yekê dema ku em dibêjin zanebûna Kurdistanî, divê em tenê weke zanebûna miletekî fêm nekin.

Zanebûna Kurdistanê, bi xebatên Rêber Apo ku li Rojavayê Kurdistanê pêş xistine ve dest bi diyalektîka çêbûyina xwe kir. Ya rast dema ku mirov wateya jiyanê fêr dibe û pênaseyên xwe pêş dixe, zanebûn çêdibe û pêş dikeve, bi vî rengî jî rastiya mirovê azad derdikeve holê.

Rêber Apo ji sala 1979’an heya heyvên dawî yên 1998’an li xaka Sûriye ma. Di vê serdemê de hemû nêzikbûnên erenî yên gel û dewleta Sûriye, bi mînet û rêz girtin dest. Li ser bingeha ew nêzikatiya erenî, li gel ku li ser esasê rîçikên wê, biratiya gelan pêş xist, bi gavên demokratîk ji nû ve ev biratiya gelan afirand. Bixwazê nexwezê van gavan, ji çanda demokratîk ku li Rojavayê Kurdistanê pêş ketin re zemînek ava kir. Bûn gavên pêşî yên ev rastiya ku li Rojavayê Kurdistanê pêş ketine.

Bêguman Şoreşa Rojava, bi YPG, YPJ û PYD’ê dest pê nekir. Ev şoreşa dîrokî bi ev salên dawî ve sînordar kirin, ji ked û xebatên Rêber Apo ku ji salên 80’î ve pêş dixe qut girtina dest, wê bibe şîlokirin, înkar û bêdîrokî. Di dawiya dawî de jî wê bibe înkara şehîdan û ji azadiyê dûr ketin.

Xebatên şoreşê, xebatên Serokatî û şehîdan e. Nedîtina perwerdehiya Serokatî, di Şoreşa Rojava de nedîtina rista şehîdên ku li çar parçeyên Kurdistanê canê xwe dane; tesîrên wan yên li ser me, hêza rêxistinkirin û girêdana malbatan a şoreşê nedîtin, înkarkirina dîroka me û hemû kêlî û wateyên wê yên pîroz e. Dîsa xebatên şoreşê, mirov nikare bi 4-5 salên dawî ve sînordar bike. Li Rojavayê Kurdistanê ev 40 sale têkoşîna şoreşgerî û keda ku di ber vê şoreşê de hatiye dayin heye. Her wiha tiştên ku ji Şoreşa Fîlîstînê hatine girtin hene. Divê em van diyardeyan hemûyan derxînin zanebûnê, wate bidinê û mafê wan bidinê.

Di serdema ku Rêber Apo li xaka Sûriye dima de, weke mêvanekî wê dewletê bû. Ev serdema mêvantiyê bi awayekî wefa û ji gelên Rojhilata Navîn re sûdê bîne derbas kirin. Her kêliyeke ev jiyana xwe ji bo xebatên azadî û demokrasiyê feda kir. Di her ciwanekî/ê Kurd ku perwerdekiriye de zanebûneke mezin ya welatparêzî, demokrasî û azadiyê afirand. Her malek, bû mala Serokatî. Her malek, bû mala çanda Kurdperweriyê. Her malek, bû

komîneke partiyê. Di her malekê de çend ferd, bûn endamê xebatên çandî û hunerî. Her malbateke û kadroyên Tevgera Azadiyê, kêliyên berhem û bênderan vegerand mîhrîcaneke.

Her demeke bênderê, vedigeriya demeke bi bereket ku bi moral û pêrojeke mezin berhem tên komkirin, pêwîstiyên malbatan û kadroyên PKK'ê tên bersivandin. Ev kêliyên ku weke mewsîm dihatin bi navkirin, kêliyên jiyana komînal ku bê rêzikname, bê qanûn û bê yasa bûn. Her kesekî/ê ku Rêber Apo nas kir, çend seatan bi wî re jiyan kir, li gel wî tasek av vexwar û xwarinek xwar, bi rihê komînê jiyîn weke kêliya xwe ya herî xweşik girt dest.

Her malbateke, xwe weke komîneke rêxistin kir. Her ferdekî/ê ku di nava malbatê de, bûyina endamê 3-4 komînan weke şêwaza jiyaneke xwezayî girt dest. Xebatên aborî, hûnerî, werzîşî û perwerdehiyê bi rihê komînê jiyî û meşand. Di encamê de gelê Rojavayê Kurdistanê qesî ku di tevahiya dîroka xwe de nedîtiye di nava van 20 salan de rêz û nirx dît, perwerdehî dît, li gel mirovê mezin Rêber Apo kêliyên pîroz yên azadbûyinê û xwe afirandinê jiyî. Bû çalakvanê dîrok û gelekî ku welatê xwe, di nava ew welatê azad de jî xwe, bi dil û mejiyekî azad diafrîne.

Rêber Apo hemû gel, xebatkar, dayik, bav û zarok pêrwerde dikirin. Perwerdehiya bingehîn a malbateke, nêzikbûn, axaftin û tiştên ku li ser xwarina êvarekê dihatin jiyîn bûn. Bêguman her tişt bi wê seatê nedihat sînordarkirin. Li her malekê wêneyên Serokatî hebûn, her malbeteke weke ku Serokatî di her kêliyeke de li ber serê wan e jiyan dikir. Her malbateke dixwest ku zarokên wan weke Serokatî bin, weke wî jiyan bikin. Ji ber vê jî zarokên xwe dişand gel Serokatî, da ku perwerde bibin.

Li Rojavayê Kurdistanê ciwanên ku neçûne gel Serokatî, neçûne cihên ku Serokatî lê maye, heftekî an jî mehekê ji Serokatî perwerdehî nedîtine, xwe weke dûnenedî didîtin. Lewma li Rojavayê Kurdistanê jiyaneke nû dihat ava kirin, kesayeteke nû û azad dihat afirandin; her kesek ber bi ev kesayeta azad û jiyana nû ve dibeziya. Ji ber vê yekê her malbateke dixwest ku zarokên wan li gel Serokatî perwerde bibînin. Ciwanên Rojavayê Kurdistanê jî, dixwestin li derdora Rêber Apo xwe nû bikin, azad bibin û bibin xwediyê wateyeke.

Gelek ciwanan, bi sûda ku ji Serokatî girtine, fêrî hunera ku jiyanê bi ziraviyên wê dihone bûn. Gelek ciwanan bi çêkirina wêneyan, lêxistina tembûrê ûhwd karîn hest û jiyankirinê xwe bînin ziman. Civaka me fêr bû ku herî kêm qesî hebûna gelê Ereb, hebûna gelê Kurd jî rastiyeke jêveneger e. Girîngiya bi zimanê xwe axaftin, stran gotin, bi zanebûna dîroka xwe jiyînê fêr bûn. Fêr bûn û fêrbûyinên xwe jiyan kirin. Dema ku van ciwanan ferq kirin ku bi tiştên ku fêr dibine, gav diavêjin nava civakbûneke nû, êdî zêdetir bi zanebûn gavên xwe diavêtin nava ew civakbûna nû.

Dema ku min jî ev tesîr dîdîtin, min meraq dikir, dixwest têbigihêjim û fêm bikim. Min dizanî ku ji gundên nêzikî me keçên ku diçin gel Serokatî û perwerde dibînîn hene. Her kesekî/ê bi rêz qala wan dikir. Vê yekê jî ez tesîr dikirim. Malbata min jî dost bû. Wê demê me digot, dost. Li Rojavayê Kurdistanê, ji malbatên ku nêzî Tevgera Azadiyê ne û piştgiriyê didin kadroyên tevgerê û zarokên wan tevlî têkoşînê bûne re dost dihat gotin.

Jixwe çareseriya pirsgireka Kurd a li Rojavayê Kurdistanê jî, li ser esasê dostanî, pêşxistina çanda demokratîk, kûrkirina feraseta Netewa Demokratîk, bi afirandina zanebûna civakbûna Kurd ji bo domandina vê hebûnê lêgerîna rêkan dihat destgirtin. Ev rewş, weke encameke nêzikbûna Serokatî a dostaniyê û wefayê derdiket holê. Serokatî ti caran li hemberî welatekî ku lê mêvan maye, dervayî demokrasî û azadiyê, aşîtî û netewiyeta demokratîk nêzikbûneke cuda nîşan neda. Her wiha pêşxistina nêzikbûn û tevgerbûyineke cuda jî qebûl nekir.

Em dîsa vegerin ser dostaniyê. Weke min got, malbata min jî dost bû. Ji mirovên me yên ku tevlî Tevgera Azadiyê bûbûn hebûn. Pismamekî min perwerdehiya Serokatî dîtibû. Qet bîra min naçe, piştî ku perwerdehî dît hatibû serdana me, pişt re jî çû qada xwe ya xebatê, ango çû Qamişlo. Dema piştî perwerdehiyê hate gel me, ew kesayeta çort çûbû, cihê wê ciwanekî paqij, rêk û pêk û rêzdar hatibû. Bi taybetî weke keçên ciwan dema ku bi me re diaxîfî, bi rêz nêzik dibû, em guhdar dikirin û weke berê di ser me de qîr nedikir. Vê yekê pir zêde bala min kişandibû. Di bîryara çûyina gel Serokatî û perwerdehî dîtina min de de rista vê bûyerê pir zêde bû.

Di civaka Rojavayê Kurdistanê de nêzikbûneke pir xweş heye, malbat ji bo tevlêbûna zarokên xwe nêzikatiyên pir neyînî nîşan nadin. Her malbateke dixwaze zarokên wan tevlê bibin û biçin gel Serokatî perwerdehî bibînin. Li gel vê yekê ger di malbateke de tevlêbûn tune be, ew malbat xwe kêm dibîne û şerm dike. Welatparêziyeke bi vî rengî heye. Her kesek dizane ku li gel Serokatî, mirov digihêje nirxên xwe yên mirovahiyê, malbat jî bi vê yekê dibin xwedî nirx û rêzdar dibin. Malbata min jî bi vî rengî bû. Ji ber ku di nava malbatê de tevlêbûn jî hebûn, vê yekê nêzikbûn û germahiyeke mezintir pêş dixist. Her wiha ev yek pêwîstiya dostaniyê bû.

Bi vê yekê malbata min, ji min re çanteyek amade kirin, pêwîstiyên min bersivandin û ez anîm qada Serokatî. Dema ku ez hatim qada Serokatî, min wisa hîs kir ku weke ez hatibim gerstêrkeke din. Min kadroyên ku ji aliyê Rêber Apo ve hatine perwerdekirin, dîtibûn. Lê vê carê cuda bû. Îcar ew ne mêvan bûn, ew xwediyê malê bûn û min wisa hîs dikir ku heya ku ez weke wan nebim, ez ê bibim mêvan. Lê ew hestên biyanîbûnê ku di kêliyên ewil de bi min re pêş ketine pir dirêj nekirin. Ya rast hevalan ji bo vê yekê destûr nedan. Hevalên jin, bi germahiya

xûçkeke ez pêşwazî kirin, hema çenteyê min girtin û ez birim gel hevalan. Nêzikatiyên germ û hundirîn ku li hemberî min nîşan dane, bi awayekî giştî ez tesîr kirim. Wê demê min xwe weke xwediyê malê hîs kir.

Piştî bêhnvedanê û du rojan, hat gotin ku ez ê Rêber Apo bibînim û divê ez xwe amade bikim. Min jî xwe amade kir û çûm gel Serokatî. Diyar e ku hê jî di nava min de meraq û pirsên bê bersiv, ango ne diyariyek hebû. Ji ber vê yekê dema ku gotin tuyê Serokatî bibînê, carek din hundirê min keliya.

Dema ku ez derketim hemberî Rêber Apo, silava wî ya germ û hundirîn ez pir tesîr kirim. Destê xwe dirêj kir û got, tu xêr hatiyê. Min jî ew bersivand, lê piştre min ferq kir ku bi dengekî nizm bersiv didim. Serokatî got, *"dengê xwe bilind bike. Divê jin bi dengekî lerzok neaxifin. Jixwe di nava malbat û civakê de hûn têra xwe hatine tepisandin. Divê hûn ji wan tûndiyan rizgar bibin. Ger hûn dixwazin azad bibin, divê bi berzkirina dengê xwe hûn destpê bikin."* Li hemberî van gotinan, di kêliyên ewil de min fêm nekir ku çi dibe. Dema ku ez niha difikirim, ez têdigihêjim ku wê demê her çiqasî ji xwe bawer bim jî, ez jineke li hemberî mêr dengê xwe jî winda dike bûm. Lê perwerdehiya Serokatî, ji dengê me heya gotin û sekna me, ji xwendina me heya têkoşîna li hemberî hevalên xurt û afirandina pîvanên têkoşînê her tişt fêrî me kir.

Ji ber vê, di her kêliya ku diherikî de ew dengê min yê nizm û lerzok jî ji holê rabû. Ji wê jî zêdetir, weke jineke dema ku jiyankirinên xwe, serpêhatiyên dayik û xûçkên xwe, jiyankirinên hemû jinan fêm dikim, bê hemda xwe li hemberî hevalên xurt dengê min ji ya pêwîst zêdetir jî berz dibe. Qesî ku dengê mirov pîroz e, divê mirov wê pîroziyê bi hemû zindiyan ve parve bike. An na em nikarin qala azadiyê û lêgerîna azadiyê bikin. Di nava ew 6 mehên ku bi perwerdehiyê derbas bûne de, hêdî bi hêdî têgihiştina van tiştan çêbû. Baweriya min bi xwe hat.

Her wiha di derheqê malbatê de jî lêhûrbûna min çêbû. Di rastiya Rojavayê Kurdistanê, bi awayekî giştî nedahûrandina malbatê, li dervayî sînorên malbatê hebûna xwe neafirandin, tu derkevê dervayî van sînoran jî bi taybetmendiyên malbatî nêzikbûn û li gorî wê nêzikatî raber kirin hebû. Ez bi perwerdehiya Serokatî ketim wê ferqê. Her wiha di encama lêhûrbûna gelek mijarên din de, bi kelecaniyeke mezin min soza tevlî nava refên şoreşê bûyinê û kadrotiya Tevgera Azadiyê da.

Piştî perwerdê da ku ez xebatên gel bimeşînim, Serokatî ez şandim aliyê Dêrîkê. Li gorî xwe min wate dida vesazbûneke bi vî rengî. Lewma di tevahiya perwerdê de rexneyên ku ji min re dihatin, nîşanî min didan ku ka ez di kîjan mijaran de li ser kîjan qadan lêhûrbûn bikim û xwe bigihînimê. Di mijarên tengbûyin, civakînebûyin, rê û rêbazê de rexne li min dihatin kirin. Serokatî diyar kir ku divê ez di nava gel de bixebitim, ked bidim, tiştên ku ji malbatê fêr bûme bi taybetmendiyên malbata mezin, ango Kurdistanê ve bikim yek; divê ez di rêbazê de dewlemendiyê pêş bixim, tiştên ku fêr bûme bi gel re parve bikim; divê weke jineke azad xwe biafrînim û şoreşa xwe di zemîna civakî de pêk bînim. Bi vî awayî, li gel bendewariyên xwe yên serkeftinê ez şandim qada xebatê.

Min ji Rêber Apo, nirx, hezkirin, rêz, zanebûn û baweriyeke mezin girtibû. Tiştên ku min girtine, di dilê min de bi cih nedibûn. Dema ku min mûqayasa roja ku ji malê derketime û ji qada Serokatî qut bûme dikir, min hîs dikir ku dilê min zêdetir tijî ye û zêdetir tengav dibe. Serokatî, malbata me ya heqîqî, rastiya me û civakbûna me, ji me dabû nasîn. Da ku ez layiqî ev keda mezin bibim û di serdema nû de di civakbûna demokratîk û azad a Kurdistanê de ked bidim, ez çûm cihê xwe yê xebatê.

Min li Dêrîkê salên dirêj xebat meşandin; dibe ku 5-10 sal di dîroka gerdûnê de pir ne dirêj bin, lê di çavê min de salên pir dirêj bûn. Lewma her rojek, qesî saleke bû; bi guhertin, nûbûyin û şoreşên civakî ve dagirtî bû. Ji rêxistinbûyinên taxan heya xebatên ziman, ji xebatên çandî heya perwerdehiya gel, ji xebatên aboriyê heya xebatên xweser yên jinê, min di hemû qadan de kar kir. Min kedên mezin dan. Piştre min fêm kir ku keda ku ez didim, keda Serokatî ku ji bo ez veguhezînim civakê dane min in.

Dema ku ez gihêşt zanebûn û asteke xebatê ku têrê bike, ji bo qadên dervayî Rojavayê Kurdistanê jî xebatê bimeşînim, min xwe amade dît û pêşniyar kir. Di vê serdemê de li hemberî Serokatî komplo pêk hatibû, li hemberî wefa û mêvanperweriya dewleta Sûriye da ku ew dewlet tengasiyan nekşîne Serokatî ji nava sînorên vê dewletê derketibû. Ji bo kesên weke me ku Serokatî li wê erdnigariyê dîtine, bê Serokatî fikirandina wan xakan pir zehmet bû. Pêşniyara min a ji bo qadeke din xebitînê jî, di van serdeman de bû. Piştî wê demê li gelek cihên Başûrê Kurdistanê min têkoşîn û xebatên xwe berdewam kirin.

Di demeke ku li Rojhilata Navîn pêla şoreşê bilind bûye de, ez careke din derbasî Rojavayê Kurdistanê bûm. Li vê qadê di asteke girîng de zemînê kombûyin û zanebûneke civakbûnê pêş ketibû. Li Rojhilata Navîn civaka ku herî zêde ji şoreşê re amade bû, Kurd bûn. Her wiha gelê Rojavayê Kurdistanê ji ber ku perwerdehiya Rêber Apo girtibû, pir bi şans bû. Vê rewşê li Rojavayê Kurdistanê lezgînî û tevgerbûneke civakî jî pêş xistibû. Ev tevgerbûyin, bi bihara gelan ve bû yek û deriyê Şoreşa Rojava vekir. Bi demê re zanebûneke civakî, çandeke komînal, rêxistinbûneke ji hemû pêwîstiyên civakê re dibe bersiv û parastina cewherî pêş ket. Di encamê de vê erdnigariyê ji şoreşeke ku bala hemû cîhanê dikşîne re malzarokî kir.

Keda ku Rêber Apo di ber xeta azadiya jinê de daye, li Rojavayê Kurdistanê ji bo zayineke weke YPJ'ê bû çavkanî û bingeh. Ger ew perwerdehî, nîqaşên azadiyê, ji paşverûtî û kevneşopiyan şiyarkirina jinê, ev vejîna civakî tuneba; îro me nedikarî em qala rêxistinbûna YPG û YPJ'ê jî bikin. Bi kurtasî Serokatî, cewhera me, şaneya me ya jiyanî, mabesta jiyan û têkoşîna me ye.

Keda Rêber Apo, zanebûn û nirxên civakî ku afirandine, ji bo hemû pêşketinên ku di dema şoreşê de pêş ketine bû tovê azadiyê. Vî tovî li gel şoreşê, qalikê ser xwe avêt û zîl da. Vî tovî ajo da, kulîlk vekirin û îro li Sûriye ji federasyona demokratîk re pêşengtiyê dike. Dê bibe koka dara azadiyê. Ber bi vê yekê ve diçe.

Ez bi kurtasî dikarim van tiştan diyar bikim. Xebata ku hûn dimeşînin jî pîroz dikim. Xebata we ji ber ku ev Şoreşa Pîroz, teyisandina ser gelê me û hemû civakê esas digre, ev xebata we jî pîroz e. Bêguman nirxên ku pîroziyan diafrînin, nirxên civakî û dîrokî ne. Ev jî, weke civak nirxên me ne. Yên her kesî/ê ne. Aîdî hemû mirovahiyê ne. Li ser vî esasî, bi wesîleya vê xebatê Şoreşa Rojava, di destpêkê de ji Rêber Apo, hemû şehîdan, gelê Kurd û hemû gelên cîhanê pîroz dikim. Di xebatên we de serkeftinê dixwazim.

**Faraşin ADAR**

**BEŞA YEKEMÎN**

**RIZGARKIRINA BAJARÊN HERÊMA CIZÎRÊ**

**1-Berî Şoreşê-Piştî Şoreşê**

***-Beriya pêvajoya 19`ê Tîrmehê rewşa herêma Cizîrê bi çi awayî bû? Bi destpêkirina pêvajoya Şoreşa 19`ê Tîrmehê re ku rizgarkirina Rojavayê Kurdistanê destpê kir, ev qonax li bajarên Herêma Cizîrê çawa pêk hat, şert û mercên siyasî bi çi awayî bûn, çi astengî û zehmetî hatin jiyîn? Di aliyên civakî, siyasî, leşkerî û di hêla moral de vê pêvajoya rizgariyê, wek kesayetekî di nava vê pratîkê de, hûn çawa dinirxînin?***

**CEMÎL KOBANÊ:** Di vê pêvajoyê de ez li milê Derîkê bûm û li wê derê me xebat dimeşandin. Em ketibûn meha Gulanê ya 2012`an. Êdî me pêvajoyek li pey xwe hiştibû. Hêza me ya leşkerî êdî di wê derê de çalak bûbû. Civînên propagandayê pêş diketin. Gund bi gund civîn hatin li darxistin. Di derheqê rewşa Sûriye û Rojava de agahî dihatin dayîn. Ji bo ku her kes derbasî pergala parastinê bibe, demekê propagandaya çekdarî hate meşandin.

Di herêma Derîkê de bi taybetî gundên di sînorê Bakûr û Başûr de gerîn û şiyarkirina wan çêbû. Xeteriyên li ser gelê me dihat vegotin û pêwîstiyên beşdarbûna xeta parastinê dihat propaganda kirin. Bêyî ku ji derdor û hêzên dîtir tesîr bibin, divê bikarîbana di nava hêzên parastinê de cih bigrin û parastina xwe ya civakî bikin. Lewra rêbaza yekane ya li ser piyan mayinê parastin bû. Êdî ew yek derdiket pêş. Ger civakek çekdar nebe, ne xwedî hêzeke xurt be; ne dikare li hemberî dewleta Sûriye serî rake, ne jî xeteriyên pêşerojê dikare rake û ji bandora wê derkeve. Bi vê şêwazê li hemû cihan propaganda dihat kirin.

Wê demê hêzeke xurt a leşkerî ya rejîmê li Derîkê hebû. Lewma Derîk navendeke wê herêmê bû û ji ber wê jî giraniya xwe didanê. Ji firqa ango tumenên leşkerî yek di bajarê Derîkê de, yek di herêma Koçeran de, yek jî di Rimêlan de hebû. Sînor tevahî bi hejmareke zêde ya leşkeran hatibû girtin. Parastina sînorê Bakûr aîdî Tirkiye bû, lê li seranserê sînorê Başûr, qesî 50 km leşkerên Sûriye hatibûn bi cih kirin.

Her wiha di Til Koçer de hêzeke leşkerî ya rejîmê hebû. Vê yekê dida diyarkirin ku hejmareke zêde ya rejîmê li herêmê heye. Ji bo ku em xwe ji vê hêzê rizgar bikin, pêwîstî bi hêzeke xurt ya leşkerî hebû. Li ser vê esasê propaganda dihat kirin û gel dihat şiyar kirin. Ji bo parastinê ronîkirina gel, gihandina asta xweparastinê, erkeke hêzên parastinê bû. Bi vê peywirê derketina nava gel û propaganda kirin, li ser gel tesîrek kir. Di astekê de rista xwe lîst. Coş û hêzek da.

Bi vî rengî em derbasî pergala '*haciz'* ango rêbend an jî navendên kontrola riyan bûn. Her ku xeterî zêde dibû, pêwîstiya kontrolkirina çûyin û hatina herêman jî girîng dibû. Kî dikeve herêmên me, kî derdikeve divê bihata zanîn. Li hemberî teqîn û provaqasyonan divê parastineke bi vî rengî çêbibûya. Ne tenê xwe parastin, divê tedbîrên parastina civakê jî bihatana girtin.

Ew peywir jî yekîneyên xweparastinê girt ser xwe û li hemû rêkên çûnûhatinê navendên xwe yên kontrolê çêkirin. Li gorî agahiyên heyî û îhtîmala xeteriyan haciz hatin danîn, ji milê sînoran ve hêzên parastinê derxistin, komên veşartî rêxistinkirin û rêxistinkirina ewlekariyê çêdibû. Ji bo ku li hemberî êrîş û planên dijmin, tu bikaribê tedbîran bigrê pêwîstiyeke wisa çêdibû. Gav bi gav yekîneyên xweparastinê ew kar jî dida meşandin.

Cizîr herêmeke wisa bû; yek, hêza leşkerî ya dewletê tê de xurt bû. Du, gelek derdorên cûda koçberî herêmê bûbûn. Bi taybetî li Dêrikê û cihên dîtir yên ser sînoran ew tişt hebû. Ji ber vê yekê divê tu zêdetir şiyar be û di nava hevsengiyekê de di warê zanebûn, rêxistinkirin û plansaziyê de hin xebat bihatana meşandin. Ne ku me tenê hebûna xwe li ser piyan bigirta. Gel jî xistina nava pergal û parastinê pêwîst dikir. Bi vî awayî bi şêwazeke tevlêkirinê kar dihatin meşandin.

**FOTO: QAMİŞLO'DAN BİR GÖRÜNÜM – FOTOĞRAFI KULLANILACAK**

Bi vî rengî rêxistinkirina gel, li ser derdorê jî tesîr dikir. Dema ku wan gelên wê herêmê dîtin ku Kurdan xwe rêxistin kiriye û bi hêzekê derketine holê, dewlet jî nikare mûdaxale bike; ew jî di hundirê xwe de ketin nava tirsekê. Ji ber ku pişt re hatibûn wê herêmê, tirsa ku dê Kurd wan biqewrînin, an jî tola xwe ji wan bigrin, jiyan dikirin. Fikarên bi vî rengî hebûn. Lê ew fikar bi nêzikatiyên me yên demê re ji holê rabûn. Bi taybetî dema ku pratîka me dîtin, gelek tişt zêdetir zelal bûn û baweriyek bi wan re çêbû.

Rewşa ku em gihiştinê êdî girtina bîryarên nû li ser me ferz dikir. Her çiqasa heya wê demê me bi `*xeteke sêyemîn*` têkoşîn dida û me dixwest hebûna gelê me, vîn û hêza me, azadiya me qebûl bikin; dewleta Sûriye di wê siyaseta înkar û îmhayê de israr dikir. Di xuyabûnê de weke ku ne dijberî me ne xwe dan nîşandan, lê di cewher de ne wisa bû. Vê jî xeteriyek bi xwe re derdixist. Ango digotin, em hebûna we qebû nakin. Lê di pêşerojê de bi têkoşîn û rêxistinbûna me ve girêdayî dê çi biba, ne diyar bû. Ger dewleta Sûriye bizanibûya, dikare hemû mûxalîfên hemberî xwe û li kêleka wan hêza me jî pê re tune bike, dê ew bikira. Lê dizanî ku nikare vê yekê bike.

Hevkarê wan, ango dewleta Tirkiye jî dev ji wan berdabû. Bi taybetî piştî sala 2000'an ew siyaseta tunekirin û îmhayê ya Kurdan ku Tirkiye û Sûriye bi hev re dimeşandin jî, ji ber ku Tirkiye bû dijberê Sûriye û pişta mûxalîfan girt, têk çû. Ew jî ji bo Sûriye darbeyeke xurt bû. Tirkiye, di destpêka şoreşê de dev ji îttîfaqa Sûriye berda û mûxalîfên wê girtin. Derfetên xwe hemû ji wan re vekirin û li hemberî dewleta Sûriye ew rêxistin kirin.

Her wiha hin tûndî û ferzkirinên hêzên navnetewî yên Emerîka li ser Sûriye hebûn, dixwestin rejîma heyî dev ji îqtîdarê berde. Ferzkirineke wisa psîkolojîk û siyasî dikirin. Li hemberî Sûriye, ya ku hêz ava dikir û piştgiriya wan dikir jî li gel Tirkiye, Emerîka bû. Lewra rejîma Sûriye di rewşeke tengav de bû. Ji ber van sedeman nêzikatiya dewleta Sûriye ya li hemberî Kurdan, her çiqasa di destpêkê de hin provaqasyon çêkiribin jî, êdî nedikarî pir mûdaxale bike.

Di hundirê wan de tirsek hebû. Êdî kengê û li kuderê êrîş û dagirkirina hêzên Artêşa Azad çêbûbûna ne diyar bû. Lewma li gelek bajaran ew pêvajo destpê kiribû û dewleta Sûriye hêdî hêdî hêza xwe ya leşkerî winda dikir û lawaz diket. Hin navendên xwe yên weke Lazqiye, Heleb û Şamê diparastin, lê herêmên derdorê û xetên sînor nedikarî biparêze. Baregehên Sûriye yên li ser sînoran rastî êrîşan dihatin û dewleta Sûriye neçar dima ku hêza xwe ya leşkerî komî ser hev bike. Divê êdî hinek herêm vala bikirana, li hin cihan paş ve gav biavêtana. Da ku bikaribin hin cihên xwe yên stratejîk biparêzin.

Dewleta Sûriye berê xwe dabû me jî, ka gelo dê helwest û nêzikbûna me çawa bûbûya. Ma em ê jî tevlî wan hêzan bibûya, an jî bi `xeta xwe ya seyemîn` em ê bi van hêzan ve di nava mesafeyekê de bimana? Ji ber vê yekê dewleta Sûriye her li hemberî me di nava fikar û gumanan de bû.

Dema ku em ji nîvê sala 2012'an derbas bûn û ber bi Tirmehê ve çûn, ji bo me jî qonaxeke nû bû. Beriya wê jî nîqaş dihatin kirin, divê ew asta heyî êdî bê derbaskirin. Hem ji milê siyasî û hem jî ji milê leşkerî ve hin pêngav bên avêtin. Li ser esasê guhertina qanûnên Sûriye, her têkoşînek me hebû. Daxwazên me, qebûlkirina hebûna gelê Kurd û herêmên Kurdan weke herêmên xweser bên naskirin bû.

Dewleta Sûriye, ev yek qebûl nedikir, ji bo wê divê me weke tevger û rêxistin li hemberî hemû hêzan helwestek bigirta. Jixwe hêzên mûxalîf jî xwe rêxistin dikirin û dixwestin bikevin herêmên me. Bi taybetî li Cizîrê, di nava gelê Ereb de jî dixwestin bandora xwe bidin çêkirin. Digotin, "*dê di pêşerojê de Kurd bibin hêz û wê li ser we hin tiştan ferz bikin.*" Divê li hemberî van nêzikatiyan jî me tedbîr bigirtana. Divê me hin gavên nû biavêtana, bi şêwazeke cûdatir di asta Sûriye de têkoşînek bimeşanda. Ev yek jî di 19`ê Tîrmehê de pêk hat.

Lê beriya wê ez dixwazim li ser Dêrikê hinek tiştên din bînim ziman. Ji milê rêxistinî û xebatên leşkerî ve me hinek vekir. Amadekarî û rêxistinbûna hêza parastinê bi navê `*Yekîneyên Xweparastina Kurdistan- YXK*`, ji warê ewlehiyê ve di derheqê hacîz danîn, dewriye avêtin û bajar girtinê de, me hinekî nirxand. Ango asteke leşkerî çêbûbû. Lê derdora wê jî berfireh bû; Girkêlegê, Rimêlan, Endîwer, Çilaxa jî li derdora Dêrikê bûn.

Di nava tevgera me de jî ji milê beşbarbûna şoreşê ve rihekî welatparêziya sade û girêdayî heye. Di destpêka şoreşê de li ser Dêrikê û li ser ew miletê welatparêz lîstok dihatin pêşxistin. Dixwestin wî miletî bixin bin kontrola xwe da ku bikaribin projeyên xwe ser bixin. Bi taybetî ji ber ku herêmeke nêzikî Başûr e, ji milê PDK`ê ve gelek lîstok li ser Dêrikê û derdora wê hebûn.

Parçebûnek di navbera gel de hatibû çêkirin. Hê di dema şerê Mele Mustafa de, gelek mirovan ji vê herêmê tevlêbûna şer çêkirine û piştgiriya xwe nîşan dane. Piştî wê dema ku tevgera şoreşgerî ya Apoger li Kurdistan û Sûriye tesîr dike, tevlêbûna şoreşê jî çêbûye. Li ser esasê tesîra tevgera Apoger, gelek kesên tevlî şoreşê bûne hene, welatparêzên pir xurt çêbûne. Mesela hevalê Xebat, hevalê Îsmaîl, hevalê Muhyedîn û hê gelek hevalên din ku di asta pêşengtiyê de tevlî şoreşê bûne hene. Bi giştî jî welatparêziyeke xurt û piştgiriyeke berfireh hatiye kirin.

Dêrik ji ber van sedeman ji milê gelek derdorên cûda ve jî weke navendeke dihat dîtin. Bi taybetî di salên 2011-12'an de li ser wî miletî gelek lîstokên giran dihatin meşandin. Ji milê gelek partî û hevrêziya ciwanan a girêdayî Artêşa Azad û PDK ê ku dibêjin tensîqiyatan ve û rasterast ji milê PDK ve gelek tevlîhevî di nava milet de dihatin avakirin. Lê bi zanebûn û şiyarbûna gel, ew lîstok bi ser nediketin. Cihê ku herî zêde dixwestin provaqasyonan çêbikin û Kurdan berdin hev, yek jî Dêrik bû.

Di pêşengtiya PYD û TEV-DEM'ê de tevgera me li Dêrikê înisîyatîf xistibû destê xwe, lê van tevgerên dîtir jî dixwestin înisîyatîfê bixin destê xwe. Ji ber vê yekê gelek propagandayên reşkirinê, meşên dijberî me dardixistin û

dixwestin ew welatparêziya xurt ku piştgiriyê dide me bigrin milê xwe, ji bo xwe bi kar bînin. Lê ew armancên wan ser nediketin.

Li Girkêlegê heman siyaset hebû. Li Endîwerê, her çiqasa di sînorê Bakûr de be û tê de gelek şehîdên me hebin jî, van partiyan jî dixwestin bikin navendeke xwe.

Ji milê din ve dewlet jî bi ser gel de çûbû û tirseke mezin dabû avakirin. Lê di vê navberê de ji milê siyaset û rêxistinbûnê ve kêliyên germ dihatin jiyankirin, zindîbûnek hebû. Siyaseta vê herêmê germtir bû. Lewra li Dêrikê hejmara zêde ya Kurdan hebû, welatparêziyeke xurt hebû. Ji ber vê yekê jî her kes giraniya xwe dabûn ser Dêrikê, da ku bikaribin netîceyan jê bigrin.

Weke me got, li vê herêmê hemû gundan propagandayeke çekdarî dihat meşandin û ji milê netewiyet û xweparastinê ve şiyarkirina gel çêdibû. Çilaxa jî navendeke partiyên dîtir bû. Çiqasa gelê Ereb jî li wir zêde be, di nava Kurdan de ew partî hakîm bûn. Ji ber ku eşîrek li wê derê bû û serokeşîrê wê bi Partiya Azadî û PDK ve girêdayî bû, ew partî di wê derê de xurt bûn. Bi vî awayî li Dêrikê, hemû Cizîr û Rojavayê Kurdistanê propagandaya PDK dihat belavkirin.

**‘Şehadeta hevalê Rûstem û hevalê Xebat pir bandor kir’**

Beriya ku em derbasî şoreşa 19’ê Tirmehê bibin, hin pêşketinên din ku li ser şoreşê bandor kirin hebûn. Ji wan yek şehadeta hevalê Rûstem Cûdî bû. Hevalê Rûstem, di nava tevahî Kurdistanê de dihat naskirin. Bi taybetî naskirin û têkiliyên wî bi gel re pir xurt bûn. Ji ber ku berê jî li Rojava xebatek meşandibû, gel behsa wî dikir. Çûye kîjan malê, bi danûstandinên xwe, bi rabûn û rûniştandina xwe, bi dilnizmiya xwe bandor li ser gel ava kiribû. Ji ber vê yekê dema ku şehadeta wî hat jiyankirin, bi taybetî li ser gelê Serêkaniyê û herêma Cizîrê li ser hemû gelê Rojava bandorek mezin kir.

**FOTO: RÜSTEM CUDİ’NİN RESMİNİN TAŞINDIĞI EYLEM – FOTOĞRAFI KULLANILACAK**

Serêkaniyê cihekî dîrokî yê Kurdan û mirovahiyê ye. Em dikarin bêjin hevalê Rûstem jî şoreşgerekî hemdem bû. Ji milê fikrî, welatparêzî, xeta têkoşîna rast ve şiyariyeke mezin û diyarbûnek da çêkirin. Ji her cihê Kurdistanê tevlêbûna merasîmê çêbû. Gelê me yê welatparêz weke pêlekê hat û bi awayekî xurt xwedî lê derketin.

Di avabûna şoreşê de, şehadeta hevalê Rûstem û hevalê Xebat pir bandor kir. Van şoreşgerên pêşeng ku bi xwe ji wê derê bûn bandoreke hestiyarî li ser gel çêkiribûn. Lê divê me ew hestiyarbûn, biziviranda rêxistinbûn û vîna gel. Bi wî rengî mirov dikare bibe bersiva şehîdan. Bi taybetî li Serêkaniyê pir bandor çêbû. Li Serêkaniyê taxek Kurd e, taxek Ereb e û yên din jî Ermenî û Asûrî ne, ji cihên dîtir yên Kurdistanê jî Kurd hatibûn û li wir bi cih bûbûn. Ango Serêkaniyê bûbû navendeke netewan.

Di nava gel de jî hev û din parastin û piştgiriyeke mezin jî hebû. Lîstokên dewletê pir zêde bandor nedibûn. Mesela pişt re gelê Kobanê jî bi piranî li Serêkaniyê bi cih bûbû û wisa jiyana xwe bi rê ve dibirin. Şehadeta hevalê Rûstem ew gel hemû kirin yek û bi wî rihî dest bi têkoşîn û rêxistinbûneke rast hate kirin. Şehadeta hevalê Rûstem bû sedemeke ku em bikaribin rêxistinbûna xwe di xeteke rast de bidin avakirin. Ez tenê tesîra wî li ser Rojava tînim ziman. Lê ji milê felsefîk, fikrî, zanebûna dîrokî û rêxistinî ve dihat naskirin.

Piştî hevalê Rûstem, şehadeta hevalê Sadiq jî hebû. Şehadeta van hevalan û merasîmên wan yên li Rojava ji bo gel manewiyeteke cûda û rihekî mezin da avakirin. Hevalê Sadiq, ji herêma Kobanê bû û weke zarokekî Kobanê piştî 2003’yan di nava tevahî gelê Rojava de xebat meşandibû, bandoreke mezin çêkiribû. Bi bihîstina şehadeta wî û anîna cenazeyê wî yê li Kobanê tesîreke xurtir da çêkirin. Ew şehadetên va hevalan weke xelekeke ku maneviyat didan gel bûn. Rihê şoreşê ava dikirin. Hemû hevalên ku di xebatên bingehîn yê Rojava de kar kiribûn; rih, şêwe, tanzîm û hêz dabûn xebatên me yên Rojava. Hevalê Sadiq jî ji wan hevalan bû. Ji ber ku ji milê her kes ve dihat naskirin, xwedî lê derketineke xurt jî çêdibû. Diyar dikirin ku di nava gel de çi berdel û êş dibin bila bibin, girêdaneke xurt ya xeta şehîdan heye.

Di hestên wan mirovan de me ew yek hîs dikir. Rondikên çavên wan gelek tişt îfade dikirin. Di dilê gel de ew hevalên ku di demên herî zehmet û teng de kar meşandine, divê bi şehadetê nevegeriyaba. Divê weke pêşengên gel bihatana ser axa Rojava û pêşengtiya şoreşê bikirana. Di nava têkoşîna azadiya gelê Rojava de cih bigirtana. Bi rastî jî gel di gelek demên cûda de pêwîstiya pêşengên wisa hîs dikir. Rewşa şoreşê hê ne diyar bû, di pêşerojê de xeterî jî hebûn. Ji ber vê yekê hebûna pêşengên ku ji gelek roj û demên teng re derbas bûne, baweriyeke mezin dida gel. Bi van sedeman şehadeta wan jî pir zêde tesîr dikir. An na, ne tenê tesîreke hestiyarî bû. Gel bi me dida hîskirin ku divê em di xeta wan hevalan de xebatên xwe bidin meşandin. Peyama “*hûn ê di xeta van hevalan de*

*bikaribin pêşeroja me bibînin û hûn dikarin li gorî wê kar bikin*" didan me. Vî gelî di heman demê de peyameke xurt dida dewleta Sûriye û hêzên derdorê jî ku digotin "*ew ji bo Rojava têkoşîn nakin, li ber xwe nadin.*"

Mesela gel dît ku hevalê Xebat bi rihekî çawa tevlî şoreşê bû, dema ku pêwîst kir vegeriya Rojava û xebatên gelê Rojava meşandin. Bi destê xiyanetkeran hat qetilkirin. Çawa hevalê Rûstem, bi têkoşîna vî gelî xwe dabû avakirin, hevalê Sadiq di demên herî zehmet de di nava gel de, têkoşîn û parastina gel dabû ser milê xwe; dema ku ev rastî diyar dibûn tesîreke mezin li ser gel çêdikir. Lîstokên wan hêzên dîtir jî vala derdiketin. Ew rihê xwedîderketina şehîdan dema ku derdiket holê, hêza vîna gelê Kurd û girêdana Tevgera Azadiyê jî diyar dibû.

Ji hêla din ve ev hebûn û hêza yekgirtî ya vî gelî, dewlet ditirsand. Ji bo xwe xeterî didît. Ew rih ji ber ku di 1961'an de jî hîs kiribûn, komkûjî pêk anîbûn. Mînaka Sînemaya Amûdê hê jî di bîra mirovan de zindî ye. Careke dîtir ew rih zindî dibe û weke kulîlkeke vedike. Bi zanebûn, bi tanzîm, bi yek fikir û yek helwestê tevgerîna gelê Kurd, zêdetir dewleta Sûriye ditirsand. Ji milekî ve dewleta Sûriye, ji milekî ve jî hindek derûdorên şoven yên Ereb ku li herêmên Rojava jiyan dikirin, di nava fikaran de bûn. Beriya ku em derbasî nava şoreşê bibin, qonaxeke bi vî rengî jî hebû.

**2-Li Herêma Cizîrê Roja Rûmetê: 19'ê Tirmehê**

Wateya Şoreşa 19'ê Tirmehê çi bû, an jî li ser kîjan esasê hate pêş xistin? Me di destpêkê de hin tişt vekirin. Lê bi taybetî çima di vê serdemê de bîryara pêkanîna şoreşê hat girtin. Ji ber ku em wek tevger girîngî didin demê; me li Rojava jî dem, şert û mercên heyî baş dinirxandin. Bi rastî jî gav bi gav bi awayekî plansazî meş çêdibû.

Şert û mercên netewa Kurd û Kurdistanê, yên Rojavayê Kurdistanê û Sûriye di ber çavan re dihatin derbaskirin. Bi vî awayî em gihiştin asta hêzeke xurt a leşkerî. Her kes jî dizanî ku êdî di Rojava de hêzeke xurt ya gel heye. Lê ew hêza leşkerî dê bi erka xwe çawa rabe, ne diyar bû. Divê ew yek bihata zelal kirin. Li ser vê esasê nîqaş û tehlîl hatin kirin.

**FOTO: HALK YÜRÜYÜŞÜ- FOTOĞRAFI KULLANILACAK**

Bi nîqaşeke li ser tevgerên hêzên derveyî û yên Sûriye tehlîleke rast hate kirin û gaveke di cih de hate avêtin. Ya yekemîn, li hemberî dewleta Sûriye di bin navê '*Artêşa Azad*' de, hêzeke leşkerî çêbûbû. Berê siyasî bû, serhildanên gel bûn, dewletê nikarî bi komkûjiyan pêşiya wê bigre. Di pêngava duyemîn de derbasî şerê çekdarî bûn. Li welatên weke Tirkiye, Qeter û Siûdiyê ketîbe ango taburên xwe yên leşkerî rêxistin kirin û li ser vê bingehê xwestin têkoşîna xwe êdî bigihînin asta hilweşandina dewletê. Ji ber ku dewlet gavan navêje, guhertinan çênake, rejîma heyî îstîfa nake û ji bo Sûriyeke nû mecal nade. Divê êdî bi şerê çekdarî rista şîdetê biketa rojevê. Atmosferek bi vî rengî hebû.

Ew yek li her cihê Sûriye û Rojava dihate hîskirin. Di qada navnetewî de jî ji milê Artêşa Azad ve amadekariyeke wisa dihat kirin. Teorîsyen û pratîsyenê vê yekê dewleta Tirkiye jî di nav de hindek dewletên herêmî û hêzên cîhanî bûn. Ew plan êdî ketibû meriyetê. Li gelek cihên Sûriye û derdorên Rojava şer destpê kiribû. Bersivdayina dewletê jî çêdibû, lê di nava wan de jî parçebûn û tevlîheviyek pêş diket. Dewleta Sûriye rewşa xwe ya herî lawaz jiyan dikir.

Li Rojavayê Kurdistanê jî heman amadekarî hebûn. Didîtin ku me li Rojava hêzeke çekdarî ava kiriye û em hin amadekariyan dikin. Tensîqiyatên ciwanan û partiyên dîtir yên Kurd jî, amadekariyek dikirin. Ew ciwanên Rojava ku koçberî Başûr bûne, kom dikirin û perwerde dikirin. Pergaleke pêşmergeyan rêxistin dikirin. Da ku bibêjin "*vaye ew ciwanên Rojava ne, em dixwazin ji bo piştgiriya Rojava mûdaxele bikin û parastina van herêman bikin.*" Weke rêxistin ew rastî ji milê me ve jî dihatin dîtin. Lê me çawa dikarî di cih û dema wê de gavek biavêta û serkeftin bi dest bixista? Ji ber van sedeman wek gava yekemîn Kobanê, mîna navendekê hate dîditin.

***Sedem çi bû ku Kobanê weke navendekê hat dîtin?***

Ya yekemin, li Kobanê cihekî stratejîk yê gel hebû û hemû Kurd bûn. Di nava şoreşê de sekneke xurt ya Kobanê hebû. Lê derdorên wê ji xeteriyan re vekirîbû, ji bo ku bi awayekî em bikaribin gelê xwe yê wê derê biparêzin, divê di wê derê de destpê bikira. Cizîr hindekî cûda bû, navendeke mezin a rejîmê ya leşkerî bû û ji bo giştî derxistina wan demek dirêj pêwîst dikir. Ji ber ku gelek pêkhateyên cûda jî hebûn, bi carekê re di nava wan de gavavêtin xeterî bû. Ji ber vê sedemê plansaziya şoreşa 19'ê Tirmehê di destpêkê de ji bo Kobanê hate çêkirin.

Lê li deverên din jî ji bo rewşên awarte amadekarî çêdibûn. Her wiha ger li ser şoreşa 19’ê Tirmehê ku li Kobanê destpê bike, rewşeke cûda pêş biketa, an jî xeteriyek derketa, ji bo mûdaxaleyî wê derê bê kirin li cihên dîtir jî amadekarî dihatin kirin. Hemû hêzên YPG di nava wê amadekariyê de bûn.

Hê jî dewlet di nava Kobanê de bû. Li Minbicê dewletê tesîra xwe winda dikir, her wiha li Babê dewlet lawaz ketibû. Ji warê leşkerî ve tenê li Cizîrê tevgera tensîqiyatan çênebûbû. Ji milê serhildanên Ereban ve jî, tevgerek çênebûbû. Bêdengiyek hebû, lê her kes li bendê bû ku ew bêdengî ka dê çi derbixe holê. Ger şerek çêbibe, dê helwesta dewletê çibûya? Ji ber ku Cizîr navendeke dewletê bû jî, zû bi zû dev jê bernedida. Hindek Erebên li herêmê ji ber ku ev rewş dîtibûn, tirsek jiyan dikirin.

Roja ku li Kobanê serhildan çêbû û hevalan dest danîn ser cihên dewletê, diyar bû ku çiqasa di dem û cihê xwe de çêbûye. Piştî wê me agahiya plansaziyên Artêşa Azad girtin. Wan jî plan kiribûn ku di 21’ê Tirmehê de derbasî Kobanê bibin û bêjin me Kobanê rizgar kiriye. Dê bi vî awayî ajîtasyon û propagandayek dabûna destpêkirin.

Ya duyemîn jî, ji milê Başûr ve; ger em neketiban herêma Dêrikê û ji milê leşkerî ve me tedbîrek negirtiba dê pêşmerge jî ji Başûr ve derbas biba û milê Dêrikê bigirta. Bi vî rengî Artêşa Azad dê Kobanê bigirta, pêşmerge jî Dêrikê bigirta. Her çiqasa me têkoşîn dabe, xebat meşandibe û pergalek dabe avakirin jî; dê dest bida ser Kobanê û ew vîn û rêxistinbûna gel.

Dema ku li Kobanê şoreşa 19’ê Tirmehê pêş ket, bi awayekî serkeftî destdanina ser hemû saziyên dewletê çêbû û herêm hate kontrolkirin; ji ber ku agahî di destê me de hebû, em jî li Dêrikê ketin tevgerê. Lewra dê pêşmerge bihatana û li qadên ku em diparêzin, dê xwe ferz bikirana. Her çiqasa li ser sînor leşkerên rejîmê hebûn jî, di navbera dewleta Sûriye û PDK`ê de jî peymanek hatibû çêkirin da ku herêma Rimêlan ji PDK re berdin.

Di 17-18’ê Tîrmehê de me hêzên xwe yên parastinê li sînor bi cih kirin. Her çiqasa hêzên rejîmê jî li ser sînor hebûn, me li hemberî sînorê wan sînorekî sêyemîn çêkir. Sînorê ewil ji milê Başûr ve yê pêşmergeyan bû, sînorê duyemîn yê dewletê bû, yê seyemîn jî hêzên YXK ava kirin û girtin.

Roja destpêkirina şoreşê 19`ê Tîrmehê, di heman demê de roja îlana Yekîneyên Parastina Gel - YPG bû jî. Bi vî rengî li hemû devaran me yê hêza xwe di bin navê YPG`ê de derbixista qadan. Êdî hêzên leşkerî ne weke YXK bûn, ji milê parastinê ve jî em derbasî qonaxe nû dibûn. Bi vî rengî me dest bi şoreşê kir.

Di 19’ê Tirmehê de Kobanê hate rizgarkirin û şoreş destpê kir. Di 21’ê Tirmehê de hin cihên dîtir hatin rizgarkirin. Piştî wê em jî ji bo Dêrikê ketin tevgerê. Dema ku dîtin Kobanê hate rizgarkirin, wan jî hema lez kirin da ku pêşmergeyên xwe bînin Derîkê. Lê weke me got, me sînor girtibû.

Dema ku dewletê dît me sînor girtiye, fêm kirin ku dê hin tişt biqewimin û ew jî ketin nava tirsekê. Fêmkirin ku ger tiştek biqewime, dewlet jê re ne amade ye. Çend baregehên xwe yên nêzikî sînor berdan û reviyan. Dema tiştên xwe kom dikirin ku birevin, hevalên me yên wê derê ku amade bûn, dest danîn ser. Me dixwest em çekên wan jî bigrin, da ku em bikaribin parastina wan deran bikin. Hevalan gotibû, “*hûn dikarin çekên xwe daynin û biçin.”*

Li herêma Dêrikê mexfer ango baregeha yekemîn ku hatine girtin Kelhê bû, Girbelat bû, Til Xenzîr bû. Di mexferekî de pevçûn derketibû û hevalekî me birîndar bûbû. Dema ku me xwest em çekên wan bigrin, li ber xwe dan. Di encamê de bê bandor hatin hiştin û dîl hatin girtin. Bi wî rengî destdanina ser çekan çêbû.

Piştî ku me dest danî ser van her sê mexferan û li Kobanê jî şoreş çêbû, gelê Dêrikê jî ket nava atmosferekî şoreşê. Jixwe dema ku gel didît, me hemû hêza xwe derxistiye qadê û em di nava amadekariyekê de ne, coş û moral digirt. Ji ber ku li ser wan tûndî û zilma dewletê pir çêbûbû, dixwestin rojek beriya rojekê ji dewletê xilas bibin.

Dema ku me ew her sê mexfer girtin, me dît ku li ser sînor jî tevgerek çêbû. Jixwe li ser sînor nêzî 20 mexferên dewleta Sûriye hebû. Panîkek di nava wan de çêbû. Jixwe em li wê derê bûn, gotin “*we sînor girtiye, hûn li vê derê çi dikin?*” Xwestin me ji wê derê dûr bixin. Ji bo vê di seat 9`ê sibê de pevçûnek jî qewimî. Êdî ev plansaziya wan bû, yan ya Başûr bû nizanim. Lê bertekeke wisa nîşan dan û xwestin hevalên me yên wê derê bê bandor bikin. Bi doçqayan li hevalan xistin, lê hevalan jî li ber xwe dan û pevçûn çêbûn.

Di cihekî de 3 leşkerên dewletê hatin kuştin, çendek jî dîl hatin girtin, çekên wan ketin destê me. Hêzeke wan ya din xwestin mûdaxale bikin, ew jî ketin kêmîna me û di wir de jî kuştî û birîndarên wan çêbûn. Dema ku dîtin em paş ve gav navêjin û em bi bîryar in, di nava hêzên wan yên sînor de aloziyek çêbû û baregeh tevahî berdan. Şervanên YPG ketin cihên wan. Ji gundê Kelhê bigre, heye gundê Zerê ew xet tevahî berdan. Xwe kişandin navenda xwe. Navendeke mezin ya leşkerî bû. Me xwest em bigihêjin wan û çekên wan ji dest bigrin, lê reviyan û ji milê dîtir re xwe gihandin sînorê Til Koçer.

Li Dêrikê bi vî rengî pêngava yekemîn li ser sînor çêbû. Lê ji me re agahî hat, gotin milet di nava Derîkê de jî destpê kiriye. Êdî milet xwe bi xwe ketibû nava serhildanan û şoreşê. Dema ku gel bihîstîbû, me şer kiriye, gelek leşkerên Sûriye hatine kuştin, birîndarên me çêbûne û me sînor girtiye, kelecanî û atmosferek di nava gel de

çêbûbû û xwe bi xwe rabûbûn serhildanê. Dest danîbûn ser mexferên polîsan, ser şaredariyê; saziyên Emin Cewî, Emin Siyasî, Emin Eskerî, Emin Dewle. Cihên wan yên mûdûriyet û fermandariyê hemû ketibûn destê gel.

Her wiha li Endîwerê jî gel rabûbû ser piyan, dest danîbûn ser mexferê û polîs reviyabûn. Bi rastî jî kelecanî û morala şoreşê çêbûbû. Em neçar man ku hevalekî rêveberiyê bişînin, da ku rewşa bajêr bixe bin kontrolê. Dema ku gel dest dida ser wan cihên dewletê, hevalên me yên ku di nava gel de xebat dimeşandin jî hebûn.

Di hundirê bajêr de Emin Eskerî li ber xwe da û pevçûn çêbûn. Wê demê ji ber ku di nava bajêr de paqijkirina dewletê ne di plana yekemîn de bû, hêzên me yên leşkerî li milê sînor bûn. Jixwe me 3 mexferên nêzî sînor destpêkê de paqij kirin, bi giştî li ser sînor nêzî 50 mexferî, me paqij kir. Divê me pişta xwe xurt bikira û berê xwe bida bajêr. Lê bêyî ku em bikin nava plana xwe gelê Derîkê ew hewayê şoreşê girtibû û bi carekê re rabûbûn. Lê di Emin Eskerî de li ser milet gule reşandibûn.

Wê demê hevalekî me ji bo tedaviya xwe li Dêrikê bû. Dema ku ew heval ku navê wî Bawer e, dibîne li ser gel direşînin, ew dixwaze pêşengtiya gel bike. Ji bo ku gel biparêze, gel dixe tanzîmê. Di nava van hewldanan de hevalê Bawer jî birîndar dibe. Pişt re hevalên din dikevin dewrê, da ku gel ji xeteriyê dûr bixin û bi rêbazeke din mûdaxaleyî Emin Eskerî bê kirin. Jixwe pişt re Emin Eskerî jî hate girtin.

Bi vî awayî li navenda Dêrikê û milê xeta sînor paqij bûbû. Lê Girzîro û derdora Dêrikê hin cihan hêzên dewletê mabûn. Bi xetên ku ketin destê me re, me YPG jî îlan kir. Vê yekê bi xwe re coşek çêkir. Dema ku me li herêma Koçeran dest da ser mexfera Til Xenzîr, ji me re agahî hat ku hêzeke ji 30-40 leşkerî pêk tê parastina fabrîqaya gazê dike. Gotin “*ew jî dixwazin birevin, ger êrîşek bê ser wir karmendên wê derê jî amadekarî dikin ku birevin.*” Heya ku em çûn wê derê, jixwe leşker reviyabûn. Me ji karmendan re jî got, “*weke YPG êdî em parastina we dikin, hûn karê xwe bidomînin.*” Bi vî awayî me dest danî ser kargeha gazê jî.

Ji berê ve hêz û amadekariyeke YPG hebû, lê bi dewletê re rû bi rû mayin û şer kirin, her wiha li hemberî Artêşa Azad sekinîn, cara yekemîn bû. Cara yekemîn em dihatin hemberî hemû saziyên dewletê û artêşa wê. Di vê astê de hevalên xwedî ezmûn jî tune bûn. Hevalê Firat, berpirsiyarê wê hêza ku li ser sînor şer kirî bû, hin hevalên din ku pêşengtiya hêzên leşkerî dikirin hebûn. Lê hejmara hevalên xwedî danehev pir kêm bû.

Mexferek li Gundê Sêmalka hebû, weke navendeke Emin Cewî bû. Li ser ava Dîjle bû, bi riya wê derê têkiliyên xwe bi Başûr re didan çêkirin. Jixwe di navbera wan û Başûr de tenê ava Dîjle hebû. Wan jî xwestin hinek ber xwe bidin, lê bi pevçûnan ew jî dîl hatin girtin. Me li ser wir jî dest danî.

Vê yekê bi xwe re rihek da çêkirin. Nîşan da ku şoreşa Rojava û pêngavên ku tên avêtin çiqasa xwediyê wateyekê ne. Ger di demeke wisa de me ew bîryar negirta û ew gavan neavêtana, dê gelê me yê Rojava biketa dorpêçkirinekê. Dê rewşeke giran bihata jiyan kirin. Jixwe gel jî fikara vê dikir, me yê bikariya di dema xwe de gel biparêzin, yan na? Her ew tirs jiyan dikir. Her çiqasa me propaganda dikir ku, em dikarin wan biparêzin lê dibêjin ku “*heya Kurd bi çavên xwe nebînin, bawer nakin!*” Bi taybetî ji ber ku gelek zilm hatiye serê gelê Rojava û gelek êş kişandine, heya roja 19’ê Tirmehê ku ew hêz û îrade dîtin, her tirs û fikarek hebû.

Di heman demê de Efrîn jî hate rizgarkirin. Kobanê, Efrîn û Dêrik, van deran pêşengiya şoreşê kiribûn. Di van deran de piranî Kurdan jiyan dikirin. Tesîra şoreşê zêde bû û teyîsî ser bajarên din yê Cizîrê jî. Jixwe me Girkê Lekê jî girt, Endîwarê jî hat girtin.

Li herêma Dêrikê tenê Çilaxa mabû. Ji ber ku ew jî navendeke dewletê bû, me dest nedabû ser. Rimêlan mabû, lîvayekî leşkerî ya mezin derveyî Dêrikê mabû. Li Girzîro hêzeke mezin ya leşkerî mabû. Di sînorê Koçeran de hêzeke dewletê mabû. Deverên dîtir bi giştî hatibûn rizgarkirin. Ew hêzên dewletê yên mayî jî ketin bin bandora me. Êdî di dorpêça me de bûn, çûnûhatinên wan, tevgera wan tevahî di bin kontrola me de bû. Hêzên dewletê jî di nav de, kê bixwesta bikeve van herêman û derkeve, bê kontrola me nedikarî derbas be.

Li Dêrikê girekî ku wek `Qereçox` tê bi navkirin hebû. Li wê derê jî navendeke kontrolkirina telefonan û îstasyonên radyo û televîzyonan hebû. Li wê derê jî yekîneyeke leşkerên dewletê hebûn. Piştî me cihên xwe girtin ewlehiyê, me ew der jî xist kontrola xwe. Araziyeke stratejîk bû, mirov dikarî li ser araziya di navbera Dêrik û Koçeran wan deran de hakîmiyeta xwe çêbikira. Gava yekemîn ya şoreşê, me bi vî awayî bi dawî kir. Di pêngava yekemîn de Kobanê, Efrîn û Dêrik hate rizgarkirin. Vê serkeftinê moraleke mezin da gel.

Bi vî awayî plansaziyên hemû hêzên herêmê li ser Rojava, bi berxwedan û şoreşê vala derketin. Plansaziya yekemîn ku vala derket, peymana dewleta Sûriye û pêşmergeyan bû. Li ser Rimêlan îttîfaq kiribûn, ew vala derket. Di nava pêşmerge û Artêşa Azad de jî peyman hebû. Divê Artêşa Azad Kobanê bigirta, pêşmergeyan jî di heman demê de Dêrik rizgar bikira. Ew jî vala derket. Dewleta Sûriye jî li hemberî vîna gel û têkoşîna me vala derket. Hêzên weke dewleta Tirkiye, ji bo ku Kurdên Rojava nebin xwedî vîn û xwedî pergal, piştgirî didan van planan û ew jî vala derketin. Nedikarîn siyaseta xwe ya ser Rojava rasterast bimeşînin. Bi destê hin hêzên din dixwestin siyaseta xwe bimeşînin. Lê ji ber ku me mecal neda siyaseta wan, me helwesteke gelêrî, şoreşgerî û leşkerî pêş xist; di

heman demê de ji gelê Erebê herêmê re, me nêzikatiyeke erênî nîşan da, ew hêz jî bi tevahî vala hatin derxistin. Tiştekî ku bikaribin li hemberî me bi kar bînin, me di destê wan de nehilişt.

Wê demê Tirkiye, bi NATO'yê ve jî di nava hevsengiyekê de kar dikir. Ji ber ku Tirkiye di şerê Iraqê de jî mûdaxale nekiribû, di şerê Sûriye de dixwest derkeve pêş. Ji bo vê yekê li gel Emerîka, Qeter, Siûdî, PDK û Artêşa Azad siyaseteke taybet dimeşand. Di bin vî navî de jî dijberiya Kurdan dikir.

Du xwestekên esas yên Tirkiye hebûn; yek hilweşîna rejîma Sûriye bû, ya duyemîn û ya herî girîng jî ew bû ku nehêle Kurd bibin xwedî statû û mafê xwe. Nedixwest Kurd bi zimanê xwe, bi vîna xwe, bi hêza xwe tiştekî bike. Dizanî ku amadekariyeke me ya leşkerî jî heye, ji ber vê lez dikir ku dest bide ser van herêman û me bê bandor bihêle. Ji vî milî ve wateyeke siyasî mezin a vê şoreşê hebû. Peymanên weke Sykes Pîcot û Lozan ku ji dîrokê ve li ser gelê Kurd tên ferzkirin, lîstokên rojane yên li ser gelê Kurd û Rêber Apo di astekê de vala hatin derxistin.

Ew siyaset hemû hêdî hêdî hatin şikenandin. Şoreşa 19'ê Tirmehê xwediyê wateyeke wisa ye. Şoreşê moral û bawerî da hemû gelê Kurd, her wiha di heman astê de gêlên din yê herêmê jî jê tesîr bûn. Di van herêman de ne tenê Kurdan, Ereb, Asûrî, Ermenî jî jiyan dikir. Piştî ku şoreş çêbû jî, nêzikatiyeke şaş li hemberî van gelan çênebû. Dijberî wê, rêka siyasetê ji wan re hate vekirin, pêngavên demokratîk hatin avêtin. Me ew beşdarî hêzên parastinê kirin. Her çiqasa derveyî me jî partiyên Kurd hebûn, me bangawazî ji wan re jî kir, da ku bên û tevlî şoreşê bibin. Bangawazî ji wan re hate kirin ku hem beşdarî siyaseta demokratîk bibin, hem tevlî avakirina pergaleke demokratîk bibin, hem jî bangawaziya parastina qadên ku hatine rizgarkirin çêbû.

Van pêngavên şoreşgerî ji bo her kes girîng û erênî bûn. Ji ber ku me hem di dema wê de, hem di cihê wê de, hem jî bi şêwazeke şoreşgerane pêk anî, serkeftin jî çêbû. Planên komplogerî û siyasetên li ser gelê Kurd tên meşandin vala hatin derxistin. Bi vî rengî şoreşa Rojava tesîreke mezin da çêkirin.

Piştî wê li Dirbêsiyê û Amûdê jî ji bo destdanîna ser sînor û deshilatdariya dewletê amadekariyek hebû. Li Qamişlo ji berê ve pergalek dihat meşandin. Ji ber ku tenê di 2 taxan de Ereban jiyan dikir û deverên din Kurd bûn. Kurdan bi awayekî vekirî pergala xwe ava kiribûn û parastina xwe dikirin. Jixwe gelek cihên dewletê ku di nava Kurdan de dimînin, gel dest dabû ser. Xwe bi xwe rêvebirinek hebû.

Ji milê Qamişlo ve weke gava yekemîn girtina hinek saziyan, girtina hinek hacizên ser rêkên ku tên Qamişlo, çêbûbû. Êdî YPG li gelek cihan haciz danî û parastina bajêr dikir. Li Qamişlo jî ji bo şoreşê tevlêbûnek hebû.

Di roja destpêkê ya şoreşê de li Dêrikê hevalê Bawer birîndar bû. Ji ber ku birînên wî xedar bûn, roja dîtir şehîd ket. Şehadeta wî jî li ser gel tesîreke mezin da avakirin. Lewma li herêma Dêrikê şehîdê yekemîn yê şoreşê bû. Berê jî hevalekî birîndar bû, lê di serhildanan de jî pêşengtiya gel kiribû. Gel ji hêzên rejîmê parast. Kesên pê re digotin, "*me çawa nikarî hevalekî birîndar biparasta.*" Ji ber van sedeman bi awayekî xurt gel lê xwedî derket. Di nava coşa şoreşê de şehîdbûna wî, ji milekî ve hêzek di gel de çêkiribû, bawerî û vînek pêş xistibû. Ji milekî ve jî xemgîniyek çêkiribû.

Li Dêrikê, di pêngavên din de me dixwest cihên ku di destê dewletê de mane, gav bi gav rizgar bikin. Me dixwest Girzîro, çend navendên di navbera Koçeran û sînorê Iraqê de mane û navenda Rimêlanê rizgar bikin. Divê ew her sê cih me di carekê de bistanda. Li ser vê esasê nîqaş û plan pêş ketin. Li gorî vê arastebûn çêbû û me dest bi pratîkê kir.

Wê demê hejmara hevalan kêm bû; hevalê Mehmud çû milê Rimêlan û Girkêlegê, hevalê Derwêş û hevalê Doxan jî li milê Dêrikê man. Ez û hindek heval jî bi ciwanên wê herêmê re ji bo Girzîro û hinek mexferên dewletê ku li herêmê mane paqij bikin, ketin tevgerê. Li ser vê esasê pêngavê destpê kir. Di roja ku hatiye diyarkirin de her kes dest bi tevgerê kir.

Gava yekemîn, me li sînor avêt. 2 cihên wan û 3 mexferên biçûk hebûn. Me ew cih dorpêç kirin, me ji wan xwest çekên xwe deynin û wê derê terk bikin. Cara berê jî kesên ku me dîl girtine, li ser esasê me ew jî ji dewletê rizgarkirine, me berdan. Wê demê leşkerên dewletê nediwêrîn ji leşkeriyê birevin, kî direvî ji pişt ve lê didan, di kuştin. Gelekên wan jî nedixwestin şerê me bikin, an jî nedixwestin di şerê Sûriye de werin kuştin. Ji ber wê em jî wisa nerm nêzik dibûn. Me di destpêkê de dikirin dorpêçê û me şertên xwe lê ferz dikirin.

Nêzikatiya me ew bû; bê ku em wan bikujin, me dixwest em wan bê bandor bikin û ji herêmên xwe derbixin. Ew leşker di navberê de mabûn, ger bireviya dê rejîmê ew bikuştana. An jî ew hêzên mûxalîf dikarîn wan bikûjin. Em jî weke xeterî didîtin. Lê dema ku dîtin me li Dêrikê şoreş çêkir û leşker ne kuştin, nedixwestin şerê me bikin. Dema ku me ew cih û mexfer xistin dorpêçê, hevalên dîtir jî ew milê Rimêlan xistibûn çemberê. Armanca me ne kuştina hejmareke zêde ya leşkeran bû. Armanca me qadên xwe paqij kirin û bûyina hêza parastina herêmên xwe bû. Dorpêçê çend rojan berdewam kir, me çend caran ji ser wan re gule avêtin, me xeber ji wan re şand. Di encamê de ji wê qadê derketin qebûl kirin. Bi vî awayî me dest da ser wan cihên sînor û heval tê de bi cih kirin.

Di vê navberê de Girzîro jî di dorpêça hevalan de bû, lê hê rewşa wir ne diyar bû. Ji ber ku Girzîro û Rimêlan navenda şîrketê bû jî, parastina wir jî xurt bû. Ji ber vê em jî hasas nêz dibûn. Lewma ger pevçûnek dijwar çêbûbûya, dê ew der hemû bişewitiya, biteqiyaba.

Bi vî rengî herêma me gav bi gav paqij dibû. Piştî ku Girkêlegê û ew mexferên di sînor de jî hatin paqij kirin, li herêma Dêrikê tenê Rimêlan, Çilaxa û Girzîro man. Di wê serdemê de, hêzêke ew qesa mezin ya dewletê bêçek kirin û ji herêmên xwe derxistin, serkeftinek mezin bû. Şoreşê ew yek ji me dixwest. Bêyî ku pevçûn derkevin, birîndarî û şehadet çêbibin; cihên xwe paqijkirin û pergala xwe xurtkirin, tiştê herî esas bû. Wê demê hêza me ya heyî jî, ne pir xwedî ezmûn bû. Ger bi dewletê re şerên pir mezin çêbûya, dê berdelên giran jî bihata dayîn.

Hinek hêzên dîtir jî dixwestin em û rejîm bikevin pevçûnan, em bi rejîmê re mijûl bibin û ew jî werin û hin cihan bigrin. Ji ber van sedeman me rêbazên pir hesas bi kar dianîn. Em bi van rêbazan digihiştin encamê û bi bandor jî dibûn.

Dema ku me li herêma Dêrikê ew cih bi vî rengî rizgar dikirin, li Sêrekaniyê êrîşan destpê kir. Serêkaniyê wê demê nehatibû rizgarkirin, lê piraniya Dirbêsiyê û Amûdê hatibû rizgarkirin. Di navenda bajêr de çend cihên rejîmê mabûn. Jixwe pişt re ew cih jî hatin rizgarkirin. Li Qamişlo jî hinek gav hatin avêtin û hinek dever hatin rizgarkirin. Li Sêrekaniyê herêmên ku Kurd tê de jiyan dikin, jixwe hatibûn rizgarkirin û dihatin parastin. Lê hêzên mûxalîfan êrîşî navendên dewletê kirin û ew der girtin.

Li Til Temir jî navendên dewletê hebûn, lê dema ku li Serêkaniyê pevçûn çêbûn, hevalên me dest danîbûn ser wan navendan. Dewletê jî xwe paş ve kişandibû. Li Sêrekaniyê jî ji hêzên dewletê yên ku karîbûn, xwe paş ve kişandibûn Hesekê, yên din jî ji hêla Artêşa Azad ve hatibûn kuştin. Li Serêkaniyê yên ku bi Artêşa Azad re şer kirin, Emin Eskerî bû. Lê Artêşa Azad ew şikandin û dest danî ser navendên wan. Di navbera Sêrekaniyê û Bakurê Kurdistanê de deriyê sînor yê Tirkiye hebû, ew jî ket destê Artêşa Azad. Ew pêşketin ji bo me nîşaneyên xeteriyê bûn. Bi destdanîna ser van navendan, Artêşa Azad xwest hebûna xwe li ser me ferz bike. Rêxistinbûna me û hêzên me jî hebûn, me dikarî wê derê jî paqij bikin. Lê ji ber ku em bi cihên dîtir re mijûl bûn em dereng ketin. Artêşa Azad ket wê derê.

Vê yekê bi xwe re gelek encam derxistin. Plansaziyên me yên Dêrikê yekser pêk nehatin. Me hinek cih rizgarkirin, lê Rimêlan û Girzîro man. Me zêdetir bala xwe da piştgiriya şerê Serêkaniyê. Ew pêngava Dêrikê nîvçe ma.

Bi vî awayî rihek çêbûbû, tevlêbûneke zêde çêdibû. Me akademiyên leşkerî vekiribûn. Berendamên YPG û YPJ di van akademiyan de dihatin perwerde kirin. Jixwe hejmara YPG jî zêde bûbû. Divê ew jî bihata rêxistinkirin û perwerdekirin û di asta şer û teknîkê de bihata pêş xistin. Di şerê dewletê û di şerê Serêkaniyê de jî ezmûneke şer çêbû. Her wiha di van şeran de hin çekên me yên giran jî çêbûbûn. Li ser vê esasê me bîryar girt ku di asta Rojava de konferansa YPG çêbikin.

Di 1'ê Çile 2013'an de konferansa yekemîn ya YPG hate lidarxistin. Di navbera 150-170 de delege, bi tevahî jî 300 kes tevlê bû. Hemû partiyan û gelên dîtir jî nûnerên xwe şandibûn. Divê diruşmeyeke hevpar hebûya û hemû hêzan di bin banê YPG'ê de cihê xwe bigirta. Me digot, "*nakokiyên siyasî çi dibin bila bibin, YPG hêza parastinê ya giştî Rojava ye û dê di her şert û mercî de gelên Rojava biparêze.*" Bi vî awayî YPG dibû hêzeke bingehîn ya Rojava û divê li derveyî vê tû hêz tuneba.

***Gelo hemû hêzên li Rojavayê Kurdistanê ev yek qebûl kiribana, ev ê çawa pêk bihata?***

Divê Asûrî, Sûryanî, Ermenî, eşîrên Ereb û hemû pêkhateyên Rojava jî di nava YPG'ê de cihê xwe bigirtana. 3 eşîrên esasî yên Ereb li Rojava hebûn, du eşîr di navberê de mabûn, yek jî li gel dewletê bû. Lê me dixwest ew jî di nava şoreşa Rojava û hêzên leşkerî de cihê xwe bigrin. Jixwe hêzên Artêşa Azad hêdî hêdî ber bi qadên ve dihatin û dê hinek tişt li ser wan ferz bikirana. Ji ber vê em bi wan re her di nava têkiliyan de bûn. Beşdarbûna wan derdoran ya konferansê jî çêbû. Rewabûna YPG bi erêkirina van partiyên siyasî û gelên herêmê jî çêbû. Ya din jî ji ber ku em dibûn hêzeke leşkerî, divê rêzikname û qanûnên me bihata diyarkirin. Li ser esasê rexne û pêşniyaran ew tişt hemû hatin pêkanîn.

Mînak, li herêmên Rojava û Sûriyê hin ketîbe û çete derdiketin û xwe îlan dikirin. Dê li hemberî rejîmê çawa şer bikin, armanca wan çi ye, rêgez û pîvanên wan çi ne? Tiştek ne diyar bû. Rêxistinbûna xwe li ser esasê talan û ji xenîmetan pargirtinê pêş dixistin. Gel jî ew yek didît û nêzikî wan nedibû. Bi vî awayî rêxistinbûna wan xeterî jî derdixistin. Li ser vê esasê divê rêzikname û rêgez bihata diyar kirin. Ala hêzên leşkerî, kincên wan, navend û rêveberî, perwerde, qanûnên girtin û tevlêkirinê, zagonên leşkerî û hwd bihata diyarkirin. Konferansa ew mijar hemû zelal kirin. Tiştê herî esasî jî perspektîfên pêşerojê zelal kirin û bîryara hêza parastina jinê YPJ hate standin. YPJ jî dê pişt re konferansa xwe li dar bixista.

***Piştî konferansê pratîkeke çawa pêşket?***

Çawa ku konferans xilas bû, em derbasî rizgarkirina herêmên mayî bûn. Şerê Serêkaniyê di nîvî de mabû, pêngava Dêrikê jî nîvçe mabû. Li cihên weke Girzîro, Rimêlan û Çilaxa hê jî hêzên dewletê hebûn. Her wiha li Tirbespiyê, gelek cihên Qamişlo û herêmên Kurdan yên Hesekê dewlet hebû. Divê ew hêz ji wan deran bihata derxistin.

**3-Rizgarkirina Girzîro**

Li ser vê esasê roja piştî konferansê me hêza xwe girt û em ji bo rizgarkirina Girzîro û Rimêlan ketin tevgerê. Me Girzîro xist dorpêçê û gav bi gav dorpêç hate teng kirin. Di 4'ê Çile de bi awayekî serkeftî konferans bi dawî bû, di 6'ê de jî pêngava Girzîro destpê kir. Dorpêça Girzîro 11 rojan berdewam kir, pevçûn çêbûn, hinek hevalên me birîndar bûn. Hinek çeteyên dewletê xwestin dorpêça me bişkînin, nêzikî 500 kesên bi çek, xwe komî ser hev kirin û xwestin êrîş bikin. Dema ku wan êrîşî dorpêçê kir, ji wan çend heb hatin kuştin, hinek birîndar bûn û 5 heb jî dîl hatin girtin. Yên mayî jî reviyan.

Dema ku em bi Girzîro re mijûl dibûn, li Serêkaniyê careke dîtir şer destpê kir. Ji hêla din ve di nava wan 11 rojan de bertekên hin eşîrên Ereb çêdibû, gefxwarina dewletê çêdibû. Ji ber ku navendeke aboriyê ji destê wan diçû. Lê em bi bîryarbûn ku wê derê bigrin.

Di roja 10'emîn de hevalên me ji deriyekî wê lîvayê re bi awayekî veşartî ketin nava hêzên wan yên ku derî diparêzin. Du ji wan kuştin û derî bi dest xistin. Piştre berpirsiyarê wan jî hate kuştin. Piştî ku em ketin hundur di nava wan de panîk çêbû û fêmkirin ku em ê wê derê bigrin. Dema ku fermandarê lîvayê û hin leşker hatin kuştin jî aloziya di nava wan de zêdetir bû.

Dîtin ku dewlet nikare mûdaxale bike û ger radest nebin dê heya roja dîtir hemû bên kuştin. Êvara roja 10'emîn hemû yek bi yek radest bûn. Çekên xwe datanîn û kom bi kom radest dibûn. Di roja 11'emîn de, me dest danî ser hemû çek û cebilxaneya wan. Zêdetirî 250 leşker dîl hate girtin. Girtina wê derê û dest danîna ser cebilxaneya wan girîng bû. Piştî ku me ew cih girt û dest danî ser, dewletê xwest bi teyareyan mûdaxale bike. Lê me tedbîrên xwe girtibûn.

Bi awayekî serkeftî pêngav bi ser ket. Rizgarkirina Girzîro serkeftineke mezin bû. Dema ku me Girzîro rizgar kir, li Serêkaniyê êrîşên Artêşa Azad dijwar bûbûn. Ji ber vê em neçar man ku em pêngava Rimêlan paş bixin da ku em bikaribin xwe bigihînin Serêkaniyê.

***We jî di rizgarkirina Girzîro de cihê xwe girt. Bi qasî ku me dît Girzîro cihekî wek kargeha petrolê ye û girîng e. Di navbera we û rejîma Sûriyê de li wir çi qewimî û çawa bi encam bû?***

**MEHMUD BERXWEDAN:** Rast e, Girzîro girîng e. Lewra jî weke YPG'ê me piştî konferansê du tişt dane pêşiya xwe. Yekemin, diviyabû em tabûrên rejîmê yên li herêma Cizîrê mayî, ji wan deran derxin. Helbet vê jî bi xwe re rîsk hildigirt. Wisa du cebhe di heman demê de vekirin xeter bû. Diviyabû em Serêkaniyê hilgirin ewlehiyê. Dîsa diviyabû em Rimêlan û Girzîro, yanî mintiqa petrolê bigrin, ji ber ku me agahî girtibû ku çeteyên Cebhet el Nusra û Artêşa Azad wê werin û êrîşê Girzîro bikin. Me got divê di zûtirîn dem de em van deran bigrin.

Ya din jî eger em van tabûrên rejîmê yên mayî negrin, Girzîro li ber Dêrikê ye yanî êdî Artêşa Azad û Cebhet el Nusra werin, wê bigihin Rimêlan û Dêrikê. Ji bo wê me Girzîro xist çemberê. Me bîryar girt ku em rasterast nestînin lê dorpêçê li ser danin. Di wê çemberê de bi sedan leşker hebû. Dîsa hinek tanqên xirabe, cebilxane tê de bû û pêdiviya me jî bi cebilxane hebû ku em di şerê Serêkaniyê de pê şer bikin. Girzîro di destê rejîmê de bû. Îcar diviyabû em du cebheyan vekin, yek li dijî çeteyên Cebhet el Nusra ya din jî li dijî rejîmê. Wê demê vekirina du cebheyan ne li berjewendiya me bû, lê şert û merc wisa hatin, me ji neçarî vekir.

Hêza rejîmê ya Girzîro yekser 11 rojan xwe ragirt. Teslîm nebû. Fermandarekî wan hebû digot, "*encax hûn cenazeyê min ji vê derê derxin*" û teslîm nebû. Helbet bi vê dorpêçê re me pêşiya Cebhet el Nusra girt. Ji ber ku me dorpêç kiribû nedikarîn werin. Me ji çeteyan re got hûn werin em ê li we jî bixin.

Piştî 11 rojan me bîryar girt ku em lêxin. Êdî em hatin duriyanekê, ya diviyabû em çemberê berdin, yan jî em lê bidin. Rejîmê gef li me xwar, gotin "*divê hûn dorpêçê rakin, eger hûn ranekin em ê li we bixin, em ê li Dêrikê û li Qamişlo jî bixin.*" Li ser vê yekê me ji nişka ve hema lêxist. Ew fermandarê ku digot "*ez teslîm nabim*" û çend leşker hatin kuştin. Me gazî wan kir ku eger neyên em ê hemûyan bikujin. Di şevekê de hemû hatin teslîm bûn. Roja din jî balafir û qobrayên rejîmê hatin. Hîn em ji wir derdiketin, me cebilxane û tiştên din xelas dikirin. Jixwe ew der cihê

petrolê ye. Yanî guleyek tenê lêbikeve êdî kes nema dikare tiştekî xelas bike. Di vê rewşê de balafiran lê xist. Qobra jî avêtin maşîneyên me, lê negirt. Bi vî rengî demekê geriyan, hevalên me yên li bilindahiyan B-7 avêtine wan. Di wê navberê de li hacîza ma, ango rêbenda me ya Girkêlegê jî dan. Jixwe dema ku lêdanê destpê kir heval belav bûn û me cebilxaneya wê derê, leşkerên dîl hemû derxistin, kesek di Girzîro de nema.

Parastin û tedbîrên me hebûn. Tu şehadet çênebûn û wisa xeteriyek pir mezin jî rû neda. Di wê dorpêçê de tenê hevalek birîndar bû. Bi vî rengî cebheya Girzîro rizgar bû. Piştî wê hevalan li Serêkaniyê hemleyeke mezin li dar xistin. Helbet ji ber ku hêza me ya Dêrikê, heta ya Qamişlo jî hinek bi Girzîro ve mijûl bûn piştî serkeftinê ev hêza me hemû çûn Serêkaniyê.

***Piştî Girzîro pêvajo çawa berdewam kir? Li cihên dîtir yên Cizîrê ji aliyê leşkerî û siyasî ve kîjan pêşketin çêbûn?***

**CEMÎL KOBANÊ:** Piştî wê jî qonaxa duyemîn ya şerê Serêkaniyê bi serkeftî qediya. Jixwe emê cûda behsa şerê Serêkaniyê bikin. Pişt re em dîsa zîvirîn da ku em pêngava Rimêlan bi ser bixin. Me plansaziyek hevpar çêkir, da ku em wê derê rizgar bikin. Ger me Rimêlan û Çilaxa jî rizgar bikira, me dikarî li herêma Dêrikê xeteke parastinê bidin avakirin.

**4-Rizgarkirina Rimêlan, Çilaxa û Tirbespiyê**

Jixwe hêzeke mezin ya dewleta Sûriyê li Rimêlan tune bû, lê di warê siyasî de dibû pirsgirek. Lê em neçar bûn ku wê derê bigrin. Li ser wê esasê me saziyên dewletê yên Rimêlan dorpêç kirin. Di wê derê de Emin leşkerî, Emin dewlê, Emin siyasî û hindek leşker hebûn. Derveyî wê hêza parastinê ya mîlîsên wan hebû. Ango ji zêdetirî 100 kes hêza wan hebû. Li gorî plansaziya me, em ê ji 5 milan ve biketana tevgerê; divê hêzekê derî bigirta, hêzekê Bakûrê wê bigirta û hêzekê jî milê başûr bigirta û ji her alî ve bigirta dorpêçê. Li gorî hêzên dewletê ku di Rimêlan de hene jî dê hêzên me xwe bikirina sê beş û her hêzeke dewletê cûda cûda bixista dorpêçê.

Wê demê hêza me ya asayîşê jî çêbûbû. Hêzek me jî, ji bo ku ji milê Çilaxa ve mûdaxale nebe dê ew cih bixistana bin kontrola xwe. Li wê derê mexferek hebû, jixwe hevalan berê ew cih girtibû. Ji milê Çilaxa tenê ew der destê me de bû. Weke tedbîr hevalan li wê derê û gundê Girziyaretê haciz danîn. Ji bo ku kesên sîvîl jî zirarê nebînin, me gelek tedbîr girtibûn.

Em seatên şevê de ketin tevgerê û di nava bajêr de me hemû cih xistin dorpêçê. Me destpêkê berpirsiyarê wan yê Emin Eskerî girt da ku em wan radest bigrin û nehêlin ku pevçûn derkevin. Dîsa ew hêzên mîlîs ku di nava Rimêlan de bûn me hemû girtin û dest danî ser cebilxaneyên wan. Tenê Emin siyasî, Emin dewlê û ew hêza leşkerî ya di wê derê de ma. Wan jî rojekê li ber xwe dan.

Ji bo ku gel û karkerên di wê derê de zirar nebînin, me nedixwest pevçûn çêbin û me dixwest wan dîl bigrin û ji wê derê derxin. Hêzên rejîmê êdî xwe radest dikirin. Lewra didîtin ku em ji bo mafê gelekî tevdigerin, nêzîkatiya me însanî ye, em xerabkariyê nakin, em bajaran talan nakin, berovajî em çêdikin, ava dikin. Ji ber wê nedixwestin bêne kuştin, dixwestin radest bibin. Bi vî awayî Rimêlan jî ji destê dewletê hate rizgarkirin. Piştî rizgarkirina Rimêlan, tenê Çilaxa û Tirbespiyê man û ji bo wan jî pêngav pêwîst dikir.

Di pêngavên Girzîro û Rimêlan de Partiya Pêşverû jî tevlê bû. Hêzên xwe di bin navê YPG'ê de beşdar kirin. Kedeke wan jî di rizgarkirina Girzîro û Rimêlan de çêbû. Her wiha beşdarî asayîşê jî bûn û di nava parastinê de jî cih girtin. Wateyeke wê ya siyasî jî hebû.

**FOTO: Rimelan'da Petrol Kuyuları – FOTOĞRAFI KULLANILACAK**

Ev pêşveçûna me, di nava Ereban de jî coş û daxwaziya tevlêbûnê çêkir. Mesela eşîra Şamaran, Şerabiyan, gelek rûspiyên gundan bi me re pêwendî datanîn. Ji ber ku hatina Artêşa Azad hîs dikirin, dixwestin em mûdaxaleyî herêmên wan bikin. Gelek kesan dixwest ku demek beriya demekê em Til Koçer bigrin. Lê ji bo ku em li gorî plansaziyekê diçûn, divê gav bi gav me ew pêngav pêş bixistana. Divê li gorî pêngavan û cihên ku hatine rizgarkirin parastin û xebatên dîtir pêş biketana.

Divê Çilaxa û Tirbespiyê bihata girtin. Li ser vê esasê ji nû ve plansazi hatin çêkirin. Dê hêza eyaleta Dêrikê Çilaxa bigirta, hêza eyaleta Qamişlo jî Tirbespiyê rizgar bikira. Li ser wê esasê me rêveberî û fermandarên xwe yên wê herêmê civandin. Her wiha asayîş hate agahdarkirin û ew jî amadekariyên xwe bikin. Lewra herêmeke ku ji provoqasyon û aloziyan re vekirî bû, divê li gorî wê asayîşê tedbîr bigirtana û bi şiyarî tevbigeriya.

Di nava Çilaxa de dewlet hebû, lê pir ne bi hêz bû. Ji ber vê yekê girtina wê derê ne pirsgirêk bû, lê divê hesasbûn li ber çavan bihata girtin. Li ser vê esasê me vesaziya xwe pêkanî. Ber destê sibê seat 4'an de me dest bi pêngavê kir û di hundirê seatekê de me hemû cih girtin. Hemû rêkên ku diçin bajêr hatin girtin. Di saziyên nava bajêr de jî hêzên dewletê bê bandor hatin hiştin. Maşîne û cebilxaneyên wan hatin desteser kirin. Bi şiyarbûna gel ya sibê re her kes dît ku alên YPG li ser her cihî ne û YPG her cihî kontrol kiriye.

Hin derûdorên Erebên Çilaxa xwestin provaqasyonan derbixin, lê destûr nehat dayin. Di encamê de Çilaxa bi awayekî serkeftî hate rizgarkirin û xebatên rêxistinkirin û tanzîmê destpê kirin. Me karê xwe hêdî hêdî radestî asayîş û partiyên siyasî kir.

Li Tirbespiyê roja destpêkê hacizekî dewletê û çend mexferên li ser sînor hatibûn stendin, hinek cihên dîtir hatibûn rizgarkirin û bajêr ketibû dorpêçê. Weke Çilaxa hesasiyeta Tirbespiyê jî hebû, ji bo wê heval bi awayekî hesas nêzik dibûn. Li ser wê esasê di nava sê rojan de ew der jî hate rizgarkirin.

Bi vî awayî ji Tirmêha 2012'an heya Nîsana 2013'an piraniya bajarên Kurdan hatin rizgarkirin. Li herêma Cizîrê, hemû cihên dewletê ku di navbera bajaran de ne, hatin rakirin û ji Dêrikê heya Serêkaniyê bi awayekî rehet û bi ewlehî çûn û hatina me çêdibû.

**5-Amûdê: Bajarê ku Dîrok Tê Ziman**

***Amûdê bajarekî kevin û dîrokî ye. Di pêvajoya destpêka şoreşê de rewşa civakî û siyasî ya Amûdê bi çi awayî bû?***

**MERYEM KOBANÊ:** Ji aliyê dîrokî û çandî ve Amûdê bajarekî Kurdan ê herî kevin e. Beriya Zayînê se hezar sal paytextê Hûriyan e û navê wê Ûrkêş e. Bermayiyên dîrokî niha li Girê Moza ne. Amûdê di aliyê çandê de jî xwedî taybetmendî ye. Ev taybetmendî niha jî dema tu li bajêr digerî, diyar in. Hem di çanda madî û hem jî ya zargotinî de diyar dibe.

Amûdê, piştî Şoreşa 19`ê Tîrmehê yek ji bajarên ku zû hate rizgar kirin bû. Li vir jî gel rabû serhildanê û bi ser saziyên dewletê de girt. Bajar di demeke kurt de hate rizgar kirin.

Bajar piranî Kurd in lê cih bi cih pêkhateyên din jî hene. Di heman demê de navendeke siyasetê ye. Gelek partiyên Kurd tê de faliyet dimeşînin. Her weha tensîqiyatên ciwanan yên girêdayî mûxalefeta li Stenbolê û PDK`ê jî tê de çalak bûn. Di vî milî de di destpêka şoreşê de di nava bajarê Amûdê de pevçûnên siyasî û îdeolojîk gelekî derketin pêş. Cih bi cih bi provoqasyonên dewleta Tirk, PDK û tensîqiyatan ji milê hindek komikan ve êrîş li ser tevgera azadiyê, nirxên gel û YPG çêbûn.

Lewra xebatên ewlekariyê yên nava bajêr hatin rêxistin kirin. Asayîş hate ava kirin û heman tedbîr li gundewarê Amûdê jî hatin xurt kirin. Di bajêr û derdorê de ewlekarî û disîplînek hate rûnandin. Hindek partiyên ENKS, li hember van xebatên avakirinê radiwestiyan, pê dilîstin û propagandayên reşkirinê pêşdixistin. Vê yekê bandora xwe li ser civakê jî çêdikir. Hinek derdoran bi zanebûn xirab dikirin û hinek kesan jî nedizanîn û bi wan bawer dikirin. Lê şerê Serêkaniyê zelaliyek bi xwe re anî. Ew propagandayê reşkirinê vala derketin. Ji ber ku kî civakê diparêze, kî di ber gel de fedaî ye û li tenişta van jî kî xerab dike, kî lîstokên derveyî tîne nava bajêr hemû diyar bûn. Gel jî ev bi hemû zelaliya xwe ve dît.

Di nava partiyên Kurdî de jî ev zelalî bi awayekî şênber derket holê. Ji ber ku dema guleya dijmin a yekemîn teqiya, pir ji wan endamên partiyan xwe avêtin pişta sînoran û ji Rojava derketin.

**6-Li Hesekê û Til Temir Şer û Alozî**

***Di destpêka sala 2013`an de li Hesekê û derdora Til Temir jî alozî derketin. Sedemê van çibûn, şer û pevçûnên we bi kîjan aliyan re derket û encamên van çawa bûn?***

**MERYEM KOBANÊ:** Wek hate diyar kirin di destpêka 2013`an de li Hesekê jî alozî û şer destpê kir. Armanca rejîmê, dixwest ku nakokî di navbera me û hêzên heremê de derbixe. Yên girêdayî dewletê û hinek eşîrên Ereban hebûn, dixwestin navbera gelan xerab bikin. Cihek hebû, yê dewletê bû, me dest danîbû ser. Jê re di gotin `*Raî*`, tiştê dewletê yên teknîkî tê de hebûn, pembû tê de hebû. Dema me ew der girt, dewlet bixwe cesaret nekir were bi ser me de, wê demê ev eşîr bi rêxistin kirin û xwest bi navê wan hinek tiştan bike. Li wir şerek derket, di wî şerî de heval Delîl şehîd ket.

Ev şer 9 Nîsan 2013'an de pêk hat. Heval Delîl ciwanekî ji Hesekê bû. Berê di çand û hunerê de cihê xwe digirt. Lê di avakirina YPG'ê de, yê ku destpêkê tevlî bû jî ew bû. Di vê pêvajoyê de rolekî pir girîng ji bo ciwanên Hesekê

leyist. Dîsa yê ku di vî şerî de rola xwe pir baş leyîst hevalê Nîdal bû. Pişt re di şerê Til Hemîs û Til Berak de şehid ket.

Hinek hevalên jin di şer de birîndar bûn. Ev şer rojekî berdewam kir, lê ji bo me girîng bû. Me fêm kir ku ev leyîstoka dewletê ye, me ji eşîran re bangawazî kir ku bisekinin, lê hinek ji wan jî jiyana xwe ji dest dan. Piştre grûbek wek meclisekî li ser navê me bi wan re axivî û me got şerê me ne bi gelan re ye. Paşî meclîsa Kurd, Sûryanî û Ereban hat ava kirin. Meclîseke wek rûspiyên Hesekê bû. Ev meclîs jî xwedî rolekî bû, lê ez dixwazim komployên ku dijmin dixwest bike rave bikim. Ji bo me mijûl bike, me bide seknandin leyîstikên dijmin jî hebûn. Yên ku bi navê artêşa azad ev leyîstok dikirin hebûn. Bi awayekî nepenî û komploger derûdor rêxistin dikirin û diajotin.

Di vê pêvajoyê de tiştekî esasî jî şerê Til Temir bû.

Şerê Til Temir di meha Gulana 2013`an de destpê kir. Heya hingî Cebhet El Nusra digot "*em bi we re şer nakin, artêşa azad bi we re şer dike.*" Her dixwestin xwe bikin navberê, siyaseteke pir kûr dikeyandin. Digotin, "*tu pirsgirêka me bi we re tune.*" Lê di esas de ne wisa bû. Jixwe piştre derket ku Cebhet el Nusra ji destpêkê ve li dijî me şer dike.

Cihekî xwedîkirina cêlekan hebû, dema me ew der girt, êrîş kirin. Bi awayekî çetekarî her tişt bi navê `ganîmet` didiziyan. Dema ew hatin, di şer de ji wan 12 kes hatin kuştin û me gelek cebilxane ji ser wan rakir.

Ev mijar çima girîng e? Lewra qomployên wan xilas nedibûn. Ji eşîrên Ereban `*Şerabî*` hene, hindek ciwanên wan bi Kurdan re nakokî jiyan kirine. Silah didin destê ciwanekî û dibêjin "*biçe ser hacîzê wan û li wan bireşîne.*" Dema ew ciwan tê ku li hevalên me bixe, heval lêdixin û ew ciwan jiyana xwe ji dest dide. Li Til Temir xwestin vê meselê di navbera Kurd û Ereban de mezin bikin, wek nakokiya navbera Kurd u Ereban nîşan bidin. Me bi carekê re dît derdora Til Temir hefteyekî hatin û çûyin tê de çênabe. Rê girtibûn.

Ji bo riya Til Temir were vekirin, şerek hate kirin. Di vî şerî de leyîstokên çeteyan hemû hatin deşifre kirin. Dixwazim di şer de wek teqtîk rolê hevalan binim ser ziman. Mesela hevalê Şîyar hebû, piştre şehîd ket. Hem di avakirina YPG'ê de, hem li Hesekê û Til Temir roleki mezin leyîst. Ciwanan pir jê hez dikir. Şiyar ji Mêrdînê bû. Çend caran dema çûne çalakiyê, hevalê Şiyar wan kincê herêmî li xwe dikirin.

Bi vî awayî hevalan şer dikirin û çend çek jî rakirin. Ew pir bandor bûn, nizanibûn heval ji ku û çawa derdikevin, di warê psikolojik de bandor bûn. Milê teqtîk de zenginbûnek pêş xist. Piştre ji bo em rê vekin hêzên me yên Qamişlo hatin. Şehîd heval Devrim û heval Seydo jî hatibûn. Dê me riya navbera Dirbêsiyê û Til Temir vekiriba.

Heval Demhat di wî şerî de şehîd bû. Tepeyek hebû ji bo em bikevin gundan pêwîst bû em wî tepeyi bigrin. Me wê demê ew tepe girt. Heval Demhat di wî tepeyi de şehîd ket. Şehadeta heval Demhat girîng bû. Tiştekî din jî yê girîng, cara yekê me banî `*eşîra Kîkan*` kir. Ji ber ew der erdê wan bû. Ewana biqasî 150 kesî hatin. Hem yên pîr, hem jî ciwan hatibûn. Me piranî ew di araziyê de hiştin û wek hêzeke parastinê tevgeriyan. Em jî di eniya pêş de bûn. Kîkan li gel YPG bûn, ew yekîtiya gel, desteka wan çêbû.

Di wî şerî de hevalên şehîd ketin roleke mezin leyistin. Di şer de hevalê Demhat, disa hevalê Kadoz şehîd ketin. Hevalê Kadoz, hevalekî ji Qamişlo bû, bi rastî fedaiyek bû. Dîsa heval Erdal hebû, pişt re şehîd ket. Bi pêşengtiya van hevalan û gelek hevalên din em çûn serkeftinê. Heval Erdal li ser baskekî bû û berî herkesi ew û hevalê Kadoz çûn baskê xwe girtin, rolekî pir çalak leyistin.

Mesela dema heval Seyda diket wê deştê, mirov digot qey tiştek xwe li hember nagre. Dîsa heval Devrim wisa bû. Gotina heval Devrim weha bû; "*heta em negihijine armanca xwe wê rûmeta me nebe.*" Di demeke kurt de lîstokên Cebhet el Nusra di wir de hat deşifre kirin, ew çi bû? Me emîrekî wan û gelekên din ji wan kuştin. Dîl jî ketin destê me. Şeş êsîrên wan ketin destê me û derket holê ku ev êsîr yê Cebhet El Nusra ne ku gotibûn şerê me nakin!

Ji bo ku kuştiyê xwe bigrin di şevekê de pênc caran êriş kirin. Dixwestin ku me bixapînin, lê em nehatin leyistokên wan. Gotinek wan ji bo me hebû, digotin "*hûn wekî tembûran e, bi hevdû re lêdixin, bi hevdû re disekinin.*'' Behsa tevgera bi aheng dikirin. Wan di şer de digotin, "*pênc deqîqe bisekinin, em birîndarên xwe bibin*", me jî digot "*baş e.*" Lê esas dixwestin di wê demê de li ser me êrîş bikin, me ferq kir û me nehêlişt.

Pişt re baweriya gelê Sûryan û Ereb jî, ji bo me pêş ket. Dîtin ku çete nikarin bi hêsanî bajarên me bigirin. Piştî şerê Serêkaniyê, di şerê Til Temir de jî baweriya wan têkûz bû. Li wir gel bawerî girt û zanibûn êdî şer çêbe jî dê werin parastin. Hevalên jin di eniya herî pêş de cih girtin. Ev jî şerekî girîng bû, di wê pêvajoya girîng de çêbû.

Piştî wê di biharê de, me xwest em Ebû Rasen bigrin da ku Serêkaniyê, Til Temir wan ji çembere derbixin, li ser vê wisa xebat hat kirin. Di wê pêvajoyê de şerê Ebû Rasen jî girîng e. Piştî bîryarê, me derdora bajêr girt. Eşîrên wir di dîrokê de jî bi Kurdan re pêwendiya wan heye. Wan xwest şer bidin sekinandin. Ji ber ew jî ketin ferqa vê leyîstokê. Her wiha kurekî wan berpirsiyarê ketibeke çeteyan bû. Ev tehlîke jî dîtin; ger pêşiya wê meseleyê nehata girtin, dê bibûya meseleya navbera Kurd û Ereban. Li ser wê nêrînê, Ereb hemû hatin li wir civînek çêbû û di encamê de derdora Ebû Rasen me li çemberê derxist, ev jî pêvajoyek giring bû.

Piştî ku pêvajoya paqijkirina rejîmê xilas bû herêmên me hemû ketin nava şerekî din. Heya Tîrmeha 2013'an şerê me bi artêşa azad re tunebû. Bi Serêkaniyê re şerê me kete rewşeke cûda. Êdi ji bo me pêvajoyekî nû destpê dikir. Pêvajoya nû ev bû, dijminê me guherî, ango dîtin ku artêşa azad nikare bi me re şer bike, li şûna wan Cebhet El Nusra kete dewrê.

***Ji bo heman pêvajoyên Hesekê û Til Temir hûn ê ji me re çi diyar bikin?***

**CEMÎL KOBANÊ:** Ji sedî 50'ê gelê Hesekê Kurd e. Lewra jî divê li taxên Kurdan parastin çêbibûya û jiyana wan bihata têkûz kirin. 7 taxên Hesekê Kurd in. Her wiha ji milê Bakurê Hesekê heya Qamişlo û Dirbêsiyê hemû gundên Kurdan û Êzidiyan e. Li nav bajarê Hesekê bi xwe jî Kurd, Ereb, Sûryanî, Asûrî û Ermenî jiyan dikin. Cihên navendî yên bajêr di destê rejîm û Ereban de ye.

Rejîmê her tim çeteyên xwe diajotin pêş û di navbera gelan de nakokî û provakasyon ava dikirin. Li hemberî vê pêngava rizgarkirinê pêş ket. Jixwe di destpêka şoreşê de hevalan hinek tax girtibûn, lê bi saziyên dewletê re her nakokî û pevçûn çêbûbûn. Bi berxwedana hevalê şehîd Delîl wan, rejîm neçar ma ku xwe hinekî paş ve bikşîne û hebûna YPG li wê derê qebûl bike.

Heya wê demê piraniya bajarên Kurdan û cihên ku Kurd lê jiyan dikin, me hêza xwe bi cih kiribû û parastina gelê xwe dikir. Li derveyî Qamişlo, li bajarên dîtir yên Kurdan rejîm nemabû. Li Qamişlo jî hin saziyên dewletê û çend ketîbeyên wê mabûn, rêvebirina bajêr û parastina bajêr dîsa di destê me de bû. Êdî ewlehiya hundirîn ya bajaran asayîşa me digirt, YPG jî parastina derve dikir.

Di nava 5-6 mehan de ew cih hemû hatibûn rizgarkirin. Êdî me berê xwe da Hesekê. Lewma Artêşa Azad jî di herêmê de dixwest xwe rêxistin bike. Dixwestin bi rêka gund û herêmên Ereban, xwe li wan deran serwer bikin. Bi şoreşa YPG, dewlet li herêma Cizîrê yekser ketibû û lawaz bûbû. Artêşa Azad jî ew wek fersend didît û valatiyên heyî dadigirtin. Dixwestin di wan deran de xwe bi cih bikin û derbasî asteke xwe rêxistinkirinê bibin.

Di navbera Serêkaniyê, Hesekê û Dirbêsiyê de bajarokê Til Temir hebû, ew jî ta astekê di destê Artêşa Azad de bû. Divê rewşa wî bajarokî jî bihata zelalkirin. Êdî em û Artêşa Azad li gelek cihan ketibûn nava hev. Lê ji ber ku di şerê Serêkaniyê de bin ketin, Artêşa Azad li cihên dîtir nediwêriya ku li hemberî me gavan biavêje. Eleqaya gelê Ereb jî li hemberî me çêdibû. Çeteyan jî ew ferq dikirin û dixwestin pêşî lê bigrin.

Li herêma Cizîrê me gelek cih girtibûn û xetek parastinê çêkiribû, li milê din jî tevgera Artêşa Azad hebû. Divê cihên navber bihatana rizgarkirin, ji bo vê jî pêngavan pêwîst dikir. Divê di herêma Qamişlo, Dirbêsiye û Hesekê de xeteke parastinê bihata çêkirin. Bi vî rengî li wê herêmê pêngavekê destpê kir û her du rê hatin girtin. Di wê navberê de gelek gund û mezra hebûn, ew cih jî hatin stendin û ket bin serweriya YPG.

Di navbera me û ketîbeyên Artêşa Azad de pevçûn çêbûn, lê ji ber ku ketîbeyên parçe û bi serê xwe bûn, şerê wan kirin pir ne zehmet bû. Dema ku çavê wan li hêzeke xurt diket, cihên xwe berdidan û direviyan. Di vê pêngavê de ji milê Bakûr ve me xwe gihandibû Qamişlo, ji milê Başûr ve jî me xwe gihandibû Hesekê.

Divê navbera Dirbêsiyê û Til Temir jî bihata vekirin. Li ser wir jî pêngavek hate pêş xistin. Rêkeke 15-20 km li wê derê hebû, ketîbeyên Artêşa Azad xwe li wir cih kiribûn û çûyin û hatina gel asteng dikirin. Ji bo vê hevalên Dirbêsiyê ketin nava wê pêngavê.  2-3 rojan li wê derê pevçûnan berdewam kir.

Di wê pêngava Til Temir de hevalekî ji Dêrikê şehîd ketibû. Navê wî Navdar bû. Hevalekî pir wêrek û xurt bû. Jixwe dema ku dikeve gund çete direvin, lê hinek hevkarên çeteyan, piştê re li wî didin. Li wê derê girekî stratejîk hebû, li ser hemû deştê hakîm bû. Hevalan çend caran ceribandibûn, lê nikarîbûn bigrin. Di encamê de şevekê ji du milan ve vediziyabûn serê gir û bi teqtîka gerîla ew gir girtibûn. Dema ku bi bandor lê dabûn, piraniya wan reviya bû, hinekên wan jî xwe berdabûn gund.

Di wê çalakiyê de hevalê Demhat şehîd ketibû. Hevalê Demhat jî, li gel hevalê Navdar di wê pêngavê de risteke pêşengtiyê lîst. Vê pêngavê weke sê milan berdewam dikir. Her hêzekê cihek dida pêşiya xwe û diçû. Hêza ku di navêndê de bû pêşengtî dikir, hêza hevalê Demhat bû. Hevalê Demhat bi narîncokan ketibû nava çeperên dijmin ên li ser wî girî, lê çepereke biçûk ferq nake, çeteyekî ku di hundirê wê derê de ye, hevalê Demhat şehîd dixe.

Piştî wê bi heman rihî pêngavê berdewam kir. Gelek çeteyan xwe berdabûn nava gund, ew hatin paqijkirin. Piştî ku ew navbera jî hate rizgarkirin, rêka wan ya Serêkaniyê jî hatibû tengav kirin. Tenê ji milekî ve dikarîn werin Serêkaniyê. Her wiha li milê Til Temir jî gund hatibûn rizgarkirin û pêşiya Til Temir jî xetek hatibû çêkirin. Bi vî rengî li Cizîrê hebûna me zêdetir têkûz bû, lê me zûtir dikarî fersendan bi kar bînin.

Ji hêla din ve li herêmên weke Reqqa, Minbic, Bab, Cerablus, Girêspî û Şêxler jî hêzên me xwe rêxistin dikirin. Lê piraniya van cihan ketibû destê ketîbeyên Artêşa Azad. Hêzên me gelê me yê li wê derê diparast. Dema ku ketîbeyan ew cih stendin, di navbera me û wan de jî nakokî zêdetir dibûn. Vê nakokiyê pêşiya şer vedikir.

Her çiqasa Ahrar El Şam û El Nusra jî hêzên hejmarê xwe mezin bin jî heya wê demê li hemberî me şerek nemeşandibûn. Lê piştî ku hin cih girtin û em nêzikî hev bûn; li hemberî me hin helwestên wan çêbûn. Ji bin ve li hemberî me ketîbeyên dîtir tehrîk dikirin. Ew ji bo me rewşeke nû bû. Divê me jî vala derbixista. Jixwe em her di nava tevgerê de bûn. Me cihên xwe paqij dikirin, pêngav lidardixistin. Alay û tabur hatibûn îlankirin. Her wiha hêza YPJ jî bûbû rêxistinek û konferansa xwe di 4`ê Nîsana 2013 de lidarxistibû.

**7-Rewşa Dirbêsiyê**

***Dirbêsiyê û Serêkaniyê bajarên cîranê hev in. Di destpêka şoreşê de hûn jî li Dirbêsiyê bûn. Hûn dikarin di wê demê de rewşa siyasî û civakî ya Dirbêsiyê hindekî şîrove bikin?***

**DILDAR KOBANÊ:** Dirbêsiyê li ser sînorê Bakûr e. Rojavayê wê Serêkaniyê ye, başûrê wê Hesekê ye, rojhilatê wê Amûdê ye. Dema ku ez çûm Dirbêsiyê, ew der hê di destê dewletê de bû. Dirbêsiyê cihekî biçûk e. Jê re digotin, "*bajarê sekreteran.*" Bi rastî jî piraniya sekreterên partiyên Rojava ji Dirbêsiyê ne. Bajar bi piranî ji eşîra Kîkan in. Serhejmara bajêr jî zêde nîne; derdora 5 hezar kes e, lê gund pir in. Nêzî 380 gund hene. Nahiyeya Zirkan jî bi ser ve ye.

**FOTO: Dirbesiye'den Bir Förünüm – Fotoğrafı Kullanılacak**

Gund di aliyê civakî û çandî de hinekî vekirîtir in. Ev hem ji aliyê rêjeya xwendinê ve hem ji aliyê serbestiya jinê ve wisa ye. Lê Dirbêsiyê wek bajar, di van milan de hindekî din girtî ye. Wekî din li Dirbêsiyê bermahiyên feodalîzmê hîna jî xurt in. Sîstema `*Melak û Fellah' ango 'axa û şixulger*` hîna jî ta astekê heye. Her çiqas li gelek cihên Rojava ev sîstem hebe jî lê li Dirbêsiyê hindekî din giraniya xwe li ser civakê heye. Ji ber ku reforma axê nehatiye çêkirin, melak xwediyê piraniya axê ne. Gelek kes jî bê zevî ne. Helbet ev hemû pirsgirêkên şoreşê ne ku di nav demê de pêwîst e bêne çareser kirin.

Jixwe bi anîna Erebên koçber bi siyaseta kembera Ereban jî, rejîmê zeviyê gelek Kurdan desteser kiriye û daye gundên Ereb. Li tevahî Cizîrê dewletê bi `*kembera Ereban*` pergaleke cûda meşandibû. Li ber sînor, di navbera her du gundên Kurdan de teqez gundekî Ereban heye. Cihê dîrokî gundên Ereb xistinê. Gundên ber bajaran, Ereb xistinê. Yek jî dewletê îmkan dane gundên Ereban; tê de dibistan çêkirine, şaredarî çêkirine û hwd. Kurd neçar kirine ku biçin û li gundên Ereban bixwînin. Mesela li hêremekê 20-30 gundên Kurdan hene, gundekî Ereban xistine wir û dibistan di wir de çêkirine. Ev tişt bi serê xwe dibin sedema zextekê.

Li Dirbêsiyê piştî 19`ê Tîrmehê di nav demê de me hemû saziyên dewletê girtin û alên xwe pê ve daliqandin. Lewra dema ku me li Kobanê hinek saziyan alên xwe pê ve nedaliqandin, van hêzên din hatibûn û ketibûnê. Li Dirbêsiyê ber bi dawiya sala 2012'an ve êdî hemû sazî di bin venêrîna me de bûn. Ji hêla din me bi awayekî berfireh dest bi avakirina meclîsan kir, lê ji ber ku şerê Serêkaniyê destpê kir, hemû lêhûrbûna me çû ser şer. Lê me her ku fersendek didît me civînên xwe dardixistin û me meclîsên xwe ava dikirin. Me bajar wek çar-pênc parçayan girte dest û me li vir meclîs ava kirin. Me li gelek gundan jî civîn lidardixistin û meclîs ava dikirin.

Li Dirbêsiyê şer nedihêlişt ku em xwe bigihînin gundên Ereban. Lê cihên ku di nava Kurdan de jiyan dikirin, me gelê Ereb jî dixistin nava meclîsan. Gundên Ereb bi piranî xwe nêzikî me nedikirin, li hêviya ku Arteşa Azad me têk bibe bûn. Ji ber ku gelek ji wan yên ku bi kembera Ereban li wan deran hatibûn bicih kirin. Digotin, "*ger rejîm biçe jî, dê Arteşa Azad dîsa pergala kembera Ereban ava bike.*" Bi taybetî Cebhet El Nusra û ew hêzên Arteşa Azad jî hêviyên wisa didan wan. Lîstokên pir qirêj dîlîstin.

Ji ber şerê Serêkaniyê, li Dirbêsiyê xebateke bi pergal nehat meşandin. Tenê dema ku me fersend didît, me xebat dimeşandin. Lewra hemû hevalan komên xwe digirtin û diçin şerê Serêkaniyê. Piştî 6 mehan, du heval hatin. Lê hevalên me ku têra 380 gundî bikin tunebûn. Êdî me bi rêveberiyên meclîsên ku me avakirine, em diçûn û meclîseke din ava dikir.

Li Dirbêsiyê tu şer çênebûn, lê hêzên Dirbêsiyê di şerê Serêkaniyê de şehîd dan. Di serî de hinek derdorên ku dixwestin li Dirbêsiyê tevlîheviyê derxin hebûn, lê hevalan tedbîr girtin. Me nehêlişt ku tu şer rû bidin. Bi piranî partiyên ENKS her di kemînê de bûn da ku em kêmasiyekê bikin ku li ser siyasetê bikin. Digotin, "*bila dewlet were, bila arteşa azad û Cebhed El Nusra werin; lê bila TEV-DEM neyê.*" Dewlet û çete qebûl dikirin, lê em qebûl nedikirin. Hê jî nêzikbûna wan ew e.

Ev partî li Dirbêsiyê jî pir sînsî tevdigeriyan. Li Amûdê jî wisa derketin pêş, lê lîstoka herî sinsî li Dirbêsiyê dilîstin. Mesela li Serêkaniyê jî girseya wan ji ya me zêdetir bû, lê dema ku gel pratîka me û ya wan dît, ew rewş guherî. Gelek ji wê girseyê, li gel hevalan şerê çeteyan kirin û ji wan partiyan re nîşan dan ku welatparêzî çawa ye…

## BEŞA DUYEMÎN
## ŞERÊN SERÊKANIYÊ

***FOTO: BERXWEDANA SEREKANİYE1 – FOTOĞRAFI KULLANILACAK***

*Li Serêkaniyê em diçin taxa ku herî zêde zirar dîtiye. Tu bibêje maleke ku ji guleyên çekan û parçeyên teqemeniyan para xwe negirtiye heye, tu nikarê bersiva vê bibînê. Dîwarên malan hatine xirabkirin û hundirê malan hatine talan kirin. Di ode, baxçe û banê her malekê de bêhejmar bermahiyên guleyan hene. Dîsa bermahiyên xwarinên ku gelê Serêkaniyê weke çete pênase dike li her cihekî ne. Li ser hemû bermahiyên van xwarinên amade etîketa Tirkiye heye.*

*Ji bo derbasbûyin û paşve vekişînê di odeyên hemû malan de qûlikên bi dirêjahî û firehiyê metroyeke derbas dikin hatine vekirin. Li ev taxa ku heya demekê deh-hezaran mirovan lê jiyan dikir, niha tenê hin şopên jiyana berê mane; pitikên pêlîstok, parçeyên bîsîkletên hatine şikandin, di nava derinceyê de xwarinên ku nîv hatine xwarin, an jî ji danekî din re hatine hiştin, li ser dîwarê ku qelişiye seata ku bi israr çerxa xwe berdewam dike, mûslixên ku dilop dikin, dantelên ku li ser televîzyona cam şikestî…*

*Taybetmendiyeke sereke ya vê taxê jî, pir nêzikî sînorê Tirkiyê ye. Ger tu qirînekê lê bikê, leşkerê Tirk ku li ser sînor notirvaniyê dike dikare te bibîze.*

***FOTO: SEREKANİYE'DE SAVAŞIN EN YOĞUN OLDUĞU MAHALLEDEYİZ-1 – FOTOĞRAFI KULLANILACAK***

***Talan kirin, rûxandin, dîzin û çûn…***

*Li taxê em di nava malên rûxiyayî de dimeşin. Em dibînin ku di cihekî berê weke dûkan dihatiye karanîn de hin tişt li maşîneyeke tên barkirin û em berê xwe didin wê derê. Dema em dikevin hûndir, yekser em bi rûxandineke ve rû bi rû dimînin. Em fêm dikin ku ew cihê em çûnê marketeke ku xwediyê wê Ermenî ye û qatê jorê jî xaniyê wê malbatê ye. Hemû dîwarên marketê xirab bûne. Hemû tiştên di hûndir de jî, di rewşeke ku nayen karanîn de ne. Malbat, tiştên ku kariye li ber rûxandinê rizgar bike, li maşîneyê bar dike. Em bi rêka hevalekî ku di gera me de ji me re dibe alîkar de bi Erebî ji malbatê re diaxifin. Jina ku ji qatê jorî rondikên çavan dirêjîne û dadikeve jêrê bala me dikşîne. Ji axaftinên wê, em fêm dikin ku rêveberî û mamosteya dibistana taxê bûye. Bi kurtasî çîroka wê ku ji me re vegotiye bi vî rengî ye;*

*“Qaşo ji bo azadkirina me hatin. Lê em ji bajarê me koçber kirin… Min di tevahiya jiyana xwe de hewil da ku ji mirovan re alîkariyê bikim û bi wan re jiyaneke hevpar bijîm. Lê ev (Arteşa Azad qest dike) ne wisa ne. Mirov di mala xwe de dikare bi qirêjahiyeke wisa re jiyan bike? Zarokên me her yek ji aliyekî ve çûn… di her qûncikekî mala me de kedeke me heye, me tê de rondikên çavan rijandine… temam we têra xwe dîzî û talan kir, lê dema ku hûn çûn bi kîjan sedemê we di hûndirê dûkan û mala me de narîncok teqandin û tarûmar kirin? Hemû hevalên min Kurd û Ereb in. Me Qûran jî danî gel Marcarses’a Pîroz ku kiryarên bi vî rengî pêk neynin. Me got, em bi hev re jiyan dikin. Gelo kîjan ol û îman, van kiryaran nas dike? Dixwazin di nava Xiristiyan û Misilmanan de nakokî û pevçûnan ava bikin. Xiristiyanan qebûl nakin û dixwazin vegerin beriya hezar û 500 sal berê…”*

***Arteşa Azad a Sûriye, ji bo rizgariya çi hate Serêkaniyê?***

*Dema ku em di nava kaş û bermahiyên malan de digerin kesê bi navê Evdilgafur Evdilwahap Erselan tê gel me û diyar dike ku karmendekî Çeçen yê Serêkaniyê ye. Bi Erebiyeke hişk û bi hêrs diaxife. Em pişt re axaftina wî ku em qeyid dikin, ji hevalekî didin wergerkirin. Dibêje, “ev ne arteşa azad in, ev arteşa diz û heraman e… bila ti kes nebêje Çeçen jî li gel wan cih digrin. Bi sedan sale em li gel Kurdan jiyaneke bi hev re pêş dixin. Ez 45 salî me û ez di nava Kurdan de mezin bûm. Hatin û gotin, “li vê derê PKK’î hene û wê van deran birûxînin” lê bi xwe rûxandin û*

*çûn.*

*YPG'î niha heya malên me tûp, mazot û alîkariyê tînin. Jixwe rejîma Esad, ji Serêkaniyê vekşiyabû. Kurd, Ereb, Çeçen, Xiristiyan… her kesekî/ê bê pirsgirek li vê derê jiyan dikir. Arteşa Azad hat ku çi rizgar bike? Ez karmendek im û karê min didome; ez heya Heleb, Şam û Hesekê diçim. Ez ji cihên ku Kurd lê ne re diçim û ti pirsgirekan jî najîm."*

*Em li Serêkaniyê taxa Xiristiyanan in. Sê dêrên aîdî Sûryanî û Ermeniyan ku pir dişibin hev û bala me dikşînin ser xwe hene. Dêra Mor Toma ku aîdî Sûryanên Ortodoks e di salên 1930'î de hatiye avakirin. Her wiha dêrên dîtir jî, yek Dêra Sûryanên Ortodoks ya Meryem Andra û yek jî Dêra Mor Hagop ku aîdî Ermeniyan e. Hersê dêr jî di rewşeke talankirî de li pêşberî me ne.*

*Mustefeyê Bijîjk ku bûye rêhevalê me yê gerê, demeke dirêje li vê navçeyê jiyan dike. Dibêje, "ev dêr berê pir şên bûn, lê piştî şer weke mal û karxaneyên wan, dêrên Xiristiyanan jî hatin talankirin. Destê van çeteyan gihêştibe kûderê, talan kirin û tiştên ku dikarin rakin, birin û firotin Tirkiye; maşîne, amûrên kerebeyî, tiştên dîrokî û bi nirx hemû firotin.*

*Em di rêbertiya bijîjk Mustefa de li dêran digerin. Ji aliyê talanê ve ti ferq nexistine navbera hersê dêran. Di hewşê hersiyan de jî şopên guleyên hawanê hene. Li ser dîwarên wan, şopên hemû cureyên çekan tên dîtin. Hemû kesên ku em mîkrofonên xwe dirêjê dikin diyar dikin ku ne tenê li Serêkaniyê, li her cihekî ku Arteşa Azad (pişt re jî DAIŞ'ê) xwe gihandiyê, heman talan hatine kirin. Li gorî daneyên Komaleya Parastina Arkeolojiyê ya Sûriye, heya salên 2013'an ji 36 mûzeyan 12'ê wan hatine talankirin.*

***Orhan dînê bajêr bû!***

*Di şerê Serêkaniyê ku bi giştî nêzikî 6 mehan berdewam kiriye de, 24 Kurdan jiyana xwe dest daye. Li gorî çavdariyên me, ji van şehadetên ku herî zêde li ser gel tesîr kiriye yek jî kûştina Orhanê Dîn e. Orhanê Hemê Mixtêr, 20 salî bû. Di 22'yê Çilêyê de, dema ku li nava erdên ku nêzî sînor digeriya de, ji aliyê Tirkiye ve bi çekên sekvanî hate kûştin. Ji ber van  sekvanan heya du rojan ti kesî nikarî neaşê wî ji wê derê bigire. Yên ku mirin dane ber çavên xwe û çûne neaşê Orhan girtine  dibêjin, "ji bo Orhan dibêjin dîn e, lê ne wisa ye. Orhan, dînê bajêr bû; dînê azadiyê bû. Çoyê wî her di dest de bû û digot, 'ez diçim ku li dijberî çeteyan şer bikim.' Dema ku Orhan şehîd ket, dilê Serêkaniyê şewitî."*

*Şerê Serêkaniyê ji bo Şoreşa Rojava xwediyê wateyeke pir mezin e. Cihekî wê yê taybet heye. Beriya ku em ji fermandarên YPG-YPJ'ê bibînin û bi wan re hevpeyvînan çêbikin, ji nêzikbûn û gotinên gelê Serêkaniyê me ev yek fêm kir. Lê li ser hêrikîna şer, me ji bo her pengaveke hevpeyvîn çêkirin. Dema ku me dest bi hevpeyvînan kir, li hin cihên Serêkanyê hê jî şer hebû. Hinek jî piştî rizgariyê çêbûn. Vaye ji her aliyekî ve şerê Serêkaniyê…*

**1-Destana Lehengiyê Destpê Dike**

***Dema ku we bi rejîma Sûriye re têkoşîn dikir û bajar rizgar dikirin di payîza 2012`an de li Serêkaniyê, bi derûdorên ku bi navê muxalefetê tevdigariyan re jî şerê we derket. Ev şerê ku gelekî deng veda û bû destanek, çawa dest pê kir û li Serêkaniyê çi hate jiyan kirin, hûn dikarin ji me re rave bikin?***

**JIYAN HELEB**: Em dikarin b ê jin ku, şerê herî berfireh ê ku çêbûyî, li Serêkaniyê bû. Dema li Serêkaniyê şer çêbû, hêzên bajarên Cizîrê hemû beşdarî vî şerî bûn. Ji ber ku êrîşeke dijwar bû. Ji Dêrikê, Tirbespiyê, Girkêlegê, Qamişlo, Amûdê, Dirbêsiyê, hêzê wir ên leşkerî hemû çûne Serêkaniyê. Dixwestin îradeya gelê Kurd li wê derê bişkînin. Ji ber ku digotin, "*wana ciwanên vê derê ne, şer nizanin, dê di guleya destpêkê de hemû birevin.*" Ji bo vê Tirkiye jî çete pir wisa araste kiribûn. Digotin, "*çima hûn wan qebûl dikin*."

Destpêkê şerê çete û dewletê bû li Serêkaniyê. Me bi xwe got: “*Em gund û bajarên Kurdan diparêzin. Ji bo vê jî karê me bi dewletê tune ye û bi we jî tune ye. Em xeta seyemîn in û em tenê dixwazin li ser esasê parastina xwe tevbigerin, em êrîşê tu kesî nakin. Lê yên ku êrîşê me jî bikin, heya dawî em ê li ber xwe bidin û şer bikin. Wan, ji gund û bajar û herêmên xwe, ji coxrafyayê Kurdistanê derxin.*” Wan ev gotinên me destpêkê weke propaganda fêm kiribûn. Weke ku hêza me tune ye, fêm kiribûn.

Min got, di serî de Tirkiye û Erebên şoven hebûn. Çeteyan wan bi vî rengî difikirîn yanî Kurd çawa wê xwe bi xwe bimeşînin. Digotin: “*Ji milê siyasî me fêm kir, lê milê leşkerî ji ku derket. Eger hûn dixwazin tevlê hêza leşkerî bibin, vaye Artêşa Azad heye, werin tevlê wan bin. Çi pêwîstî bi artêşeke sêyemîn heye?*”

Me jî digot ku di van şert û mercan de ya herî girîng milê leşkerî ye, parastin e, ji bo ku tu karibî îradeya xwe nîşan bidî, temsîl bikî. Di vî milî de şerê Serêkaniyê ji bo me ezmûneke dîrokî bû û helbet encama pêvajoya beriya vê bi bist salan ku Serokatiyê li Rojava meşandibû.

Cebilxanêya me jî tune bû. Mînak, li ser hevalan çar jarjor û du bombe hebûn. Li ser ciwanên cem me jî her yek du cercûl hebûn. Tenê qilêşên me hebûn. Yanî tu bêjê destpêkê BKC û B-7’ên me, yan jî çekên giran ên cuda hebûn, na. Yên heyî jî pir kêm bûn. Her tabûrê yek pê re bû. Lê yên çeteyan bi hezaran çekên wan hebûn, çekên wan ên giran hebûn. Ji bo vê Tirkiyê jî ji wan re ji aliyê lojîstîk, cebilxane, tendirustî û hwd. de heya dawî sînor vekirîbûn.

**Wan Xwest Serêkaniyê Bigrin!**

Tirkan ew araste kiribûn ku dê di rojekê de, di Serêkaniyê re bikevinê û di Dêrikê re derkevin. Bi vî awayî xwe îkna kiribûn. Şerê wan û dewletê 8 rojan dewam kir. Em di ortê de man, yanî me ne aliyê wan û ne jî aliyên din girt, me xeta xwe ya seyemîn parast. Cihê navendên xwe yên diyar me girtin. Di nav wî şerî de, me hinek terzê wan ê şer jî fêm kir. Ji ber ku dewlet derveyê bajêr bû me şerê dewletê zêde nedidît. Lê çete li hin taxên ber sînor tevdigeriyan. Ev ji bo me bû awantajek ku em wan nas bikin.

Mînak, milê wan ên hov, me milê wan ên derveyê exlaqê didîtin. Ji ber ku leşkerên dikuştin tije erebayan dikirin û digerandin, an jî erebeyên xwe di ser cenazeyên leşkeran re diajotin. Weke din bi cesedên wan pir dilîstin. Heta di dawiyê de hevalên me helwest danîn, nedikarîn ev yek qebul bikirana.

Dema dewlet xelas bû, berê xwe dane me. Wan digot, “*dewleta Suriye bi tanq û topên xwe, teyareyên xwe li ber me nesekiniye.*” Ji ber ku wan didît, tenê çekên me li ser me ne. Lê me digot, “*çekên me veşartî ne, eger şerek derkeve çekên me yên giran pir in, cebilxaneya me pir e.*” Me ciwanên xwe wisa motîve dikirin. Jixwe li gel çeteyan me hîn zêdetir digot ku “*me çekên xwe yên mezin veşartine, ne hewce ye em niha derxin.*” Lê wan fêm kiribû, çekên li ser me tenê ew in.

Ji bo wê jî piştî ku wan dewlet xist, ji sedî sed îkna bûn ku ew ê karibin me di rojekê de ji Cizîrê derxin. Em her şev di nava bajêr de derdiketin dewriyê. Gel bi piranî reviyabû Bakur. Ji ber ku siyaseta çeteyan ev bû; gund û bajaran vala bikin, paşê bi xwe têkevinê. Ji bo vê tevî ku bajar vala jî bû, dîsa jî ji bo tiştên gel neyên dizîn, an jî neyên şewitandin ya girîng jî, ji milê leşkerî ve neyên mayin-bombe neçînin, me dewriye derdixist. Em destpêkê grûba dewriyê bûn; her roj ji 6`ê êvarê heya 6`ê sibê me dewriye derdixist. Me ew jî didîtin, lê li taxên xwe bûn, nediketin taxên Kurdan.

Demek şûn de berteka gelê ku di bajêr de mabû li hember van çeteyan çêbû. Hinek malbatên me yên welatparêz, malbatên me yên şehîdan mabûn. Digotin, “*ev hov li welatê me, bajarê me çi digerin*.” Ji wan ditirsîn, li wan dinêrîn riyên wan simbêlên wan hemû tevlîhev bibûn. Jixwe cilên wan ên reş, xwe weke hovan kiribûn. Ji aliyê psîkolojîk ve jî bandor dikirin.

Gel dixwest ku ji Serêkaniyê derkevin. Lê wan qebûl nekir. Dema van qebûl nekir, hevalan xwest ku bertekên aştiyane bêne darxistin. Mînak gelê Cizîrê li hemberî wan derkeve meşê. Dema fêm kirin ku wê li hemberî wan meş çêbe pir tirsiyan. Êvarê hevalên me tehdît kiribûn. Gotibûn, “*divê hûn vê meşê bidin sekinandin.*” Hevalan jî gotibû: “*Îradeya gel e, em nikarin li ber îradeya gel bisekinin. Gel naxwaze hûn li vê derê bin û ji ber wê, gel ê meşeke xwe ya pir rewa li dar bixe. Ji ber ku ti rewabûna we tine ye ji bo ku hûn li vê derê bin. Ger hûn bixwazin bi dewletê re şer bikin biçin Şamê, Idlibê, Hama û Humisê… Navendên dewletê li wan deran in, ne li Serêkaniyê ne. Eger armanca we azadiya gelê Ereb be biçin wan deran, tu karê we li van deran tune ye*.”

Ji ber vê yekê pir hêrs bibûn lê nedabûn derve. Serokê meclisa me ya bajarê Serêkaniyê Abid Xelîl û hindek heval hebûn, hê bêhtir wan dîalogên ji milê siyasî ve dimeşandin. Ji wan re gotibûn, “*pêwîst ev meş bisekine*”. Piştre jî xwestibûn hindek tundî û provoqasyonan çêbikin û belav bibûn.

**2-Çeteyan Piştî Provoqasyonê Êrîş Kirin**

Me got qey belav bûne. Li ser vî esasî me jî dewriyeya xwe temam kir. Her kes sekinîbû. Seat 6`ê sibê bû, hevalê Dozdar telefon vekir. Ji ber ku em grûba meşê bûn, me xwe amade dikir. Got ku "*zû werin ser navenda sanayî, hacizê çeteyan xwe amade kirine, wê êrîş bikin, aloziyeke pir mezin heye, eger hûn qadê bigirin baş dibe.*"

Li ser çar aliyên bajêr mewziyên me hebûn. Lê mewziyên me yên herî xurt, xeta Dirbêsiyê bûn. Ji ber ku xwestibûn riyên me yên bi bajarên din re qut bikin. Em çûn wê derê, jixwe me dît çete hemû li milekî sekinîne. Nêzîkî 150 kesî bûn. Bi erebe û doçkeyên xwe hatibûn û hacizê me girtibûn. Li wê nuqtê hevala Jiyan û hevalê Rêzan Rojhilat li ser disekinîn.

Dema em gihîştin wê derê hinek hevalan xwe di mewziyan de bi cih kiribûn. Hevalê Dozdar got ku "*bila şer dernekeve, em naxwazin têkevin şer, ji ber ku tîfaqên me yên siyasî û leşkerî hene bi wan re, ji bo wê jî heya ez nebêjim divê kes gule bernede.*" Lê çete çawa hatin êrîş kirin. jixwe weke min got 3-4 doçqeyên wan ji hebû.

Hevalê Firat li ser nuqteya kontrolê bû û çend ciwanên Qamişlo jî li gel bûn. Fermandar ango `emîr`ên wan çawa ji erebeyên xwe daketin, em jî ji erebeyên xwe daketin. Hatin û xwestin hevalê Firat teslîm bigrin û dest bi provoqasyonê kirin. Lê Hevalê Firat pir bi lezgînî tevgeriya, emniyeta çeka xwe vekir û da ber wî. Dema wisa bû destpêkê me ji hevala re got, "*bisekinin*!" Lê dema ku me dît hevalê me digrin, me got "*bila her kes dest pê bike!*" Hevalan destpê kir û bi vî awayî şerê destpêkê derket.

Hîn mewziyên me ne temam bûn. Li bajêr cebilxaneyeke ku têrê me bike tune bû. Lê wan êrîş kiribû, me bi xwe êrîşa despêke nekir. Beriya wê jî dest li ser nuqteyeke me danîbûn. Ji bo wê jî hemû hevalên ku li wê derê mewzî girtibûn bi hev re destpê kirin. Lê ji ber ku hindek ciwanên li cem me di şer de ne wisa pispor bûn, guleyên xwe zû bi kar anîn. Her çiqas me banî dikir ku yek bi yek biavêjin jî lê hinekan cebilxana xwe xilas jî kiribû.

Em seat di 6`an de ketin şer, heya seat 9`ê beriya nîvro cebilxaneya pir ciwanan nemabû. Çeteyan riya me ya Dirbêsiyê jî qut kiribûn. Riyên me yên bi bajarên din re qut kiribûn. Em tenê yê di Serêkaniyê de mabûn. Vê carê diviyabû teqwiyeya leşkerî bihata, ji ber ku cebilxaneya ser me pir kêm mabû û ciwan jî li cem me pir bûn. Mînak di xeta me de nêzîkî 200 ciwan li gel me bû.

Şer li milê xeta sînorê Bakurê Kurdistan, hinek jî herêma sanayî ango pîşesazî bû. Wisa kêleka bajêr bû. Dema cebilxaneya van ciwanan nema piranî wisa bi sloganan şer kirin. Me tim digot, "*heval tên, tenê em mewziyên xwe bernedin!"* Êdî li ser me jî her yekî/ê çend gule mabûn. Me got, "*heta dijmin neyê ber we hûn ê neavêjinê, kengê hatin ber we hûn ê wisa li wan bixin.*" Ya rast jî ew çend gule jî me ji bo hem xwe biparêzin û hem jî ji bo nekevin dest, dabûn wan. Ji ber ku bombeyên me jî zêde tunebûn.

Her ku çû wan êrîş kirin. Weke min gotiye, hem rê girtibûn û hem jî êrîş dikirin û nêz bûn. Helbet agahiya me tunebû ku li milê Hesekê 15 heval ketine destê wan. Heval Rojînda û Cemîl li ser wê derê bûn. Heval Rojînda destpêkê zû birîndar dibe. Ew jî hevalan dikin çemberê. Ji bo vê jî hê pir hevalan cihê xwe negirtibûn çember li wan teng dibe, cebilxaneya wan jî têrê nake û li gel hevalên din, heval Rojînda jî bi birîndarî dikeve destê çeteyan.

Têkiliyên me bi wan hevalan re qut bibûn. Di nava bajêr de jî grûbeke me mabû. Hevalê Cemşîd û Avşîn Kobanê li wir bûn. Ji ber ku rêveberiya me ya Serêkaniyê ev her du heval bûn. Yanî wan kordîne dikir. Min telefon ji wan re vekir. Gotin, "*em bi xwe jî di çemberê de ne, tiştekî em bikin tune ye, êdî her heval bi înisiyatîfa xwe bimeşîne, heya ku teqwiye tê."*

Saet 9 bû, me ji heval Meryem Kobanê re telefon vekir, wê demê li ser eyaleta Dirbêsiyê bû. Jixwe ji ber ku me bi şev pir telefonê bi kar anîbû, şarja wan nemabû. Wisa fikarên me hebû, em di demên acîl de diaxifîn. Cîhazên me jî tunebûn. Yanî ji şer re, amadekariyeke me ya xurt nebû.

Bi vî awayî şer dewam kir. Jixwe her diçû nêz dibûn. Herî dawî di navbera me de tenê ew cadeya sereke ya ku diçe Amûdê mabû. Ew li hêla sanayiyê di nava bîna û daîreyan de bûn, li cihê stratejîk bûn. Em jî li çolê bûn, me hinek mewziyên ji axê çêkiribûn, hinek jî ji kerpîç çêkiribûn. Çend heval jî bi neçarî di nav çopê de bûn, li wê derê çopa sanayiyê bû û kiribûn çeper. Gule jî weke baranê dihatin. Diyar bû ku hinekan ji wan jî zêde ji şer fêm nedikirin, ji ber ku wan jî serasera diavêtin. Hawanan pir bi kar anîn.

**'Ciwanan Bi Diruşmeyan Şer Dikirin'**

Hinek ciwanên cem me bi diruşmeyan, bi tilîliyan, bi diruşmeya "*Bijî Serok Apo*" bersiv didan. Bi rastî jî tevî ku ezmûna wan a şer jî nebû lê cesareteke mezin û bê dudilî şer dikirin. Coşa xwe bi dirûşmeyan nîşan didan. Dijmin jî her nêz dibû me yek bi yek gule diavêtin. Wan digot "*ev sekvan in, xwe nedin ser van.*" Lê yê me ne sekvanî bû, ji ber ku cebilxaneya me nebû me kêm kêm diavêt!

Êdî ber bi êvarî bibû. Xwestin vedizin cihê me. Wan digot “*êdî kes nemaye.*” Dîsa xwestin haciz bigrin, Heval Goran li wir bû, Hevalekî ji Cizîra Botan bû. Heval Goran heya dawiyê rih û moral dida ciwanên dora xwe. Bombeyeke wî ya dawî mabû. Dibîne ku 4 kes nêzî wî dibin. Çeteyekî El Nusra destê xwe diavêje ala YPG dikişîne lê hevalê Goran jî alê dikişîne û piştre bomba xwe diavêje û wan 4 çeteyan dikuje. Piştî wê êdî şerê wan gihîşt asta qarnas, doçqe û hewanan.

Heya wê demê li gel rêveberiyê carcaran têkiliyên me çêdibûn. Em bi hevalan re diaxifîn digotin, “*vaye li pêşiya me jî pir kemîn hene*.” Herî dawî em wisa fikirîn û me got, “*ewqas ciwan li gel me ne û cebilxana me li ber qedandinê ye, em ciwanan rizgar bikin*.” Wisa em bi rêveberiyê re axifîn. Me got, “*eger êvar bibe û tarî bikeve erdê em ê van ciwanan paş de bikişînin. Em ê bi xwe bi tenê bimînin.*” Lewra me got nêzî 200 kesî li gel me ne, herî kêm nekevin dest û şehîd nekevin. Ji ber ku ew dê li ser me pir giran be.

Ji bo vê jî çawa tarî kete erdê wan jî erê kir. Teqwiye jî wê dereng bihata, ji ber ku hevalên ku dihatin alîkariyê jî, di rê de şer dikirin û wisa dihatin. Li pişt me zevî hebûn, garis û pembû çandibûn. Zeviyên wisa ku heta nuqteyên çeteyan derbas bikî û têkevî milê gundên Dirbêsiyê hebûn. Ji bo vê yekê çawa me ‘erênî’ girt em li hev civiyan; hevalê Ciwan, hevalê Goran, hevalê Serhed, hevalê Firat û hevala Jiyan bûn. Me got, “*em her yek li mewziyekê bimînin û em van ciwanan bişînin piştê.*” *3-4 kesên ku arazî baş nas dikirin hebûn.* Bi rastî jî wan bi lehengî şer kirin. Çawa tarîbû, me ciwan tîm tîm kişandin ew zeviyên pembû û garis. Me ji wan re gund diyar kirin, me got herin li wê derê heval hene û bi wî rengî me ew ji mewziyan derxistin û şandin.

Di destpêka destana Serêkaniyê heya dawiyê rol û rista jinên şervan û xwedî vîn jî careke din bi hemû heybeta xwe ve diyar bû. Hevala Jiyan Mako hebû. Ji Rojhilatê Kurdistan tevlî bûbû, paşî di şerê Kobanê de bi lehengî şehîd ket, wê demê bi koma Dirbêsiyê re hatibû. Bi rastî jî bi lehengî şer kir. Yanî em bêjin tevî ku ciwan bû, zêde xwedî ezmûn jî nebû, lê rihê wê yê berxwedanê hêjayî dîtinê bû. Ciwanên derdora xwe hemû kirin mewziyan û heta êvarî bi sloganan, bi tilîliyan heta dawî şer dikir. Bi rihêkî zindî tevlî bû. Jixwe dema hevalên jin di nava şer de bin, pir cûda ye!

**FOTO: JİYAN ROJHİLAT- AMİN PİRİ – FOTOĞRAFI KULLANILACAK**

Di wî şerî de yek jê giran, çar hevalên me birîndar bibûn. Jixwe bi guleya destpêkê hevalê Dozdar birîndar bibû. Yên ku diçûn û dihatin, bi çeteyan re dîalog danîn heval Dozdar û serokê Meclîsa Gel a bajarê Serêkaniyê Abid Xelîl bûn. Di êrîşa ewil de heval Dozdar jî birîndar bû. Piştî birîndar bû, hevalê Firat xwest bi rihekî fedaî wî xelas bike û rasterast maşîne ajot. Di nava wê deştê de û saet 10`ê rojê bû, ew û hevalê Abid çûn.

Ji bo vê jî çawa derketin hê 10 metro neçûne, hemû camên erebeyê hatin xwarê. Ji ber ku bi sedan gule lêketin. Jixwe me got hemû şehîd ketin. Lê tevî wê jî bi ewlehî derbas bûn û hatin. Lê li nuqteyên pêş me dîsa ketin kemînê. Di wir de hevalê Abid Xelîl şehîd ket. Li kêleka hevalê Dozdar bû, ji bo ku wî bibe doktor li kêlekê bû. Bi wî rihê hevaltî û fedaîtiyê şehîd bû. Ew hevalê din jî berê li gel me birîndar bibûn û me birînên wan girêdabûn.

Piştî ku me hêza ciwanan paşve kişand em tenê 6 heval mabûn. Çeteyan bi qîr û dengê bilind dixwestin bandoreke psîkolojîk çêbikin. Lê li hemberî wan rihekî pir fedayane li wê derê hebû. Heval jî her yek di nuqteyekê de, wisa me banî hev dikir, me jî pir deng derdixist. Ji bo wê hevala Jiyan tilîlî dikir û hevalên din slogan diavêtin. Jixwe di vê mijarê de çete şaş dibûn, digotin “*çawa dibe ku jin di nava şerekî wisa de, bi moraleke ewqas mezin, weke ku di dîlanê de ye wisa dilîlîn e û wisa diruşman diavêje!*”

**3-Çeteyan Derbeke Giran Xwarin**

Ber bi 12`ê şevê komeke ewil ji hevalê Cizîrê hatin gihiştin me. Li gel wan doçqeyeke 12,5 jî hebû. Dema gihiştin me, êdî şer sekinîbû. Wan tekbîr dianîn, pir deng derdixistin û wisa gule direşandin. Hevalên ku ju bo teqwiyê hatibûn, bi B-7`an li wan dan û wan jî fêm kir ku alîkarî hatiye. Ji bo vê jî paşve reviyan. Seat 1’ê şevê jî hêza Dirbêsiyê û Qamişlo gihîştin me.

Bi vî awayî hêz û cebilxane gihîşte me. Çete jî dema reviyabûn cenaze û çekên xwe hiştibûn. Me wê demê ji wê dêrê 3 doçqeyên 12,5 û doçqayek 23 rakir. Wê demê me ferq kir ku kuştiyên pir in. 18 cenazê wan li erdê bûn.

Piştî ku derba giran xwarin çeteyan telefon ji hevalan re vekiribûn û gotibûn, *“em dixwazin şer raweste, ev lîstokeke Tirkan bû û em ketin vê lîstokê, em dixwazin bi biratî ev pirsgirêk çareser bibe!”*

Hevalên me yên di nava bajêr de jî lehengiyeke pir mezin kiribûn. Çeteyan nikarîbûn cihên wan bigrin. Hevalan li ber xwe dabûn. Yanî di wî şerê destpêkê yê Serêkaniyê de, tenê ew koma hevalên riya Hesekê kete destê dijmin. Ew jî di encama birîndarî de bû.

Şerê Serêkaniyê di çend qonaxan de gelekî dirêj kir. Cih bi cih sekinî, agirbest çêbûn lê piştre dîsa destpê kir. Di hemû pêngavan de şehîd û birîndarên me çêbûn. Bi hezaran çete hatin kuştin. Lê di dawiyê de serkeftineke pir mezin bû, ew şer bi ser ket. Jixwe Serêkaniyê bû destan. Planên Tirkiyê û dijminên Kurdan ku bi destê çeteyên weke Cebhet-el Nusra pêkdihatin, vala derketin. Di serî de jî ew partiyên ku bi navê `Kurdayetî` xwe didan jiyan kirin, îxanet dikirin. Serkeftina Serêkaniyê îro bû bingeha serkeftina hemû bajaran.

**‘Dema hevalek birîndar an şehîd bibe, ez ê çeka wî hilgirim!’**

Paşî di asta herî jor de bi rihê berxwedanê, serkeftina Serêkaniyê hate pîrozkirin. Di wê roja ewil de, li gel hevalê Abid hevalekî ciwan jî şehîd bû. Ew heval ji Serêkaniyê bû. Me nas nedikir û bê çek sekinîbû. Ji ber ku çekên me pir kêm bûn, çi gotiye? Gotiye, “*dema hevalek birîndar bibe an jî şehîd bikeve, ez ê cihê wî bigirim, çeka wî hilgirim!*” Tevî ku me hevalên bê çek ji qada şer derxistibûn jî lê wî nexwestibû dûr bikeve. Ciwanekî 18 salî bû û rihekî pir fedaî pê re bû. Tevî ku bê çek bû jî, di nava şerekî ewqas giran de ma û xwe neda paş. Bi vî awayî ew ciwan şehîd ket. Ji ber ku çek di dest de tunebû û hinekê dûrî me jî bû, giran birîndar bibû, paşî şehîd ket. Bêguman destan û dîrok wiha têne nivîsîn!

Çeteyan paşî di peymana agirbestê de ji hevalan re gotibûn, “*30 kes ji me hate kuştin û 200 jî birîndarê me hene.*” Bi vî rengî cara destpêkê bû ku em di bajaran de şer dikin, mewzî digirin. Nexasim li hemberî dijminekî ewqas hov û dirinde. Lê rihê Apoger, rihê tevgera azadiyê bi rastî jî hişt ku bibe awantejeke herî mezin.

Mînak, berê ji min re bigotana, “*hevalên ciwan ku hîn nû perwerde didîtine û bê ezmûn, bi qlêşekê û du cercûlan, li hemberî ewqas çeteyên ku li Efxanîstan, Iraqê û derê din şer kirî; berxwedaneke bêhempa nîşan dane û ew şikênandine!*” dibe ku min bawer nekirana. Lê min ev dît, min jiyan kir! Ev yek vê dide nîşandan; eger yekîtiya rih û fikir hebe, hevaltiya bilind û bi rûmet hebe, dijiminê te çi dibe bila bibe, heta dawî wê têkbiçe.

***Encam û ezmûnên şerê Serekaniyê hûn çawa digrin dest? We diyar kirk u şer û serkeftina Serêkaniyê, ji bo Şoreşê rawestgeheke girîng e. Vê berxwedanê, pêşketinên piştî xwe çawa tesîr kirin?***

Şerê Serêkaniyê ji bo me bû dîrok, destpêka şerê bajaran, dîroka terz û rêbazeke nû. Li ser vê esasê her çar parçeyên Kurdistanê û cîhanê dît ku erê YPG’ê ciwanên herêmî ne, lê ji milê fikir û rih ve tecrûbeya 40 salan a hereketa Apogerî girtine. Li ser vê esasê li hemberî hemû êrîşan li ber xwe dan.

Ji milê civakî ve Serêkaniyê dewlemend e. Kurd, Ereb, Ermenî, Çeçen hene. Ew destan, wan bi xwe jî dît. Kurdê wê derê çawa şer kirin, çawa li ber xwe dan… Ji bo vê jî rewabûna xwe qezenc kir. Yê ku diparêze ew qezenc dike. YPG’ê û YPJ’ê ev erka xwe pêk anîn.

Piştî şerê Serêkaniyê me hinek civîn lidarxistin. Kêmasî hatin nirxandin, tiştê ku beriya şer nehate dîtin, nehate kirin bû mijara nîqaşê û encam hatin derxistin. Dîsa ezmûna yekemîn ya şerê bajaran jî hate nirxandin. Mijareke bingehîn a rexneyan jî beriya xeteriyan çeper çêkirin, mewzî û cebilxane amade kirin û ya herî girîng jî gel amade kirin bû. Xaleke girîng jî *“ ‘Xeta Parastina Rewa’ pêwîst e çawa bê fêmkirin, çawa pratîkî bibe û kêmasiyên ku di milê têgihiştinê de derketin çawa bê derbaskirin*” bû. Di vî milî de jî encamên gelekî girîng hatin derxistin.

Mînak, di guleya destpêkê de, piraniya gel reviya milê Serêkaniyê ya Bakur. Bajar hate valakirin, ev jî ji çeteya bû awantajek. Li gorî dilê xwe hemû kolan bi kar anîn, bajar bi kar anîn. Dizî, talan heta dawî hate kirin. Ji hêla din ve em cara yekemîn diketin şerê bajaran. Tu nikarî her derê kontrol bikî. Lewra jî pêwîst e beriya xeteriyê tu xwedî tedbîr be. Şer hebe tinebe, divê tu amade be. Yanî divê tu ji sedî sed qadê li gorî parastina cewherî amade bikî. Hem coxrafya, hem gel û bi taybetî milê cebilxane û lojîstîkê…

Encameke dîrokî jî di warê tevgera jinê de bû. Di wê derê de cîhanê dît ku bi rastî jî dema jin xwe perwerde bike dikare bibe sîstem; dikare bibe tabûr, bi nav û deng bibe, pêşengîtiyê ji civakê re bike. Bi taybetî sîstema xweseriya demokratîk di kesayetiya jinê de were avakirin. Li ser bingehên esasî yên parastina cewherî dikare bibe tevger.

Ji bo Serêkaniyê bi giştî mirov dikare bêje xala dîrokî ya şoreşa Rojava li wê derê bû. Nîşaneya serkeftin û binkeftin dîsa li wê derê diyar bû. Ji bo wê, serkeftinê hişt ku li hemû bajarên Rojava ev rih belav bibe. Piştre li qadên din jî şer dest pê kir. Helbet çeteyan çend carên din jî xwe li Serêkaniyê ceribandin…

***Hûn jî beşdarî şerê Serekaniyê bûn; hûn dikarin ezmûnên xwe ji me re bînin ziman?***

**DIJWAR SERÊKANIYÊ:** Wê demê li xeta Serêkaniyê-Dirbêsiyê me kar dikir. Me dizanî ku di rewşeke wisa de, dê êrîş bên ser tevahî bajarên Kurdistanê û wisa bi aramî nabe. Ji ber vê nirxandinên hemû hevalan hebûn û li gorî wê

tedbîr jî dihatin rêxistinkirin. Bajarê Serêkaniyê ji gelên Kurd, Ereb û netewên din pêk tê. Rast e, bajarekî Kurdan e; lê hê di dema Serokê Misirê yê kevin Cemal Ebdûl Nasir de piraniya Kurdan ji wir derxistine û Ereb lê bi cih kirine. Hêremeke çandiniyê ye. Ji aliyê ax û avê ve dewlemend e.

Cebhet El Nusra, Ahrar El Şam û gelek komikên din yên çete ji hundurê Tirkiyê re êrîşî Serêkaniyê kirin. Wê demê li Serêkaniyê hê hêzên rejîmê jî hebûn. Jixwe hemû bajar hê nehatibûn paqijkirin. Bi carekê re şev êrîş kirin û hinek hêzên rejîmê kuştin, hinek dan revandin. Di demeke kin de Serêkaniyê girtin. Ango hêza rejîmê ji wir derxistin. Li Serêkaniyê hinek xebatên me yên meclis û parastinê jî hebûn. Îhtîmala êrîşê dihat dîtin, lê me texmîn nedikir ku bi wê lezginî û di demeke ew qesa kin de êrîş çêbibin. Me digot wê gav bi gav werin; dê di serî de werin Hesekê, pişt re werin Serêkaniyê û cihên dîtir. Lê wisa nebû.

Ez wê demê li Til Temir bûm. Bajarê Til Temir jî, di navbera Serêkaniyê û Hesekê de ye. Li wir jî Kurd, Ereb û Asûr bi hev re dijîn. Li wir jî tevlîhevî hebû, me dixwest meclîsên hevbeş ava bikin. Dema şer destpê kir ez ji Til Temir dihatim Qamişlo da ku hevalan bibînim û derbasî aliyê Helebê bibim. Li Dirbêsiyê ez rastî hevalan hatim ku bi gelek maşîneyan xwe amade dikirin. Min got, "*çi bûye?*" Gotin, "*li Serêkaniyê di navbera me û çeteyan de şer derketiye, em ê mûdaxale bikin.*" Bi vî awayî çûyina min ya Helebê jî sekini û ez jî ketim nav hevalan. Roja duduyan em gihiştin Serêkaniyê û şer berdewam kir.

Di şer de, em yekser li kêleka bajêr bûn. Em li aliyê rojhilatê bajêr diman. Roja ewil dema êrîş dikin, hacîzekî hevalan li ser riya Hesekê jî heye. Dema ku li rojhilatê Serêkaniyê heval li çeteyan dixin, ew jî êrîşî wî hacîzê li ser riya Hesekê dikin. 15 heval li wir hebûn. Fermandara wan hevala Rojînda bû. Hevala Rojînda birîndar dibe, hevalên din jî pir zêde ne xwedî ezmûn in, hemû dîl dikevin. Piştî ku me şer kir, me jî gelek çete dîl girtin û me wisa hevalê xwe rizgar kirin.

Dema şer destpê kir û teqwiye jî ji hevalên Serêkaniyê re çû êdî şer belav bû. Şer êdî li cade û kolanan bû, di nava malan de bû. Em rûniştin û me nîqaş kir, divê em pêş ve biçûna. Lê ji ber sekvanan û qarnasan tu nikarî di kolanan re biçî. Encex di nava malan re tevger gengaz bû. Me got, "*em ê dîwaran kûn bikin.*" Me tevir li dîwaran didan, lê pir dereng dibû. Ew rêbazên kûnkirina dîwaran jî em pir diwestandin. Pişt re balyoz ango mezrebe, bû amûrekî xurt. Êdî weke amûrekî cebilxanê lê hatibû. Divê li gel hemû yekîneyan balyoz hebûya.

Wekî din ji bo ku em bikaribin di hindek kolanan re bimeşin û sekvan me nebînin jî me perde datanîn. Lê bi BKC'yan perde didirandin. Dîsa jî rêbazeke bi bandor bû. Wan jî carna êrîş dikir, lê qet paşve zivirandina me çênedibû. Wisa gav bi gav em pêş ve diçûn.

Şerê Serêkaniyê mirov weke 3 pêngavan dikare binirxîne. Pêngava yekemîn, ew şerê ku hevalê Abid Xelîl wan şehîd ketibûn. Pêngava dûyemîn jî, şerê ku hevalê Goran wan şehîd ketin. Pêngava seyemîn jî, ew şerê herî dawî ku me çete ji Serêkaniyê derxistin.

Di şerê Serêkaniyê de xeta Dirbêsiyê-Serêkaniyê stratejîk bû. Li wir gundê Alok hebû. Dijmin car caran êrîşî vir dikir û dixwestin navbera Dirbêsiyê û Serêkaniyê qut bikin. Ji milê başûr ve êrîş dikirin. Di navbera Til Temir û Serêkaniyê de jî wan xwe bi cih kiribûn. Gelek komikên wan hebûn. Dixwestin wê rêkê her qut bikin. Lê hevalan her bersiv dida. Jixwe alîkariya ku ji me re dihat, di wê rêkê re dihat. Ji ber vê giraniya xwe didan wir. Caran ji milê Tirkiyê ve jî dihatin, lê hevalan li wan didan.

Li gundê Alok hacîzekî me hebû. Dijmin êrîşî wir kir. Seat 10`ê şevê bû, hevalan telefon vekir û gotin, "*dijmin rê girt.*" Ango navbera Serêkaniyê û Dirbêsiyê qut bû. Wisa em di dorpêçê de diman. Jixwe aliyên din hemû dijmin bûn. Tenê xeta ku diçe Dirbêsiyê vekirî bû, ew jî hat girtin. Em ketin tevgerê û bi du maşîneyan em çûn. Me agahî da hevalên aliyê Dirbêsiyê jî, me got hûn jî di wî alî re werin.

Çeteyan hin kes ji gel jî dîl girtibûn. Me got, ger em rast e rast li wan bixin, dibe ku ew kesên dîl jî li wir bin. Me bîryar girt ku em bi çekên giran tenê li dîwarên xaniyan bixin. Ji milê me ve jî me heval kom bi kom, bi awayekî veşartî li derdora rê bicih kirin. Dê heval ji mile başûr re bi awayekî veşartî biçûna û xwe nêzikî xaniyan bikirana. Ji ber vê divê hevalên aliyê din, li aliyê bakur bixistana. Jixwe ew der nêzikî sînorê Tirkiye bû. Hevalên ku veşartî çûn, heya 50 metrî xwe nêzik kirin. Me ji wan re got, "*li wir bisekinin.*" Hevalên din re jî me got, "*êdî li aliyê bakurê gund bixin*." Em jî çûn gel wan hevalên 50 metrî nêzikî gund bûne û me bi B-7 li xaniyan xist. Bi vê re me dît ku bi motoran ji nava gund derketin. Jixwe qîrewîra wan bû, tekbîr dianîn. Me gule barandin ser wan.

Dema em nêzikî xaniyan bûn, me dît ku deng ji hundur tê. Me gazî kir û got, "*xwe radest bikin*." Lê bi Erebî gotin, "*em sîvîl in.*" Me got, "*destê xwe rakin û derkevin*." Dema ku dengê jin û zarokan hat, êdî me fêm kir ku sîvîl in. Derketin û xwe avêtin me. Lê "*digotin baş e ku YPG hat, van çeteyan em dabûn pêşiya xwe.*" Pişt re me dît ku li wir hinek çeteyên birîndar li erdê dinalin, me ew jî dîl girtin.

Ew gundiyên wir ne dostên me bûn, lê piştî ku me ew rizgar kirin, bûne dost û alîkariya me kirin. Dema ku em bi ser çeteyan de çûn hemû amûrên xwe hiştin û reviyan. Wê demê qamyoneke mezin, doçqayek, roketên B-7 û hinek cebilxane me girt.

***We behsa pêngava duyemîn kir, di vê pêngavê de çi pêşketin çêbûn?***

Di pêngava duyemîn ya Serêkaniyê de, heval Goran şehîd ket. Me wisa xetek çêkiribû. Ji firinê heya başûr ji mile rojhilat ve ketibû destê me. Dema ku em di pêngava duyemîn de gihiştin wir, me ji hevalan re got, "*em li vir xetekê çêkin.*" Dema me li wir xet çêkir; hevalê Cemşîd berpirsiyarê Serêkaniyê bû, me bi hev re ew der tanzîm kir. Şehîd Goran wan jî bi me re bûn. Lê di şerê bajaran de ger tu hemû eniyê nexê destê xwe, dijmin di her kêliyê de dikare bizivire pişta te û te bixe dorpêçê. Êdî tenê tu dikarê heya ku cebilxaneya te xilas bibe şer bikî. Dema ku tu li cihekî ji pêş ve diçe, divê çep û rastê te jî pêş ve biçe. An na her îhtimala êrîşê û ketina dorpêçê heye. Xeta ku me çêkiribû, heval Goran wir derbas dike û diçe dikeve hin bînayên vala.

**FOTO: GORAN -EBDULWEHEB EBDULQADIR – FOTOĞRAFI KULLANILACAK**

Çeteyên ku êrîş dikirin jî her dihatin guhertin. Digotin, "*nizanim di çend seatan de me rejîm ji vir derxistiye, ma em nikarin we derxin?*" Wisa nêzikî me dibûn. Kîjan koma wan dihat, wisa nêzik dibû. Komek tê û êrîşî hevalê Goran wan dike. Lê hevalê Goran wan qederê 60 metrî pêş ve çûne û agahiya me jê tunebû. Nobedariya xwe jî baş nakin, dijmin heya ber derî tê û dibêje radest bibin. Wisa şer destpê dike. Başe ku derî girtîbûye.

Dema ku dikevin dorpêçê, hevalê Goran wan hinek şer dikin. Lê dora wan hemû hatiye girtin. Ji ber bêtedbîriyê 12 heval tengav bibûn. Hevalan xwestiye bi niyeteke baş pêşve biçin, lê bê tedbîr ketine nava dijmin. Me bihîst û mûdaxale kir. Lê heta mûdaxale çû, Hevalê Goran şehîd ketibû. Ger hêza me li wir tunebûya û me mûdaxale nekiriba, dibe ku hemû heval jî şehîd biketana.

***Di rewşeke wisa de we çawa mûdaxale kir?***

Ber êvar bû, me sê-çar caran êrîş kir da ku em hevalan rizgar bikin. Çeteyan jî pir êrîş dikir, me cîhazên wan guhdarî dikirin. Digotin, "*me xistine çemberê, em ê hemûyan bi dest bigrin.*" Me got çawa tarî bikeve, em ê êrîş bikin. Hevalê Şahîn, hevalê Ferhat, hevalê Ciwan Îbrahîm û hevalê Cemşîd her yek ji wan li ser yekîneyekê çûne êrîşê. Wisa ji çar aliyan ve hevalan êrîş kirin. Ji hevalên di dorpêçê de re jî me got, "*hûn di hundurê xanî de deriyan xurt bigrin û dernekevin heya ku me li ber derî gazî we nekir, derî venekin.*"

Hevalan bi narîncok û B-7'an êrîş kirin. Wê demê hevalê Şahîn birîndar bû. Doktoran hema mûdaxale kir û tiştek nebû. Me sekvanên xwe bi cih kirin û careke din êrîş kir. Di encamê de em gihiştin gel hevalan. Hevalê Goran ji serê xwe gule xwaribû û şehîd ketibû. Sekvanan ew şehîd xistibûn. Gelek kuştiyên çeteyan jî hebûn.

Ew xeta ku heval Goran lê şehîd ket wan carake din ji bo wir amadekariyên êrîşê dikirin. Hêzên xwe yên teqwiye anîn. Agahî ji me re dihatin. Hêza Ahfad el Resûl û gelek ketîbeyên Artêşa Azad hatibûn. Ahrar Xwêran, Arteşa Azad, komên El Qaîde hebûn, ji xwe Cebhet El Nusra hebû. Gelek nav li xwe dikirin. Nêzikbûna wan li ser esasê talanê bû. Diketin kuderê mal û dûkanên gel dişêlandin.

Di nava wan de hinek nokerên `Kurd` jî hebûn. Ew kesên girêdayî ketîbeya Mîşel Temo, komikên tevgera azadî wan hemû noker bûn. Evan li gel wan çeteyan li malên dostên me digeriyan, li malên malbatên şehîdan digeriyan. Ango kî dostê me be, malên wan hemû talan dikirin. Rikeke wisa ji ya dijmin jî xerabtir hebû li hemberî me. Bêguman gelek ji wan di şer de dihatin kuştin jî.

Di şerên Serêkaniyê de cih bi cih agirbest çêdibûn lê me baweriya xwe bi çeteyan nedianî. Lewra ne cihê bawerî û ewlehiyê bûn. Nedibû ku em tedbîrê ji dest berdin. Jixwe di demeke agirbesê de wisa şerekî giran destpê kir. Me agahî da hevalan û teqwiye ji me re hat. Ji wan re jî teqwiye hatîbûn. Zilamek ji aliyê Îdlîbê hatibû, navê wî Ebû Cemal bû. Ew yekser girêdayî Tirkan bû. Rast e rast, bi Tirkan dişêwirî. Beriya wê em diçûn hevdîtînan, lê di wê demê de me digot em naçin hevdîtinan jî. Lewra zilam komploger bûn, bi çavekî biçûk li me meyze dikir. Kengê çi bikirana ne diyar bû. Ji ber vê me digot, bila ew werin. Pir komploger bûn. Vê dawiyê hevalên me li Efrînê çûne hevdîtinan, hemû girtine û avêtine zîndanan.

Di şerê seyemîn ê Serêkaniyê de, dema ku me destpê kir êdî em nesekinîn. Heya ku riya Hesekê hat girtin û me mile nexweşxaneya mezin girt em nesekinîn. Çar rojên destpêkê şer hinekî giran bû; ne em pêşve çûn, ne jî wan karî pêşve bên. Wan jî amadekariyeke pir mezin kiribûn û digotin, "*di nava hefteyekî de em ê van paqij bikin.*" Xwe wisa tanzîm kiribûn. Sûbayên Tirkan jî hatibûn wir, bi awayekî vekirî bi Tirkî jî diaxifîn. Me jî amadekarî kiribûn. Hevalan jî hinek giranî dabûn Serêkaniyê. Çar rojan şer pir dijwar bû. Doçqa û hawan pir dişûxilandin. Doçqa di bajêr de pir bandor nedikir, lê hawan ji aliyê Tirkan ve jî dihatin.

Di wan çar rojan de 7 heval şehîd ketin. Bi giştî di 16 rojan de 27 heval şehîd ketin. Hevalê Serhed, Lewend, Zerdeşt, Adil, Xeyrî, Ehmed û hevalê Îsmaîl şehîd ketin. Piraniya hevalên şehîd jî ji Serêkaniyê û Qamişlo bûn. Di şer de em her pêş ve diçûn. Me cîhazên wan guhdarî dikirin, pir tengav dibûn, piraniya wan direviyan. Ji ber vê her paşve çûn û em jî pêşve çûn. Ew di qada navnetewî de jî bû rojev.

**Gelê Serêkaniyê ji YPG hez kir...**

Dema ku li Serêkaniyê şer destpê kir, ji bajarên din yên Cizîrê gelek kes reviyan û welat terikandin. Jixwe antipropagandaya me jî wan partiyên ENKS dikir. Li Serêkaniyê jî gel kêm ma. Lê dema ku di her pêngavekê de em pêşve diçûn gel zêdetir vedigeriya û dihat. Yên ne dostên me jî dihatin. Mînak malbateke mezin hebû, ne bi me re bûn; lê bi maşîne û ciwanên xwe alîkariya me kirin. Gelê Serêkaniyê, ji bo hevalan pir zêde hezkirin nîşan didan. Êdî YPG-YPJ weke xwediyê xwe didîtin. Cihê ku ala YPG hebû, bi eniya xwe ve girêdidan, maç dikirin. Li ber alan disekinîn û wêne dikşandin. Dema ku fîşekek diteqiya, êdî zarokên Serêkaniyê fêm dikirin ku kîjan çek diteqe û dengê çi ye!

**FOTO: SEREKANİYE'DE HALK EKMEK KUYRUĞUNDA – FOTOĞRAFI KULLANILACAK**

Di vir de moralê gel pir zêde bû, baweriyek çêbû. Êdî îspat bû ku em dikarin bajarên xwe biparêzin û pergala xwe ava bikin. Digotin, “*ev çete diçin li dewletê dixin; lê nikarin bi YPG*!” Wisa jî pir tevlêbûna ciwanan çêdibû. Gelek malbatan sê-çar şehîdên wan çêbûn. Mînak malbata Şehîd Omer heye, hevalekî ku refên PKKê de gerila bû, di çalakiya Rûbarokê de şehîd ketibû. Birayê wî jî tevlê gerila bû û wî jî navê xwe Omer danî. Di 2005’an de ew heval jî li Bakurê Kurdistanê, Botanê şehîd ket. Di wî şerî de jî birayekî wan hebû, çûbû ber sînor û ew jî şehîd xistibûn. Sê bira ji malbatekê şehîd ketibûn.

**FOTO: SEREKANİYE ŞEHİTLERİNİ ANIYOR - FOTOĞRAFI KULLANILACAK**

***Di mijara Serêkaniyê de wek encam xalên bingehîn li gor we çi bûn?***

Pêngava Serêkaniyê bi ser ket. Bû sedem ku YPG jî mezin bibe û gelê Rojava jî bi xwe bawer be. Mesela gelê Dirbêsiyê û Amûdê berxwedaneke pir mezin nîşan dan. Nîvî nanê xwe dişandin Serêkaniyê. Ji her alî ve alîkarî dihat. Seferberî hebû. Bi kurtayî ez dikarim bibêjim, di şerê Serêkaniyê de moralekî pir mezin çêbû. Ezmûnek çêbû. Bawerî û vînek derket holê. Kêmasiyên me jî hebûn. Bi vî awayî heya Çile ya 2013’an 27 hevalên me şehîd ketin. Tevî ku şer pir giran bû û ezmûna me ya bajaran jî pir tune bû, astek hate girtin.

Piştî ku wê demê agirbest çêbû, me hindek xal dane ber wan. Me got ku divê tu kes di hundurê bajêr de nesekine. Hûnê li derveyî bajêr bisekinin, em jî li derdora zindanê bisekinin. Ew hêzên Artêşa Azad wan hemû derketin. Tenê navendeke El Nusra mabû. Planên wan jî cûda bûn, dixwestin xwe komî ser hev bikin û ji nû ve êrîşî me bikin. Di dema agirbesê de kesên medenî jî ketin navberê û meclîsên bajêr hatin avakirin.

Di wan deman de, ez ji Serêkaniyê derketim. Piştî wê hevalan pêngaveke nû çêkirin û ew der bi giştî paqij kirin. Milê Til Xelef wan deran jî hatin paqij kirin. Bi giştî mirov dikare vê bibêje, şerê Serêkaniyê bawerî da gele Rojavayê Kurdistanê û hemû gelê Kurd. Careke din diyar bû ku gelê Kurd xwedî vîn e, dikare xwe biparêze, dikare xwe rêxistin bike û xwe bi rê ve bibe. Ji ber vê jî pêngaveke stratejîk bû. Dibe ku destpêk bû, lê di şikênandina dijmin de şerekî esasî bû. Wê demê êdî rejîmê jî, El Nusra jî, Artêşa Azad jî û Tirkiyê jî dîtin ku vîn û rihê Apogerî li Rojava heye. Teqez vegotina min pir aliyan ve kêm dimîne. Hêvî dikim ku aliyên kêm mane, hevalên şahidiya wê berxwedanê kirine temam bikin.

***Fermandara Bavê Xwe Jineke Ciwan…***

*Li Serêkaniyê em diçin bendeke qontrolê ya YPG’ê. Şervanên YPG’ê ku li vê derê notirvaniyê dikin, her yek ji temenekî/ê cuda ye. Em silavê didinê û rewşa wan dipirsin. Weke her careke di destpêkê de em xwe didin nasîn û tiştên ku em dixwazin bikin, ji bo wan jî tînin ziman. Pişt re ew dest bi serpêhatiyên xwe dikin… Şervaneke ciwan bi rûkeniya xwe balê dikşîne ser xwe. Em fêr dibin ku navê wê Beyan e. Hema li ser piyan em dest bi axaftinê dikin. Em dixwazin tiştên ku tên axaftin werin qeydkirin, lê Beyan vê yekê qebûl nake. Em jî naxwazin pir israr bikin. Roja dîtir, li taxake dîtir a Serêkaniyê em careke din Beyanê dibînin. Bi rehetiya hevnaskirin û axaftinên duh, hema tê gel me. Bêyî ku were plankirin, em dikevin nava nîqaş û sohbeteke germ. Beyan dest bi vegotina çîroka xwe dike, em ji*

*bi pirsên xwe meseleyê kûr dikin. Bi hesteke hundirîn û zimanekî nerm hemû pirsên me dibersivîne. Dema ku em dibêjin, "em ê van tiştan binivisînin" dijberî gotina xwe ya duh dibişire û dibêje "bêguman hûn dikarin binivisînin, li vê derê çi tê jiyîn bila her kesek bizanibe."*

**FOTO: BEYAN ve 'BEYAN VE AİLESİ' - FOTOĞRALARI KULLANILACAK**

*Beyan, 17 salî ye. 8 xûçk û bira ne, ji malbata wê 5 kes di nava YPG-YPJ'ê de cih digrin. Bavê wê jî di asayîşa bajêr de cih digre. Beyan di nava gotinê xwe de car caran bi henekî dibêje, "ez fermandara bavê xwe me." Lewma li gorî bavê xwe, ew bi awayekî profesyonel û çalak tevlî şoreşê bûye. Weke her carê gotin dîsa dizivire ser şerê Serêkaniyê, Beyan van gotina li pêy hev rêz dike; "beriya salekê dema ku çeteyên Arteşa Azad êrîşî Serêkaniyê kirin, em hemû tirsiyan. Lewma bi çekên giran ji aliyê Tirkiye ve hatin û êrîşî me kirin. Li bajêr koçberiyeke mezin çêbû. Lê weke malbat em koçber nebûn. Me bîryar girt ku em li Serêkaniyê bimînin û li dijî zilma ku bi salane li ser me tê ferzkirin têbikoşin... Di demên cuda de 5 êrîşên mezin çêbûn, lê êrîşa dawî êrîşa herî mezin bû. Pir zêde mirov hatin kûştin. Nêzikî hezarî çeteyên ku dixwastin bajarê me talan bikin û dest daynin ser malên me hatin kûştin. Nêzî 20 hevalan jî di vî şerî de me şehîd dan..."*

*Beyan di nava pevçûnan de careke dîl ketiye destê çeteyan. Bi awayekî dîl birina wê ya milê Tirkiyê bi van hevakon tîne ziman; "ji ber ku ez jin im, diyardikirin ku ji min re neaxifin. Ez 18 rojan di destê wan de mam. Li milê Tirkiye ez birim cihekî ku ez nas nakim. Pişt re dema li gel hevalan guhertina dîlan kirin, ez serbest berdam. Her wiha xûçka min a 18 salî jî bi birîndarî dîl ket destê çeteyan. Navê wê Jiyan e. Ji sê cihên cuda birîndar bûbû. Hewil didin ku xûçka min bikûjin, lê bijijkê çeteyan ku Kurd e, xûçka min nas dike. Ji çeteyan re dibêje, "ez ê wê derman bikim" û ji wê derê direvîne. Pişt re jî wê radestî hevalên me dike... Xûçka min bi wî awayî rizgar bû."*

***Xeyala Amed'ê...***

*Temenê Beyanê ji yê me kêmtir e, lê xwe bawerbûyin û girêdana ku di navbera pêşketinên siyasî û leşkerî de çêdike bala me dikşîne. Em vê yekê di navbera xwe de nîqaş dikin û digehêjin encameke wisa; şer û têkoşîna mafdar, mirov pir zû digihêjîne û mezin dike. Em Beyan'ê pirsin dikin ka wê tevlêbûna xwe ya şer bidomîne, an na? Dibêje, "heya ku em Serêkaniyê û Rojavayê Kurdistanê bi giştî rizgar nekin, em dev ji şer û doza xwe bernadin. Piştî ew qesa tûndî û zilim, em nikarin dev ji desteftiyên gelê xwe berdin. Weke jineke heya dawiyê di nava YPG'ê de ez ê têkoşîna xwe bimeşînim." Lê şer biqede? Ev pirsa me jî wisa dibersivîne, "piştî ku şer xilas bibe, xeyala min a herî mezin, çûyin û dîtina Amed'ê ye. Her wiha ez dixwazim xûçka xwe ya li Edene'yê jî bibînim."*

***Şerê Serêkaniyê hûn ê çawa rave bikin? Li gorî dîtina we, sedema ku êrîşên çeteyan li Serêkaniyê dest pê kir çibû?***

**CEMÎL KOBANÊ:** Serekaniyê, ji bo Rojavayê Kurdistanê pêvajoyek pir girînge. Van ketîbeyên ku êrîşî Serêkaniyê kirin xwe weke hêzên Sûriye didîtin, dixwestin hêzên rejîmê bixînin û dest deynin ser herêmê. Jixwe di wê navberê de di ser Girêspî re hatin milê Serêkaniyê. Girêspî, Mebrûka, Aliya û Serêkaniyê girtin û hebûna xwe li ser me ferz kirin. Gotin, "*me ji van deran dewlet derxistiye, saziyên we jî li vê derê nayên qebûlkirin, divê hûn bikevin bin venêrîna me û şertên me qebûl bikin.*"

Li ser vê esasê şer derket. Dema ku ew nîqaş çêdibûn, wan ji milekî ve jî amadekariyên xwe kiribûn. Hevalên me jî ne amade bûn. Ji ber vê dema ku êrîş kirin, ketibûn nava taxên me û hin cih girtibûn. Dema ku êrîşên wan destpê kirin, hevalan cihên di navbera Dirbêsiyê û Serêkaniyê de asê kiribûn da ku çûnûhatina hêzên leşkerî bi rehetî çêbibe.

Li wir şehadata hevalê Serhed û hevalê Lewend çêbûbû. Ew heval pêşengên xebatên ciwanan bûn. Dema ku şer destpê dike, ji Qamişlo diçin û dikevin nava pêngavê. Di pêngava yekemîn de rizgarkirina taxên Kurdan û cihên ku me berê tê de xebat meşandine hatibûn hedef girtin û ew cih hatin girtin. Lê gelek pevçûn çêbûbûn û gelek berdelên vê jî çêbûn.

Dijmin ji milê Til Temir û Hesekê ve dîsa ji milê Helebê ve teqwiye dianî. Alîkarî û teqwiyeya esasî jî ji hêla dewleta Tirkiyê ve dihat. Cihên bilind û stratejîk yên bajêr girtibûn. Dixwestin êrîş û berxwedaniya me bişkînin. Dema ku dîtin em ew qesa li ber xwe didin, çekên giran anîn. Serêkaniyê ji wan re bûbû cihekî dijwar û li

Serêkaniyê darbe dixwarin. Kuştiyên wan pir zêde çêdibûn, moralê wan diket. Bi vî awayî her çiqasa me şerê bajaran zêde nedizanî jî, me gelek qad girtin û me dijmin pir tengav kir.

Dema ku me ew qadên Kurdan rizgar kirin, di navbera me û wan de agirbestek çêbû. Gotin, "*em di Serêkaniyê de rêveberiyeke hevbeş bidin avakirin.*" Jixwe li Serêkaniyê gelên dîtir jî hebûn, ji ber vê me ew yek qebûl kir. Jixwe hêzên weke El Nusra xwe bêalî nîşan didan û ketin navberê. Digotin, "*li hemberî hêzên ku li dijî rejîmê şer dikin, em şer nakin.*" Li ser vê bingehê ketin navbera me û Artêşa Azad.

Li ser wê esasê agirbesta yekemîn çêbû. Di warê siyasî de jî bandora vê agirbestê çêbû. Wan partiyên dîtir digotin, em ê li gel mûxalîfên Sûriye, li rejîmê bixin û pişt re mafê Kurdan bistînin. Lê derket ku ne wisa ye. Di Serêkaniyê de hate dîtin ku vîna Kurdan nayê qebûlkirin. Ji ber vê yekê di navbera Kurdan de hevbeşiyeke siyasî çêbû. Li Duhok, Silêmanî û Hewlêrê hevdîtin çêbûn da ku Kurd bibin yek û di şoreşa Sûriye de bi yek nêrîn û bi yek fikir tevbigerin. Helwesteke siyasî ya Kurdan derket holê, hêza leşkerî ku li hemberî dijmin dikare gel biparêze jî xwe îspat kir. Her wiha di qada navnetewî de qebûlnekirina Kurdan, lîstok û êrîşên ji milê dewleta Tirk ve tên pêş xistin, hemû zelal bûn.

Ji ber ku êrîşên çeteyan her dubare dibûn, me bîryar girt ku em wan bi giştî ji Serêkaniyê biavêjin. Weke me got, her çiqasa ezmûna me ya şerê bajaran tunebû jî, bi fedakarî û afirêneriya hevalan serkeftin çêdibû. Êdî sekvanên me jî xurt bûbûn. Dê çawa pêşveçûn çêbibe, hin teqtîk di van mijaran de pêş ketibûn. Mesela hevalê Akîf ji ber ku li Serêkaniyê kar dikir, ew tax hemû nas dikirin. Di wî şerî de risteke girîng pêk anî. Her wiha hevalê Firat jî wisa bû. Hevalên ciwan bûn, dikarîn ciwanan jî bidin kêleka xwe û bi danehevên ku çêbûne pêş ve biçin.

Bi vî rengî hevalan ji milê Bakur ve dan ber xwe û heya nêzî derî çûn. Di nava bajêr de jî cih û saziyên dewletê ku çeteyan girtibûn hebûn. Ew cih hevalan xistin dorpêçê û girtin. Du xetên wan yê esasî hebûn, yek ji Til Xelefê dihat û yek jî ji Hesekê dihat û diket nava bajêr. Hêzeke me jî li wir eniyek vekir û ketin û derketin qut kir. Hinek hevalan li milê başûrê bajêr şer dikirin, hinek hevalan jî ji milê sînor ve di nava bajêr de pêş ve diçûn. Wisa bi awayekî kordîne û bi çalakiyan pêşveçûn çêdibû. Di nava çend rojan de ji milê başûr ve em gihiştin dawiya bajêr. Me ji milê rêka Serêkaniyê û Hesekê re bajar derbas kir û em gihiştin hacizên derveyî bajêr.

Dema ku dijmin dît, li Serêkaniyê nikare li ber xwe bide cara duyemîn agirbest xwestin. Me heya wê demê gelek cih girtibûn, tenê taxa Mehata û deriyê Bakur mabû. Şer li wê derê û li gundên ku diçin Til Xelef mabû. Me ji agirbestên wan bawer nedikir, lê ji ber ku êdî em bi xwe bawer bûn ku em kengê bixwazin dikarin ew cihên di destê wan de mane bigrin, me şer da sekinandin. Me giranî da rizgarkirina cihên dîtir.

***Hûn jî di dema wî şerî de li Dirbêsiyê bûn, em dikarin bêjin cîranê Serêkaniyê bûn, hûn dikarin şahîdiya xwe bînin ziman?***

**DILDAR KOBANÊ:** Şerê Serêkaniyê di navbera dewleta Sûriyê û Arteşa Azad de destpê kir. Em jî neçarbûn tedbîrên xwe bigrin. Jixwe dema ku Artêşa Azad Serêkaniyê girt, komeke wan ber bi hacizê me ve hat. Berê hacizên me tunebûn, lê dema ku me dît şer mezin dibe, me haciz danîn. Rojekê ji haciz telefon vekirin, gotin "*ketîbe hatine, dixwazin derbasî aliyê Dirbêsiyê bibin.*" Me jî got, "*nehêlin derbas bibin*." Çete dibêjin em ê biçin gundên Ereban, lê heval nahêlin. Piştre gotibûn, "*ew çekên bi milê me ve yên Tirkan e, hûn bixwazin jî nexwazin jî, em ê rojên pêş derbas bibin.*" Bi vî rengî em bi Tirkan tehdît dikirin.

Di şerê wan û dewletê de, balefirê li malbatek welatparêz xistibû, 3 şehîdên gel çêbûbûn. Bi eslê xwe ji Kobanê bûn, lê li Serêkaniyê dijiyan. Jixwe di şerê wan de gel bi piranî ji bajêr derketibû. Hevalan jî nêzikî bajêr xwe bicih kiribûn. Hevalan ji bo ku milet vegerê cihê xwe, bi Artêşa Azad re ketibûn nava dîyalogê. Di destpêkê de ew jî erênî nêzik bûn. Lê piştre bi destwerdana Tirkiyê qebûl nekirin.

Me li her cihî amadekariyên xwe dikirin. Di wê navberê de me telefon ji heval Dozdar re vekir, lê di telefonê de dengê çekan dihat! Got, "*Arteşa Azad êrîşî me dike.*" Hê em diaxifiyan, hevalê Dozdar birîndar bû û telefon qut bû. Demek şûn de me dît ku hevalê Dozdar anîn, hema me birîna wî pêça û şand Qamişlo.

Piştre em hinek pêş ve çûn. Hevalê Lewend jî li pêşiya me diçû, lê ket kemînê. Derdora wan pêçabûn. Ji aliyê Derîkê ve hêz ketibû rê. 3-4 hevalan xwe gihandin cihê me û me hinek hevalên ku rê dizanîn jî dan gel wan û me şandin alîkariya hevalên di kemînê de. Di wê navberê de hevalên hacizê jî hinek tedbîrên xwe girtibûn û ew dorpêç hate şikenandin.

Li gundê Alok jî şer derket û hevalan ji her du alî ve lêda. 14 cinazeyên wan jî ketin destê hevalan. Çend doçqa jî hevalan girtibûn. Ew cih nêzî Serêkaniyê bû. Êdî piştî wê bi mehan, li Serêkaniyê şer nesekinî. Dema ku çete tengav dibûn, digotin "*em agirbestê îlan bikin*." Lê dema ku xurt dibûn, bi hemû hêza xwe êrîş dikirin. Şerê psikolojik dimeşandin.

Miletê Serêkaniyê jî bajar vala kiribû û gelek ji wan hatibûn Dirbêsiyê. Xwarina hemû hêzên li Serêkaniyê jî, li Dirbêsiyê dihate amade kirin. Gelê Dirbêsiyê fedakariyeke pir mezin nîşan da. Ji aliyekî ve jî li birîndaran meyze dikirin, şehîd radikirin. Heya ku ez li Dirbêsiyê bûm, 30 şehîdên me çêbûn; 17 heval yên YPG û 13 mirovên me jî kesên sîvîl bûn.

**4 –Plana Şerê Serêkaniyê Li Tirkiye Hate Amadekirin**

Tirkiyê pir piştgirî dida çeteyan. ENKS jî li ser vê esasê amadekariyên xwe dikirin. Rêveberiyên xwe amade dikirin. Lewra bi wan re peyman çêkiribûn. Li gor plansaziya wan, wê em têk bibirana û dest bidana ser her tiştê gel. Civîn jî li Tirkiye çêkiribûn. Hin eşîrên Ereb yên hêremê û ew partî jî di nav de bûn. Çekên ku li wan belav bikin jî li Sûrûcê amade kiribûn. Dixwestin hîn wê demê pergala caşîtî ava bikin. Ev lîstokên Tirkiye û hin hêzên Kurd bûn. Gelek peymanên wisa îmze kiribûn. Lê ne me destûr dida van tiştan, ne jî gelê Rojava. Dema ku gel jî ew rastî dîtin, piraniya wan ji van partiyan qut bûn. Ew partî marjinal bûn û heliyan.

Êrîşên Serêkaniyê li ser esasê planekê dihatin lidarxistin. Jixwe Erdogan digot, “*îro Serêkaniyê, sibê Kobanê û roja din jî Efrîn dê bikeve.*” Di destpêkê de ketîbeyên cûda yên Artêşa Azad êrîş kirin. Lê dema ku ew şikestin, vêcarê El Nusra ket tevgerê. Bi taybetî jî Tirkiyê ew xistin dewrê. El Nusra wisa dîmenek nîşan dida, weke ku di navbera me û Artêşa Azad de danûstandinê dike. Lê me dizanî ku yên tevlîheviyê derdixin ew in. Gelê Ereb jî tehrîk dikirin.

Weke rêxistin, lijneyeke me ya bi eşîran re danûstandin dikirin hebû. Gelekên wan bibûn dostên me. El Nusra jî dixwest li ser van eşîran bilîze. Mesela eşîra `Herb` heye, ji wan yek kiribûn emîrê xwe û li ser gel gef dixwarin. Her ew eşîr tehrîk dikirin da ku em lêxin. Lê em bi sebir nêzîk bûn û me her tedbîr digirtin

Di van şerên ku li Serêkaniyê, Til Temir û Hesekê pêşketine de; hevalê şehîd Xemgîn hebû. Hevalekî pir fedekar û bi cesaret bû. Jixwe li kûderê teqînek çêdibû, hema komek heval digirt û diçû. Bi xwe berpirsiyarê hêzên Dirbêsiyê bû, lê kûderê şer derketa li wir bû. Herî dawî êrîşek pir dijwar li ser Tirbespîyê hebû, çû wir û li wir şehîd ket. Şehadeta wî bandorek mezin li ser hevalan kir. Taybetmendiyên wî pir cûda bûn. Ji ber ku her li pêş bû, hem gel, hem jî şervanan pir ji wî hez dikir. Tu caran bi pirsgirêkekê nehat pêşberî rêxistinê. Tu caran nakokî jiyan nekirin. Bê dudilî dibeziya her karî. Şehadeta wî havîna 2013’an e.

Di şerê Serêkaniyê de jî, hevalê Goran hebû. Bi lehengiyekê şehîd ket. Ketibûn êrîşê û bi sûîqastê şehîd ketibû. Lê di wî şerî de risteke mezin lîstibû. Moral û rih dabû şer. Bibû nîşaneya şer û berxwedanê. Cihê ku ew hebû, hemû hevalan hêz digirt. Hevalên ku li gel wî ketine şer, dikarin zêdetir bînin ziman.

***Firina Amûdê Ji Bo Serêkaniyê jî Dixebite***

*Em li pêşiya Firina Amûdê rêzika nan dibînin û disekinin. Firineke mezin ku hemû pêwîstiya nan a Amûdê û gundên wê dibersivîne ye. Piştî pevçûnan ji ber ku Firina Serêkaniyê nexebitiye, ev firin pêwîstiya nan a Serêkaniyê jî dibersivîne. Berpirsyarê Firinê Îbrahîm Ehmed diyar dike ku berê rojê 9-10 ton nan di vê firinê de çêdikirine, lê niha derxistine 18 tonan. Her wiha firina ku berê 15-16 seatan kar dikiriye, niha 24 seatan bênavber kar dike. Tenê ji paqijî û tamîra makîneyan nîv seat navber tê dayin.*

**FOTO: AMUDE FIRINI SEREKANEYİ HALKI İÇİN ARALIKSIZ ÇALIŞIYOR – fotoğrafı kullanılacak**

*Gelek Kurdên ku li Heleb û Şam’ê jiyan dikin jî hatine Amûdê, her wiha ji ber rewşa şer ji Serêkaniyê jî gelek kes hatine û li Amûdê bi cih bûne. Ji ber vê yekê pêwîstiya nan jî zêdetir bûye. Heya ji ber tinebûna ard, xwê û mazotê firin qet nesekiniye. Ev pêwîstî ji careke re werin qutkirin jî, kedkarên firinê tevdîrên xwe girtine. Stoka wan ku têra nanê heyveke bike her heye. Di firinê de 50 kes dixebite. Rojê 700 paket nan dişînin Serêkaniyê. Her roj ji bo Serêkaniyê firin 2 seatan zêde kar dike. Kedkarên ku di mûtbaxa Firinê de em pê re axifiyane jî diyar dikin ku berê di nava rojê de 8 seatan dixebitîne, lê niha 14-15 seatan kar dikin. Çend kedkarên ji ber vê rewşê giliyên xwe bînin ziman hebin jî, piraniya wan diyar dikin ku di van rojên zehmet de da ku gel bê nan nemîne peywira xwe ya xwezayî tînin cih. Dema ku em pirseke westandina wan rawe bike tînin ziman, çend heb ji wan bertek nîşanî me didin; “li beramberî wan kesên ku di êniya şer de canê xwe didin, çend seatan zêde xebitîn û behskirina vê şerm e ji bo me.” Kesên ku di rêza nan de ne jî, seateke bisekinin jî bêyî ku nanê xwe bigrin venagerin mala xwe…*

****Hûn jî weke fermandar di nava vî şerî de bûn. Li ser girîngî û ezmûna Serêkaniyê em dikarin nêrînên we bigrin?***

**MEHMUD BERXWEDAN:** Serêkaniyê rewşeke xwe ya taybet heye. Yekemîn, nîvî nîştecihên wê Ereb bûn. Beşek Çeçen hene û ji aliyê olî ve hinek Xirîstiyan jî tê de hene. Rejîmê, bi Kembera Ereban li vê derê siyasetê Erebkirinê daye meşandin. Di nava girseya Serêkaniyê de jî rêxistina me pir xurt nebû. YPG û rêxistinên me yên civakî jî tê de xurt nebûn. Artêşa Azad jî ev yek dît. Me yekser nikarîbû ku em pêşiya Artêşa Azad bigrin û em Serêkaniyê bistînin. Yanî weke Dêrikê û Kobanê asta me negihîşt ku em karibin Serêkaniyê bistînin. Eger me yekser hêza xwe dabûyê, me yê bikarîba lê me esas hîn yekser plan nekiribû.

Artêşa Azad jî dixwest deriyekî ji bo Cizîrê veke ku di cihekî re têkeve Cizîrê. Ya din jî pêşiya pêşketina me bigre. Ji hêla me ve jî, me li vî milî Amûdê û Dirbêsiyê girtibû. Li milê din jî Kobanê girtibû. Di navbera wan de Serêkaniyê mabû û di destê rejîmê de bû. Eger çete têkevinê û rejîmê derxin êdî di wê derê de wê li dijî me şer bikin, pêşiya me bigrin û ji me re bibin asteng. Çeteyên bi navê Artêşa Azad bi destê Dewleta Tirkiyê ji aliyê Bakur ve, bi şev ketin Serêkaniyê. Dewleta Tirk ji aliyê xwe de bi rêxistin kirin. Wê demê şert û mercên polîtîk û leşkerî, dest nedan ku em mûdaxale bikin.

Çeteyan destpêkê rejîm hedef girtin. Piştre berê xwe dane me. Di encam de di beşekê biçûk yê bajêr de, tenê li aliyê sanayiyê heval mabûn. Bi vî rengî êrîşî hevalan kirin û şer derket. Êdî li Serêkaniyê şer bû rastiyek. Şer hat yanî, yan em ê şer bikin, wê rîskê bidin ber çavên xwe yan jî em ê ji wê derê derkevin. Ya herî rast ew bû ku êdî me li hemberê wan jî helwest daniya. Êdî me yê şer bikirana. Ji ber ku ev çete bi dewleta Tirk re di nav plansaziyekê de tevdigeriyan û hedefan wan hemû bajarê me bûn. Cebhet El Nusra û hinek ketîbeyên bi navê Meşal Temo yê ku bi PDK'ê ve girêdayî bûn jî di nav çeteyan de bûn. Şerekî giran dest pê kir û hevalan di cihê kontrola ketina bajêr de gelek çete kuştin.

Jixwe şerê Serêkaniyê ji wê derê dest pê kir. Ji wê û şûn de êdî em cara destpêkê, li Cizîrê bi `Artêşa Azad` û Cebhet El Nusra re ketin şer. Helbet ev ji bo me tiştekî nû bû. Li Efrînê Qestelê jî şer çêbûbû. Ketîbeke li Ezazê bi navê 'Asîfat Şîmal' êrîşê Qestel Cindo kiribûn. Li wê derê jî 2-3 rojan pevçûn çêbûbû, wendahiyeke me ya cidî nebû. Em li Efrînê jî cara destpêkê bi Artêşa Azad re ketin nava şerekî. Di wê demê de li Helebê jî şer hem bi rejîmê re û hem jî bi Artêşa Azad re çêbû.

Lê şerê Serêkaniyê rewşeke cidî bû. Ji ber ku hêza me ya Serêkaniyê kêm bû; me ji Dêrikê, Qamişlo, Dirbêsiyê û Amûdê hêza teqwiye gihand. Pevçûnên destpêkê 2-3 rojan dirêj kir. Amadekariyên me, ne tamam bûn. Çete jî zêde amade nebûn. Ji bo wê demekê şer sekinî lê pişt re careke din destpê kir. Êdî wisa hin caran disekinî û pey re dîsa dest pê dikir. Destpêkê ji milê rojhilat ve di ketina bajêr de em tenê di sanayî ya bajêr de bûn. Lê piştî ku şer dîsa destpê kir û me hêzên xwe teqwiye kirin, taxên destpêkê Hewarna û cihê hepsê, me ji wan girt.

Ev tecrûbeya me ya destpêkê bû. Di vê derê de me ferq kir ku li gorî şerê bajaran yên bi vî rengî, amadekarî û tecrûbeyên me pir kêm in. Mînak bidim, ji kolanekê em ê derbasî ya din bûna lê, me nedizanî em çawa derbas bin. Mînak, Heval ji bo ku derbasî milê din an kolana din bibin diçûn lê bi çeknê suîqastê a qarnasê ve birîndar yan şehîd dibûn. Îcar me zanî ku wisa nabe û jê re rêbaz lazim e. Lewra em li ser fikirîn ku êdî em ê çawa di nava xaniyan re derbas bibin. Me balyoz peyda kir, pê dîwar û xanî kun kirin, wisa pêş de çûn û me xwe ji êrîşên dijmin parast. Di nav şer di per teqtikên nu hatin pêşxistin. Heta salvegera 19`ê Tîrmehê bi vî rengî çû û piştre şer kete qonaxeke din…

## BEŞA SÊYEMÎN

### DI SALVEGERA 19`Ê TÎRMEHÊ DE ÊRÎŞÊN BERFIREH LI SER CIZÎRÊ

***Dema ku yekemîn salvegera 19`ê Tîrmehê nêzîk dibû, ber bi havîna 2013`an ve li gelek deverên Cizîrê, ji aliyê çeteyan ve êrîşên berfireh hatin destpê kirin. Ev êrîş di serî de li Serêkaniyê, li her derê çêbûn. Armanca van êrîşan çi bû, çi hate jiyan kirin? Em ji Serêkaniyê destpê bikin…***

**AYTEN SERÊKANIYÊ**: Dema ez derbasî Cizîrê bûm, di navbera me û Cebhet El Nusra de şer berdewam dikir. Wê demê Serêkaniyê, Amûdê, Til Temir û Dirbêsiye bi giştî me weke qadekê digirt dest. Ez derbasî wê qadê bûm. Ji van bajaran Dewlet hatibû derxistin û hemû bajar di bin serweriya me de bûn. Tenê li Serêkaniyê, Artêşa Azad û El Nusra hebûn. Serêkaniyê, ji bo xwe weke cihekî navendî didîtin. Piştî şerê çend mehan, nîvê bajêr di destê wan de bû, nîvê din jî di destê me de bû. Lê gelek komplo û lîstîk jî lidardixistin. Her tim nakokî hebû. Pir ne dijwar be jî cih bi cih pevçûn derdiketin.

Bi vî rengî berxwedanî û lehengîtiyeke pir mezin hatibû çêkirin. Lê dema ku em çûn şer sekinî bû û peymanek hatibû çêkirin. Ew riya ku ji Helebê tê û di nava bajêr re derbas dibe, bûbû sînorê me û wan. Ew xeta ku ji Kobanê te, deriyê sînor û Rojavayê Serêkaniyê giştî di destê wan de bû. Milê Amûdê, Dirbêsiye û rêka ku diçe Hesekê jî di destê hevalan de bû û hêzên me yên leşkerî di wê derê de cihê xwe girtibûn.

Dema ku em çûn Serêkaniyê, beriya me gelek xebat hatibûn meşandin û pergalek hatibû avakirin. Me dixwest em hinekî nas bikin. Mesela wê demê weke hêza YPJ, Tabura Şehît Berçem hatibû avakirin û pergaleke leşkerî çêbûbû. Bajarên dîtir yên weke Amûdê, Dirbêsiyê û Til Temir jî bi vê tabûrê ve girêdayî bûn. Weke hêzên giştî yên van bajaran jî bi tabûra Şehîd Goran ve girêdayî bûn. Şehît Goran, di şerê Serêkaniyê ku 15 rojan berdewam kiriye de şehîd ketibû. Şehadeta wî hevalî jî windahiyeke pir mezin bû. Ji bo girêdana bîranîna wî tabûra hêzên YPG yên wê herêmê, li ser navê wî hatibû rêxistinkirin.

**1-Serêkaniyê; Dîsa Şer, Dîsa Lehengî û Serkeftin**

Piştî em çûn, demeke kurt şûn de dîsa şer destpê kir. Jixwe hêzên me jî hemû amadekariyên xwe di wê navberê de kiribûn. Bi vî rengî şerê Serêkaniyê ku armanc, dijmin bi giştî ji bajêr derxistin bû, dest pê kir. Wê demê em li Dirbêsiyê bûn. Me ji bo 19’ê Tirmehê amadekarî dikirin, da ku em salvegera rizgarkirina Kobanê pîroz bikin. Me hêzên xwe amade kiribûn û qadek berfireh çêkiribû da ku em hemû hêzên xwe yên YPG û YPJ kom bikin û merasîmeke bi heybet lidarbixin.

Amadekarî li ser wê esasê dihatin kirin. Ez û Şehît Xemgîn li Dirbêsiyê cihekî bûn. Hevala Nalîn telefon vekir û got, “*bila amadekariyên we hebin, dibe ku şer destpê bike*.” Jixwe hêza me hem ji bo pîrozbahiyên 19’ê Tirmehê, hem jî ji bo rewşeke awarte amade bû. Piştî çend deqayan hevalê Heqî jî telefon vekir û heman tişt got. Wê demê yek ji berpirsiyarên leşkerî hevala Rojna bû. Min jî ji hevala Rojna re got, “*dibe ku şer destpê bike, pêwîst e hûn amadekarî bikin û şiyar bin.*” Piştî wan telefonan 10-15 deqeyan, hevala Rojna ji navenda xwe derdikeve û ber bi bajêr ve diçe da ku ji bo dest bi amadekariyên kincan bike. Wê demê çete bi carekê re derdora wan digrin û dixwazin wan dîl bigrin. Dema ku ajokarê wê digrin, milet jî li wê derê aloziyan derdixin û telefonî hevalan dikin. Beriya wê jî hevala Rojna agahî daye hêzên me yên Serêkaniyê, da ku ji bo rewşeke awarte amade bin.

**FOTO: XEMGÎN DİRBÊSİYÊ- BEYRAM ABDULMECÎD ACAR – FOTOĞRAFI KULLANILACAK**

Çete di nava tevgerê de bûn, lê wê çawa êrîş bikirana ne diyar bû. Dijmin amadekariyên xwe kiribû û ketibû nava tevgerê. Bi girtina hevalê ajokar pevçûnan jî destpê kir. Lê bi destwerdana lezgîn ya hevalan, ew heval hate rizgar kirin. Dema heval Rojna telefonî me kir û mesele got, me telefonî hêzên xwe yên Dirbêsiyê û Amûdê kir ku xwe amade bikin. Min û hevalê Xemgîn jî hinek hêzên li Dirbêsiyê girtin û em bi çend seyareyan çûn Serêkaniyê. Hevalê Xemgîn jî berpirsiyarê giştî yê Dirbêsiyê bû. Hevalekî ji Bakurê Kurdistanê, ji bajarê Wanê bû û xwedî ezmûn bû. Jixwe di navenda Dirbêsiyê de hin maşîneyên bi doçqa jî amade bûn, hema me ew jî girtin û em hemû çûn.

Dema em derbasî Serêkaniyê bûn, hevalan çeperên xwe girtibûn. Hevalên rêveberiya Serêkaniyê jî gihiştibûn wir û tedbîrên xwe girtibûn. Hevalên wê demê di rêveberiya Serêkaniyê de hevala Rojna, hevala Jiyan Rojhilat, hevalê Cemşîd û hevalê Zagros bûn. Hevalê Zagros, hevalekî ku ji wê derê tevlê bibû. Weke fermandarê tabure hatibû erkdarkirin. Tabûra wî jî nêzîkî cihê avahiya kevin a hêzên ewlekariya Dewletê bû. Tabûra wî û hêzên dijmin li kêleka hev bûn, di navbera wan de mesafeyeke pir dirêj tune bû.

Hevalê Dilgeş jî, hêzek heval li gel wî hebû û wî jî milek girtibû. Bi vî rengî tedbîrek hatibû girtin, da ku dijmin pêş ve neyê. Dema ku em çûn wir jixwe pevçûnan destpê kiribû. Wê demê hêzên dijmin bi doçqayan ji navenda xwe derdikevin da ku mûdaxaleyî aloziyê bikin. Hêzên me yên YPG û hevalê Zagros wan jî gavekê pêş ve diçin û dest bi şer dikin. Dema ku heval dest bi şer dikin, ew şoq dibin. Lewra pevçûn wan dabûn destpêkirin, hêvî nedikirin ku em ew qesa bi amadekarî ne. Pişt re teqwiye ji wan re jî hat, çekên giran anîn. Jixwe nîvê zêdetir yê Serêkaniyê di destê wan de bû û ew li ser Serêkaniyê serwer bûn.

Yê me jî tenê xetek di destê me de bû. Hevalan maşîneyeke wan ya doçqayê îmha kiribûn, 3 kesên wan li ser wê maşîneyê kuştibûn. Li milê din jî 9 çete kuştibûn. Bi vî rengî şer yekser germ bûbû, ne gengaz bû ku êdî bê sekinandin. Lewra êdî hatibû noqteya dawî. Dema ku em çûn, me hemû xetên şer xurt kirin. Di wê navberê de wan jî hemû xetên xwe girtin. Bi vî rengî şerekî dijwar destpê kir û heya êvarê berdewam kir. Hevalê Xemgîn û hevala Viyan jî her yek hêzek girtin û derbasî milê hevalê Dilgeş bûn. Ji milê Dirbêsiyê ve bajar hat girtin, da ku dijmin derbasî vî milî nebe û em bikaribin çeperên xwe xurt bikin.

Bi vî rengî heya 6’ê êvarê şer berdewam kir. Ji milekî ve jî telefonî hevalan dikirin, digotin “*bila heval bisekinin.*” Armanca wan ew bû, dixwestin maşîneya xwe yên doçqayê ji bin serweriya me derbixin, cenazeyên xwe bikşînin, çeperên xwe xurt bikin û pişt re dîsa êrîşî me bikin. Lewra ew qesa cenazeyên wan ketibûn erdê, ne gengaz bû ku şer bidin sekinandin. Ango ji bo sekinandina şer jî telefon nedikirin. Diyar bû ku dijmin nasekine. Hevalan gotin, “*lê nedin, bila werin cenazeyên xwe bibin.*” Me jî lê neda, lê me digot “*divê em wê doçqayê bibin.*” Lewra pêwîstiya me bi doçqayê hebû. Dema ku hatin cenazeyan bigrin, hevalan careke dîtir lêdan. Jixwe hevalan dixwestin wan mijûl bikin, da ku bigihêjin bîryareke rast.

Bi vî rengî heya êvarê seat 8’an carcaran dîyalog jî berdewam dikir. Heya wê seatê du hevalên me şehîd ketibûn; her du heval jî yên Serêkaniyê bûn. Navê hevalekî Rûstem bû, yê din jî nayê bîra min. Piştî van şehadetan û wî şerî, êdî ne gengaz bû ku em û Arteşa Azad carekî dîtir di Serêkaniyê de bi hev û din re bimînin. Rewşeke wisa derketibû holê. Di wê navberê de hevalan her li wan didan.

Di encamê de hevalan bîryar dan ku em Serêkaniyê bi tevahî bistînin û hêz jî ji me re şandin. Jixwe tabura me ya Şehît Goran li wir bû. Bi doçqa û maşînên xwe her amade bûn. Li hemberî hemû êrîşan sekneke wan ya fedaî hebû. Fermandarê wê tabura me Şehît Cîger bû. Bi eslê xwe ji Qamişloyê bû, lê derbasî Bakur bûbûn; li Mêrsînê mezin bûbû. Berê jî birayekî hevalê Cîger, di nav refên gerila de şehîd ketibû. Taburên bi vî awayî kesayetên xurt jê re pêwîst dikin. Şehît Cîger ji vê yekê re dibû bersiv. Hevalê Cîger tabura xwe girt û hat Serêkaniyê. Tabura Şehît Berçem hebû, hevala Zîlan Mêrdîn li ser disekinî. Ew tabura me berê jî tevlî şerê 15 rojan yê Serêkaniyê bûbû, tevlî şerê Ebû Rasên û şerê Hesekê bûbû.

Hêzeke bi vî awayî bû û hem ji milê ezmûn, hem jî ji milê cebilxaneyê ve amade bû. Ew her du taburên me jî hatin û li gorî pozîsyona şer, pêwîst bû çepergirtin pir xurt bihata çêkirin. Jixwe her pevçûnan berdewam dikir. Hevalan, hêzên me yên Qamişlo jî weke alîkarî şandibûn. Jixwe hevalê Heqî û hevala Nalîn wan jî li gel çend taburan hatibûn Serêkaniyê. Hêzeke YPJ hevala Sozdar Qamişlo, hêzekê jî hevala Devrîm li ser bû. Êdî weke destpêkirina pêngavekê, ji bo Serêkaniyê hêz hatin. Jixwe hêzeke me ya amade jî hebû.

**Şerekî pir germ û dijwar...**

Şer ber sibê destpê kir, heya sibeha dîtir berdewam kir. Hevalê Zagros, li ser baskekî ji milê avahiya ewlekariya kevin ya dewletê ve heya rêka milê Kobanê êrîş kir. Hevalê Dilgeş, hevala Viyan, Şehît Xemgîn û min jî xetek girtibû. Milekî jî hevala Zîlan girtibû. Baskek jî hevala Rojna û Devrîm girtibû. Me êvarê xetên di destê dijmin de hemû kirin dorpêçê. Bi rastî jî di Serêkaniyê de şerekî pir dijwar hate meşandin, dijmin ne li hêviya amadekariyeke wisa bû. Tiştekî wisa bawer nedikirin. Ji ber ku dijmin di destpêkê de windahiyeke mezin da, şikest û nikarî li ber xwe bide.

Bi vî awayî bi şerekî pir dijwar ji bo dorpêçkirina wan çêbû û hemû navendên wan yên li Serêkaniyê û amûrên wan hatin bi dest xistin. Heya ku em gihiştin sawama ango embarên genim wisa berdewam kir. Di sawama de hêzeke biçûk hebû, jixwe yên ketîbeke biçûk bûn û radest bûn. Hevalan anîn, demekê li gel me man û pişt re me berdan. Çeteyan di dawiyê de xwe kişandin deriyê sînor yê Bakurê Kurdistan. Lewra derî ji bo wan pir girîng bû. Hêviya wan derî bû, wisa dihizirîn ku ger derî di destê wan de be, careke dîtir dikarin Serêkaniyê bistînin. Wisa bawer dikirin. Heya bû sibeha din seat 6, tevahî bajarê Serêkaniyê ji çeteyan hate paqijkirin. Tenê milê benzînxane û deriyê Bakur mabûn. Di wan deran de jî şerên pir dijwar qewimîn. Lewra ji bo ku cihên dawî yên dijmin bûn, di wan deran de li ber xwe dan.

Ger di derî de bimana, dihat wê wateyê ku wê di Serêkaniyê de bimînin. Deriyê Serêkaniyê, ji bo wan deriyekî girîng bû, hemû têkiliyên xwe bi dewleta Tirkiye re li wir pêş dixistin. Çûn û hatin, derbasbûyina milê Tirkiye hemû di bin çavdêrî û serweriya wan de çêdibû. Di wê demê de jî dewleta Tirkiye piştgirî dida wan. Dema ku em ber bi sawama re derbasî wî milî bûn jî, me nikarîbû şehît û birîndarên xwe bînin. Lewra dewleta Tirkiye jî ew der gulebaran dikirin. Nedixwestin ku derî bikeve destê me. Ji bo vê yekê her tişt dikirin. Hevalê Dilgeş û Şehît Dilo li ser wî baskê disekinîn. Her yek ji baskekî ve êrîş kirin, heya nîvro pevçûnan berdewam kir. Ji ber ku deşt bû û şer pir dijwar bû û Tirkan jî gule diavêtin, me bi zehmetî hevalên xwe xilas dikirin. Ew qesa germ bû xwêdan û tîbûn û westan pir bû.

Serê sibê şer dîsa destpê kir, heya nîvro pir dijwar berdewam kir. Çi dibe bila bibe, pêwîste me derî bistenda. Lewra ger di wê kêliyê de me derî nestanda, carekî dîtir me nedikarî em bistînin. Wê hem piştgirî ji wan re bihata, hem jî dewleta Tirkiye piştgirî dida wan. Li hêla din ji ber ku di navbera me û hevalan de mesafe jî hebû, me nedikarî xwe bigihînin wan. Kî diçû birîndar dibû. Me şerîtên qablo anîn, şûşeyên pet ya avê dagirtin û hevalên herî bi hêz ew şûşe diavêtin mewziyan da ku heval avê vexwin. Dîsa me cebilxane jî dixist kîsikan, bi şerîtan ve girê dida û diavêt ji hevalan re. Ji bo ku heval bê cebilxane nemînin û em bikaribin wê derê bistînin.

**2-Rizgariya Serêkaniyê!**

Bi taybetî ber êvarê şer pir dijwar bû, divê teqez me ew der bistenda. Riyeke din tune bû. Di seat 3’yan de hevalan êrîş kir û derî girtin. Li wê derê hemu reviyan û 6-7 cenaze ketin destê hevalan. Dema ku derî ket, yên din jî ber bi sînorê Tirkiye ve reviyan. Jixwe me ew xeta rêka Hesekê, rêka Til Xelef û rêka Helebê girtibû. Hevalê Cîger û hêza xwe ew der girtibûn. Heval di xeta avahiya spî û benzînxaneyê de çeper girtibûn. Dema ku derî ket, hemû çete derbasî xeta rojavayî bajêr, Til Xelef bûn. Piştî wê derê, me çeperên xwe yên wî milî xurtir kirin. Bi vî rengî bajarê Serêkaniyê ji çeteyan hate rizgar kirin.

Rizgarkirina Serêkaniyê, rastî salvegera rizgarkirina Kobanê ya 19’ê Tirmehê hat. Ew serkeftineke pir mezin bû û tesîreke pir mezin jî çêkir. Lewra li wê derê şikestinek dijmin çêbû. Tu caran bawer nedikirin ku ji Serêkaniyê derkevin, Serêkaniyê weke paytexta xwe didîtin. Wisa nêzik dibûn. Lê dema ku Serêkaniyê hate rizgarkirin, ji milê gel ve coş, kelecanî, moral û baweriyeke xurt çêbû. Ji bo me jî rizgarkirina Serêkaniyê pir girîng bû. Lewra gelek hevalên me di wê derê de şehîd ketin. Gelek hevalên weke hevalê Serhad û hevalê Goran, bi dehan hevalên ku li wê derê bi lehengîtî şer kiribûn û şehîd ketibûn hebûn. Bi taybetî wan hevalên ku bi wan şehîdan re jiyan kirine, berxwedaniyeke pir mezin kirin û Serêkaniyê rizgar kirin.

**Têkçûna mezin a çeteyan...**

Jixwe dijmin nekarî tiştekî xwe xilas bike. Yên ku reviyane, dibe ku çend çekên xwe bi xwe re biribin. Lewra hevalan ew hemû kiribûn dorpêçê û nikarîn xwe û tiştên xwe xilas bikin. Yên xilas bûne jî di ber sînorê Tirkiye re xwe xilas kirin. Li wir gelek tiştên ku hatin destxistin hebûn. Avahiyên ku tê de bûn û malên gel ku dest dane ser û ketinê de pir zêde tiştên wan hebûn. Me dest da ser hemû tiştên wan. Me 5 heb doçqa bi dest xistin. Cebilxane û guleyên ku me girtin jî bêhesap bûn. Ji BKC û B-7’an bigre heya maşîneyên wan, nikarîn tiştekî jî xilas bikin. Gelek cih kolabûn û malên gel xirab kiribûn. Diyar bu dixwestin Serêkaniyê bikin cihekî navendî. Jixwe beriya wê çend caran êrîşî hevalan kiribûn, da ku hevalan ji Serêkaniyê derbixin û bajar bikin navenda xwe. Lê bi ser neketibûn.

Şikestina çeteyan a mezin di Serêkaniyê de çêbû. Li wê derê bin ketin, hêza wan şikest û vîna wan nema. Jixwe piştî wê Arteşa Azad nikarî weke berê şer bike. Lewra di wê derê de şikestin. Êdî nikarî li bajarên din jî li ber xwe bide. Lewra Serêkaniyê weke navendeke wan bû. Piştî wê digotin, “*kengê jî mabe, emê Serêkaniyê bistînin, ma Serêkaniyê wê were jibîrkirin?*” Ewqesa êşiyabûn. Ya rast rûxiyabûn…

Piştî ku me bajarê Serêkaniyê rizgar kir, çeteyan xeta xwe ji milê Til Xelefê ve xurt kirin. Di vê demê de şerên pir dijwar çêbûn. Ji deriyê sînor heya xeta ku ji Hesekê tê û hacîza Tûwêna çeperên me xurt bûn. Şerên wir demeke dirêj berdewam kirin. Ji bo ku careke din nekevin Serêkaniyê, me sînorek diyar kir û xeta xwe lê çêkir, li hemberî wê wan jî xet û sînorekî xwe çêkirin û pevçûnan her berdewam kirin. Ji bo ku Serêkaniyê careke dîtir bistînin, hêzeke pir mezin anîn û pir hewl nîşan dan. Rêxistinê jî her tiştê xwe xist seferberiyê, da ku em careke dîtir nehêlin dijmin têkeve Serêkaniyê. Ji bo vê yekê me gelek şehîd dan.

**3-Şerê Dijwar Li Gundewaran**

Piştî rizgarkirina bajar jî li gundewarên Serêkaniyê, şerên pir dijwar diqewimîn. Ji milekî ve jixwe dewleta Tirkiye piştgiriya wan dikir, cebilxane û xwarin ji wan re dişand. Dewleta Tirk ji wan re digot, “*bes hun Serêkaniyê bistînin, çi pêwîst bibe, emê pêşkêş bikin.*” Tanq û cebilxane didan, her tişt didane wan. Lewra dewleta Tirkiye, Serêkaniyê ji bo xwe weke xeteriyeke pir mezin didît. Serketina Serêkaniyê, ji bo wan binketineke pir mezin bû. Li ser wê esasê dijmin bi hemû hêza xwe êrîşî Serêkaniyê dikir. Ji Tîrmehê 2013 heya meha Mijdarê şerê gundewarên Serêkaniyê, bi awayekî pir dijwar berdewam dikir. Dema ku di xetekê de kêmekî lawazî bidîta, hema dixwestin di wir re êrîş bikin. Bi taybetî hevalê Cîger û hevalê Botan di xetekê de disekinîn, 24 seatan di wê xetê de şer bû. Ji ber ku cihê herî stratejîk ew der bû, dixwestin wê derê bixînin. Lê tabura Şehît Goran rê nedida wan. Hevalên di wê tabûrê de pir xurt bûn. Jixwe piraniya wan şehîd ketine.

Li ser wê tabûrê jî hevalê Cîger hebû, ew jî hevalekî xwedî danehevên xurt bû. Hem xwedî cesaret bû, hem jî wêrekî dida derdora xwe. Sîng bi sîng şer dikir û bi dijmin ve diketin nava hev. Dijmin her êvarê êrîş dikir da ku cihekî lawaz bibîne û bikeve Serêkaniyê. Lê me cihekî ku ew derbas bibin, nehiştibû. Heval jî nedisekinîn, êvaran diçûn ser wan. Da ku êrîşên wan bişkînin. Cara yekemîn me şerekî ew qesa dijwar dimeşand. Çi teknîk nema ku li hemberî me nedan şixûlandin. Ew tûpên mûtfaxê tijî TNT dikirin û diavêtin me. Digotin “*ew teqemeniya ku her tiştî tune dike, hat*!” Serê carê teknîkek diceribandin da ku ji milê derûnî ve li ser hevalan û gel tesîr bikin. Lê çi bikirana

jî, li hemberî şerê hevalan encam nedigirt. Lewra ya ku ev şer dida meşandin, wêrekî, bawerî û vîna hevalan bû. An na mirov nikare bi heyvan û 24 seat bênavber şer bike.

**4-Keça Leheng a Êzîdî Berîvan, Fermandar Şîlan û Şêrê Serêkaniyê Hemze**

Li hemberî ew şerên dijwar me jî her amadekariyên xwe xurt dikirin. Me çeperên xwe berfireh dikirin û xendek dikoliyan. Di wê derê de berxwedan û lehengiyeke dîrokî pêş ket. Gelek heval birîndar bûn, hinek şehîd ketin. Me dît ku rewş xeter e, ger em hevalan di wê derê de bihêlin, wê bibe sedema windahiyên pir mezin. Divê me ew der jî berneda. Lê me ji hevalan re got, "*qademekê xwe bidin paş*." Dema qademeyekê pişt ve tên, hevala Berçem li wir bû. Hevala Bêrîvan birîndar dibe, lê ji bo ku moralê hevalan nekeve, nabêje. Dema ku du hevalên keç yên ciwan dibînin ku birîndar bûye, hevalek ji wan hevala Bêrîvan bi lingê xwe ve girê dide û bi erdê re dixwaze wê bikşîne, lê ew heval jî birîndar dibe. Hevala Bêrîvan, keçeke Êzîdî bû. Malbata wê hemû çûbû Ewrupa, lê her çiqasa malbat bangê dike jî, ew neçûbû û tevlî xebatên YPJ bûbû. Ji destpêkê ve di nava xebatên rêxistinkirina YPJ'ê de cih girtibû. Hevaleke pir bi bîryar û jîr bû. Ji pêşketinê re vekirî bû. Her wiha gelek hevalên dîtir li wir birîndar dibin. Ji dûr ve jî heval bi doçqa û B-7'an li dijmin didin, da ku nikaribin bi ser hevalan de bên. Bi vî awayî şerekî pir dijwar çêdibû.

Piştre taburek heval teqwiye hat. Ew tabura hevalan dema ku hatibû, beriya ku bê gel me, ji milê dîtir re xwe gihandibû hevalên ku tengav bûne. Hevala Şîlan berpirsiyarê tabura teqwiye bû. Dema ku çawa xwe digihîne hevalan dibêje, "*rewş çi ye?*" Heval jî dibêjin, "*hevaleke jin li wê derê birîndar e.*" Cihê ku ew heval lê birîndar bûye, hemû deşt e. Kî diçe wir, birîndar dibe. Heval nizanin ku çawa wê hevalê xilas bikin. Dibêjin, "*dibe ku şehîd jî ketibe, lê dema me li wir hişt hê birîndar bû.*" Dema ku hevala Şîlan van tiştan dibihîze, qet nasekine. Hema lê dide û diçe ku wê hevalê rizgar bike. Heval dixwazin ku neçe, lê nikarin wê bigrin. Jixwe dijmin ew der kiriye dorpêçê. Hê negihiştiye nîvê rê, dijmin gulebaran dike û hevala Şîlan şehîd dikeve. Heval bi coş û kelecaneke mezin hatibûn ku tevlî şoreşa Rojava bibin, lê ji ber dijwarbûna şer, seatek derbas nebû ku wê hevalê gava xwe avêt ser xaka Rojava û şehîd ket. Berpirsiyariya mîlîtantiya tevgera azadiyê bi vî rengî derdiket holê. Ew rihê hevala Şîlan jî ew yek dida diyarkirin.

**FOTO: ŞEHİTLER ŞİLAN VE HEMZE'NİN FOTOĞRAFI KULLANILACAK- HENÜZ BULUNAMADI**

Hevalê Hemze jî bi wî rengî şehîd ket. Hevalekî ji Bakur bû, rihekî wî yê pir xurt hebû. Di wî şerê Serêkaniyê de risteke wî ya pir mezin hebû. Li ku şer û pevçûn hebûya, hevalê Hemze li wir bû. Ew jî li milê derî bû, lê dema ku dibihîze şer li wir dijwar bûye û her du hevalên jin li wir birîndar in, ew jî diçe wir. Heval wî digrin ku neçe, lê xwe ji hevalan vedişêre û diçe. Bi vî rengî ew jî çû û şehîd ket. Ji ber ku şer ew qesa dijwar bû, me nikarî du rojan cenazeyê wan hevalan jî bigrin. Bextreşiyeke herî mezin jî, hevalê Cîger zû birîndar bû. Dema ku êrîşên pir dijwar hatibûn ser wan, birîndar bûbû û heval neçar mabûn ku wî derxin. Ger birîndar nebûya, teqez ji wê derê dernediket. Hevalekî bi vî awayî bû. Piştî çend rojan me plansazî çêkir û me careke dîtir êrîş kir da ku em wir bigrin. Hevalan êrîş kir û careke dîtir ew der girtin. Lewra ger me ew der negirta, dikarîbûn ji wir êrîşî Serêkaniyê bikin. Dijmin ji bo ku bikaribe wê derê bigre bi her avayî êrîş dikir û li hemberî wê jî berxwedanî çêdibû. Her pevçûnan bi vî awayî berdewam dikir û şer dijwar dibû.

Milê ku êrîşên wan çêdibûn, xetên me pir xurt bûbûn. Me çeper xurt dikirin, rê digirtin, mayin datanîn. Me rê nedida valahiyan. Dijmin li ku valahî bidîta, di wir re êrîş dikir. Carna lawaziyên me jî derdiketin. Ew tişt dijmin baş bi kar dianîn. Agahiyê dijmin çeperên ku me çêkirine tune bû. Lê ji ber ku leşkerên Tirkan li ser sînor bûn, didîtin em çi dikin. Hêza me didîtin, tevgera me didîtin. Demildest agahî didan çeteyan. Herî dawî dijmin di ber sînorê Tirkiyê re hat û êrîş kir. Jixwe cara yekemîn tanq li wir bikaranîn.

**5-Li Ser Derî Êrîşa Mezin û Piştgiriya Gelê Bakurê Kurdistanê**

***Di wir de dîsa êrîşî deriyê sînor kirin û me baldarî li ser ekranan temaşe kir. Ev êrîş çawa çêbû?***

Rast e, di wir re êrîşî derî kirin. Digotin, "*jixwe derî bikeve, Serêkaniyê jî dikeve.*" Serê sibehê komek çete di ber xeta sînor re hat û êrîş kir. Jixwe cihê ku tê re hatine hemû geliyê biçûk bûn. Dema gihiştibûn nêzîk, hevalan ew ferq kiribûn. Bombeyên ku bi destan çêkiribûn jî, sandoq tijî kiribûn û bi wan êrîş kiribûn. Dema nêzikî hevalan dibin, dixwazin wan bombeyan biavêjin hevalan û êrîş bikin. Teqtîka wan bi vî awayî bû. Lê hevalan zû ferq kirin. Ji geliyê dîtir jî amadekarî kiribûn da ku bi tanqan êrîşî derî bikin. Çawa ku hevalan ew ferq kirin û lêdan, tanq hat û li dîwarê baxçeyê deriyê sînor da û ket baxçê. Heval jî di qatê duduyan yê avahiyê de bûn. Hevalan şerekî pir dijwar

di wê derê de meşandin, nehiştin ku yek jî bikeve hundurê derî. Tabura bi berpirsiyariya hevalê Rizgar ku nû hatibûn, hema çûn ku xwe bigihînin derî. Çawa ku gihiştibûn wir, bi bombeyan ketin nava hev û din. Ji cihên dîtir jî hevalan xwe gihandibûn wir.

Hevalê Zagros jî di derî de bû. Ger derî biketa, Serêkaniyê wê careke dîtir biziviribûya dîroka xwe ya beriya şer. Me got: "*Heval bila herkes bi aqil şer bike, herkes ji milê xwe ve baş lê bide. Ger wisa bibe, an em ê derî paqij bikin, an jî em hemûyê heya dawî li ber xwe bidin û di vî derî de şehîd bikevin.*" Bi vî awayî hemû hevalan diruşme diavêtin û êrîş dikirin. Jixwe hevalan gazî hev dikirin û digotin, "*Bijî Serok Apo*" û lêdixistin. Bi rastî jî rihekî pir xurt hebû. Rihê Apogerî derket holê. Bi vî rengî pevçûneke sîng bi sîng çêbû û heya seat duduyê nîvro berdewam kir.

***Dema ku pevçûnan berdewam dikir, hûn bi leşkerên Tirkiyê ve jî rû bi rû diman?***

Dijmin li milekî bînayê bû, em li milekî bûn. Leşkerên Tirk jî derketibûn ser bînayên xwe û li me temaşe dikirin. Ji ber ku pevçûn ew qesa mezin bû, leşkerên Tirkan hemû ji deriyê milê xwe derketibûn û reviyabûn. Ji dûr ve temaşe dikirin. Dijmin tanqa xwe xistibû derî û li cihê benzînxanê ku hevalên me di wê derê de bûn, dida.

***Dema ku li ser sînor pevçûnên wisa dijwar diqewimîn, helwesta gelê Bakur çawa bû?***

Tiştekî herî zêde me jê moral digirt jî, dayik û ciwanên Bakurê Kurdistanê bûn. Gel hatibû ber derî û moral didan me. Di şer de heval hemû birçî û tî ketibûn. Ji milê Bakur yê sînor ve gel ji me re xwarin û av diavêt. Kêm mabû ku gel sînor biqetîne û derbasî vî milî bibe.

Hevalan di wî derî de berxwedaneke pir mezin kirin. Dema ku tanq dihat, li ser piyan dibeziyan, B-7 li tanqê didan û vedigeriyan. Vê yekê jî rih û wêrekiyeke pir cûda dida hevalan. Wan hevalan li wir dîrok nivîsandin. Di dawiyê de hevalê Zagros û sê ciwanên din yên Serêkaniyê, êrîşê bînayê kirin û ew der girtin. Bi êrîşa wan hevalan, dijmin tanqa xwe derxist û reviya.

Di wî şerê derî de, di êrîşa serê sibehê de hevalê Sîpan şehîd ket. Hevalekî xwedî hêzeke xurt bû. Bi berxwedana hevalên weke hevalên Sîpan, berxwedana deriyê Serêkaniyê ji sibehê heya seat 3'yan berdewam kir û hevalan dijmin ji wir derxistin. Serkeftineke pir mezin hat bi dest xistin. Dijmin hemû hêviya xwe bi xistina derî ve girêdabû. Gel jî ji vê yekê pir ditirsî. Bi taybetî ciwanên me yên Serêkaniyê, bi awayekî dijwar êrîşî derî dikirin da ku nekeve. Li milê benzînxanê jî çend heval birîndar bûbûn. Mesela ciwanekî ji Serêkaniye hebû, navê wî Evdo bû. Di wî şerê Serêkaniyê de 7-8 caran birîndar bû. Dema tanqê êrîş kir jî di benzînxanê de bû. Dibeziya û pişt re vedigeriya çepara xwe. Di navbera wan û dijmin de 50 metro hebû, lê nehişt ku çeteyek jî bikeve çepera wî. 7-8 mehan wî hevalî, di êniya herî pêş de cihê xwe girt.

Hemû hêzên me wisa li ber xwe dan. Şerê xeta derî, benzînxane û bînaya spî jî wisa bi ser ket. Ew xeta Til Xelef û rêya Helebê bû. Xeteke stratejîk bû. Ji ber vê yekê dijmin her êrîşî wir dikir. Lê vê xetê 4 mehan li ber xwe da û bi ser xist. Bi rastî jî hevalan fedakariyeke bê mînak nîşan didan.

***Di vê pêvajoyê de kesayetên ku damgaya xwe berxwedanê dane û divê mirov bi bîr bîne hene?**

Di vê pêvajoyê de hevaleke ku herî zêde tesîra xwe li ser min kiriye, hevala Bêrîvan e. Hevala Bêrîvan Êzîdî, beriya ku şehîd bikeve her rojnivîsa xwe dinivîsand. Di nivîsên herî dawî yên rojnivîsê de, beriya ku şehîd bikeve nivîsandibû. Dema ku mirov dixwîne pir pê bandor dibe. Li hemberî xweşikbûna jinê, hestên wê pir hêja bûn. Ji ber ku malbata wê her dixwaze biçe Ewrupa, ji malbata xwe re dibêje: "*Ezê bibim bûka welatê xwe. Ger ez bibim bûka welatê xwe, ezê weke jinekê, serbilind bim. Ez nikarim weke jineke ji rêzê jiyan bikim.*" Keçeke ciwan û pir jîr bû. Dema ku ji milê xwe birîndar dibe, heval dixwazin wê xilas bikin. Lê ji bo ku heval nekevin xeteriyê, ji hevalan re dibêje, "*hemû hevalan silav bikin, ez ji we hemûyan hez dikim.*"

Girêdana wê ya bi Serokatî, gel û welat re pir cûda bû. Di jiyan û hevaltiya xwe de jî wisa bû. Dema tu diçû tabûra wan, ya ku herî zêde bala mirov dikşand, hevala Bêrîvan bû. Hema bala mirov dikşand ser xwe. Keçeke hem hêja bû, hem xweşik bû, hem zana bû. Li ser hevalan helbest dixwendin. Hevala Bêrîvan weke jin, şehîdê Rojava ya yekemin e. Hevalan digotin, hevala Silava şehîda me ya ewil e. Lê beriya wê hevala Berîvan şehîd ketibû, ji ber ku ketibû dest dijmin hevalan yekser nedizanîn ku birîndar e, an şehîd bûye. Heya ku cenazeyê wê me girt jî, hevalan şehadeta wê îlan nekiribûn. Her du heval jî şehîdên destpêkê yên YPJ bûn. Hevala Şîlan jî di wê demê de şehîd ketibû.

Windahiyeke me ya mezin jî hevalê Xemgîn bû. Hevalê Xemgîn, rol û risteke pir mezin lîst. Cihekî wî yê pir taybet hebû di wan şeran de. Ji milê wêrekî, şerkerî û kesayetê de pir xurt bû. Gotin têrê nakin ku mirov hevalê Xemgîn bîne ser ziman. Hevalekî gelek hêja bû. Li kûdera Rojava şer hebûya, hevalê Xemgîn li wê derê bû. Xwedî

bawerî, vîn û hêzeke mezin bû. Bê dudilî diçû ser dijmin. Xwe gihandibû hêzeke pir mezin. Hevalê Xemgîn di şerê ewil yê rizgarkirina Til Temirê û şerê Hesekê de cihê xwe girt. Di her sê şerên Serêkaniyê de jî cihê xwe girt. Dema ku gotina şer dihat ziman, hevalê Xemgîn yekîneya xwe digirt û hema diçû. Ango di şerê Rojava de, bi taybetî li Serêkaniyê û Dirbêsiyê, cihekî pir taybet yê hevalê Xemgîn hebû.

Hevalê Xemgîn, dijmin ne pir mezin dikir, ne jî pir biçûk dikir. Li gorî teqtîk û zanistî nêzik dibû. Di şerê Serêkaniyê de heya ku dijmin bi giştî ji bajêr hate derxistin, em bi hev re bûn. Piştre di eniyê de, dema ku dixwaze pêşiya dijmin bigre, xwe ji ser xanî re avêtibû. Dema ku ketibû xwarê, parsûyên wî êşiyabûn.

Dema çû Dirbêsiyê, piştî çend rojan li xeta Tirbespiyê û Qamişlo şer destpê kiribû. Hevalan gotin, "*pêwîst e, ji milê we hêzek were vir.*" Hevalê Xemgîn hat û got, "*ez ê biçim*." Me jî got, "*heval tu birîndarî, em te naşînin.*" Lê pir israr kir, hêza xwe amade kir û çû.

Dema ku diçe Tirbespiyê, şer li wir pir dijwar e. Hema diçe û dikeve eniyekê û li milê gundê Til Marûf êrîş dike ser dijmin. Girekî digre, di girê duyemîn de birîndar dibe. Hevalên li gel jî, hevalên herêmî bûn, ne xwedî tecrûbe bûn. Dixwazin hevalê Xemgîn xilas bikin û ji wê derê derbixin, lê li wê derê şehîd dikeve. Şehadeta hevalê Xemgîn, pir zehmet bû. Hem li ser hemû hevalan bandor çêkir, hem jî valatiyek çêbû. Hevala Bêrîvan jî beriya ku şehîd bikeve, li ser hevalê Xemgîn gelek nivîsên xweş nivîsandibûn. Ango hevalekê li ser şehîdekî dinivîsand, lê piştî demekê bi xwe şehîd ket. Eger em behsa van hevalên şehîd nekin, em nikarin dîrok û bûyer bi tenê bidin xuya kirin.

**6-Êrîşa Dijwar Li Ser Gundên Alok û Cafa**

***Di vê navberê de dîsa êrîşek li ser gundê Cafa û alok çêbû, ev êrîşa duyemîn bû ne wisa?***

Rast e, şerê Serêkaniyê her berdewam dikir. Dijmin pir hewl da ku bikeve Serêkaniyê, lê nikarî. Li hemberî hêza me her teqtîkek jî dida şixûlandin, lê nedikarîn bi ser bikevin. Jixwe ji milê xwe ve hemû rê girtibûn, me jî milê Serêkaniyê girtibû û rêbend danîbûn. Dijmin berê êrîşî gundê Cafa kiribû, lê şikestibû. Di dawiyê de teqtîka xwe guhertin û xwestin Serêkaniyê qut bikin. Êvarekê agahî ji me re hat ku dijmin di xetekê de amadekariyên xwe dike, da ku Serêkaniyê ji Cizîrê qut bike. Me jî li cihên pêwîst tedbîr girtin û teqwiyeyên pêwîst ji wan deran re şandin. Êrîşên wan her ber bi destê sibê re bûn. Wan jî vê carê ji bo qutkirina Serêkaniyê, amadekariyeke pir mezin kiribûn. Lewra wekî din encam nedigirtin û hêviya xwe bi wir ve girêdabûn.

Heval di gundê Cafa de bûn, gundê Alok kes tê de tune bû, lê nêzikî gund rêbendeke me hebû. Hevalan wisa xetek girtibûn. Ev der navbera Serêkaniyê û Dirbêsiyê bû. Dijmin hatibû û di serê sibehê de êrîşî Cafa kiribû. Li ser sê milan, êrîşî hevalan kiribûn. Beriya ku êrîş bikin, plansazîya xwe çêkiribûn û komek bi awayekî veşartî hatibû û ketibû gundê Alok. Ew gund jî li ser rêya ku ji Serêkaniyê diçe Dirbêsiyê bû. Li wê derê di nava daran de xwe vedişêrin. Ji ber ku di wî gundî de heval tunebûn, hevalên rêbendê her diçin û wî gundî kontrol dikin. Wê rojê jî du heval dibêjin, em biçin gund kontrol bikin, ka tiştek heye, an na. Dema ku her du heval diçin, kemînê datînin pêşiya wan û gule li ser wan direşînin. Hevalek birîndar ketibû û hevalekî jî xwe rizgar kiribû.

Ger ew her du heval neçûbana wir, dibe ku rewşeke girantir biqewimiya. Ger bi hêzeke mezin ew der qut bikirana, wê Serêkaniyê jî biketa xeteriyê. Gundiyên Alokê piranî Ereb bûn û pir baş bûn. Keyayê gund dema ku dibîne hevalek li erdê birîndar e, hema xwe diavêje û wî xilas dike. Wî hevalî di mala xwe de diparêze. Dema ku çete tên li malê digerin jî, zilam wan mijûl dike û hevjîn û zarokên wî jî, wî hevalî ji milê din yê malê re rizgar dikin û digihînin hevalan. Lê dema ku di hundurê malê de şopên xwînê dibînin, fêm dikin ku wê malbatê ew heval rizgar kiriye û wê malê tevahî dişewitînin.

Jixwe piştî wê bûyerê jî, hate fêmkirin ku dijmin di gundê Alokê de cihê xwe girtiye. Me ketina dijmin ya Alokê qet texmîn nedikir. Lewra hevalan gundê pêşiya wî girtibûn û li wir şer dikirin. Dema ku me fêmkir ku dijmin ketiye gundê Alokê, em bi gelek hevalan ve ber bi wir ve çûn. Xetek hevalê Çavreş girtibû, xetek jî hevalê Dilo û birayê xwe girtibûn. Ew heval her sê jî fermandarê tabûrê bûn. Di xeta Alok de jî hevalê Mazlum disekinî. Hevalê Mehmet Salih, di gundê Cafa de bû.

Jixwe bi carekê re pevçûnên pir dijwar destpê kiribûn. Dijmin bi hemû hêza xwe ve bi tanq, hemir, doçqa û her cure çekan êrîş kiribû. Dixwestin ku vê carê teqez berxwedana Serêkaniyê bişkînin. Em pênc heval bi maşînekê siwar bûn û çûne Alok û di malên pêşiyê de sekinîn. Me dît ku di hundurê xaniyan de tijî zilam e. Me ji hinek hevalan re got, ka lêpirsîn bikin ev kî ne. Me jî di xaniyan de hinek kûn vekirin da ku bikaribin tê de şer bikin. Hêvalê Dilgeş jî li gel me bû û bi rê ket da ku biçe alîkariya hevalên rêbendê. Dema ku em çûne wir, rewşa gundê Cafa bi ber ketinê bû. Pir dijwar êrîş dikirin.

Hevala Rojna û Sozdar Qamişlo, xwe gihandin gundê kêleka Cafa û ew xet girtin. Ez û hevala Zelal jî çûn Cafa da ku nekeve. Hevalên li wê derê jixwe piranî şehîd ketibûn û birîndar bûbûn. 2-3 heval mabûn. Wan hevalên mayî jî digotin, "*ger hun negihêjin me, emê bombeyên xwe yên dawî bi xwe de biteqînin!*" Me ji hevalan re got, "*heval, li ber xwe bidin, vaye em tên.*" Maşîna me cebilxane anî û em çûn. Jixwe me gund baş nas dikir. Me ji hevalan re got, "*tepe di destê we de ye?*" Gotin, "*erê, di destê me de ye.*" Me jî xwest em di wî milî re biçin gel hevalan. Beriya me jî maşîna doçqayê derbas bûbû. Hevalekî ku zêde ajotina maşîneyê nedizanî, bi neçarî du hevalên birîndar jî li maşîneyê siwar kiribûn û doçqa ji wir derxistibû. Navê wî Şêrko bû. Ciwanekî pir xurt bû. Li Hesekê jî wisa kiribû. Dijmin maşîneya wî parçe parçe kiribû, lê doçqaya xwe bernedabû. Ger doçqa ji wê derê dernexistiba, hem ew hevalên birîndar şehîd diketin, hem jî doçqa dikete destê dijmin. Dema hevalê Şêrko li ser doçqayê bûya, dilê me rehet bû. Di doçqayê de pir xurt û wêrekiyeke mezin bi wî re hebû.

Dema em gihiştin wir, hevalan gotin, "*maşîne derbas bûye, pirsgirêkek heye*." Dema ku doçqa ji wir derketibû, tepe ketibû. Dijmin tepe û ew xeta gund bi giştî girtibû. Tenê aliyekî rê mabû, hevalan di wê derê de li ber xwe didan. Beriya ku em bigihin ber tepe, dijmin hemû çek li ser me şixûlandin. Dema ku çek li ser me şixûlandin, yek bi yek me xwe ji maşîneyê avêt û em derbasî milê xaniyan bûn. Me xwe hinekî komî ser hev kir û me got em careke dîtir tepe bigrin.

Wê demê tenê hevalê Mehmet Salîh û hevalê Canfeda di tepe de mabûn. BKC û B-7'ên wan jî li gel wan mabûn. Heya guleya xwe ya dawî jî şer kiribûn. Hevalê Canfeda dema ku li Qamişlo tevlê bû, hê ciwan bû. Lê pir wêrek bû. Hêvalê Mehmet Salîh jî, tevî ku di temenekî mezin de bû, ew jî ew qasa wêrek û şerker bû. Tevî her tiştî jî ew tepe bernedabûn. Di dawiyê de dijmin çar aliyên wan jî girtibûn û her du heval jî şehîd xistibûn. Bi vî awayî karîbûn tepe bixin. Dema ku şehîd bûbûn jî, hê li ser BKC'ya xwe bûn. Bi awayekî fedaiyane li ber xwe dabûn. Lewra wan hevalan hîs kiribû ku ger ew tepe bikeve, wê Serêkaniyê jî bikeve.

Dema ku em gihiştin wir, bi vî awayî tepe û xeteke gund ketibû. Bi giştî 4 heval şehîd ketibûn. Hevalê Nûman li wê derê bû. Karê sabotajê dikir, di sabotajê de pir zîrek bû. Em di şerê derî de jî bi hev re bûn. Di şer de baweriyeke mezin dida mirov. Ji bo ku heval tu caran dudilî jiyan nekin, di çeperan de hemû derdora hevalan li dijî dijmin mayin dikir. 24 seatan di araziyê de bû, mayin diçandin. Wê rojê jî hat cîhazek ji me xwest, maşîna xwe ya mayinan girt û hat araziyê. Dema êvarê li araziyê hinek mayin çandibûn, lê ji ber ku karê wî yekser xilas nebûbû xwestibû li wê derê raze û sibê dîsa berdewam bike. Dema ku êrîş çêdibin, ew jî dixwaze xwe bigihîne hevalan û maşîna mayinan rizgar bike. Lê bi dijmin ve ketibûn nava hev û gelek çete di wê derê de kuştibûn. Cenazeyê wî û yê çeteyan wisa li gel hev bû, di mesafeyeke pir nêz de şer kiribû. Li gel wan hevalan, hevalekî ji Serêkaniyê jî şehîd ketibû. Bi giştî 4 heval şehîd ketibûn.

Di vê pevçûnê de hevalê Dilo jî hebû. Bi xwe ji Serêkaniyê bû. Ew û birayê xwe her du jî fermandarê tabûrê bûn. Her yekî li ser riya Hesekê xetek girtibû. Her du heval jî pir zîrek bûn. Li kûderê pevçûnek çêbûya, hevalê Dilo dixwest biçe wir. Lê me nedihişt ku xeta xwe berde. Mesela li ser bînaya spî çend caran dijmin êrîş kir û girt, me careke dîtir êrîş dikir û digirt. Cara dawî me pir zehmet girt. Hevalê Dilo digot, "*min berdin, ez werim, ezê du deqîqayan de bigrim.*" Di 7-8 êrîşan de cihê xwe girt, di hemûyan de jî bi ser ket. Xwedî kesayeteke têgihiştî, bi perwerde û wêrek bû. Kesayeta xwe ji çanda malbatê digirt, malbata wî jî pir hêja bû. Dema ku ewilî YPG çêbû, hevalê ku destpêkê di nav de cihê xwe girt, ew bû. Her wiha di pevçûnên rizgarkirina Serêkaniyê de jî, di êrîşên ewil de wî û hevalê Dilgeş cihê xwe girtin.

Dema ku êrîş li ser cihê Çavreş wan çêbû, hevalê Dilo ew çûn û careke dîtir ew der girtin. Hevalê Dilo, dema ku bihîst li milê me pevçûnên pir dijwar hene, dixwest were cihê ku em lê ne. Lê me got, "*hûn xeta xwe biparêzin, neyên vî milî.*" Nehiştibûn ku dijmin nêzikî xeta wan bibe. 5 çete kuştibûn, gelek cabilxane jî li ser wan rakiribûn, hildabûn saxlamiyê û hatibûn. Dema ku hatibû gel hevalê Cemşîd wan û fêr bûbû ku em di nava pêvçûnê de ne, nesekinî bû û hatibû. Di navbera 10 deqan de xwe gihande me. Me xwest em êrîş bikin, da ku em wê derê bigrin û Alok jî nekeve. Lê ger me ew der negirta, wê Alok jî biketa. Dijmin jî hemû amadekariyên xwe kiribûn ku me bişkîne. Hem tepe girtibû, hem jî pir hêz û cebilxane ji wan re dihat. Ango dijmin pir bi awantaj bû, hejmara me têrê nedikir.

Dîsa jî hevalê Dilo got, "*beriya ku dijmin xwe xurt bike, divê em êrîş bikin*." Dawiyê de me wisa bîryar girt. BKC û B-7'ên hevalan jî ketibûn destê dijmin. Koma li wê derê çekên giran di destê wan de nemabûn. Tenê qilêş û bombe li ser me mabûn. Em bi giştî jî 10 heval bûn. Dijmin jî di nava gund û tepe de 5 maşîneyên doçqayê bi cih kiribûn. Me digot, em xeta di destê xwe de biparêzin, da ku bibe êvar û em cihên di destê wan de jî bigrin. Dema ku me çeperên xwe digirtin, doçqa li ser me dan şixûlandin û hevalê Avareş birîndar bû. Çend hevalan hema ew rakirin û birin Serêkaniyê. Lê beriya ku bigihêje nexweşxanê ew jî şehîd ketibû. Jixwe êdî cih nemabû ku em hevalên birîndar jî tê re derbasî milê Cizîrê bikin.

Dema ku tanq hate alîkariya wan, hema berê xwe da cihê me. Dar û dîwar bi ser hevalan de hildiweşand. Lê hevalan bi qilêşan serê carê dibeziyan milekî dîwar û li tanqê didan. Doçqayên li ser tanqê jî li ser me dişûxilandin, lê heval qet jê bandor nedibûn. Bi qilêşan tanq didan sekinandin. Heval Dilo digot, "*heval li ber xwe bidin, heya ku Dilo sax be, dijmin nakeve vir, ev soza Apogeriyê ye!*" Çar bombe girtin û êrîşî ser tanqê kir. Me jî bi qilêşan parastin kir. Dema ku tanqê dît ku hevalê Dilo bi bombeyan diçe ser, paşve vekişiya. Hevalê dilo rih û wêrekiyeke mezin bi vî awayî dida hevalan.

***Di vê şerê dijwar da gelo ti şervanan dudilî jiyan nekir, yan nêzikatiyeke ku rihê serkeftinê nebaş bandor bike derneket holê?**

Bêguman şerekî pir dijwar bû lê ne rewşeke tirsê yan yê dudiliyê hebû. Lewra dijmin pir windahî dida û em di milê ruhî de ji asteke baştir da bûn. Hemu heval dizanibû ku, em mafdar in. Ev yek dihişt ku em dudilî nejîn. Me du mil girtibûn û şerekî pir dijwar berdewam dikir. Ji ser 20 cenazeyên çeteyan li vir bû. Dixwestin bi tanqê wan cenazeyên xwe xilas bikin. Lê nedikarîn. Bi vî rengî heya êvarê hevalan li ber xwe da, hevalê Zinar birîndar bûbû.

Hevalê Zinar wan ji Kobanê hatibûn perwerdê, lê ji ber ku şer dijwar bûbû, ew jî tevlê bûbûn. Hevalê Adnan xwest, hevalê Zinar bide pişta xwe û ji wir derbixe. Heya wê demê me ew xeta pişta xwe bi kar tanî. Dema ku hevalê Ednan, hevalê Zinar li pişta xwe kir û berê xwe da wir, dijmin bi sekvanî ew jî şehîd xist! Hevalê Zinar jî wisa bi awayekî birîndar li erdê ma, lê pişt re hêdî hêdî xwe ji wir xilas kir. Me wê demê ferq kir ku pişta me jî girtine.

Dema ku seat bû 2-3, hevala Nalîn wan telefonî me kirin û gotin, "*bila heval xwe şûn ve bidin*." Me jî got, "*piştî vê seatê kî xwe şûn ve bide jî nikare rizgar bibe.*" Lewra deşt bû û ew der jî girtibûn. Êdî baweriya hevalan jî bi xwe hebû. Lewra berxwedaniyeke mezin nîşan dabûn. Ji êvara berê destpê kiribûn û heya wê êvarê, hevalan bê nan û av şer kiribûn. Bi rastî jî ji bo vê yekê wêrekiyeke pir mezin û fedakariyek pêwîst dike. Bi vî awayî di wan her du gundan de jî berxwedaniyeke bêhempa dihat meşandin. Dijmin hê nû bi nû hêzên xwe bi tanqan derbasî Alok dikirin. Wê demê di destê me de teknîkeke pir xurt jî tune bû. Lê li hemberî wan tanqan, wêrekiya hevalan hebû, şer bi wî awayî dihat meşandin.

Dema ku tarî ket erdê, pevçûn dijwartir bûn. Tanq cara duyem hat ku xeta me bişkîne. Di wê navberê de hevalan BKC û B-7 ji me re şandibûn. Dijmin jî hemû planên xwe li gorî êvarê kiribû, beriya ku yekser tarî bikeve erdê dixwestin xeta me bişkînin. Ger vê carê jî nikarîba bişkînin, êdî nedikarîn xwe bigrin. Rih û moralê hevalan jî hemû avantajên wan ji holê radikirin. Dema ku vê carê tanq hat, hevalê Dilo, B-7 girt û çû pêşiya tanqê! Hemû çek li ser hevalê Dilo hatin bikaranîn. Tevî vê jî 4 guleyên B-7'ê li nava wê tanqê dan. Bi vî awayî tanq careke dîtir paşve vegeriya û me bi hemû çekan li dijmin da. Vê yekê baweriyeke pir mezin da hevalan.

Êdî cebilxaneya me jî pir kêm mabû. Hemû heval birçî û tî bûn. Hevalan hinek av û firengî ji me re rêkiribûn. Piranî ew jî me dan hevalên birîndar. Me ji hevalê Dilo re got, "*were û hinekî bêhna xwe vede.*" Lê em guhdarî nekirin, cebilxaneya xwe girt û careke dîtir çû. Min jî da pey, ew di milekî dîwar re çû, ez jî di milê dîtir re çûm. Lê çawa ku hevalê Dilo di ber dîwar re derket, guleyeke sekvanî avêtin û hevalê Dilo birîndar kirin. Heya wê demê jî li gel hemû avantajên dijmin, me zehmetiyeke ku me tengav bike jiyan nekiribû. Lê dema ku hevalê Dilo birîndar bû, em ketin fikaran. Lewra hevalê Dilo ji bo me hêz û wêrekî bû. Dema ku li cihekî ba, herkesî pişta xwe xurt didît. Mirovên wisa pir kêm in.

Ger hevalê Dilo şehîd neketiba, wê weke Kemal Pîr lê bihata. Hemû taybetmendiyên wî, pê re hebûn. Xwedî sekneke bi vî rengî bû. Exleq û çanda tevgera azadiyê, mirov di hevalê Dilo de didît. Dema ku birîndar bû, hevalan hema birin. Heya cihekî hevalan bi piştê biribûn. Pişt re bi motorê biribûn bajêr û ew ameliyat jî kiribûn. Xwestibûn derbasî Qamişlo bikin, lê ji ber ku gundê Aloka Jorîn dijmin girtibû, bi peyayî hevalê Dilo biribûn. Lê ji ber ku rê jî pir ne bi tendûristî bû, heya ku gihiştibû Qamişlo şehîd ketibû. Lê me nedizanî ku şehîd ketiye. Dema ku jiyan dikir jî, dema ku şehîd ket jî bandoreke pir mezin li Serêkaniyê çêkir. Di şexsê wî de gelek ciwan bîryar dan û tevlê bûn.

Dema ku hevalê Dilo birîndar bû û hevalan ji qadê derxistin li ser hevalan jî bi awayekî neyînî bandor kir. Lê me got: "*Hûn hemû Dilo ne, divê hûn xwe bigihînin sekin û wêrekiya wî. Divê mirov wisa nêzik bibe û wisa bi hevalê Dilo ve girêdana xwe nîşan bide.*" Li ser vê esasê gelek hevalan xwe xurt kirin û dijwartir jî şer kirin. Wê demê dijmin dixwest, navbera me û hevala Zelal wan qut bike. Nedihişt ku an em derbasî milê wan bibin, an jî ew derbasî milê me bibin.

Dema ku hevalê Yilmaz ceriband ku derbas bibe, ji pişta xwe birîndar bû û nikarî rabe ser xwe. Navbera me û hevala Zelal wan agir girtibû, ji her cihî gule dihatin. Hevala Zelal got, "*divê em nehêlin ku dijmin bikeve navbera me, an na wê ji bo me pir baş nebe.*" Hevalê Yilmaz jî li erdê mabû, me digot, "*heval, çend gavan ber bi me ve biavêje, da ku em bikaribin te xilas bikin.*" Lê nedikarî ji cihê xwe bilive, hevalan jî nedikarî biçin cihê wî. Kîjan heval

biçûya, birîndar dibû. Herî dawî jî got, “*ji hevalan re bibêjin bila li ber xwe bidin, da ku cenazeyê me nekeve destê dijmin!*”

Her ku diçû birîndarên me zêdetir dibûn, ez bi xwe jî birîndar bûm. Vê yekê rewş jî girantir dikir. Navbera me û hevala Zelal wan jî her hate parastin, me nehişt ku dijmin bikeve navberê. Piştî seatekê ku yekser tarî bû, hevalê Delîl Meletî wan jî hêzek bi xwe re anîn û teqwiye hatin. Beriya wê jî 2-3 komên asayîşê xwe gihandin me. Ger ew nehatibana rewşa me ne baş bû! Lewra êdî di nava xaniyan de em bi bombeyan ketibûn nava hev. Jixwe ji ber ku ew hevalên asayîşê jî pir ne xwedî tecrûbe bûn, yek bi guleya sekvanî, yek jî bi bombeyê birîndar bûn. Dema ku teqwiye hat, hevalan xet yekser girtin û hevalên birîndar û hevalên ku ji destpêkê ve li wir şer dikirin derxistin. Li gundê Alokê û gundê dîtir jî şer pir dijwar bûbû. Jixwe di gundê dîtir de hevala Rojna wan hebûn, ji sibê ve nehiştibûn ku gund bikeve.

Bi vî awayî şerê wan sê gundan, di 14’ê Îlona 2013’an de heya êvarê berdewam kir. Êvarê tabûrên me yên necihî ji milê Qamişlo û wan deran hatibûn û ji milê Dirbêsiyê ve lêdabûn da ku dijmin ji wî milî ve bişkînin. Dijmin hesabê wê nekiribû. Digotin qey tevahî hêza me di Serêkaniyê de ye. Şevê li Alok jî şer pir dijwar bû. Ji bo Cafa jî hevalan amadekariyeke pir xurt kiribûn. Jixwe wê rojê, di wî gundî de 14 heval şehîd ketin. Wê demê cara yekemîn, hevalan ew panzêrên ku bi desta çêkirine, dixwestin di Alokê de bidin karanîn. Hevalan 2 panzer jî bi xwe re anîbûn. Hêza hatî jî hemû xwedî tecrûbe bû. Her tabûrekî plansazîya xwe çêkiribû û ji milekî ve lêdidan.

Dê panzêran ji milekî ve êrîş bikira û bala dijmin belav bikira, hevalên dîtir jî ji milê piştê re lê bida. Jixwe Alok tijî çete bûbû. Hevalan jî hemû derdora gund girtibûn. Dema ku panzêr ketin tevgerê, bi fûzeyan li panzêra dan û agir bi panzêra ket. Îcar heval di panzêran de tengav bûn û 6-7 heval di panzêran de şehîd ketin, tenê 3-4 heval jê rizgar bûn. Panzêr bi vî rengî di cihê xwe de sekinîn û tasfiye bûn. Lê hevalan ji milê din ve lêdan. Ji ber ku dijmin di wir de xwe xurt kiribû, şerekî pir dijwar çêbû.

Di wî şerî de hevalê Rûstem û hevalê Seydo hebûn. Hevalê Seydo, ji Rojhilat e. Di têkoşîna Rojava de, hem bi rihê xwe, hem bi berxwedan û teqtîkên li hemberî dijmin dane şixûlandin, hem jî bi dengê xwe hevalê Seydo cihekî pir hêja girtibû. Hemû hêzên me yên YPG jê tesîr dibûn. Wî jî cihê xwe di nava êrîşa Alokê de girt. Êvarî hevalan hinek cihên gund girtibûn, lê bi pevçûnan bibû roj. Gelek heval jî birîndar bûbûn. Heval di navbera xwe de nîqaş dikin, ger paş ve vekişin wê pir birîndarî çêbibin û careke dîtir nikarin bikevin wir. Dema ku wisa nîqaş dikin, hevalê Seydo li ser cîhazê ji hemû hevalan re dibêje, “*Heval! Em vê derê bernedin, ger em vê derê berdin, sibê emê bi sedan şehîdan bidin.*”

Hevalê Seydo got: “*Ez di mala destpêkê de me, yên ku dixwazin bila bi min re bimînin, da ku em vê derê bigrin. An na em careke dîtir nikarin vê derê bigrin. Panzêrên me û cenazeyên me di nava gund de ne, em nikarin berdin.”* Dema ku hevalê Seydo li ser cîhazê axifî herkesî moral girt. Ew mala ku hevalê Seydo wan tê de bûn, venekişîn. Hevalê Seydo heya êvara dîtir, bi wî awayî di wê derê de şer kir. Komek heval jî li gel hevalê Seydo bûn, xwediyê wêrekiyeke pir xurt bûn. Çeperên pir xurt di wê derê de çêkiribûn. Ew qesa heval jî şehîd ketibûn, moralê hevalan hinekî ketibû jî. Lê piştî dengê wî, tu hevalan fikar nekirin. Bi vî awayî hevalê Seydo û koma gel wî, heya êvarê di gund de man.

Roja dîtir ji bo ku em Alok bistînin, plansazîyeke xurtir hat çêkirin. Ji sê milan ve hevalan amadekarî kirin. Wê hêzek ji milê Serêkaniyê ve bihata û êrîş bikira. Du hêz jî ji milê Dirbêsiyê ve bihata û êrîş bikirana. Li ser esasê şikandina dijmin plansazîyeke bi vî rengî hate çêkirin. Jixwe hê jî biroj bû, hevalan bi çekên giran lê didan. Da ku dijmin pir tevger neke û neçe ser hevalê Seydo wan. Dijmin jî dizanî ku pêwîstî pê heye ku em Alok bistînin, an na ji bo Serêkaniyê dibû xeterî. Gelê Serêkaniyê jî ketibû nava tirseke mezin. Lê yên ku bi me re bûn û bi me bawer bûn, dizanîn ku emê teqez bistînin.

Bi vî rengî êvarî her sê hêzên me jî ji sê milan ve ketin tevgerê û derdora Alok girtin. Tenê ji bo revê xetek ji dijmin re hatibû hiştin. Bi awayekî pir fedaî heval çûn ser Alokê û bi şerekî dijwar rizgar kirin. Rizgarkirina Alok, weke rizgarkirina Serêkaniyê bû! Ji ber vê jî tiştê ku di wê derê de derket holê, binketina dijmin bû. Lewra dijmin hemû hêza xwe xistibû dewrê û dixwest rêka me bigre û di Serêkaniyê de me bifetisîne. Dixwestin gel di wê derê de dîl bigre. Plansazîya xwe wisa kiribûn. Dibe ku pir berxwedanî çêbibe û me pir şehîd û birîndar jî dabin, lê teqtîka dijmin bi ser neket. Gelek kuştiyên dijmin çêbûn, birîndarên wan çêbûn. Me gelek cebilxane ji ser wan rakir. Gelek cenazeyên wan ketin destê me.

Jixwe piştî rojekê Cafa jî hate standin. Bi giştî di Alok û Cafa de 25 heval şehîd ketin. Her hevalek jî bi lehengî şer kir û şehîd ket. Her hevalek jî bi dil û can tevlî wî şerî bû. Hevala Hêlîn hebû, hê nû hatibû. Lê di Alokê de berxwedaniyeke pir mezin kir. Hevala Bêrîtan Goyî hatibû, ketibû hundurê panzêrê û şehîd ketibû. Ji ber ku dijmin jî li hemberî me pir li ber xwe da, şerekî hebûn û tunebûnê di wê derê de çêbû. Bi vî awayî serkeftineke pir mezin çêbû, bi berxwedana hevalan ew her sê gundên ku dijmin dixwest bigre jî di destê me de man. Dijberî wê me çeperên hê xurtir di wan gundan de çêkirin.

FOTO...YPG’lilerin halay çektiği bir fotoğraf kullanılacak

Piştî ku ew der hatin rizgarkirin, di Serêkaniyê de şahiyên pir mezin hatin li darxistin. Navê gelek hevalên ku di gundê Alok û Cafa de şehîd ketine jî nizanim, lê me ji lehengîtiya wan re şahidî kir. Bi qasî ku ji destê me tê emê her behsa wan bikin û wan bidin jiyîn. Kurmamekî hevalê Dilo hebû. Ew jî di şerê Serêkaniyê yê 15 rojan de ji serê xwe birîndar bûbû. Dema ku wî bihîst ku hevalê Dilo şehîd ketiye, bi wê birîndariya xwe ve nesekinî û tevlî êrîşa Alokê bû. Ew jî li wir şehîd ket! Ew di navbera hevalan de bû rihek, rih û hestên tolhildanê di nava hevalan de çêbûn. Hestekî pir cûda yê hevaltî û armanca dozê bû. Vê yekê bandora xwe li ser gel jî kiribû. Jixwe rastiya ku em dibirin serkeftinê, ew rihê Apoger bû.

Piştî şerê gundê Alokê, dijmin li Serêkaniyê bi giştî şikest. Êdî hêviya wan ya li Serêkaniyê nema. Nikarîn wisa êrîşên pir dijwar bikin. Vê yekê da diyarkirin ku li hemberî YPG û YPJ nikarin bi ser bikevin. Êdî her li wir mayina wan, ji bo wan xeterî bû.

***We jî ji sala 2013`an û şûn de di nav şoreşê de cihê xwe girt. Hûn jî yek ji beşdarên şerê Gundê Alok û Cafa bûn. Em dixwazin li ser vî şerî nirxandinên we jî bigrin.***

**ÇIYA KOBANÊ:** Agahî ji me re hat, gotin êrîş li ser Serêkaniyê heye. Beriya wê weke me behs kir, bi berxwedana hevalan, dijmin şikest. Baweriyek çêbû. Êdî me hêzên bi tevger çêkirin. Hêzên mewziyan ku di xeta parastinê de me cuda rêxistin kirin. Li gel wê me hêzeke êrîşê çêkir. Eger ji cihekî êrîş bibe, em ê bikaribin hêza xwe ya destwerdanê bikin tevgerê, da ku bersiv bidin dijmin. Tabûrên çekan me çêkirin. Êdî ew doçqe û panzêrên heyî, erebeyên heyî me tamîr kirin û ajokarên wan rêxistin kirin. Di heman demê de me amadekarî kir ku eger êrîş bibe, hêza me karibe dest werde. Sîstema xwe ya muhaberê, me çêkir.

Di mercên wisa de agahî hat. Gotin, li milê Serêkaniyê êrîşên Cebhet El Nusra hene. Êrîşê gundê Alok û Cafa kirine. Gundê Alok û Cafa cihekî wan ê stratejîk heye. Ev gund li ser cadê ne. Bi taybetî Alok li ser riya ji Dêrik, Qamişlo û Dirbêsiyê ku derbasî Serêkaniyê dibe ye. Yanî eger ew gund bikeve girêdana Dirbêsiyê, Qamişlo û Dêrikê ji Serêkaniyê qut dibe. Jixwe milê riya ku ji Hesekê tê Serêkaniyê jî di dest çeteyan de ye.

Riya ku ji milê Dêrik û Dirbêsiyê tê Serêkaniyê jî di wê êrîşê de hatiye girtin. Dixwazin Serêkaniyê bixin dorpêçê, teng bikin, bigirin û bifetisînin. Milet jî tê de heye. Ev di nava milet de liv û tevgereke çêdike. Bi vî rengî hêza bi tevger çû, em jî çûne milê Alok. Dema êrîşî Cafa û her du gundan kirine 11 heval şehîd ketine û her du gund girtine û cade jî ketiye destê çeteyan. Cadeya ku li ber gundê Alok e. Yanî gund hema bi cadê vê ye. Ew rê hatiye girtin. Riya Hesekê jixwe hatiye girtin. Weke herfa ‘C’ Serêkaniyê xistine çemberê.

Jixwe di navbera sînorê Tirkiyê de kîlometreyek maye, eger xwe bigihînin sînor êdî tenê gundek maye, gundê Aloka jêrîn e. Du Gundê Alok hene; Aloka jêrîn li ber sînor e, eger ew gund jî bikeve êdî xwe digihînin sînorê Tirkiyê û Serêkaniyê yekser dikeve. Êdî qonaxeke jiyanî ye; mirov dikare wisa bi nav bike. Ji ber ku gelek girîng e. Ji bo Serêkaniyê meseleya hebûn û tunebûnê ye. Me plansaziyek çêkir û êvarê heval ketin êrîşê. Me panzêrên xwe jî bi xwe re biribûn. Me bi panzêran heval rêkirin, çûn û ketin gund, hetanî derdorê mektebê girtin û pevçûnan destpê kir.

Wan êvarê *`fûzeyên hararet*ê` ango fûzeyên ku diçine germahiyê li panzêra me dan. Panzêrê me derbkirin û tê de heval şehîd bûn, hinek heval birîndar bûn. Ji bo em wê dêrê bigirin, me hemû rîsk girtin ber çavan. Eger em wê derê negirin, diviyabû em Serêkaniyê jî berdin. Hetanî wê demê fûze bi kar ne anîbûn. Me bawer nedikir ku fûze di destê dijmin de hene. Me nedizanî dewleta Tirk fûze daye çeteyan. Ew grûba ku ketibûn panzêrê, welê bi hêrs çûbûn. Ji bo wan gundan rizgar bikin. Hin heval jî bê destûr ketibûnê. Dema fûze lê dan hindek heval şehîd bûn.

Eger em ji wê derê vekişiyabana, an jî me gavek paş ve biavêta, divê me dev ji Serêkaniyê berda. Heval li wê derê jî hebûn. Hevalan li wê derê li derdora bajêr mewziyên xwe amade kiribûn. Feqet tenê wek nefesekê mabû, dixwestin wê derê bigirin. Tenê dibistan di destê me de mabû. Hevalan mewziyên xwe girtin û bû roj. Şer kete nava rojê. Hevalên wê derê rola xwe lîstin.

Mesela hevalê Seydo hebû, paşî li Hesekê şehîd bû. Rola hevalê Seydo, di wê çalakiya Alok de zaf girîng bû. Piştî ku heval şehîd bûn, hinek heval tengav bûn û zehmetî hatin kişandin, Hevalê Seydo grûb girt û çeper danî. Dibistana ku di destê me de mayî di ber cadê de bû û di dawiya gund de bû. Şerekî pir zêde giran bû. Tanq anîn û dan. Hevalan jî bi B-7’an lê dan. Me jî weke xetekê çêkir û hetanî êvarê pevçûnan berdewam kir.

Grûbeke me ket bînayan û di wir de şer dikir. Dijmin her êrîş dikir, hevalan dişkênand. Qatê jêr ê bînayê çete ketinê, qatê jor jî heval bûn. Hevalan li wê derê berxwedaneke bi wate çêkirin. Di encama lêdana tanqan de dîwarên dibistanê hemû hilweşiyan. Lê bi berxwedana hevalan li wê derê ku kiriye, dijmin li wê derê şikest. Dîsa

hetanî roj şer dewam kir. Êvarê me êrîşeke bi du baskan dar xist. Hevalê Cemşîd bi hêzekê kete êrîşê. Baskek ji aliyê Serêkaniyê ve hat, baskek jî ji gel me derket.

Me gotibû eger em hemû jî tê de biçin, gerek em Alok bigirin. Dema me êrîş kirî esas şehadetên me di wê derê de çênebûn. Bi rasti jî qehremaniyeke mezin hate kirin û di dawiyê de hevalan Alok girtin. Gundê Cafa jî, nêzî Alok kîlometroyek e. Diviyabû me ew der jî bigirtana. Me wê rojê Alok girt. Me xwe amade kir, hevalên xwe yên şehîd rakirin. Bi dehan cenazeyên çeteyan ketin destê hevalan. Hinek çete çûbûn xwe xistibûn nava pembû, heval çûn şer kirin û ew jî kuştin. Me di Alok de dijmin şikênand. Wê demê cadeya ku diçû Serêkaniyê hate vekirin. Pêngav bi vî rengî çêbû. Piştî wê, diviyabû me herêma xwe fireh bikirana û me Cafa jî bigirtana.

Bû roja din me got, “*divê em Cafa bistînin*.” Ger em Cafa negirin, îhtimal heye dîsa Alok bistînin. Li milê Cafa girek hebû. Me yê ji du baskan ve êrîş bikirana ser. Cîhaza xwe li wê derê danîbûn. Dîsa dijmin di pêvajoyên destpêkê de zêde fûze bi kar neanîbûn lê niha di destê wan de hene. Me got, divê em ji vir û pê vê li gorî vê xwe amade bikin. Li ser vî esasî êrîşa Cafa çêbû. Me got emê teqtîkekê bimeşînin; em ê di pêşî de weke ku singesing êrîş dikin, nîşan bidin. Em ê çekên giran bi vî rengî bi kar bînin, lê grûba me ya esasî em ê lê bizîvirin û bikevin gund. Baskek ji milê Serêkaniyê ve hat û baskek jî ji milê me ve çû. Grûbek jî me danî ser cade. Ji bo rêkê bigrin û dijmin ji bo mûdaxale neyê.

Dema me êrîş dest pê kir, wan jî wek cebhe bersiv dan. Ew grûbên me di kêlekan de xwe nêz kirin. Dema nêz bûn, me çekên giran sekinandin û hevalan bi bombeyan dest pê kirin û ew girê Cafa girtin. Dema bilez gir girtin, di milê din de jî grûb ketinê, hinek şer çêbû. Du heval li wê derê şehîd bûn. Lê hevalan gir û taxên derdora girê girt in. Di vê navberê de alîkarî ji dijmin re hat. Lê hevalên li ser cadê lê dan û ew îmha kirin, hinek jî revîn. Heval pê ve çûn û parçe parçe gundê Cafa rizgar kirin. Di wan gundan de qada weke 6 heta 10 kîlometre hate rizgar kirin. Ew rêk hate vekirin. Yanî mirov dikare bêje êrîşên dijmin, bi lehengî û fedakariya YPG û YPJ’ê, hemû vala derketin. Moralê gel û YPG û YPJ’ê gelek bilind bû.

***-Dema ku li Serêkaniyê şer hebû li qadên din yên Cizîrê jî êrîş û şer diqewimî. Hûn dikarin qad bi qad kurahiya van êrîşan rave bikin? Van hêzên êrîşkar xwedî çi armancê bûn, çi rêbaz dimeşandin û di vê pêvajoyê de çi qonax hatin derbas kirin?***

**CEMÎL KOBANÊ:** Sala 2013’ê diyar bû, êdî qonaxeke nû destpê dike û dê şer jî berfirehtir bibe. Gelek ketîbe û hêz hebûn. Hinekên wan li hemberî me şer dikirin, helwesta yên din jî dê diyar bibûya. Van hêzan wek armanc qaşo li hemberî rejîmê şer dikirin, lê li herêmên me rejîm tune bû. Tenê li Qamişlo hin hêzên biçûk yên dewletê mabûn, her dixwestin êrîşî wir bikin. Lê gelek cihên weke Hesekê dewlet hebû, êrîşî wan deran nedikirin.

Bi vî awayî dest bi komployan kirin. Teqînên veşartî çêkirin. Bi taybetî Tirbespiyê kirin navendeke teqînan. Li Çilaxa mayin teqandin. Li ser rêkên Qamişlo teqînên bi vî rengî çêkirin. Dixwestin gel bitirsînin û aloziyeke wisa pêş bixin. Ji milê din ve dewletê jî dizanî ku em hene, lê bi awayekî fermî naskirin tune bû. Her wiha di pêngava Girzîro û Rimêlan de hinek hêza partiya Pêşverû bi me re tevgeriyabû û hinek ji gelê Ereb jî xwe nêzikî me dikir. Lê bi hatina hêzên weke El Nusra û Ahrar El Şam, ew gelê Ereb jî hinek tesîr bû û tirsiyan. Tevî vê jî gelek derdorên Ereb ku piştgiriya me dikirin hebûn. Yekîtiya siyasî ya Kurdan jî lawaz bû, wan partiyan jî xwe dane paş.

Ji hêla din, heya wê demê pergaleke me ya leşkerî rûniştibû, lê xeterî û gefên ku li ser herêmên me hene, baş nehatin hesapkirin û bi pêşdîtînî nêzik bûn çênebû. Dema ku ew yek hate ferqkirin jî demeke pir zêde ku mirov tedbîran bigre nema bû. Lê dîsa jî hewldan û amadekariyek hebû.

Mesela wê demê tevlêbûneke pir zêde çêdibû lê çekên me pir zêde tune bûn. Her wiha di şer de teknîk derdiket pêş, teknîka di destê me de jî nedibû bersiv da ku em hin cihan rizgar bikin û parastineke têkûz çêbikin. Mesela doçqayek wê demê hawayekî wê hebû. Wan hêzan tanq û çekên giran jî ji dewletê girtibûn. Ango avantaja teknîkê di destê wan de bû. Ji hêla me ve jî, fedakarî û lehengîtiyek hebû, dîtin û lêhûrbûn jî hebû. Lê di asta pêkanînê û vala derxistina dijmin de lawazî hebûn. Ji ber vê divê zêdetir bi hesap û bi plan tevgerîn çêbibûya.

Mesela berê di destê çeteyan de jî pir teknîk tune bû. Dema ku çend doçqayên ku di destê me de ne, me nîşanî wan didan, di nava wan de panîk û alozî derdiket. Lê hem hezên weke Tirkiye piştgirî didan wan û hem jî ji dewletê hin çekên giran girtibûn. Teknîka wan xurtir bû û vê yekê ji bo me xeteriyek jî çêdikir. Her wiha ji milê siyasî ve jî, hindek tevger û partiyên Kurd, Ermenî, Asûrî, Sûryanî û Ereb ku li Rojavayê Kurdistanê jiyan dikin, neketin nava kar. Xwestin encamê bibînin û li gorî hevsengiyan xwe bi cih bikin.

Bi vî awayî heya Hezîrana 2013’an hemû sînorên me ketibûn destê Ahrar El Şam û El Nusra û dixwestin li ser me ferzkirinekê bidin çêkirin. Bi vî awayî serdemeke nû jî destpê dikir. Hêdî bi hêdî Artêşa Azad li herêmê lawaz diket, El Nusra û Ahrar El Şam xurt dibûn. Bi awayekî vekîrî armancên xwe dianîn ziman. Ji berhemên ku ji Rojava derdikevin par dixwestin. Weke berhemên Sûriye didîtin û para xwe tê de didîtin.

**‘Li Amûdê bi navê `Kurdayetî` heval şehîd kirin!’**

Me behsa pêngava di navbera Serêkaniyê, Dirbêsiyê û Hesekê de kiribû. Dema ku hêzên ji Qamişlo çûn û tevlî vê pêngavê bûn, piştî bi dawîbûna pêngavê dixwazin vegerin Qamişlo. Ji ber vê dema ku digêhêjin Amûdê, hin partiyên qaşo Kurd li ser konvoya hevalan gule direşînin. Hevalê Sebrî Gulo, di wê gulebaranê de şehîd dikeve, her wiha gelek heval birîndar dibin. Jixwe ew bi rojan bû ku bi lîstokên Tirkiye û PDK`ê li Amûdê provoqasyon lidardixistin. Îcar dema ku YPG ji pêngava li ser çeteyan bi serkeftî vedigeriya, êrîşeke bi vî rengî di nava Amûdê de pêkanîn.

Ew jî tiştekî nû bû. Rast e, li Amûdê tensîqiyat û partiyên Kurd hebûn. Lê nedihat payîn ku dê kiryareke wisa pêş bixin. Wê demê hem hêza Qamişlo li wir bû, hem jî hêza Amûdê hebû. Hevalan bi wê hêzê hema mûdaxale kirin. Dorpêçek li derdorê bajar ava kirin û li ser wan hêzên ku provaqasyon derxistine operasyonek dane destpê kirin. Ew kesên ku provakasyon kirin hatin tasfiye kirin.

Lê ew helwesteke nû bû. Ango digotin, em kengê bixwazin dikarin hevalekî we bikujin. Her wiha dixwestin van nakokiyan kûr bikin, li Qamişlo jî rehet nesekinîn. Her wiha li Dirbêsiyê jî heman rewş hate jiyankirin. Lê weke tevger û saziyên pergalê yên weke asayîşê mûdaxaleyî wan nekirin. Tenê mûdaxale li wan kesên ku li Amûdê provaqasyon derxistine çêbû.

Her wiha bi van provaqasyonan dixwestin Artêşa Azad, El Nusra û Pêşmerge bi hev re li hemberî me şer bikin û deskeftiyên Rojava di nava hev de parve bikin. Van komikan her bangawazî li wan hêzan dikirin. Jixwe digotin, 5 hezar pêşmerge amade ne, kengê pêwîstî bê dîtin dê mûdaxaleyî Rojava bikin. Me jî bangawazî kir û got, “*werin û di bin banê YPG’ê de cihê xwe bigrin, lewma YPG hêza rewa ya parastina giştî Rojava ye.*” Gelek rêxistinan jî di destpêkê de ew yek qebûl kirin, lê pişt re wan jî xwe ji me qut kirin.

Di vê demê de El Nusra di navbera Serêkaniyê, Til Xelef û Til Temir de xwe xurt dikir. Li milê Rimêlan jî gef li me dixwarin, lê dîtin ku ew gefxwarin bi kêrî tiştekî nayên, hin ketîbeyên Artêşa Azad şandin wan deran. Me jî bersiveke teqez da wan û paş ve zivirandin. Li ser milet xwestin provaqasyonekê bikin, ew jî bi ser neket. Bi vî rengî pêwîstî bi şer didîtin û piştî meha Hazîranê, dema ku em ber bi salvegera şoreşa Tirmehê ve diçûn, di navbera me û El Nusra-Ahrar El Şam de şer destpê kir.

Gelekên van hêzan bi Siûdî û Qeterê ve girêdayî bûn. Jixwe El Nusra jî bi El Qaîde ve girêdayî bû. Li herêma me êdî dest bi êrîşên xwe dikirin û bi vî rengî şerekî dest pê kir. Jixwe bi awayekî eşkere piştgiriya Tirkiye hebû. Heya wê demê me gelek qad girtibûn. Li Tirbespiyê şer destpê kir, di ser Til Merûf re xwestin êrîşî Tirbespiyê bikin da ku navbera Dêrik û Qamişloyê qut bikin û bi rehetî Dêrikê bixeniqînin. Li milê Dêrikê plansaziya wan wisa bû.

Her wiha di milê Til Koçer re dê êrîşî Çilaxa bikirana û bi vî rengî gef li ser me bixwarina. Li ser sînor jî dema ku dîtin ku pêşmerge nikarin derbasî Rojava bibin, dest bi kolandina xendekan kiribûn da ku têkiliya Rojava û Başûr ve qut bikin. Ji milê Bakur ve bi destê Tirkiye sînor girtibûn. Ji Başûr re jî dorpêçkirinek hebû. Li ser esasê plansaziya wan dê Dêrik, Rimêlan, Girzîro teqez bigirtana.

El Nusra digot, “*cihê ku dewlet heye, em rejîmê hildiweşînin û rêveberiyê dewrî gelê wê derê dikin.*” Lê li herêma Dêrikê heya Qamişlo tu hêz û saziyên dewletê tune bûn. Lê dixwestin xeta Qamişlo û Dêrikê ji hev û din qut bikin. Wê demê cih bi cih li Serêkaniyê jî pevçûn hebûn. Pişt re di xeta Til Alo de jî êrîşî hacizên me kirin. Jixwe di navbera ew sêkoşeya Rimêlan, Til Alo û Til Koçer de hêza me hebû. Ji ber vê êrîşî wir jî kirin. Li ser du piyan êrîş kirin. Piyekî ji milê Tirbespiyê ve dest pê kir, piyê duyemîn jî ji milê xeta Til Alo ve destpê kir. Ango ji Tirbespiyê heya sînorê Iraqê eniyeke berfireh vekiribûn. Dixwestin gav bi gav pêş ve werin, cihên me bistînin û hebûna me înkar bikin.

**7-Êrîşên Li Xeta Rimêlan û Çilaxa**

Li herêma Cizîrê şer bi vî rengî destpê kir. Bi wê re li Serêkaniyê jî êrîşan destpê kir. Li herêmê şerê me, yê dewletê û Artêşa Azad êdî nemabû. Jixwe van hêzan nedikarîn li dijberî me li ber xwe bidin. Êdî şer di navbera me û El Nusra-Ahrar El Şam de bû. Van çeteyan teknîkeke giran ji dewletê standibûn û li ser me bi kar dianîn. Şer despêkê li nêzî Çilaxa li gundê Xirab Bajar de dijwar bû. Ger ew der bigirtana, di navbera wan û Çilaxa de gundek dima. Dixwestin bikevin nava Çilaxa û gelê Ereb ê wir jî bi xwe re rakin. Li hemberî êrîşên wan ên li herêma Xirab Bajar berxwedaniyeke xurt çêbû. Fermandarê wê berxwedaniyê hevalê Murat bû. Şev û rojekê bê navber berxwedanî çêkiribûn. Ji ber ku li wan herêman cihên ku petrola safî derdixistin hebûn û sawama tijî genim bûn, êrîşên pir dijwar dianîn ser wir. Lê hevalan qet derfet nedida wan. Wê demê ji milê Qamişlo, Girkêlegê û Çilaxa ve mûdaxale bû.

Bi vî rengî şerekî mezin li ber derî bû. Li derdorên Serêkaniyê kom dibûn. Ji milê Til Merûf ve xwestin dest bi êrîşan bikin. Çeteyan di destpêkê de raste rast êrîşî ser herêma Cizîrê nedikirin, dixwestin navbera wir û Helebê û Kobanê qut bikin. Li aliyê din çeteyan hîn zêdetir li milê Çilaxa, Girhok, Til Alo û Til Hecer xwe bi cih kirin. Em jî li wê xetê di çeperên xwe de bûn, da ku em herêmên xwe biparêzin.  Pişt re êrîşî Til Alo kirin. Li wê derê hêzên Qamişlo hebûn. Hevalê Murat jî tabura xwe girtibû û mûdaxale kiribû. Li wir şerekî pir dijwar çêbû û di encama berxwedana mezin de hevalê Murat şehîd ket. Êdî şer derbasî Girê Fatê bû.

FOTO: Ş.MURAT – FOTOĞRAFI KULLINACAK

Li wir sêkoşeyek hebû û tê de amadekariyên hevalan jî hebûn. Hevalan li gelek cihan kêmîn danîbûn. Dema ku êrîş kiribûn, hevalan şer kiribû û paş ve vekişiyabûn. Roja dîtir jî êrîşî wî gundikê kêleka Girê Fatê kiribûn. Li wê derê hevalê Çekdar û pismamekî wî, giran birîndar dibin û şehîd dikevin. Li wê derê sawama genim hebû, dixwestin wan bigrin; her wiha li Girhok navendeke petrolê hebû. Dixwestin wê derê jî bigrin û xeteke xwe ya tîcaretê li wir çêkin. Li ser wê esasê êrîşên dijwar dianîn ser wir. Ji ber ku li rêya navdewletî a ku jê re digotin `xeta siyasî` hinek cih ketibûn destê dijmin, heval hinek paş ve vekişiyabûn û xwestibûn xeteke nû bidin çêkirin.

Bi vî rengî ji Serêkaniyê heya Qamişlo, ji Til Merûf heya sînorê Iraqê, li her cihekî şer dest pê kir. Di êrîşan de avantaj di destê çeteyan de bû. Teknîkeke xurt ji dewletê girtibûn û li hemberî me bi kar dianîn. Di destê wan de tanq, doçqa, hawan û katuşa hebûn. Çekên me li hemberî teknîka wan bê bandor bûn. Hêza YPG jî pir nû bû û şerê tanqan qet nedîtibû. Ji ber vê yekê, tanqê tesîreke psîkolojîk jî dikir. Hevalên me yên dîtir jî, hinek ezmûn pêşxistibûn. Lewma li hemberî dewletê li gelek cihan şerê me çêbûbû, li Serêkaniyê û cihên dîtir li hemberî çeteyan şerê me çêbûbû. Lê li hemberî wê teknîka di destê çeteyan de wan jî zehmetî dikşand.

Bi vî awayî çeteyan çend gund, haciz û cihên petrolê girtin. Em dikarin bibêjin bi pêngava xwe ya yekemîn 5-6 cihên ku heval tê de bûn girtin. Hevalên me jî gavek paş ve avêtibûn. Rojane şerê me dişopandin û dîtin ku YPG paş ve gav avêt. Ew jî weke lawaztiyeke dîtin û êrîşên dijwartir dane meşandin.

Li cebheya Rimêlan li pêşiya gundê Yusufiyê li gel hacizê Sason se cihên me hebûn, ji wir heya gundê Safa xetek hatibû girtin. Di deştê de jî li hin cihên nêzikî bîrên neftê hevalan çeper girtibûn. Ew der hedef girtin û bi tanq û topan êrîşî wan hevalan kirin. Wê demê li wir hevalê Polat û hevalê Mahsum hebû, jixwe hevalê Polat birîndar dibe. Dema ku dibînin ku êrîşên dijmin dijwar bûne, dixwazin hevalan ji wê derê derbixin. Ew heval parastinê dikin û hevalên dîtir jî ji wê derê derdixin. Lê ji ber ku dijmin pir nêz dibe, bi xwe nikarin ji wê derê derkevin. Bi awayekî lehengîtî di wê derê de şer dikin û şehîd dikevin.

Êdî dijmin berê xwe dabû Çilaxa û Rimêlan. Her çiqasa di wê navberê de hêza me hebe jî, weke ku em nikarin li ber xwe bidin û wê hemû êrîşên wan bi ser bikevin û bigêhêjin armancên xwe tevdigeriyan. Me jî hêzek teqwiye anî û me ew hêz di wê xetê de bi cih kir. Li gundê Mizerta êrîşek çêbû û hevalan ew der girtin, di malên pêşiyê de kemîn danîn û di araziyê de jî mayin çandin. Dijmin wan dişopîne, dema ku ew heval ji kemînê derdikevin û dizîvirin cihê xwe, dijmin vedize û dikeve cihê wan yê kemînê.

Hêzek jî ji milê rastê yê hevalan re dişînin, dixwazin di çend malên ku li wir hene de cih bibin û bi wî rengî hevalan bixin dorpêçê. Lê heval pê hesiyabûn! Em jî nêzikî wê derê bûn, dema me ferq kir, em jî ketin çeperan. Li milê rastê yê gund baxçe hebûn, hevalê Cûdî nêzikî wê derê bû û dema ku dibînin çete di nava baxçe de ne, li wan didin. Pişt re hemû hevalan berê xwe dan wan û li wan dan. Di wê derê de 14 cenazeyên wan ketin destê hevalan. Bi tanqan û bi êrîşan xwestin aloziyeke derbixin da ku yên di nava baxçe de birevin, lê fersend careke ketibû destê hevalan û heya dawî li wan dan. Ji milê din ve jî şerekî pir dijwar qewimî. Cara ewil tanq ew qesa nêzik bû û bi bandor li hevalan xist lê disa jî hevalan cihê xwe bernedan. Êrîşa dijmin weke berxwedan û çalakiyeke hevalan li dijmin ziviriya. Dijmin di wê derê de darbeyeke mezin xwar.

Piştî wê serkeftina hevalan, dijmin weke tolhildanê êrîşî gundê Safa kir. Di wê derê de hevalan çeper kolabûn û 5-6 cihên hevalan hebûn. Cihek li milê Girê Fatê bû. Dema êrîş kirin, ew cihê ewil dijmin girt. Piştî rojeke hacizê Sason û hacizekî din jî girtin. Li cihên dîtir jî rojane pevçûn hebûn û êrîşên wan berdewam dikirin, lê ji ber ku xeteke parastinê çêbûbû, nedikarîn pêş ve werin. Piştî ku hacizê Sason girtin, di wir re êrîşî gundê Yusufiyê kirin. Bi lêdana zêde ketibûn nava gund. Qederê seatekê pevçûnên dijwar çêbûbûn.

Ji ber ku fermandarên wan hevalan jî birîndar bûbûn, pergala parastinê ya hevalan xirab bûbû. Heval neçar mabûn ku gav bi gav xwe bidin paş. Çend hevalên hêja di wî şerî de şehîd ketin. Mesela hevalê Sefqan hebû, ji Efrîn bû. Hevalê ku herî dawî di gund de maye ew bû, nexwestibû ji gund derkeve. Bi vî rengî şehîd ketibû. Di encamê de gundê Yusufiyê jî ket. Ji ber ku gundekî Ereban bû û li gel me bûn, zilmeke mezin li ser wî gundî pêş xistin. Yên ku tevlî YPG bibûn, malên wan xerab kirin.

Bi vî awayî paş de gavavêtina hêzên me, hem ji milê şervanên me, hem jî ji milê gel ve lawaziyek çêdikir û moralê wan diket. Ji milê psîkolojîk ve tesîr dikir. Em li ser difikiriyan ka em ê wê psîkolojiyê çawa bidin

derbaskirin. Bi wê re heval weke teqwiye hatin. Tabûra hevalê Cîlo, ya hevalê Rohat, ya hevalê Baran û hê gelek tabûrên din hatin. Piranî jî hevalên perwerde kirîbûn. Hevalên sabotajê hebûn, hevalên sûîqastê hebûn. Dikarîn di wê derê de rista xwe bîlîzin. Bi wan hevalan me xeta xwe ya parastinê têkûz kir. Dema ku ew heval ketin nava hêzên YPG jî, asteke moralê derxist holê.

Piştî ku ew xeta parastinê çêbû, divê êdî em derbasî êrîşê bibana. Çalakiya ewil me li Yusufiyê kir, me bi du hêzan xwest em Yusufiyê bigrin. Hê hevalan yekser cihê xwe negirtibûn, hatin ferqkirin. Ji ber vê pevçûn dirêj bûn û me heval paş ve kişandin. Pişt re li cihê Şehît Mahsum me çalakiyek dar xist. Li wir du cih hebûn, divê me êrîş bikira û ew der bistenda. Li ser hêzekê hevalê Şivan Kobanê hebû. Wan hevalan bi vedizîn çûn û çekên giran jî parastina wan dikir. Hêza bi berpirsiyariya hevalê Şivan bi ser ket û 4 cenaze, 4 dîl, doçqayek û çekên wan deste ser kirin. Fermandarê hêza din ji ber ku rista xwe nelîst, em neçar man wan paş ve bikşînin. Bi vî awayî xeteke me ya parastinê çêbû û êdî hewldanên me yên çalakiyan û girtina hin cihan jî çêdibûn.

Êdî hejmareke zêde teqwiye jî me re dihat. Beriya ku teqwiye bê, li wî milê sînor me xwest em pêngavekê pêş bixin. Gelek heval li wir hebûn, hêzên Girkêlegê me xistin çeperan. Her wiha tabûra hevalê Rohat hat jî me teqwiye kir. Di asta rêveberiyê de jî gelek heval hebûn, valatiyên heyî hatin dagirtin û bi vî rengî ji bo pêngaveke xurt amadekarî jî hatin kirin. Di wê dema ku me amadekarî dikirin de, dijmin êrîşî gundê Rimêlanpaşa û Sikêriyê kir. Şer li wir di 4'ê sibehê de destpê kir, heya êvarî berdewam kir. Gelek çeteyên ku li wê derê jiyan dikirin jî, tevlî El Nusra bûbûn. Ji ber ku wan arazî jî dizanîn, dikarîn vedizin.

Bi rastî jî şerekî dijwar bû, ez bawerim Cebhet El Nusra û Ahrar El Şam tu caran wî şerî jibîrnakin. Hejmareke ji sed kesî zêdetir êrîş kirin, xwestin Rimêlanpaşa bistînin û derbasî Rimêlanşêx bibin. Her du gund jî li pêşiya bajarokê Rimêlan in. Lê berxwedana ku di wê derê de hat kirin, nehilişt ku bigihêjin armanca xwe. Wê demê tabura hevalên Berxwedan Rojhilat û Xemgîn li wir bû û grubek jî hêza ji ciwanên Ereb ku tevlî YPG bûne hebûn. Di gund de girek hebû, me komek hevalê jîr di wir de bi cih kiribû. Ger gund ketibûya jî, wan hevalên li ser gir dikarîn parastina wan bikin. Dijmin xwestibû vedize nava gir, lê hevalan bi bandor lê dabûn.

Wê rojê bi her cureyê çekan êrîş kirin, lê nikarîn ser bixin. Piştî serê sibehê hevalan cihên wan tespît kirin û îcar hevalan li wan da. Dema ku hevalan êrîşî wan kir, pir tengav bûn. Jixwe me rêkên wan yê teqwiyê jî qut kiribûn. Her wiha tanqên wan jî hevalan bi B-7'an bê tesîr dikirin. Êdî nedikarîn paş ve jî vebikişin. Lewra pişta wan araziya rût bû, ger derketibana wê îmha bûna. Bi vî rengî yek bi yek çete hatin kuştin. Bi qasî ku me agahî bi dest xistin 100 çete zêdetir ketibû wir, lê 48 cenaze bi cebilxane û çekên wan ve ketin destê me.

Tenê komeke biçûk karî xwe rizgar bike. Dijmin di wê derê de darbeyeke mezin xwar. Me jî di wir de berdelên giran dan. Hevalê Abdûrezaq mîlîsekî me bû. Li gel me li xeta piştê disekinî, dema ku hevalan cebilxane xwestin me şand. Ew jî bê agahiya me li maşîneyê siwar bûbû û xwestibû xwe bigihîne hevalên li ser girê. Dijmin sûîqast kiribû û ew şehîd xistibûn. Hevalê Adil û hevala Asmîn jî di wir de şehîd ketin. Piraniya şehadetên me jî piştî ku çete şikiyan û heval ketin êrîşî çêbûn. Hevalê Rohat, hê ku çete hemû nehatine paqij kirin ji maşîneyê daketibû û hatibû sûîqast kirin. Ehmedê Ereb jî wisa bû. Her wiha Şehît Lewend û Şehît Şerîf jî wisa gihiştin şehadetê. Bi giştî di vî şerî de 12 heval şehîd ketin.

Me di wê derê de dijmin şikand. Lê kêmasiyên me jî hebûn. Dema êrîşê cihê dijmin baş nehatibû tespît kirin. Dîsa hevalên ku ji bo teqwiye hatin, baş nehatibûn vesazkirin. Serxweşiyeke serkeftinê jî çêdibû. Ji ber van sedeman şehadetên ne di cih de jî hatin jiyankirin. Piştî vî şerî me çalakiyek li ser Til Hecer ango Ebû Hacera kir. Li wir hevalan êrîşî ser girekî kir. Di wir de jî gelek cenazeyên çeteyan ket destê me. Disa çek, hawan û qederek cebilxane jî ket destê me. Her wiha 2 çete jî dîl hatibûn girtin. Dihat hîskirin ku dijmin êdî lawaz dibû û li hemberî me nikare xwe rabigre. Lewma beriya wê jî li gundê Sikêriyê bi tanqan êrîş kirin, li wir jî tabûra hevalê Cîlo berxwedaneke mezin nîşan da. Li wir çar heval di eniya pêş de ne, tanq xwe nêzîkî wan dike. Lê ji ber ku wê mayinê biteqînin, cihê xwe bernadin. Jixwe mayinê di tanqê de diteqînin û îmha dikin. Di wir de jî gelek cenaze û windahiyên wan çêdibin.

Li cihê şehadeta hevala Azadî jî hevalan bi mayinan êrîşên çeteyan şikenandin û gelek cebilxaneyên wan ketin destê hevalan. Di êrîşa berê de hevala Azadî bi sûîqastê li wê derê hatibû şehîd xistin. Ji ber vê yekê ew cih weke nuqteya hevala Azadî dihat naskirin.

Dema ku ew çalakî hatin kirin, asteke ku em li hemberî çeteyan bikevin nava berxwedanekê çêbû. Wê demê cejna qûrbanê bû û çeteyan ev rojên cejnê ji bo êrîş û komkujiyên xwe wek sedem ango hêncet nîşan didan! Lewra me dizanî wê êrîş bikin. Lê wê ji kîjan milî ve êrîş bikirana ne diyar bû. Ji ber ku gelek cenaze û cîhazên wan jî ketibûn destê me, me dikarî êdî pergala wan ya muhaberê jî bixin bin venêrîna xwe. Roja cejnê dîsa êrîşî Til Alo kirin. Li wir berxwedanek pêş ket. Li wir hem hêza Qamişlo, hem jî hêza Girkêlegê hebû. Di nava wan 5-6 komên me de, komek bê tedbîr girtibûn. Komeke Girkêlegê derketibû întîşarê, ji ber vê cihê xwe berdabûn. Dijmin jî

hatibû û ketibû cihê wan. Cihê wan jî pir asê bû, tê de qanal kola bûn. Ji bo careke din standina wir, hevalan ji hinek aliyan ve lê dabûn.

Lê hedefa esasî ya çeteyan hêza Qamişlo bû. Sibê heya êvarê şer berdewam kir. Komeke dijmin ket dorpêça me, piraniya wan jî mirin û reviyan. Me lez dikir, da ku em wê derê dîsa bigrin û piştgiriyê bigihînin hêza Qamişlo. Ji ber wê lezkirinê hevalek şehîd ket, yek jî birîndar bû. Ji ber vê me girtina wê derê ji êvarê re hişt. Lê me nedihêlişt ku teqwiye û cebilxane ji wan re were, bi tanqan dixwestin mûdaxale bikin, me li wan jî dida. Jixwe me tanqek jî girt û çend hep îmha kirin. Dema wisa bû ketin nava panîkê. Hevalê Şivan û hevalê Şoreş li wir birîndar bûn, hevala Dîcle ku fermandara wê eniyê bû, şehîd ket. Ji ber ku her cihê wê derê jî şewitî bû, me navê wê `Til Aloya şewitî` lêkiribû.

Dema bû êvar, me êrîş kir û ew cihê hevalan girt. Me çete ji wir paqij kirin. Me plansazî da pêşiya xwe ku medrese ango dibistan û girekî ku ketiye destê çeteyan jî paqij bikin. Da ku em xwe bigihînin hêza Qamişlo û li ser herêmê kontrola xwe çêkin. Bi vî rengî heya sibê jî em nesekinîn û me li dijmin da, me dijmin ji hemû cihên ku ketinê de derxist. Ji ber ku ew avantaja wan ya teknîkê nemabû, me tanqên wan jî îmha kiribûn, dijmin nedikarî xwe bigre. Di vî şerî de li milê Çilaxa 13 cenazeyên çeteyan ketin destê hevalan. Çek û cebilxana wan û tanqek ket destê me. Bi rihê hevala Dîcle û hevalê Akîf ew şer jî bi ser ket.

Di wê navberê de êrîşên li ser gundê Safa jî qut nebûn. Piştî ku em ketin êrîşê, me xwest em wî gundikî bistînin. Dê 5 heval bi panzêrê êrîş bikirana, hinek hevalan jî piştgirî bidana wan. Ew panzêr me cara ewil wisa diceribandin. Ango cara ewil me bi panzêran pêngav dimeşand. Wan jî di gundik de tanqek veşartibûn. Dema ku çavê wan li panzêrê dikeve tanqê jî berdidin û direvin. Panîk di nava wan de çêdibe, li derdora xwe gule direşînin û bi peyatî direvin. Ew hizirîn ku tiştekî mezin e û dê di wan de biteqe. Çûn tanq anîn û dane ser panzêra me. Dema ku panzêr û tanq li hev ketin, hevalên di hundurê panzêrê de hejiyan û neçar man ku dakevin.

Fermandarê wê komê hevalê Şiyar bû. Hema ji tanqê dadikeve û bi bombeya xwe dikeve û dixwaze tanqê biteqîne. Lê hevalên dîtir, çalakiya heval Şiyar negihandibûn serî. Piraniya wan birîndar bûbûn û ji ser hiş çûbûn. Dema ku hevalê Şiyar radibe ku bombeyê bixe hundurê tanqê, ew çeteyên ku reviyane ji dûr ve gule reşandibûn û hevalê Şiyar şehîd ketibû. Dema ku hevalê Şiyar şehîd dikeve, hevalên din jî bi neçarî xwe didin paş. Beriya wê jî komeke heval xwestibû bi awayekî vedizîn êrîşî wê derê bikin, bi ser neketibûn. Hevalek şehîd ketibû, yek jî birîndar bûbû. Ji bo tolhildana wan hevalan, hevalê Şiyar wisa bi bîryar çû ser wê hedefê.

Li heman herêmê, dijmin êrîşeke din anî ser hevalan. Di nava rojê seat 2'yan de ketin êrîşê. Bi panzêran komek anîn û xistin nava gund. Lê hevalan cihê xwe bernedan û hem di nava gund de, hem jî li derveyî gund lêxistin û şer dijwar bû. Li ser vê yekê panzêrên wan çûn û careke dîtir teqwiye anîn. Ji her milî ve jî bi çekên giran gule dibarandin, da ku ew çeteyên wan ku ketine dorpêçê rizgar bikin. Di dawiyê de bê bandor man û êvarê reviyan. Panzêr û cenazeyên xwe li pey xwe hiştin. Lê me jî fermandarekî YPG hevalê Çekjîn di wê derê de şehîd da. Dijmin sûîqast kiribû û ji serê xwe birîndar bû. Me rakir nexweşxaneyê, lê şehîd ket. Heval Çekjîn xwedî ezmûn bû û di wan şeran de bi rihekî fedaî, bêwestan û bêrawestan heta kêliya dawiyê pêşengî kir. Hevalekî pir hêja û bi cesaret bû.

Careke dîtir jî xwestin êrîşî çeperên li pêşiya gund bikin. Lê hevalan bi awayekî bandor li wan dan. Teqwiyeyên wan hemû hatin îmhakirin, nedikarîn tevbigerin. Jixwe yên ku ketine nava me jî, piranî hatibûn kuştin. Di dawiyê de 12 cenazeyên wan ketin destê me. Heval jî li cihekî bi kom sekinîbûn, hawanek li nêzikî wan dikeve û di encamê de hevala Jiyan, hevala Nûjiyan û hevalê Hewraz şehîd dikevin. Li wê derê serkeftineke mezin çêbû, lê piştî wê şehadeta van hevalan heval pir bandor kirin. Gundê Safa her berdêlên wisa giran bi me didan jiyankirin. Di her pevçûnekê de me fermandarek xwe winda dikir.

Teqtîkê me yê esasî parastin bû. Divê me ji milekî ve xeta xwe biparasta û ji milekî ve jî amadekariyên êrîşan bikirana. Divê êdî pêngavekê destpê bikira û me darbe li dijmin bixista. Di wî şerî de gelek berdêl hatin dayin û şehadetên giranbiha çêbûn. Lê hem di şervanan de, hem jî di gel de baweriyek çêbûbû.

***Armancên komên Cebhet El Nusra û ketîbeyên weke Ahrar El Şam çi bûn?***

**ÇIYA KOBANÊ:** Armancên Cebhet El Nusra û ketîbeyên weke Ahrar El Şam ev bû; Dixwestin li Rojava serweriyekê ji xwe re çêkin. Bi taybet jî herêmên weke Rimêlan, Girkêlegê û xeta Girzîro, Çilaxa, Tirbespiyê, heta Qamişlo bi dest bixin. Ji xwe berê jî êrîşî Serêkaniyê kiribûn. Bi vî rengî ji hemû milan ve êrîşek hebû û me jî xeteke parastinê çêkiribû.

Wê demê gelê me yê welatparêz, avahiya me ya rêxistinê û keç û xortên Rojava di nav berxwedanê de bûn. Tevlî YPG-YPJ'ê dibûn û parastina xwe dikirin. Her wiha tevlî hemû xebatan dibûn. Bi can û dil tevlêbûna wan çêbû. Feqet li vir tiştekî din heye. Beşên din bi taybet girseyeke ku di bin bandora siyaset û şerê taybet yê PDK'ê de bûn,

ji ber ku wan deman şer germ bû û nêzî bajarên Rojavayê Kurdistanê bû, gelek ji wan yan xwe dane paş, yan jî koçî derve kirin. Xwe ji bo şer amade nedikirin. Lê êrîş li ser bajarên Rojavayê Kurdistanê dihate çêkirin. Ji bo parastina nirxên xwe û erdnîgariya ku tê de jiyan dikin, gelekan ji wan xwe nedan ber şer û berxwedanê.

Dema ez çûm, li milê Rimêlan û Çilaxa hevalan xeteke parastinê çêkiribûn, di gelek cebheyan de şer hebû. Xeta me ya herî pêş; xeta Rimêlan, Yusifiyê, Sikêriyê dîsa li milê sînor pêşiya kargeha gazê bû. Li sînorê Başûrê Kurdistanê û Iraqê xeta gundên weke Mişêrfa, Sehrîç û mexfera Siriyê jî hebû û dijmin jî li wir xetek danîbû. Li milê Çilaxa jî xeta gundê Safa, Tahûnê heta xeta Til Marûf wisa dewam dike. Jixwe di heman demê de li Serêkaniyê jî mewziyên hevalan û yên çeteyan pir nêzî hev bûn û di nava şer de bûn.

Destpekê êrîşên dijmin bi dijwarî li ser Yusifiyê çêbûn. Bi tanqan hatin û êrîş kirin. Bû sibe, me got "*çi bû?*" Gotin, "*Yusifiyê ketiye*." Çawa ketiye, bi çi rengî ketiye? Tiştê me ji wir fêm kirî ew e; weke min destpêkê jî got, bi ciwanên Rojavayê Kurdistanê re ew rih û cesareta şer heye, lê tecrûbe tunebû. Êrîş kirin, pevçûn çêbû, heya dawiyê berxwedanek jî çêbû. Heval şêhîd jî ketin. Lê tecrûbe tune û tedbîr li hemberî teknîkê zêde tune.

Dema li Yusifiyê ew êrîş çêbû, hema şevê hatin û girtin. Dîsa, li xeta Safa, li xeta Sikêriyê êrîş kirin. Me ev nirxand. Me got "*bi vî rengî çênabe*." Yanî parastina ku mirov bike tenê, ne gerek hema em di mewziyan de bin, em parastinê çêbikin û dijmin dema were êrîş bike, em jî êrîş bikin. Bi vî rengî êdî nabe. Me wisa nîqaş kir. Parastina herî xurt çi ye? Yek, em ê cihê ku em lê disekinin wek xet çêbikin. Divê em mewziyên xwe û bendên ji axê çêbikin. Ji bo ku tu xwe biparêzî weke bendên ji axê, yanî satir dihatin çêkirin. Li hinek deran jî me xendek dikolan. Ev hemû tedbîr û parastin bû.

Di deştê de ji bo ku mirov xwe biparêze sîstema xendekan gelekî girîng e. Hem ji bo parastina xwe û hem jî ji bo ku maşîneyên dijmin nikare derbasî qada te bibe, girîng e. Me li ser vê bingehê hinek çeper di ber çavan re derbas kirin û xurtir kirin. Dîsa me got sîstema parastinê ya herî xurt ew e ku ji bo mirov xwe biparêze divê mirov êrîş bike. Parastina herî xurt êrîş e.

Ji bo parastinê divê em dest bi êrîşan bikin. Me amadekarî kirin û hinek keşif pêş xistin. Mînak, hacizekî dijmin li milê gundê Girhok hêbû. Haciza wan ê destpêkê bû. Wan jî weke xetekê çêkiribûn. Du hacizên dijmin hebûn û hevûdin diparastin. Jixwe Yusifiyê û Girhok di destê wan de bû. Dîsa em çûne milê Sikêriyê. Li wir Til Hecer heye, Ebû Hacera jê re dibêjin. Me li wê derê jî keşif kir. Ji bo ku em dijmin bidin sekinandin, moralê wan xera bikin û derbeyeke xurt li wan bidin; pêwîst bû em çalakiyan bikin.

Ya din jî, ji bo ku em li hemberî êrîşê dijmin bikaribin xwe biparêzin divê em van tanqan bisekinînin. Psîkolojiya tanqan ji ser ciwanan rakin. Ev li ser hêzê hinekî bandor çêdike. Ji bo tanqê jî me got teknîka di destê me de B-7 e. Divê em bi B-7'ê van tanqan bisekinînin. Me ev nîqaş pêş xistin û em derbasî pratîkê bûn. Hîn me dest bi van çalakiyan nekiriye li milê Sikêriyê êrîş çêbû. Heval şehîd Cîlo li wê derê bû. Piştre heval di pêngaveke din de şehîd ket. Hevalekî wêrek û bi rihê fedaî bû, bê dudilî bû. Di şer de bi xwestek, bi dil û can, bi bîr û bawerî bû.

Dijmin ji sê baskan ve êrîş kir. Baskekî di xeta Xirbit Bîr û di navbera Sikêriyê re êrîş kir. Baskekî jî ji hemberê Til Hecer re êrîş kir. Baskê din jî di navbera Rimêlanpaşe û Sikêriyê re êrîş kir. Hevalan mewziyên xwe girtibûn û weke mewziyek li pêş çêkiribûn. Xwe li wê derê veşartibûn. Dema grûba destpêkê tê, dixwazin xwe bidin ber wê axê; heval hema weke di kemînê de bin, lê didin. Dema lê didin 8 çeteyan dikujin. Paşî dema grûba din tê heval li wan jî didin. Li wê derê jî 4 çeta dikujin. Li grûba sêyem jî didin dîsa 2 kesan dikujin. Yanî hevalên li wê derê her sê baskan bê bandor dikin.

Dijmin çawa fêr bibû? Êrîş dikir, welê digirt û wisa elimî bû. Piştî ku me pergal xurt kir di êrîşa destpêkê de dema wan êrîş kir û hevalan li wan dan, ew şikênandin. Heval çûn ser cenazeyên wan û çek rakirin. Wan tu cih ji hevalan negirtin. Hevalan çeperê xwe çêkiribûn. Li pêşiya çeperan jî mewziyên xwe yên veşartî çêkiribûn. Wisa xwe tê de veşartibûn, dema dijmin tê û heval li wan didin. Li wê derê wan bê bandor dikin.

Baskê milê Xirbit Bîr heye, hevalê Şoreş Xinis li wir bû. Ew jî hevalekî fermandarê tabûrê bû. Piştre li milê Serêkaniyê şehîd ket. Heval li wî baskê dijmin jî didin û wî î jî dişkînin. Hinekan dikujin û cenazeyên wan li erdê dimîne. Piştre zivirî pevçûnê. Pevçûn heta destê sibê dewam kir, êdî çete dîsa tanq anîn. Hevalan got "*tanq tê*." Me bersiv da, "*heval, tedbîra wê bigirin*." Me berê jî welê nîqaş kiribû, me tîma B-7'an derxistibû. 4 heval li wê derê bûn û B-7 bi wan re bû. Li pişt wan jî 2 BKC çeper girtibûn. Dema tanq tê, dixwaze li baskê Sikeriyê bizivire. Dema wisa dike, heval bi hev re bi 4 heb B-7'an lê didin û tanq li wê derê di nava agir de dimîne. Hinek çete tê de hatin kuştin û çendek jî tanq li wê derê hiştin û revîn.

Niha meseleya tanqê bi vî rengî bû. Ew psîkolojî û tirsa tanqê jî ji holê rabû. Çeteyan digotin, "*em werin kîjan deverê, emê bistînin.*" Tirsek di nava milet de dabûn çêkirin. Lê hevalan ji wan re xetek danî û gotin, "*hûn nikarin ji vê derê derbas bibin.*" Ji ber ku eger wisa be li hinek cihan 4-5 kîlometre mabû ku xwe bigihînin Rimêlan û kargeha gazê, yan jî xwe bigihînin bajarokê Çilaxa.

Di wê pevçûna ku me behsa wê kir de çete şikestin. Piştî tanqê, hevalan maşîneyeka wan jî îmha kir. Ew pevçûn heta êvarê dewam kir. Di wê pevçûnê de 3 hevalên me şehîd bûn. Pevçûn êvarê dest pê kiribû, heta êvara roja din berdewam kiribû. Ew hevalên ku şehîd ketin li cihê çeperan cihê xwe yê veşartî çêkiribûn û li hêzên dijmin ên êrîşê dabûn. Piştre jî çûbûn ser û çek rakiribûn. Nehiştibûn dijmin bi pêş de were. Dijmin di wê derê de şikest.

Min berê gotibû me du hedef keşif kiribûn. Li pêşiya Girhok hacizê dijmin hebûn û me dê çalakî li ser wan bikira. Dîsa li Til Hecer, me got çalakiya bi serdegirtinê li dar bixin. Piştî ku dijmin li wê derê wisa şikest, divê em êrîş bikin. Me ev nîqaş kirin. Me êvarê plan kir, grûbeke êrîşê ji 6 hevalan me derxist. Ji bo haciz me grûbeke din jî derxist. Hevalê Şivan li ser grûba me bû. Me got, “*hûn ê bi bombeyan dest pê bikin, divê ev çalakî bi bombe destpê bike û bê wendahî be!*” Heval li gorî plansaziya ku hatiye çêkirin ketin tevgerê. Bi şêwazê vedizînê çûn.

Dema hevalan vedizîn, çûn li piştê zîvirîn. Çawa hevalan bi bombeyan destpê kir, ew navend di deh deqîqayan de girtin. Li wê derê çûne ser 8 cenazeyên dijmin; doçqa û çekên din anîn. Çalakiyeke windahî tê de nebû. Tenê hevalek birîndar bû, ew jî ne giran bû. Bi vî awayî dijmin di wî şerî de derbeyeke din xwar, şikest.

Me çalakiya din li hemberê Sikêriyê, li gund û girê Ebû Hacera li dar xist. Til Hecer jî jê re dibêjin, li pişta gundê Yusifiyê ye. Hevalan sê baskên êrîşê derxistin. Li gel hevalên êrîşê civîn û nîqaş çêbû ku wê çawa biçin. Di çûyînê de hindekê mesafe heye, mirov dikeve nava deştê. Pêwîst bû grûb bilez tevbigere û bi bandor lê bide, çalakiyeke weke şoqekê li dar bixe. Sê bask çêbûn. Du bask ji bo gire bû. Baskek jî ji bo cihên dîtir bû; li biniya girê hinek mal hebûn, weke baregehekê bi kar dianîn. Li gel wan xaniyan cihê topavêjên wan hebû. Hewanên 120 û 82 bi kar dianîn. Gir jî weke parastina gundê Yusifiyê û derûdor bi kar dianîn.

Li ser baskê hevalê Rizgar û hevalê Bîlal hebûn. Me bombeyên ku hevalan bi dest çêkiribûn dane grûban. Me 2 doçqa jî wek hêza parastinê danî. Bi vî rengî heval çûn, xwe bi cih kirin û li ser wî esasî dest bi êrîşê kirin. Rêbaza êrîşê bi awayê serdegirtinê bû. Koma ewil, weke koma êrîşê 6 heval bûn. Koma duyemîn 5 heval bûn. Koma din jî 8 heval bûn. Me komeke B-7’an jî ji bo parastinê li nêz danî bû.

Êrîşê dest pê kir. Bi rastî ew êrîş, pir xurt bû. Heval wisa bi hêrs, bi awayekî ku hedefa xwe ji binî ve rakin êrîş kirin. Çalakiya herî bilez ku moral dida mirov bû. Dibe ku negihîştebe 10 deqîqa, hevalan girê xistin. Bi awayakî giran bi B-7’an, bi bombeyan lê dan û çûn ketin girê. Gir jî piçekê dirêj bû. Hevalek welê bi bombeyan ji milekî ve dikevê, ji mewziyekê derbas dibe lê şehîd dikeve. Di wê çalakiyê de du hevalên me şehîd bûn. Hevalan li wê derê gelek çek girtin. Di tepe û li biniya girê bi giştî 18 cenazê dijmin ketibûn destê hevalan. Hinek sax man jî reviyan. Hevalan 2 hawanên 120 û hawaneke 82 girtin. Dîsa derdorê 12 qilêş, 2 BKC, 2 B-7 û doçqayek girtin. Li derveyî wan otobûsek, maşîneyek treksek girtin.

Êdî dijmin kete rewşa parastinê. Yanî ew dijminê ku her tim êrîş dikir, piştî wan çalakiyan kete parastinê. Ew tanqên ku welê bi êrîşê dihatin, hevalan bêbandor kirin. Piştî wê careke din li xeta Safa êrîşî haciza me kirin. Hevalan li wê derê li ber xwe dan, şerekî giran qewimî. Ketin çend malên destpêkê. Şerekî giran çêbû û hevalan mudaxale kir. Hevalê Çekjîn li ser çeka bi navê îspîçînay bû, got ku “*ez ê jî biçim alîkariyê*” û grûbek girt û çû. Hinekî bi dijwarî pevçûnan dewam kir. Wan esas dixwestin riya Çilaxa bigrin. Yanî riya giştî ya ku diçe Dêrikê, Rimêlan û ji Dêrike derbasî Qamişlo dibe, bigirin.

Di xeta Tahûnê, Safa û Til Alo de obûs, hawan û teknîka giran bi kar dianîn; hin hawanên bi desta çêkiribûn diavêtin vî milî. Êrîşan hetanî ber destê sibê dewam kir. Panzêrek BMB hat ket nava me û hevalan bi B-7’an lê da. Xwe li nava têlan qeliband. Hevalan li wê derê jî li wan dan û ji wan gelek kuştin. Gelek cenazeyên xwe li wir hiştin û gelek kel û pelên wan jî man. BMB’ya wan jî di newalokê de ma, hevalan bi B-7’an lê dan, bê bandor kirin.

**8-Dijmin Ti Caran Nikare Me Bişkîne!**

Bi vî rengî di nava wê pevçûnê de bû sibe, sibê jî dewam kir heya êvarê domiya û êvarê jî BMB’ya xwe jî li wê derê hiştin û çûn. Hevalê Çekjîn di wê pevçûnê de bi suîqastê şehîd ket. Li wê derê destpêkê birîndar bû, piştî wê hevalan gihandin nexweşxanê lê dema gihîşt wê derê şehîd bû. Heval Çekjîn Efrîn, berpirsiyarê eyaleta Dêrikê bû. Rola wî hem di şer de û hem jî di rêxistinkirinê de hebû. Li herêmê pir dihat hezkirin. Têkiliyên wî bi gelê Ereb re jî pir xurt bûn.

Hevalê Çekjîn dema pevçûn diqewime alîkariya hevalan dike, destek dide, di şer de roleke çalak dilîze. Dibeziya hemû karan û bi fedakariya xwe hevalekî bi bandor bû. Hem gel û hem jî hevalan ji ber vê yekê gelek jê hez dikir. Di wî şerî de jî bi rola xwe rabû. Bi rihê hevalê Çekjîn rihê fedaî, rihê bê teredût li wê derê bi ser ket. Bi helwesta xwe ya “*dijmin tu caran nikare me bişkîne*” berxwedan meşand. Rolekî wî yê girîng li wê derê hebû.

Di wan şeran de dijmin careke din şikest. Hevalan bi dehan cenazeyên dijmin girtin, bi dehan çek rakirin û panzêr û BMB’ya wan bi dest xistin. Me li cîhazê dijmin guhdar dikir, fermandarê wan digot, “*çawa çêbû?*” Yê din

digotin, “*wele êrîş kirin û em şikestin, me nekarîbû, em paş de vegeriyan, me BMB’ya xwe daniye cihekî, em ê sibe herin bînin*.”Sibe çi herin bînin! Yanî wan hatin êrîş kirin, lê hevalan dijmin şikênandin. Heval ketin êrîşê û ketin pey wan. Bi xwe reviyan!

Pevçûneke din a bi vi rengî li milê xeta Tahûnê çêbû, êrîşê baregeheke me kirin. Hevalan cihek çêkiribûn. Dijmin hat, êrîşê wir kir û pevçûnên giran çêbûn. Li wir du baregeh li kêleka hev bûn, yek ji wan kete destê dijmin. Çete ketin tê de lê hevalan dest werda. Hevalan êrîş kir û ew baregeh ji çeteyan dîsa girtin. Hevalan di wê deştê de hemû îmha kirin. Bi rastî piştî wê me agahî girt. Digotin, “*li wê derê 70 kes hatiye kuştin.*”

Di wê pêvçûnê de jî hevalekî ku bi rastî jî bi bandor, bi rihê fedaî êrîş kiriye yek jî hevalê Cîhad Efrîn bû. Ew heval li wê derê şehîd bû. Hevalê Cîhad bê teredût dikete êrîşê. Dema heval êrîş dike û wan mewziyan digre; di wê derê de çeperek weke cihokek hatiye kolandin heye, di wê derê de çete xwe veşartine. Heval hema hema hemû mewziyan îmha dike, paqij dike û wan çeteyan hemûyan dikuje. 2 çete di wê derê de ne, direşînin û hevalê Cîhad şehîd dixin.

Di cîhazê de digot: “*Heval hûn meraq nekin, ne ew ê êrîş bikin, ez ê pêlî hemûyan bikim, hemûyan bikujim. Ew nikarin werin bikevin vê derê. Ez soz didim ku ew gir 10 deqîqeyan li ber xwe nede.*” Heval bi lehengiyeke wisa ketin wê derê. Êdî pevçûn zivirî destê roj, heya sibê berdewam kir. Ew heval li wê derê şehîd bû. Gelek bi êş bû, mirov nizane çawa bîne ziman. Heval li wê derê wan her du çeteyan jî dikujin.

Di herêma Çilaxa de gelek şer qewimîn. Dîsa di navbera wî hacizê ku me behs kiribû û hacizê Tahûnê de cihek heye; wisa hinek ax danîbûn ber û hinek çete li ber bûn. Çeteyan nikarîbûn birevin û bi şûn de biçin, ji ber ku şikestin. Hevalên me yên suîqastê me li wê derê bi cih kiribûn, çete çawa derdiketin lê didan. Carekê tanq ji milê `Til Alo ya Fileh` ve hat. Ev hêza çeteyan nû bû û ji Helebê hatibûn, hêzên taybet bûn. Wan bi tanqan êrîş kirin. Tanq di cadê de bû û hat xwe nêz kir. Di wan şeran de hevalan ji çeteyan fûzeyek girtibûn, du guleyên wê hebûn. Hevalan bi fûzeya çeteyan, li tanqa wan xistin. 2 çete tê de mirin. Çeteyên din reviyan, lê hevalan bi suîqastê li wan dan û şeş kes kuştin. Emîrên wan jî di navê de bû, ew jî hat kuştin.

Hevalan çûn ew tanq anîn. Tanqê derb xwaribû, lê dîsa jî dixebitî. Di wir de me BMB’yek jî girt. Piştre êdî tanqan nikarîbûn êrîş bikin, eger êrîş bikirana jî îmha dibûn. Dema hevalan êrîş şikênandin li milê Til Alo, hêza me ya Qamişlo hebû. Li wê derê 4 heval li girê Til Alo, di serdegirtina serê sibê de şehîd dikevin. Dema wan êrîş kir û girê Til Alo girtin di Tahûnê de heval hebûn. Ger ew gir nehata girtin, ew grûba me ya Tahûnê wê îmha bibûya. Êrîş li ser wî esasî bû. Hêzê Tahûnê jî di pevçûnê de bûn. Lê belê ew êrîşên li ser baregeha wan dewam bikira, ew grûba me ya Tahûnê ku ji 15 hevalan pêk dihat, dê îmha bibûna.

**‘Dijmin di kuderê de lawaz e?’**

Piştî vê pêvajoyê em gihiştin duriyanekê. Pêwîst e li hember dijmin me pêngavên nû biavêta. Li ser vê bingehê me xwest hinek keşfan bikin ku ka di kî derê de karibin dijmin bişkînin, karibin pêngaveke nû bidin destpê kirin. Eger em pêngaveke pêş bixin, em ê karibin dijmin dûrî bajar û bajarokên xwe bikin. Ji bo wê jî em ketin lêkolînan. Em ê cihên lawaz ên dijmin çawa peyde bikin ku em karibin dijmin bişkînin. Bi vî rengî nîqaşên me pêş ketin.

Bi vî awayî me grûbek girt û em çûn keşfê. Berê me li xeta sînor, li milê kargeha gazê bû. Ji ber ku cebheya pêş a dijmin li wê derê bû. Li wê derê xeta xwe ya esasî çêkiribû da ku Til Koçer biparêze. Ew êrîşên li ser me jî li xeta Til Alo hetanî sînor dihatin çêkirin. Yanî pişta wan Til Koçer bû. Ji Til Koçer hem destek ji wan re dihat, hem jî maşîneyên teqînê li wê derê amade dikirin. Esas xeta wan ya parastinê ew bû. Bi vî rengî dijmin xwe diparêze û di heman demê de êrîşên xwe li ser qada me çêdike. Me got, “*heta niha çima em singesing di vê xeta Rimêlan û Çilaxa de şer dikin?*”

Me meyze kir ku xala herî lawaz ya dijmin xeta sînor e; milê Başûr û Iraqê ye! Em di wê derê de êrîşekê pêş bixin, an jî pêngavekê destpê bikin, em ê bi ser bikevin. Em di wê keşfa xwe de gihiştin wê encamê. Me hedefên xwe jî di wê derê de zelal kirin. Eger em di wê derê re êrîş bikin, em ê bikaribin cebheyekê din di wê derê de vekin û em ê dijmin di wê derê de tengav bikin. Li ser wî esasî em êdî ketin nava amadekariyan. Me cebilxana, teknîk û hemû derfetên xwe di ber çavan re derbas kirin, kêmasiyên xwe hindekî bi ser hev de anîn.

Me bîryar da ji bo em plansazî çêbikin, da ku em pêngavêkê destpê bikin. Pêngava me wê li ser wî cihê ku me keşif kiribû û destpêkê jî li ser kargeha gazê bibûya. Me hêz li cihê kargeha gazê kom kir. Me baskên êrîşê derxistin. Hedefa me ya ewil baregeha li ser sînor bû ku jê re digotin baregeha Siriyê, nêzî gundê Xiwêtla bû. Dîsa rastî wê mexferek di nîvê deştê de çêkiribûn. Dijmin çepera xwe weke xetekê avakiribû.

Dîsa di gundê Mişêrfa de grûbek çete ya pirhejmar hebû. Li jora gundê Mişerfa girê gund bi xwe heye. Li milê gundê Sehrîc jî grûbeke wan hebû. Li ser vî esasî me destpê kir. Doçqake me ya 23,5 hebû. Dîsa 4 doçqayên me yên 14,5, du jî 12,5 hebûn. Bi şev seat 11 me dest bi çalakiya xwe kir. Hevalan êrîşê Mexferê kirin, kêmekê li ber

xwe da. Lê li hacizê nîvê deştê heval ketin cihê wan, bi B-7’an lê dan û şewitandin û girtin. Dîsa raserê Mişerfa girek hebû, êrîş kirin û girtîn. Êrîşî Mexfera Siriyê kirin, hinekê wan li berxwe da û ew der jî ket.

Lê li Mişerfa hinekî şer giran bû. Hevalan hemû hedefên xwe girtin, Mişêrfa ma. Li Mişêrfa pevçûn domiya heta destê sibê. Baskekî me kete goşeyekî gund û li wê derê pevçûn çêbû. 2 heval li wê derê şehîd bûn. Lê me bîryar girtibû ku em paş ve nekişin û pêngavê her bi pêş de bibin. Me panzerên xwe xistin tevgerê. Bi roj me ew her du panzêr xistin gund, lê wan hin cihên stratejîk girtibûn. Me teqtîk da meşandin; grûbek ji milê sînor ve ketin taxekê û girtin. Paşî çûn dibistanê û ew jî girtin. Vêcarê baskê hember yanî yê milê rastê ket tevgerê. Vî baskî bi bombe û B-7’an ketin avahiyan û ew jî girtin. Dîsa panzêr ketin ser pişta wan. Dema reviyan jî hevalan lê dan. Hinek jê hatin kuştin û yên din revîn, çûn mezra Sidêdiyê. Li wê derê pêngav bi ser ket. Di dijmin de şikestinek çêbû.

Hevalan 2 doçqa, çend BKC, gelek qilêş û qederek cebilxana ji ser dijmin rakirin. Gundê Mişêrfa ku wek navenda wan dihat zanîn hate girtin. Mişêrfa gundekî nêzî 70-80 malî ye û wek navenda wan bû. Li wir ji sînorê Iraqê hetanî Sehrîc, wek berahî xeteke bi qasî 10 kîlometre hate girtin. Derdorê 7 kilometre jî dirêj bû. Li qadeke bi vî awayî çeper hate girtin.

Di hêza me de baweriyek çêbû. Heta wê demê êrîşên dijmin çêdibûn. Ew êrîşên dijmin dihatin şikênandin. Çalakî dihate kirin û li cihê ku hatine girtin hevalan kelûpelên dijmin radikirin û ji wî cihî bi şûn ve vedikişîn. Lê vê carê weke pêngavekê, me qad girtin û em tê de man. Vê yekê di nava hevalan de bawerî hîn xurtir kir. Di wê pêvajoyê de dema me ew xet girt, dijmin zêde hezim nekir. Taybetmendiya dijmin çibû? Dema tu qadekê digrî, ew bi şêwazekî dijwar êrîş dike. Carekê du caran êrîş dike, eger tu wan êrîşan bişkînî êdî qebûl dike ku ev cih êdî yê te ye.

Piştî wê me bi trêks û teknîka di dest xwe de xet çêkir. Ew xeta parastinê bi rastî ji bo me gelekî girîng bû. Ev gava me dibe ku biçûk bû. Lê ji bo pêngava destpêkê ku em karibin Til Koçer bigrin girîng bû. Bi vî rengî me dewam kir. Piştî pêngava xeta Mişêrfa, di gelê me yê Dêrik, Rimêlan, Girkêlegê û di giştî de jî baweriyeke xurt û moralekî gelek girîng çêbû. Ciwanên me tevlî YPG bûn. Bi xwe re baweriyek çêkir ku êdî dijmin nikare li hemberî YPG û YPJ li ber  xwe bide.

Ew teknîka ku ji ser dijmin hatin rakirin weke panzêr, çek, doçqa û hwd gel bi xwe jî didît. Gelekên ji wan, tevî ku bi temen jî bûn hatin, di cebheya paşî de alîkarî dikirin, destek didan. Mînak, gel ji me re ji gundan, ji bajaran lojîstîk kom dikirin. Dayikan ji me re xwarin çêdikirin, amade dikirin û dişandin cebhê. Bi rastî jî rista xwe pêkdianîn, alîkarî dikirin. Dîsa ajokarên me yên trêksan, ji me re mewzî çêdikirin. Traktor dianîn û pê ax dikişandin, pêwîstiyên hevalan pê dianîn. Gel hemu di nav kar da bûn.

Di vê demê de, me dest neda xeta Yusifiyê û Rimêlan Paşa. Dijmin jî çikir? Li hemberî vê pêngav û teqtîka me bi heman rengî bersiv da! Hat û xwe li xeta me ya herî pêş li Rimêlanpaşa ango ya herî nêzî bajarokê Rimêlan da. Derdora 100 çeteyên Cebhet El Nusra û Ahrar El Şam, ber bi destê sibê ve êrîşeke berfireh anîn ser xeta me ya Rimêlan Paşa. Gundê Rimêlan Paşa xwedî girekî stratejîk e û derdorê wî girî hemû mal in. Weke du taxan e û di nava taxekê re cade derbas dibe. Taxek jî li kêleka gir e.

Êrîşê destê sibê di seat 4`an de destpê kir. Pevçûn giran bû û dixwestin Rimêlan Paşa bigrin, piştî wê jî armanc jixwe Rimêlan bi xwe bû. Hevalan li wê derê berxwedaneke dîrokî kirin. Heval Şehît Rohat fermandarê tabûrê bû û li cebheyekî din bû. Dema bihîst ew jî hat. Bi rasti jî berxwedana hevalê Rohat û rista ku di şer de lîstiye mirov nikare ji bîr bike.

Dijmin weke bêhişan êrîş dikir, weke ku derzî li wan dabûn, aqlê wan ne di sere wan de bû! Ji ber wê yekê întîharwarî, çavtarî dihatin. Lê her êrîşên ku dihatin hevalan şikandin. Komek di newalokê re hatin, hevalan 2-3 mayin di wan de teqandin. Ew grûb li wê derê îmha bû. Baskek jî ji milê qesrê re êrîş kir, hevalan li wê derê jî şikênandin. Baskek kete nava taxên pêş. Heval bi panzêrê çûne parastinê.

Di wir de mîlîsekî me bi navê Abdûrezaq jî şehîd ket. Esas pêwîst e neçûba nava şer, lê dema dibîne ku heval cebilxana dixwazin ew jî bê agahiya me hema bi hevalan re diçe, dikeve nava pevçûnan û şehîd dikeve. Bi rastî jî rista hevalên şehîd heval Rohat, heval Abdûrezaq û hevalên din dîrokî ye.

Dijmin di nava xaniyan de bûn. Êdî şer jî ketibû nava xaniyan, heval û dijmin bi bombeyan ketibûn nava hev de! Tanqa wan hat, hevalan mayin tê de teqandin, bi B-7’an lêdan. Gelek çete hatin kuştin. Di navbera Yusifiyê û Rimêlan Paşa de deşteke fireh heye. Dema çete di deştê re direvîn hevalan bi suîqastê, bi çekên Zagros û qernasan lê didan. Yanî ez dikarim bêjim ku ji wî 100 çeteyî komeke biçûk xwe xilas kir. Me li wê derê nêzî 50 cenazeyê dijmin rakir. Bi dehan jî di wê deşta di navbera me de hatin kuştin. Hevalê Abdûrezaq digot, “*ev çeteyên qirêj dê bên û axa Kurdistana Rojava, axa gelê Kurd qirêj bikin, em tu carî vê qebûl nakin.*”

Bi rastî jî wê rojê li wê derê destaneke berxwedanê çêbû. Di wî şerî de 12 heval bi lehengiyeke dîrokî şehîd ketin. Di Rimêlan Paşa de dijmin şikest.

**9-Serkeftineke Stratejîk; Rizgariya Til Koçer**

***Di vê demê de pêngava Til Koçer jî gelekî deng veda. Til Koçer çawa hate rizgar kirin, vê pêngavê çi encamên girîng bi xwe re anîn?***

**ÇIYA KOBANÊ:** Til Koçer bajarokekî di sînorê Başûr û Iraqê de ye. Di heman demê de deriyekî sînorî yê navdewletî ye û ew milê sînor jî bajarokê Rebîa ye. Lewra jî Til Koçer cihekî girîng û stratejîk e. Çeteyan ev der weke navendeke esasî bi kar dianîn. Ji bo keşfa Til Koçer em çûne Mişêrfa. Gundê Mişêrfa zemînekî guncaw bû di girtina Til Koçer de. Li ser vî esasî me keşfa xwe pêk anî û dest bi amedekariyên pêngava li ser Til Koçer kir. Me hêza xwe amade kir û her tişt di ber çavan re derbas kir.

Ji bo Til Koçer weke 3 baskan me plan çêkir. Baskê yekê wê ber sînor ve biçûya. Baskê duyemîn di xeta navîn de rêka ku diçe Sidêdiyê û Mehmûdiyê dê esas bigirta. Baskek jî ji milê Sikêriyê dê bi rê keta. Esas baskên ku bikevin tê de baskê Sikêriyê û Til Anter, dê navbera xeta Girhok û xeta Yusifiyê bigire, di wê derê re were; ji bo ku xeta petrola Dîcleyê bigire.

Her baskek derdora 300 şervanî bû; dibe ku 1000 şervan nebe, lê derdora 800-900 şervanî me bi rêkûpêk kir. Hêzên ku biçin pêş û yên ku xeta paş bigirin me diyar kirin. Hevalan li gel hemû grûban civîn lidarxistin; pêngav wê çawa pêkwere, armanca me çi ye, çima Til Koçer, ev mijar hemû hatin rave kirin. Eger navenda Til Koçer em bigirin ew xeta ku dijmin girtiye ji bingeh de dişkê.

Bi vî rengî hemu bask ketin êrîşê. Baskê sînor çûn û êrîşê mexferên kêlekê kirin û ew der girtin. Dîsa me got, em xeta destpêkê bişkînin temam e. Hevalê Argeş li ser baskê êrîşê bû. Ji bo xeta Sidêdiyê, me rêbaza li pişt zivirandinê esas girt. Bi vî awayî em li piştê zîvirîn û mezraya Sidêdiyê hate girtin. Piştî wê mezrayeke din hebû, li pêşiya gundê Sehrîc, hevalan êrîşê wê derê kirin, ew der jî girtin. Baskê milê rastê, yê hevalê Rênas wana, ew jî di milê Til Anter re hatin û ew der girtin. Bi vî awayî pêngav pêş ket û pêvçûn çêbûn.

Cihê ku berxwedana dijmin hebû, hevalan êrîş kirin. Hevalan terz û teqtîka di nava hev de êrîş û şêweyê vedizînê bi kar anîn. Pişt re li pêşiya Sidêdiyê cihek hebû, hevalan êrîş kirin û ew der jî girtin. Di dawiyê de êrîşî Mehmûdiyê kirin lê Mehmûdiyê hinekê li ber xwe da; ji ber ku di navbera Mehmûdiyê û bajarê Til Koçer de 1,5 kîlometro hebû. Bi êrîşên dijwar Mehmûdiyê ket. Bi vî rengî dema Mehmûdiyê hate girtin, baskê me yê rastê hat nêzî girê Til Anter, hevalan êrîşî girê kirin û girtin. Ew girekî stratejîk e, li ser cadeya navdewletî serwer e. Êdî çember li Til Koçer teng bû, behna çeteyan hate teng kirin. Panîkek kete nava wan. Di wê demê de eşîra Ereb bi navê `Şamar` ku niştecihên Til Koçer bûn, ew jî hatin aliyê me.

Di wê navberê de baskê milê sînor ketin hewşa kargeha çîmento ya Til Koçer. Di wê derê de jî şerekî dijwar qewimiya. Tanq hatin, hevalan bi B-7'an lê dan û tanq derbe kirin, şewitandin. Hevalan li wê derê komeka wan îmha kirin. Ew cihê stratejîk hate girtin û li wê derê sekvanek hate danîn. Baskekî din hate cihê 'Çaydan.' Hevalan wilo bi nav dikirin, cihê qehwexaneyekê ye, bi Erebî jê re dibêjin 'dellê.' Hevalan ew mezraya girt. Êdî Til Koçer yekser kete dorpêçê. Baskê me yê navîn ji milê Mehmûdiyê ve bi panzêran kete nav de û me dijmin qelişand. Dema hatin parçe kirin, hêzên Cebhet El Nusra reviyan, li wê derê şikestin.

Heval ketin Til Koçer, baskê me yê milê sînor hat û milê deriyê sînor girt. Baskên din jî ketin bajar de. Ji çeteyên Cebhet El Nusra yê hate kuştin ji xwe hat kuştin û yên din jî reviyan. Til Koçer bi vî awayî ket destê YPG'ê.

Hevalan bajar kontrol kirin. Di wê derê de me 4 tanq girtin. Wekî din panzêreke ku li ser wê doçqa ya çar lûle heye, me girt. Bi dehan erebeyên çeteyan ketin destê me. Cihê wan ê ku maşîneyên bombebarkirî amade dikirin jî li wir bû. Bi tonan teqemenî û erebeyên amadekirî hate desteser kirin. Dîsa sazî û dezgeh, gelek belge û amûrên teknîkî ketin destê YPG. Hejmareke zêde çek jî hatin girtin. Derdorê 6-7 doçqayan ketin dest.

Rojên dawî ku beriya Til Koçer bikeve, serçeteyên Cebhet El Nusra bi me re ketin pêwendiyê û gotin, "*em şer bisekinînin û agirbestê bikin.*" Ji ber ku dizanîbûn dê Til Koçer bikeve. Helbet armanca wan mijûl kirin û qomplo bû. Lewra jî hevalan negotin "*na*", lê negotin "*erê*" jî; gotin, "*hindek dem bidin me.*" Ji ber ku niyeta dijmin diyar bû, pêngav dewam kir û Til Koçer hate girtin.

Pêngava Til Koçer serkeftî bû û bi xwe re moral, bîr û baweriyeke xurt di hêza me ya YPG û YPJ'de ava kir. Gelek encam û tecrûbe derket holê ku bajar bi lez çawa tên girtin. Di 6 rojan de me Til Koçer girt. Di pêngava me ya Til Koçer de ji serî heya dawî, 6 hevalên me şehîd bûn. Bi dehan cenazeyên çeteyan ketin destê hevalan. Dema Til Koçer hate rizgarkirin, ji bo derve jî; ji bo bajarên Kurdan jî bû moralek. Ji bo qada navneteweyî jî di çapemeniyê de deng veda. Bi awayê "vaye Til Koçer cihekî wisa stratejîk e, hatiye girtin û ketiye destê YPG'ê…"

Ji aliyê din ve dema Til Koçer hate girtin, çete li milê Yusifiyê wan ketin panîkê, ji ber ku navenda wan ket. Dema navenda wan ket, yanî serî hilweşiya jixwe laş jî hildiweşe. Teqtîk hinekê li ser vî esasî bû. Hin bi hin bi xwe re tecrubeyên wisa hatin jiyankirin.

Piştî wê me berdewam kir û em hatin xeta Til Alo û Çilaxa. Li xeta Tahûnê, Sawama Til Alo, xeta Girhok û Yusifiyê, li wan xetan hemû me operasyon kir. Bi vî rengî me operasyoneke berfireh çêkir. Ew qada ku berê çeteyan bi kar dianî, hevalan êrîş kirin û girtin. Xeta Dîcle ya petrolê jî me girt. Ew rêka navdewletî jî seranser hemû kete destê YPG'ê. Yanî ji Til Koçer hetanî Qamişlo rêka mezin a navdewletî kete dest. Bi vî rengî me ji Til Koçer hetanî Qamişlo xetek çêkir. Dijmin ji wê derê revî û rasterast çû xeta Cezaa. Mirov dikare bêje, dijmin ji Til Koçer nêzî 40 km revî çû li xeta Cezaa sekinî.

Yê ku destpêkê kete bajarê Til Koçer şehîd Argeş bû. Heval Argeş fermandar bû, pir germ bû. Dema ku ketibûyê, tê de qîr dabû û gotibû, "*baş e, werin, me girt*!" Hevalê Argeş, pişt re di pêngava Til Hemîs de şehîd ket.

Serkeftina Til Koçer parastina herêmê ye, parastina gelê Rojavayê Kurdistanê ye. Ji ber ku êdî xeteriya dijmin li ser bajarên me hinekê dûr diket. Êdî hevalan sîstem li Til Koçer çêkirin, asayîş ava kirin. Dema ku Cebhet El Nusra li bajêr bû, yên pê re alîkarî dikirin jî li gel wan çûn. Me dîsa bangî gelê Til Koçer kir, ew ê ku ji ber çeteyan reviyabû. Hatin û derbasî bajêr bûn, di bajêr de dîsa bi cih bûn. Jiyana normal a Til Koçer vegeriya.

***Em dizanin ku bi taybet ji nîvê sala 2013`an pê ve li Herêma Cizîrê li gelek cebheyan êrîş çêbûn. Bi qasî ku me dît hêzên we yên leşkerî di nava cebheyan de mîna mekûkê diçin û tên. Carina jî di heman demê de li gelek cebheyan şer heye. Lewra jî em dîsa vegerin Serêkaniyê. Piştî şerê Alok û Cafa li Serêkaniyê kîjan qonaxê şer hatin jiyan kirin?***

**AYTEN SERÊKANIYÊ:** Piştî demekê di Mijdara 2013'an de ji milê rêxistinê ve bîryar hate girtin ku derdorê Serêkaniyê bi giştî bê rizgarkirin. Heya wê demê 4 mehan Serêkaniyê di nava dorpêçekê de bû. Êdî pêwîstî bi pêngaveke rizgarkirinê hebû. Plansazîyeke berfireh hate çêkirin, da ku dijmin ji gundewarên Serêkaniyê bê derxistin û dûrî Serêkaniyê bikeve. Ew yek wê ji bo Serêkaniyê re bibûya nefes û bêhnfirehî. Li ser vê esasê ji her milî ve amadekarî hatin kirin. Ji bo vê jî teqtîk û plansazîyên pir xurt pêwîst dikirin. Heya wê demê tenê me teqtîkek dimeşand, me carina hin cihên biçûk digirtin, da ku em çeperên xwe xurt bikin. Ji bilî wê her wan êrîş dikirin. Lê îcar divê me bi hêzeke pir mezin, dijmin bida ber xwe û ji qadê derbixista û pişta wan bişkanda.

Cara yekemîn amadekariyên panzer, doçqayên mezin û hêzeke mezin dihate kirin. Di şerên wisa mezin de aqil çiqasa pêwîst be, teknîk û amadekariyên dîtir jî ew qesa girîng in. Divê hêzek ji milê Alok û Cafa ve biketa tevgerê û heya Til Xelef ji çeteyan bihatana paqijkirin; ji milê derî û riya Helebê ve jî divê hêzek biketa tevgerê û di pişta Til Xelefê ve bizivirîbana û lê bidana. Bi vî awayî pêngav destpê kir û cara ewil hêzeka me jî li pişta dijmin dizivirî. Dema ku me li her du aliyan ve lêxist, me dijmin xist nava xwe. Şerekî wisa dijwar çêbû û dijmin hate şikandin.

Me bi careke re êrîşî çeperên wan yên xurt nekir û sîng bi sîng şer nekir. Me teqtîkeke cûda meşand û em li pişta wan zîvirîn. Ji Serêkaniyê heya Ebû Rasên hêzeke ji hezar hevalî zêdetir em ketin navê û me dijmin tengav kir. Cara yekemîn çete ew qesa tengav dibûn. Êdî neçar ma ku an birevin, an jî radest bibin. Di dawiyê de ji xeteke ber sînor re reviyan û derbasî milê riya Helebê bûn. Ew qada 20 km zêdetir, me bi pêngavekê paqij kir. Pişt re em gaveke din pêş ve çûn û me dijmin heya 30 km paqij kir. Dijmin ber bi Girêspî ve çû. Xeteke me Til Xenzîr, Til Boxa û Firîza bû. Me bi vî awayî çeperên xwe li wan deran xurt kirin. Êdî navenda wan ji Til Xelef derket û bû Rawya, Mebrûka û Dehma. Heya wê derê me derxistin.

Hêza me ku em bikaribin, pê xetê bigrin û parastinê bikin ew qesa bû. Ji bo vê yekê me nikarî pir pêş ve biçin. Jixwe plansazîya me jî wisa bû. Bi wê hêza ku me pê pêngava Serêkaniyê û Til Xelef pêk anî, ne 30 km, me dikarî em 500 km jî biçin. Lewra di wê demê de şikestibûn û nedikarîn li ber xwe bidin. Me pêngav di kûderê de bida sekinandin, dijmin di wê derê de çeperên xwe xurt dikirin. Wê demê me dikarî em wan heya Girêspî jî bibin, lê hêza me ya parastinê ew qesa têrê dikir. Yanî ne tenê qad girtin, parastina wê jî girîng bû û di vir de hêza me encex têrê dikir. Lewra qadeke pir berfireh û deşt bû.

Dema ku me Til Xelef bi dest xist, gelek cebilxaneyên wan yên bi desta çêkirine û hwd ketin destê me. Wan cihên ku me girtin, di xeta wê ya parastinê de tabûrên hevalê Zagros, hevalê Xebat, hevala Zîlan û hevala Berçem hebûn. Carekê dijmin êrîşî Til Xenzîr kir, tenê tabûra hevala jin di wê derê de bû. Cihekî ew qesa stratejîk û tenê hevalên jin tê de bûn. Lê ji milê çeper û parastinê ve pir şiyar bûn. Mesela gelek caran ranedizan, şiyarbûneke pir xurt hebû. Her ku dijmin êrîş dikir jî, dijmin dişkandin. Hevalên xort yên li wir jî digotin, "*çawa be hevalên jin li vir in"* û hindekî sist nêzîk dibûn. Ji ber ku pişta wan xurt bû, hevalên xort jî rehet nêzik dibûn. Lewra dizanîbûn ku hevalên jin sistahî nakin.

Dema ku dijmin ji milê Fîrîza ve êrîşî Til Boxa kir, di xetekê de hevalên xort hebûn, lê wekî din giştî hevalên jin di wê derê de bûn. Hevala Zîlan li wir bû. Cara yekemîn berxwedaniyeke jinê ya bi wî rengî di wê derê de çêbû. Piranî jî endamên herêmî bûn. Berxwedaneke wisa kirin ku pir bi heybet bû. Doçqayên xwe bi awayekî didan şixûlandin ku dijmin nedikarî êrîş jî bike. Tenê cihekî mevzî hate berdan, di wê derê de şikestinek çêbû. Di wê derê de hevala Bermal Efrîn hebû. Heya dawiyê bi qilêş û BKC'ya xwe şer kir. Ji ber ku girekî stratejîk bû, dijmin pir êrîşî wir kir. Hevalan gotibû, "*paşve were*" lê dîsa jî nehatibû. Heya guleya xwe ya dawiyê di wî girî de şer kir û şehîd ket.

**'Me bizaniya jin şer dikin, em nedihatin!'**

Ji hevalên gel xwe re gotibû, "*hemû xwe xilas bikin, heya ku guleyek min bimîne jî ez nahêlim ku dijmin bikeve vir.*" Bi wî rihê jinê heya dawiyê şer kir û di wê derê de li gel hevala Mîzgîn şehîd ket. Hevala Mîzgîn jî, ji Tirbespiyê bû. Her du hevalên jin di wê derê de şerekî pir dijwar kirin, heya ku hevalên birîndar û hevalên dîtir xwe xilas kirin. Dema ku hevalên xort jî diçin alîkariya wan, hevalekî xort jî di wê derê de şehîd ket. Piştî wê dijmin tê û cenazeyê hevalan dibîne û dibêje, "*ger me bizanîba yên ku bi vî rengî li hemberî me şer dikin jin in, em nedihatin vî tepeyî!*" Jixwe re jî weke şikestinekê didîtin. Wê çawa jinan ew bişkanda û ew bikuştana! Lewra di wê demê de 9 cenazeyên wan ketibûn destê hevalan. Bi destê jinê mirin, ji xwe re heram dibînin! Dibêjin, "*ger em bi destê jinê bimirin, em nikarin biçin bihûştê.*" Ya rast ew tirsa ku wê berxwedanê xistiye dilê wan, bi wî awayî dianîn ziman.

**FOTO: YPJ'LİLERİN YÜRÜYÜŞÜ - FOTOĞRAFI KULLANILACAK**

Jixwe piştî wê derê, li hemberî hevalên jin tirseke mezin ketibû nav dilê çeteyan. Heya ku hatibûn û dîtibûn jî, bawer nekiribûn ku 2 hevalên jin li hemberî wan ew qesa şer kirine. Wan hevalan ew rihê şerker yê jinê, di wê derê de dan diyarkirin. Bi giştî di wê xetê de şerên pir dijwar hatin meşandin. Gelek hevalên ku di wan pêngavan de şehîd ketin jî hebûn. Mesela heval Rêzan şehîd ket, hevalekî pir ciwan bû. Di şexsê wan şehîdan de jî rihekî mezin derket holê. Hevalê Fedakar hebû, bi lehengî şehîd ket. Hevala Evîndar hebû, sembola rihê êrîşê bû. Ji ber ku di Serêkaniyê de şikestina dijmin çêbû, dijmin xeta navbera Serêkaniyê û Kobanê pir xurt kir.

Me heya Menacîr û Rawya xetek çêkiribû, hêzên me li wan deran hebûn. Piştî pêngavê çeteyan li Menacîrê êrîş kirin û maşîne teqandin. Li wir jî çeperên hevalan xort bûn. Di wî gundî de pir kêm Kurd hebûn, bi piranî Ereb bûn. Dema wan êrîş kirin, hevalê Devrîm li wir bû. Dijmin hatibû û di rêbendeke stratejîk de maşîne teqandibûn. Dijmin plansazîyeke wisa çêkiribû, embarên genim derbaskiribûn û êrîşî Menacîrê kiribûn. Tabûreke me ya herî xurt jî li embarê bû. Wisa hesap dikin ku dema Menacîrê bişkînin, wê embaran jî bixin nava xwe û îmha bikin. Dema ku maşîne teqandibûn pê re êrîşî hevalan kiribûn. Li wê rêbendê çend heval li jêrê dimînin, hevalên dîtir jî li bînaya du qatî ya kêleka rêbendê de dimînin. Heya ku maşîne xwe digihîne rêbendê, hevalê Devrîm û hevalekî din ku temen mezin bû li hemberî maşîneyê şer dikin.

**'Ew berxwedan bû destanek...'**

Hevalê temen mezin, lingê xwe bi pêlêkana bînayê ve girê dide û şer dike. Da ku nehêle dijmin wî derbas bike û derkeve jor! Heya ku şehîd ketiye, wisa şer kiribû. Ew rih û wêrekiya Kurdiniyê bû ku li hemberî dijmin gelek tişt îspat dikir. Dijmin hemû hêza xwe xistibû wê derê, devê tanqê jî dabû wê bînayê, lê nikarî wê derê bixe. 5 heval di bînaya dibistanê de bûn, hevalên din jî derdorê çeperên xwe girtibûn. Bi cebilxaneyên li ser xwe, wan hevalan heya êvarê li ber xwe dan û bi berxwedaniya wan 5 hevalan ew bîna neket. Ew berxwedan bû destanek. Çete bi hemû hêza xwe ve dihat ser gundê Menacîrê. Piraniya gundiyên wir jî, li gel wan bûn. Êvarî hevalan plansazî kiribûn û dijmin ji wir derxistibûn. Dema ku hevalan êrîş kiribûn, hevalê Welat li wê derê şehîd ket. Hevalên din hemûyan derdorê wî girtibûn û dijmin şikandibûn. Bi vî awayî ew heval ji dibistanê xilas kiribûn. Piştî ku dijmin şikandin jî, hevalan dan pey wan û qewitandin.

****Ev berxwedana ku hûn weke destan pênase dikin, teyisandina wê ya li ser gel çi bû? Li ser helwesta neyînî û erenî ya gel hûn dikarin çavdariyên xwe bi me re parve bikin?***

Berxwedana wan hevalan, ew gundiyên Menecîr jî pir bandor kiribûn. Piştî wê gundiyan gotin: "*Edî em pişta çeteyan nagrin, lewra yên ku me diparêzin, YPG û YPJ'e ne*." Beriya wê yek kes jî ji wî gundî tevlê me nedibû. Lê piştî wê berxwedanê baweriyeke mezin hevalan dabû wan. Ciwanekî wî gundî hebû, digot: "Ez *tu caran qîrîna wan*

*hevalên ku şehîd ketine û gotine 'hun nikarin rihê Apogerî di vê derê de bişkînin' ji bîr nakim.*" Di teqînê de, du endamên Ereb yên YPG jî li wir şehîd ketibûn. Wan jî bi Erebî diruşme avêtibûn, gundî ji wan jî tesîr bûbûn. Ji ber van berxwedanên hevalan û şikandinên dijmin, Serêkaniyê ji bo dijmin bûye derd. Ger niha fersendê bibînin, wê dîsa êrîşî Serêkaniyê bikin. Hê jî li ser cîhazê digotin, "*kengê mabe jî emê dîsa Serêkaniyê bigrin.*" Piştî wê li her derê Cizîrê şerên pir dijwar diqewimîn. Mesela li Cezaa êrîş dikirin û şerên dijwar çêdibûn. Her wiha li Til Koçer êrîşên dijwar çêdibûn. Êdî li ku fersend dîtîbana, êrîşî wir dikirin.

Li ser esasê xeta ku diçe Kobanê, hinekî bê berfireh kirin û parastin bê xurt kirin, plansazî çêbûn da ku em hinek cihên dîtir bistînin. Jixwe heya Til Boxa, Til Xenzîr û Firîza me berê girtibûn. Li pêşiyê jî gundê Rawya û Dehma hebûn. Ew gund jî weke bajarokan bûn, qederekê mezin bûn. Divê ew xet jî bihatana şikenandin û em derbasî Mebrûka bibûna. Ger Mebrûka jî bihata şikenandin, ew xeta Kobanê dihat vekirin. Di heman demê de li milê Kobanê jî, şerekî pir dijwar dihat çêkirin. Bi vî rengî pêwîstî bi pêngava Rawya û Dehma hate dîtin. Dijmin ji xwe re kiribû navendek û weke cihekî stratejîk didît.

Lewra têkiliyên wan û dewleta Tirk jî di ser wir re dihatin pêş xistin. Dema ku me ew xeta Serêkaniyê girt êdî alîkarî bi lezgînî nedigihişt wan. Dibirin û di cihekî pir dûr re dizivirandin. Ji ber vê yekê Rawya kiribûn cihekî xwe yê stratejîk. Bîrîndarên xwe di wir re dişandin, hêza wan di wir re dihat, cebilxane û lojîstîk di wir ve dianîn. Ji ber wê yekê pêwîstî bi şikenandina Rawya û Dehma hate dîtin û li ser wî esasî plansazîyek hate çêkirin. Li gorî plansazîyê, divê hêzekê benzînxane bigirta, hêzekê bi çekên giran li Rawya bida û hêzekê jî Dehma bigirta. Hêzek jî wê di milê Til Boxa û Fîrîza ve biçûya, dîsa hêzeke din jî ji milê Til Xenzîr re biçûya. Di nava her hêzekê de jî 2 baskên êrîşê hebûn.

Wê demê hevala Rojda hebû, fermandara tabûrê bû, pişt re li Kobanê şehîd ket. Hevalên Botan û Akîf hebûn. Di destpêkê de bi rêxistinkirina Serêkaniyê de risteke mezin ya hevalê Akîf hebû. Divê van hevalan benzînxane bigirtana û xetek çêbikirana da ku dijmin nikarîbana derbasî Dehma bibana. Wê hêzekê di piştê re êrîşî Rawya bikira û hêzekê jî ji milê Til Xenzîr ve êrîşî Dehma bikirana. Dijmin jî di wê derê de tedbîrên xwe girtibûn, jixwe dema ku tu bi hêzeke ew qesa mezin biçê, wê dijmin jî tedbîrên xwe bigre. Ne wisa hêzeke biçûk e ku tu bi awayekî veşartî biçê. Êdî plansazî û amadekarî li ser vê esasê hatin kirin. Jixwe piştre wê li ser bê sekinandin, êdî dijminê me DAIŞ bû. Lewra DAIŞ, yên din hemû yan tasfiye kiribûn yan jî tevlê xwe kiribûn.

Ji bo ku navbera Kobanê û Serêkaniyê sivik bibe û rêka wir bê vekirin, di 25'ê Gulana 2014'an de, pêngavê destpê kir. Dema ku me êrîş kir, hevalan yekser benzînxane girtin. Bêşansiya hêza ku ji milê Fîrîza ve êrîş dike ew bû ku genim hemû hişk bibûn, ger guleyek li nava genim biketa, wê agir pê biketa. Fermandarê wê hêzê hevalê Şervan bû, ji Amedê bû. Çawa ku êrîş kirin, ew heval û hevalekî dîtir şehîd ketin. Hevalên din êdî ketin pevçûnê û wisa satir girtin. Jixwe çawa ku dest bi reşandina guleyan kiribûn, agir bi genim girtibû. Ji ber ku ronahî jî hebû û dijmin çeperên xwe xurt kiribûn, şerekî dijwar qewimî. Pevçûnan bi vî rengî 3-4 seatan berdewam kir.

Dema ku heval Şervan û hevalê dîtir xwestibûn çeperan bigrin jixwe şehîd ketibûn. Şer ji ber vê yekê pir dirêj kir. Ji ber ku cihekî navendî bû, dijmin ji xwe re weke kelehekê didît û pir li ber xwe da. Di xeta Til Xenzîr de jî hevalan lêdabûn. Dijmin pêşiya di gund de jî satirên xwe çêkiribûn. Dema ku heval pêşve çûbûn, dijmin xwe paş de dabû. Hevalan weke ku çeperên wan vala ne tevgeriyabûn û rehet çûbûn. Dema ku heval wisa rehet çûbûn, dijmin ji kûnên ku di malan de çêkirine, li hevalan didin. Gelek heval birîndar bûbûn û hema hevalan, birîndar ji wê derê derxistibûn. Piştî wê hevalan dîsa êrîş kiribûn û êrîşên dijmin şikandibûn. Lê şikandina her êrîşekê dijwar derbas bibû. Bi vî awayî dijmin qademeyekê xwe dabû pişt û hevalan ew der girtin.

Hevalan heya dibistana mezin ya Rawya û cihê avê girtin. Nîvê Rawya di destê me de mabû, wan jî hemû hêza xwe kişandin piştê. Dema ku dijmin xwe kişande piştê, hevalên ku berê pişta wir girtine jî nikarîn wê derê bigrin. Lewra her cihî agir girtibû araziyê. Gelek hevalan bi zehmetî xwe ji nava wî agirî xilas kiribûn. Di wê xeta ku dijmin xwe kişandiyê de jî şerên pir dijwar hatin kirin. Ew hêza me ya ku ji milê Fîrîza re pişta dijmin girtibû bi neçarî qademeyekê xwe paş ve kişandin. Kêmasiya herî mezin, ew cihê benzînxaneyê berdan bû. Lewra rê di wir re dihat û teqwiye wê ji wan re bihata. Ji ber ku şer pir berdewam kiribû, êdî ber bi rojê ve diçû. Ger em di gund de bimana, divê em di rêbend de jî bimana. Hevalan bîryar girtibûn ku wî milê rê bi tevahî berdin û bi wî rengî li wî milî heval tevahî kişiyan.

Ew şaştiyeke mezin ya teqtîkê bû. Ew der berdabûn, lê hevalên din di gund de bûn. Di nava gund de jî her pevçûnan berdewam dikir. Hevalan her hêvî dikir ku dijmin bişkê, jixwe me heya nîvê gund girtibû. Nêzikatiyeke me ya bi vî rengî hebû. Dijmin neşikest, heval jî di gund de tengav bûbûn. Em bi tabûrek heval çûn wir, şerekî pir dijwar hebû. Şaştiya ewil, divê pişta dijmin nehatibûya berdan. Şaştiya duyemîn jî, çiqasa heval şehîd ketine, çiqasa birîndar bûne, agahiya kordîne pê tune bû. Hevalên wê derê agahî nedabûn kordîneyê. Hevalên kordînê jî dibêjin, qey heval serkeftî ne û înisîyatîfa şer jî di destê me de ye. Dema ku dijmin dibîne ku pişta wan vala bûye, zêdetir hêza xwe dixe wê derê. Cihê dibistanê ku di destê me de ye jî hatibû berdan.

Di şexsê Abas Çîçek de xiyanet li wir hatibû jiyankirin û dibistan hatibû berdan! Dema ku berdabû, dijmin bi tanqan ketibû dibistanê. Hinek hevalan xwe xilas kiribûn, hinek heval jî di dibistanê de mabûn û êdî nedikarîn li ber xwe bidin. Hevalê Seyîd Amed hebû, fermandar bû. Hevalê Seyîd Riza hebû, fermandarê tabûrê bû. Her du heval jî ji Amedê bûn. Wan hevalan li ber xwe dan. Lê piştre heval her paş ve hatin û di ber malan de man. Me wê demê rewşa heye, pir baş nenirxand û heval paş ve nekişandin. Her me digot, "*wê heval dijmin bişkînin, wê pêş ve biçin*." Dema ku heval bi awayekî komî ketin ber malan, wê demê me xeterî dît. Dîsa jî hevalan zû bîryar negirtin. Hê jî hêviya girtinê hebû. Nêzikatiyeke paşxistinî hebû.

Piştî wê jî dijmin bi tanqan êrîşî ser hevalan kir. Wan jî teqtîkeke xwe pêş xistibûn, her tişt li gorî tengavkirina hevalan ya di wê derê de hesap kiribûn. Teqtîkeke wan hebû, dema te êrîş kir; pêşiya te vedikir û tu pêş ve diçûyî. Lê bi carekê re li pişta te dizivirî! Di hemû gundan de ew teqtîk didan meşandin. Li wê derê jî bi vî awayî derdora hevalan girtin. Hemû panzêr û tanqên me jî ketibûn tevgerê, da ku êrîşên dijmin bişkînin û birîndar û şehîdan rizgar bikin. Hevalan di wê derê de berxwedaniyeke ku qet nehatiye jiyankirin, pêş xistin.

Qet ji bîra min naçe, wê demê li ser cîhazê hevalê Seyîd Riza bang kir û got, "*heval wê dibistanê bernedin, ger hûn berdin wê li vê derê komkujî çêbibe.*" Ew xiyanetkarê ku reviya hat, ew der berda. Hevalan êdî bazdan ku xwe bigihînin dibistanê, lê dijmin nehişt, bi tanqan lêdixist. 3 hevalên ku di wê derê de mabûn, li ber xwe dan. Dizanîn ku ger wê derê berdin, wê eniya pişt hevalan bişkê. Ew der bernedan û her sê heval jî di dibistanê de şehîd ketin. Hevalê Elî û hevalê Dijwar, di wê derê de fedakariyên pir mezin kirin. Dijmin berê amadekariyên xwe kiribûn, li xaniyên ku heval ketibûnê bermîlên benzînê danîbûn. Dema ku heval ketinê, ew bermîl diteqandin û agir bera xanî didan. Hevalan di nava wî agirî de, li hemberî panzêran berxwedaniyeke pir mezin dikirin.

Hevalê Seyîd, Seyîd Riza, hevalê Şivanê Rojhilat û gelek hevalên dîtir; xetek girtibûn û li ser piyan bi BKC'yê lê didan. Gotin, "*heval hûn xwe xilas bikin, emê we biparêzin*." Wan hevalan bi awayekî fedaî, heya guleya xwe ya dawî di wê derê de şer kirin û şehîd ketin. Di wî şerî de kêmasiyên ku ji milê teqtîk ve me jiyan kirine jî hebûn, lê fedakariyeke mirov nikare bîne ziman jî hebû. Hevalê Seyîd Riza, di jiyanê de jî, di hevaltiyê de jî, di teqtîk û stratejiya şer de jî di asteke herî xurt de bû. Digot, "*heya ku dilopek xwîn di canê me de hebe, emê li vê derê li ber xwe bidin û emê nehêlin ku dijmin vê derê bixe.*" Hevalan xwe diavêtin ber tanqan û li hemberî dijmin wisa şer dikirin. Rihekî xurt nîşanî herkesî didan. Bi giştî nêzikî 42 hevalan di wî şerî de şehîd ketin. Weke yekemîn pêngava Til Hemîs, pir bi êş bû. Şêwazê teqtîka me dibû sedem. Hevalên Seyîd, Seyîd Riza, Bedran, Zagros, Sason, Şervan, Baran, hevala Berfîn, Delal, Evîndar, Zelal, Rojîn û hê gelek hevalên din di wê derê de li ber xwe dan û şehîd ketin.

Jixwe di derheqê wan kêmasiyên ku li Rawya hatine jiyankirin de lêpirsîn hate destpêkirin. Hevalên ku wê demê kordîneya şer dikirin, ketin ber lêpirsînê de.

***Bêguman ev pêngava li gundewarên Serêkaniyê gelekî bi dijwarî derbas bûye. Lewra em dixwazin ji we jî guhdarî bikin, li ser pevçûn û pêngavên vê qadê hûn ê çi bêjin?***

**ÇIYA KOBANÊ**: Piştî ku me gundên Alok û Cafa girtin, dijmin li gundewarên Serêkaniyê çeper danîbû. Jixwe Til Xelef di destê wan de bû. Erê, derî di destê me de ye, lê li derdorê çepera dijmin heye. Ji bo em vê ji holê rakin divê em li ser wî esasî pêngavekê li dar bixin. Wilo nîqaşek pêş ket. Me bîryar girt ku em pêngava xwe li ser Til Xelef û xeta Mişêrfa bikin da ku em bikaribin xetekê çêbikin û xeteriyên li ser Serêkaniyê ji holê rakin.

Li gorî vê plansaziyek pêş ket. Me hêza xwe ya parastinê hişt û derveyî wê hemû hêza Dêrik û Girkê Lêge derbasî Serêkaniyê kir. Li Serêkaniyê hevalan plansaziyek çêkiribûn. Hevalan gotin, "*em ê êrîşî milê Mişêrfa bikin.*" Bi terza singesing êrîş, dibe ku di vê şêwazê de girtin jî hebe, lê zor û zehmetiyen wê hene. Ji ber ku di cebheyê de singesing êrîş bikê; yek, mayin hene; du, dijmin xwe amade kiriye û ji bo êrîşê amadekariyên wan hene. Ji ber ku agahî jî distînin ku ji Serêkaniyê wê êrîş were. Dijmin li ser wî esasî amadekariya xwe dike. Dema em çûn jixwe hevalan destpê kiribûn. Hevalan singesing êrîşê milê Mişêrfa kirin. Êrîşa hevalan berfireh bû.

Hevalan di wê derê de panzêrek îmha kirin, nîvê gund girtin, lê ji ber ku pişta dijmin vekiribû, timî ji wan re teqwiye dihatin û ew êrîşên me bê bandor dibûn. Di wê derê de hêza me gelekî zehmetî kişand. Me civîn li dar xist û nîqaş kir, di civînê de bîryar derket ku divê em teqtîkê pêş bixin; weke ku em di cebheyê de şer dikin bidin nîşandan, lê em li wan bizîvirin. Em ê ew cebheya ku li hemberî Serêkaniyê; cebheya dijmin ku çepera xwe lê çêkiriye, ji Til Xelef heta Mişêrfa wan xetan û wan cebhan wek ku em di wir re êrîş bikin nîşan bidin, lê em ê lê bizîvirin. Em ê ji hev qut bikin. Çawa tu qut dikî, ew ên di hundur de dimînin dişkên, dimirin.

Pêngava me bi vî rengî berdewam kir. Li pêşiya me çend gir hebûn, hevalan li wan giran dest pê kir. Em ketin çend gundên destpêkê. Jixwe çend çete tê de hebûn, hevalan lê dan kuştin û yên mayî reviyan. Bi vî rengî bi şiklekî bilez heval lê zîvirîn û gihiştin pişta Til Xelef û Mişêrfa. Ji wir jî em gihiştin cadeya ku ji Hesekê tê Serêkaniyê. Ev cade me xist bin kontrola xwe. Ji wî milî ve heval lê zîvirîn û qut kirin.

Cih bi cih şer çêbûn, di van pevçûnan de dijmin li ber xwe neda; bi vê teqtîka me hema bêje hilweşiya. Me cadeya Hesekê û Serêkaniyê girt. Dîsa ew cadeya ji Mebrûka tê hetanî nêzî Serêkaniyê ket bin kontrola me. Dema ew cade kete kontrolê, dijmin hilweşiya. Qorîdoreke biçûk mabû, dijmin dest bi revê kir. Bi vî rengî heval ketin bajarokê Til Xelef. Hevalan ew hêza pêş a di cebheyê de mayî lêdan û gelek kuştin. Dijmin gelek çekên xwe hiştin, gelek cenaze jî ketin dest. Bi sedan guleyên hawanê, doçqa û çekên cur bi cur ketin destê me.

Piştî Til Xelef em bi awayekî hêsan ketin gundê Mişêrfa. Li ser wî esasî me got "*em nasekinin*." Hevalan di cadê de dewam kir û bi wî rengî gihîştin gundê Xirbit Benat. Me gundê Xirbit Benat wek xeta cebhe, xeta me ya parastinê esas girt. Yanî ji Serêkaniyê heta Xirbit Benat, dijmin derdorê 30-35 km ji bajarê Serêkaniyê dûr ket.

**Cesûrê Roboskiyê...**

Pêngava me ya li ser Til Xelef, Mişêrfa û gelek gundên weke Til Arqam, Til Ezîziyê serkeftî bû, ev gund hemû hevalan girtin. Di qadê de bi hezaran mayin danîbûn, xefk danîbûn. Ji bo em paqij bikin, bi taybetî cihên li hemberî Serêkaniyê grûbên me yên teqemeniyê derketin. Ew der hemû pak kirin û bêhna milet fireh bû, moraleke mezin girtin û bi şahiyekê li Serêkaniyê pîroz kirin. Di pêngava me ya lêzivirandinê de 2 heval şehîd bûn.

Di vê hemlê de yek ji hevalên ku rola xwe baş lîstiye, hevalê Cesûr bû. Hevalê Cesûr, hevalekî ji gundê Roboskiyê bû. Hevalê Cesûr paşî di pêngava Hesekê de şehîd ket. Ew heval timî li pêş bû, roleke wî ya sereke hebû. Timî li peş û di êrîşên destpêkê de pir bilez rola xwe lîst. Heval Cesûr ji bo pêngava serkeftin û rizgarkirina xeta Til Xelef û Mişêrfa wisa bi roleke sereke rabû. Bi saya hevalên wisa leheng pêngava gundewarên Serêkaniyê bi ser ket.

Hevalekî din ku di serkeftina pêngavê de bi rola xwe rabû û roleke girîng lîst hevalê Devrim bû. Hevalê Devrim jî fermandarê cebheyê bû. Rola herî krîtîk, herî girîng wan hevalan lîst. Hevalê Devrim timî li pêş bû û bi rihê serkeftinê tevdigeriya, mirov weke mînak nîşan dida. Wan hevalan rola xwe ya di pêngavê de gelekî bi layiqî anîn cih. Sedema serkeftina pêngavê yek jî ev bû. Yek teqtîka lêzivirandinê bû. Du, bilezbûna hevalan bû; van her du tiştan hişt ku dijmin şaş be.

Piştî ku me xeta Xirbit Benat danî û çêkir, çete nûka hatin xeta Til Xenzîr; hevalan li wan dan, dîsa revîn. Bi vî awayî pêl bi pêl, pêngav li pey pêngavê çêbû. Ez xaleke din jî bînim ziman. Cesaret û fedakariya ciwanên Serêkaniyê gelekî girîng bû, bi rihê xwe yê fedaîyane timî di eniyên pêş de cih girtin û rol lîstin. Dîsa di dem û cihê xwe tevgerînê de risteke girîng lîstin.

Pişt re li ser rêka Til Temir û Hesekê pêngavê berdewam kir. Li Menacîr komek çete hebû, hevalên me yên Dirbêsiyê derdora wan girtin, pevçûn çêbû. Sawama jî li wir heye. Heman teqtîka Til Xelef me pêk anî, wek sê baskan me derxist. Baskek çû ser gir, baskek me di ortê re şand û baskek jî me lê zivirand. Wê hingê hevalan çend guleyên tanqê lê dan. Di pêş de jî sing û sing lê dan. Piştre grûbekê me lê zîvirîn. Ew grûb dema çû gihişt Sawama, çeteyên tê de îmha kirin û çendek jî revîn. Ew belde jî hate girtin û ew xet jî paqij bû. Hevalan xwe li Menacîr bi cih kirin û li ser wê esasî çeperek hate çêkirin.

**10-Pengava Xeta Navîn; Tirbespiyê**

***-Di vê demê de li gundewarên Tirbespiyê û Hesekê jî operasyonên YPG çêbûn, hûn dikarin encamên wan vebêjin?***

**ÇIYA KOBANÊ**: Dema şikênandinek di dijmin de hate jiyankirin divê em hamleya xwe dewam bikin. Ji ber ku eger em fersendê bidin çeteyên Cebhet El Nusra, Ahrar El Şam û ketibeyên cûda, mimkun e xwe komî ser hev bikin, bibe sedema êrîşên wan. Ji bo ku xwe komî ser hev nekin, me bîryareke din jî girt; me nîqaş kir ku divê em li ser qada Tirbespiyê pêngavekê çêkin. Divê em dijmin ji wê derê jî dûr bixin û li wê derê jî xeteke parastinê çêbikin. Me nîqaş kir û em li ser wî esasî derbasî pêngavekê bibin.

Pêngava me ji gundê Til Îd ku nêzî Qamişlo ye hetanî gundê Mihemed Dîyab ku nêzî Tirbespiyê ye, wê pêk bihata. Di nava wê qadê de jî gelek gundên mezin û biçûk hene. Divê em wê dêrê jî rizgar bikin. Nêzî 40-50 gund li vê herême hene. Me grûbên keşfê rêkirin. Di Til Îd de xeta dijmin heye, yanî Til Îd bi xwe dijmin tê de ye. Berdewama wê hetanî tê gundê Ebû Qesayîb û wan deran hemû dijmin e. Dîsa xeta Mihemed Dîyab di wê navberê de jî gelek gund û girên stratejik di destê dijmin de ne. Divê em wan deran paqij bikin ku em xetekê li wan deran çêbikin.

Niha, xeta Til Koçer û ya Serêkaniyê hatiye çêkirin, divê em xeta navîn jî çêbikin ku ew jî Tirbespiyê ye. Ji bo wê jî keşif u plansazî hatin çêkirin. Li ser wî esasî divê dîsa du baskên mezin bêne araste kirin. Ji wan baskan yek ji bo Til Nasir hetanî Til Îd û wan gundên navberê de, ji bo ew hemû bên paqijkirin. Di heman demê de di xeta Mihemêd Dîyab de, wê dêrê bigirin û êrîşekî li ser wê derê çêbikin, wê derê jî paqij bikin.

Bi vî awayî tevgerê destpê kir. Baskekî mezin li milê Til Nasir, Til Îd û li wan gundên wê navberê de kete tevgerê. Baskek jî ji bo milê gundê Mihemed Dîyab destpê kir. Ew bask weke du cebhe çêbûn. Her cebheyek jî qordîneya wê cûda bû. Ew pêngava Til Îd û girê wir, li derdora 15 gundan hevalan destpê kir. Dîsa teqtîka di yek aliyê de dijmin mijûl kirin, di gundekî de pevçûn derxistin lê bi baskekî me yê esasî lê zivirandin hate meşandin. Bi vî rengî destpêkê 15 gund hatin rizgar kirin.

Hedefa herî dawî jî Til Îd bû. Hevalê Argeş li ser êrîşa Til Îd bû. Dijmin li wê derê li ber xwe da, pevçûn çêbû. Çepera xwe di gir û gund de baş çêkiribûn. Me weke du cebhe çêkiribûn, ji bo wî gundî me du baskên êrîşê derxistibûn. Yek, wê di milê gir de bizivire û bikeve gund. Baskek jî ji milê pêş ve, ji milê dibistanê ve bikeve tevgerê. Hevalê Egîd li ser vî baskî me yê êrîşê bû. Pêngav bi şiklê bi ser de girtinê hate dest pê kirin. Jixwe derdora 15 gunda hevalan girtibûn, gundên herî stratejîk bûn; navendeke Cebhet El Nusra, weke bîryargeheke wan bû. Ji ber wê, ew der gelekî xurt kiribûn.

Hevalan êrîşa wê derê, destpê kirin. Ji milê pêş ve hevalan êrîş kirin, pevçûneke dijwar çêbû. Li wê derê panzêra me derb xwar. Li gel panzêrê du hevalên birîndar jî hebûn. Hevalên ku çûbûn wan bînin, nekarîbûn bînin. Du heval li wê derê şehîd bûn. Grûbeke parastinê heta êvarê ew heval parastin ji bo ku dijmin neyê ser wan. Li wê derê pevçûneke gelek dijwar hate jiyîn. Yê ku di parastinê de bûn, ji wan hevalan şehîd Devrim rola xwe gelekî lîst. Bi çekên giran lê didan. Dema bû êvar jixwe her du baskên me yên êrîşê ketin tevgerê. Dema li tepe çekên giran bi şiklekî zêde şixulîn, baskê me yê êrîşê hevalê Argeş wan, bombe li nava tepe dan û tepe bi şiklekî bilez hate girtin.

Dema tepe ket, baskê êrîşê kete wê taxa jêrê ya milê dibistanê. Jixwe tanqê jî çend gule lê dabûn. Dema ew dibistan hate girtin, hevalan li wê derê çûne ser 6 cenazê dijmin. Baskê din jî çû ser 4 cenazan. Li wir depoya avê hebû û mewziyekê gelekî li ber xwe dida, hevalên me B-7 bi kar dianî û bal dikişand ser xwe, hevalek jî lê zivirî û çû bombe xist mewziyê, ew mewzî îmha kir.

Hevalê Argeş wan jî girê herî bilind ê Til Îd girtin. Gundê Til Îd bi vî rengî hate rizgar kirin. Tevî gundê Til Îd derdora 20 gund hatin girtin. Ew gund hatin paqijkirin. Çeper li ser wî esasî hatin çêkirin. Ew gundên di navberê de hemû di kontroleke giştî re hatin derbas kirin. Li wê derê hevalan gelek alavên leşkerî û nêzî 20 çek rakir. Derdora 18 cenazeyê dijmin kete dest. Wekî din jî di wî cebheyî de bi giştî 60 çete hatibûn kuştin.

Li cebheya din jî girê gundê Mihemed Dîab bilind û stratejîk bû. Li ser gundên derdora xwe bandor dikir. Di deştan de wisa ye, cihên herî stratejîk tepe ne. Eger tu wan giran bigirê tu dikarî li ser araziyê bi bandor hakimiyetekê çêbikê. Li wê derê jî hevalan 12 gund girtin. Gundê Mihemed Dîab jî hevalan bi şêwazê vedizînê êrîş kirin. Êrîşa hevalan bi vedizînê, bi bombeyan destpê kir. Dema dest pê kirin; gir weke sê beşan bû, beşa destpêkê çawa bi bombeyan lê dan, li wê derê 6 çete kuştin û çekên wan girtin, li wê derê hevalek şehîd bû. Berdewamiya wê jî hemû gir girtin. Bi vî rengî derdorê 18 gund jî li wê derê hatin rizgar kirin.

Ew cebheya Tirbespiyê mirov dikarê bêje weke pêngaveke mezin a sêyemîn bi encam bû. Serkeftina wê jî ew bû ku bi şiklekî kurt hevalan xist dest xwe. Serkeftina pêngava Tirbespiyê jî bi rizgarkirina Mihemed Dîab, xeta Til Marûf, Til Îd û Til Nasir bi encam bû. Piştî serkeftina pêngava Tirbespiyê, hem hejmara YPG-YPJ'ê, hem hejmara Asayîşê gelekî zêde bû. Di heman demê de şêxên eşîrên wan herêman bi me re ketin pêwendiyê. Ji ber ku êdî YPG-YPJ bi nav û deng bû. Serokeşîrên Ereb ên wan deran hatin gel hevalan û gotin "*va em jî dixwazin alîkarî, destek bidin*." Eşîrên weke Şamarî û Şerabî hebûn. Bi wan re pêwendiyeke bi vî rengî hate çêkirin.

Dema ev pêngavên serkeftî pêş diketin, dewleta Sûriyê jî êdî dikete nava tirsekê. Me dewlet raste rast nedabû hemberî xwe. Lewra riya me *xeta sêyemîn* bû ku eger êrîş ji aliyekî neyê, em jî êrîş nakin; yên ku êrîş bikin jî heya dawiyê em ê li ber xwe bidin. Tevî vê jî dewlet di nava tirsekê de bû. Lewra hem bi dehan salan mêtingeriyek li Rojava meşandibû û hem jî tu caran ber bi mafê gelê Kurd nehatibû, nedihat.

Li hemberî serkeftinên me yên li dijî çeteyan, hêzên weke PDK'ê û ENKS antîpropagandaya me di TV û çapemeniyê de dikirin, digotin: "*Ev çi şer e; şerê Ereb û Kurdan e.*" Dixwestin êrîşên çeteyan li hemberî me bi kar bînin. Dîsa digotin: "*Ev li gel rêjimê tevdigerin, li gel dewletê ne*." Tiştekî wîsa tune bû, em ne bi rêjîmê re û ne jî bi dewletê re ne. Ji bo parastina gelê Kurd, ji bo parastina axa xwe û hêzêke xurt ku di Rojavayê Kurdistan de ava bikin, hewldan nîşan didin. Yên ku di pişt deriyan de hevdîtinên tarî û bêyom dikirin jî ew bi xwe bûn…

**11-Pengava Navbera Hesekê û Til Temir**

Piştî wê me bîryara pêngava xeta Hesekê girt. Ji bo vê pêngavê jî keşif, amadekarî û plansazî hatin kirin. Berê jî hinek agahî hebûn ka rewşa rejîmê û hêzên din li wê derê çawa ye. Lê pêwîst bû em dîsa keşif bikin. Li ser wî esasî weke sê baskan divê pêngav pêş biketana. Divê me dijmin ji wê xeta Hesekê û gundê Tûwêna derxista. Ji destpêka Hesekê heta Til Temir hemû di destê Cebhet El Nusra de bû û her tim li pey komplo û êrîşan bûn. Divê baskek ji Tûwêna biketa tevgerê. Tûwêna gundekî mezin e, mirov dikare bêje bajarokek e û li ser cadê ye. Dema mirov ji Hesekê diçe Til Temir, li ser destê çepê dikeve. Jixwe tu çawa ji Hesekê derdikevê hema gund destpê dike.

Baskek jî ji qada bi navê 'Cihê Wezîr' ku cihê berê yê bêhnvedana wezîrê rejîmê bû û nêzî Hesekê ye wisa diçe ber bi Medcenê ango cihê mirîşka ve ji xwe re bike armanc. Ew der jî di destê çeteyan de bû. Baskek jî ji milê rastê ve li pişt golê, yanî li pişta sedê ango barajê bizivre were gundê Xerîta bigire. Ji bo ku li pişt bizivire weke teqtîk bi vî rengî hate plankirin.

Li ser vî esasî weke sê cebheyan me plan kir. Cebheya herî dûr, dema cihê wezîr û li pişt sedê dizivire, heta milê ser cadeya di navbera Hesekê û Til Temir de bû. Bi vî rengî hate plan kirin. Bask diyar bûn û cebhe jî hatin diyarkirin. Cebheyek hevalê Dewrim li ser bû ya din hevalê Cesûr û hevala Eylûl bûn Cebheyek jî hevalê Têkoşêr û hevalê Memo li ser bûn.

Bi vî rengî heval bi şev ketin tevgerê. Dîsa teqtîka qutkirina dijmin esas hate girtin. Xeta jor ya navîn ku ji xeta Medcenê diçe heta cihê wezîr, ew heval ketin tevgerê û çûn. Beşê Medcenê destpêke lê zîvirîn, qut kirin û xetekê danîn. Parastinek danîn û parçe parçe heval pê ve çûn. Beriya bigihîjin cihê wezîr, ew bask ketin pevçûneke dijwar. Hevalan ji 2-3 milan ve lê dan. Ew grûba çeteyan li wê derê îmha kirin. Beşek ji wan revîn u çûn cihê wezîr.

Dîsa baskê me yê milê rastê li pişt zîvirîn, ji bo xwe nêzî mefreq ango duriyana gundê Xerîta bike. Ev gund li ser cadeya navbera Til Temir û Hesekê de ye. Ev baskê Tûwêna jî me hişt da ku malên destpêkê bigire. Heval vedizîn û malên destpêkê girtin. Jixwe çeteyan ferq kiribû û qedemeyeke xwe şûn de kişandibûn. Hevalan li wê derê weke çeperekê çêkir. Me ew bask hinekê da sekinandin. Hetanî baskên din pêş de biçin. Ji ber ku ew bask pêş de biçe hineke dibe singesing. Me got bila ew bask zêde tevnegere.

Di wê pevçûna giran de, di Medcenê de dijmin hinekê li ber xwe da. Hevalê Memo li wê derê şehîd bû. Hevalê Memo di dema hemlê de jî her li pêş bû, wek pêşengekî wek lehengekî, rola wî gelek girîng bû. Di wî şerî de yê ku herî çalak rol dilîst, pêş de diçû, destpêkê hedafa xwe digirt, yek jî hevalê Memo bû. Hevalek bi lehengî, bi zîrektiya xwe tê naskirin e.

Dîsa ew baskê me yê Xerîta, li pêşiya gund rastî grûbeke çete hat. Heval li wê derê dikevin pevçûnê. Hevalê Cesûr ew li çeteyan didin û grûbek çete îmha dikin. Di gulebarana çeteyekî de hevalê Cesûr jî şehîd dibe. Di şerê me de hevalê Cesûr timî li pêş bû. Timî di pêş de tevdigerî. Bi lez û çalakbûna xwe dihate naskirin. Di her pêngava me de hevalê Cesûr hebû. Tevî ku baskekî dijmin îmha dike, baskê dijmin ê din nabîne; dema gulebaranek tê kirin, ew heval şehîd dibe.

Heval axifîn û gotin, "*heval şehîd ketiye.*" Me got, "*çi dibe bila bibe divê ew gundê Xerîta bê girtin.*" Hevalan xwe li gor wê derê plan kirin. Ji xwe baskê êrîşê amade bû. Êrîş kirin, bi qasî du seatan pevçûn dirêj bû û Xerîta Mefraq girtin. Cihê hevalê Memo şehîd bûyî, ew heval pêş de çûn, li pêşiya wan cihê wezîr hebû. Cihekî mezin e, wekî bexçeyekî, hewşekî mezin e. Di nav de gelek xanî hene. Çetê jî li wir bi cih bûne. Hevalan li grûbên wan ên destpêkê dan û li wê derê îmha kirin. Gelek çete li wê derê hatin kuştin. Lê li wê derê grûbek di cihê wezîr de ma, paşî ew jî reviyan. Bi vî rengî cihê wezîr û sed kete dest.

Dema ew der ket, hevalên Tûwêna ketin tevgerê. Baskekî me ji milê cihê wezîr ve, ji ber ku cade ye, bi 3 panzêran xwe berdan jêrê, aliyê Tûwêna. Baskek jî ji hêla Til Temir ve ji cihê wezîr diçe Tuwêna da ku ew çeteyên di Tûwêna de îmha bike. Baskekî din jî ji milê Hesekê ve hat. Gundê Tûwêna mezin bû, nêzî 150-200 malî bû, hevalan êrîş kir. Li wê derê pevçûn çêbû, hevalan çend mal girtin û hinek ji wan hatin kuştîn. Li wê derê 11 cenaze ketin destê hevalan. Hinek çek, alavên leşkerî û çend erebe jî ketin dest. Ew xeta Tûwêna hemû paqij bû. Li wir ava Xabur heye, dijmin av qut kir û berê xwe da rexê Çiyayê Kizwana ku jê re Çiyayê Abdulezîz jî tê gotin û reviyan. Mirov dikare bêje ji Hesekê hetanî cihê Wezîr, ew cade hemû paqij bû.

Di pêş de 10 km nêzî cihê Wezîr, Mefraqa Xerîta heye. Jixwe heval lê zîvirîn, vedizîn û ew der girtin. Dema hevalan girtin, dijmin şoq bû. Pişta wî şikest. Lewra pişta wî hatibû girtin. Wekî pêngavekê, baskekî mezin ji hêza me hema hema mirov dikare bêje nêzî sed erebe ket wê cadê û bi şiklê parastin, berê xwe dan Xerîta. Li wê derê em gihiştin baskê hevalên din. Jixwe li wê derê çeperek hatibû çêkirin. Hedefa me ew bû; em ji Xerîta hetanî Til Temir, çep û rast derdorê cade hemû gundan ji çeteyan paqij bikin. Ji ber ku çete li wir, li gundên Asûriyan, xwe bi cih kiribûn.

Li wê derê bi şiklekî giran nêzî 3 seatan pevçûnek çêbû. Hevalan li wan hemûyan dan wisa dan ber xwe û paqij kirin. Ji milê Til Temir jî baskek hat. Navbera Til Temir û Hesekê hetanî Xerîta jixwe hevalan girtibû, wê demê ew

der jî hemû hevalan paqij kirin. Bi giştî kontrol ket destê hevalan û lêgerek çêkirin, ka tiştek heye yan tune. Hejmareke mezin mayin hatin dîtin. Bi vî rengî çeteyan berê xwe dan Çiyayê Kizwana û bi wê xetê ve reviyan.

Heya Til Temir dijmin hate paqijkirin. Ew qonvoy bi sed erebeyî derbasî nava Til Temir bûn. Demeke dirêj bû di navbera Til Temir û Hesekê de çûn û hatin tune bû. Til Temir di destê me de bû feqet, çeteyan nedihişt gelê me ji Til Temir were Hesekê. Dema dihat jî gelek zordarî dikirin. Ji Hesekê li ser Til Temir weke dorpêçekê hatibû çêkirin. Dema ew rêk hate paqij kirin gelê Til Temir gelekî kêfxweş bû. Bi rasti jî wisa ew hêza YPG bi sed erebeyên xwe û doçqayên xwe dema derbasî nava bajêr bûn, pêşwaziyeke xurt a gel çêbû; gel hemû rabû ser piyan, li kêleka cadê ew konvoy, maşîne û hevalên YPG-YPJ'ê dîtin û bi coşeke mezin pêşwazî kirin. Tilîlî û lîlanên dayikan digihiştin ezmanan, dayikan birinc diavêtin ser hevalan; bawer im kevneşopiyeke Kurdan e, tê wateya başî û xêrê.

Li gel rêveberiya Til Temir û rêveberiya pêngavê, li ser çeperan nîqaşek pêş ket. Kurtecivînek, nîqaşek hate çêkirin ku kîjan heval, yan jî kîjan hêz dê ku derê bigire. Ew mewziyên li ser cadê di ber çavan re hate derbas kirin. Çepereke xurt hate çêkirin. Ew rêkên di navbera Til Temir û Hesekê de hatin vekirin. Cihê berê yê îstireheta wezîr û bendav, ketin destê me. Ew bendav, yên komkirin avê û li ser erdan belavkirinê ne û ji bo çandiniyê bû. Lewra li wan deran erd zêde bi xêr û bêr e.

Li vê derê teqtîk û tarzê me ev bû; lezgînî û lê zivirandin. Di vê pêngavê de bi giştî du hevalên me şehîd ketin, hevalê Memo û hevalê Cesûr. Ev heval bi lehengî şehîd ketin. Ew heval pêşengên van pêngavan bûn. Di van pêngavan de timî serkêşî dikirin û timî di eniyên pêş de di şer de bûn. Hêzên YPG'ê bi van hevalan ve gelekî hatibûn girêdan. Dema şehadeta wan hevalan bihîstin, gelekî pê bandor bûn. Lê ji bo tolhildana wan hevalan, pêngav bi serkeftî derbas bû. Dema pêngav bi ser ket, miletê Hesekê û bi giştî miletê Til Temirê, hemû Kurdan ev serkeftin bi coş û şahiyeke mezin pêşwazî kirin. Bi van pêngavan YPG hîn mezin bû û bilind bû. Pêngava Hesekê bi vî rengî çêbû, bi serkeftinê encam bû.

**12-Pêngava Til Berak û Til Hemîs**

***Ber bi dawiya sala 2013`an cara yekemîn pêngaveke we li ser bajarokên Til Berak û Til Hemîs çêbû. Di nava Şoreşa Rojavayê Kurdistanê de ev pêngav, cihekî xwe yê girîng û bi êş heye. Di vê pêngav an ku operasyona we de çi çêbû, çima ewqas windahî hatine jiyan kirin û bandora vê çawa çêbû? Piştî wê hûn çawa tevgeriyan?***

**ÇIYA KOBANÊ:** Belê, piştî van pêşveçûnên ku me anîn ziman, êdî li pêşiya me Til Hemîs û Til Berak hebû. Gerek li ser van cihan pêngav bihata pêş xistin. Karê me disa bi keşfê destpê kir. Til Hemîs wê demê navendeke Cebhet El Nusra bû, piştre kete destê DAIŞ`ê de. Bajarok cihekî stratejîk û navendî ye. Çeteyan ji vir dikarîbûn êrîşê xeta Til Koçer, Tirbespiyê û cebheya Qamişlo bikin. Piraniya xwe ji eşira Ereb a Şerabî ne. Gundên derdorê jî Şamarî ne. Têkiliyên me bi Şamariyan re hene û xurt in.

Berê li Til Hemîs Kurd hebûne lê di dema rejîmê de derxistine û Ereb li şûna wan bi cih kirine. Til Berak jî bi vî rengî ye. Li derdora Til Berak gundên Kurdan gelek in. Riya ku ji Qamişlo tê, di wê derê re derbasî Hesekê dibe. Til Hemîs hinekî ji Til Berak mezintir e.

Ji bo pêngava li ser van bajarokan rêveberiya YPG'ê kom bû û nîqaş pêş xist. Pêngavên ku heta wê demê hatine kirin hemû jî serkeftî bûn û ji bo serkeftina vê operasyonê jî bîryardarî hate nîşan dan. Plansaziyên berfireh çêbûn. Hinek hevalan digot, *"em pêngavên li ser Til Hemîs û Til Berak bi hev re bikin."* Lê hinek hevalan jî digot em yek bi yek bigrin dest. Di dawiyê de bîryar derket ku em her du bajarokan bi hev re bigirin. Li ser wî esasî ketina tevgerê çêbû. Ji milê lojîstîk, cebilxane, teknîk û hwd ve amadekarî çêbûn.

Dijmin çûnûhatina Til Hemîs qedexe kiribû û bajar jî bi piranî vala kiribû. Wek navendeke şer û êrîşan dida bi kar anîn. Lewra jî ji wir agahîgirtin hindekî zehmet bû. Çeteyan hindekî agahî bi zanîn û plan belav dikirin. Digotin, hejmareke zehf mezin tê de heye, her der mayin kirine, gelek xendek kolane û hwd… Helbet armanc ji belavkirina van agahiyan xapandin bû.

Di şert û mercên wisa de em ketin tevgerê. Baskek ji Til Koçer dê derdikeve û biçe Cezaa, piştre divê were Mefreq Qesam bigire. Baskek ji Sawamayê Til Alo û xeta gundê Heddadê dê raste rast biçe Til Hemîs. Baskek jî ji milê gundê Til Marûf ve wê bikeve tevgerê, heta Ebû Qesayib were û xeta Ebû Qesayib bigire. Baskek jî wê ji Sawamayê Gebeka derbasî milê Til Berak bibe. Baskek jî ji milê Hesekê ve were. Plansazî bi vî rengî bû.

Bi vî awayî hêz ket nava tevgerê. Baskê milê Til Koçer ket tevgerê û hat Cezaa girt. Dîsa baskek jî ji milê Hedadê ve ket tevgerê û çû Mefraq Ebax sekinî. Grûbeke çeteyan li wê derê hebû, hevalan lê da û îmha kirin. girtin. Destpêkê Mefraq Ebax û gundê Ebû Xedîr girtin. Baskê milê Til Marûf jî, qedemeyekê pêş de çû û milê

Qerêsa wan xetan girtin. Şeva destpêkê baskên me bi vî rengî tevger kirin. Dîsa baskê Til Berak di şeva destpêkê de raste rast derbas bû û bi lezgînî kete hundurê Til Berak.

Dema heval ketin Til Berak pevçûnên dijwar qewimîn. Hevalan hinek ji çeteyan kuştin û Til Berak hildan kontrolê. Piştî wê divê hêza Til Berak bi heta pişta Til Hemîs dewam bikira. Dema Til Berak hate girtin, bi vî rengî hevalan dewam kir. Li ser vê xetê benzînxaneyek heye ku dijmin tê de çeper danîbû. Dema hevalan lê da dijmin li wê derê hinekî li ber xwe da. Hevalan bi teknîkê lê dan û ew çeper îmha kirin, benzînxane girtin. Dema mirov ji wir derdikeve, rêkek bi milê Til Hemîs ve diçe, rêkek jî bi Holê ve diçe. Hevalan berê xwe dan wir lê ji ber ku arazî berfireh e hêza heyî tê rê nedikir. Hinekî bi wî milî de pêş de çûn lê nikarîbûn xwe bigihînin pişt Til Hemîs yanî cihê ku hedef hatibû nîşan dan.

Baskê milê Til Marûfê jî qedemekyekê pêş ve hatin. Milê Ebû Qasayîb hate girtin. Baskê Til Koçer jî piştî Cezaa dewam kir û hate gundê Qurtuba girt. Li wê derê jî pevçûneke dijwar çêbû. Li wê derê 3 heval şehîd ketin. Heval neçar bûn ku li wê derê bisekinîn û xetekê çêkin. Ji ber ku qadeke fireh e jî, tu nikarî ragihandineke xurt di navbera hêzan de çêbikî.

Baskê xeta petrolê jî dewam kir û pêş de hat. Ji Mefraq Atax pêş ve çû û li milê Hasewiyê pevçûneke giran çêbû. Bask bi giştî nêzî hev bûn. Bi taybet jî baskê xeta petrolê, nêzî Til Hemîs bû. Baskê ku ji milê Til Marûf û xeta Qamişlo dihat jî nêz bû û gihîşte Milkêf. Milkêf, li ser cadeya ku ji Qamişlo diçe Til Hemîs e. Li hemû cebheyan bi şiklekî giran pevçûn çêbûn.

Heta wê demê xweş diçû, baş diçû. Feqet baskê me yê Til Koçer ku ketibû tevgerê û gihişte Qurtuba zêde nikarîbû pêş de biçûya. Lewra riyeke zehf dirêj e. Ya din jî pir zêde pevçûn çêbûn. Teknîka ku heyî têrê nake. Heval neçar bûn ku li milê Qurtuba xetekê çêkin û di wê derê de pevçûnan dewam kirin. Dîsa baskê şehîd Argeş li wê derê diçin 2-3 gundan digirin. Piştre diçin li wê derê çeperê xwe çêdikin. Yanî ji xeta Hedadê heta wê derê, hevalan nêzî 25-30 gund girtiye û êdî çeper danîne.

Dema çeper çêdikin dijmin vedize û êrîşê ser hacizekî kêleka hevalê Argeş wan dike. Pevçûneke giran çêdibe. Li wê derê bi rastî şerekî pir giran çêbû. Dijmin û heval ketin nava hev. Hevalê Argeş bi hêzekê dest werdide. Li wê derê bi dehan çete têne kuştin, lêbelê tevî hevalê Argeş 8 heval şehîd dikevin. Hevalê Argeş hetanî şehîd jî ket, di nav şerekî giran de bû. Hevalan mûdaxaleyî wir jî kirin lê neçar man xetekê çêkin. Yanî ji hemû milan ve pevçûn zêde bûn.

Hevalên milê Milkêf dewam kirin û êdî ji wir Til Hemîs xuya dike. Baskê li ser cadeya ku ji Qamişlo tê, 2 km mabû ku bigihêje Til Hemîs. Baskê ku ji milê Til Berak hat, li gundê Huseyniyê ma. Gundê Huseyniyê, gundekî piçekî belave ye. Plansazî çêbû ku heval biçin û êrîşê gund bikin. Şeva yekê hevalan xwestin êrîş bikin, yekser çênebû, şeva duyem hevalan êrîş kirin. Şeveke gelek tarî bû. Panzerên me di şeva tarî de zêde pêşiya xwe nabînin û erd jî hinekî şil bû. Heval pêş ketin. Li pêşiya Huseyniyê mayin hebûn, 1-2 mayin teqiyan, zêde tiştek çênebû.

**Di şeva tarî de lehengî, şahadetên giran û tolhildan...**

Di wê kêliyê de kordîne got, “*bila heval bisekinin.*” Dema heval ji bo mayinan sekinîn, li wê derê panzêreke me rêka xwe şaş dike. Tarî ye, berê xwe dide gundê Husêyniyê û dikeve nava çeteyan. Di wê panzêrê de 8 heval hebûn û pevçûnan dest pê kir. Bi ser de jî pirsgirêkên pêwendiya bi rêka cîhazan derket. Ya rast ew kom neketiba nava gund de, rewş bi giştî baş bû. Yanî di hemû milan de pêşketin hebû. Dibe ku pevçûn xurt bûn, lê hevalan nîqaş kir û gotin, “*em ê bikarin bi şêwazekî din berdewam bikin.*”

Jixwe çeteyan jî agahî rê kiribûn û gotibûn ku “*em dixwazin agirbest bikin.*” Heta vê derê rewş baş bû. Lê dema ew grûba me bi xeletî kete nava dijmin û şûn de êdî li pey hev destpê kir! Heval neçar bûn ku biçin wan hevalan xilas bikin û grûb ketin tevgerê. Grûbek çû, ew jî ketin pevçûnê. Dijmin jî hêza xwe ji milê Til Hemîs ve teqwiye kir. Wê demê DAIŞ jî nû hatibû herêmê û çend ketîbeyên wan li Til Hemîs hebûn. Wan jî mudaxale kirin û pevçûn giran bûn. Ji bo ku wan hevalan xelas bikin, hemû heval bi fedayiyane çûne wî gundî. Bi vî rengî jî pevçûn ji kontrolê derketin.

Li wê derê hevalê Devrim wan heta dawiyê şer dikin. Di wî şerî de nêzî 100 çete hatin kuştin. Lê ji ber ku pişta wan vala bû dijmin teqwiye kir. Gelek hevalên me li wê derê şehîd bûn, nêzî 40 hevalî şehîd ket. Ew gelekî bi êş bû. Ez dema tînim ser ziman gelek zehmetî dikişînim.

**FOTO: DEVRİM-ORHAN YAKUT – FOTOĞRAFI KULLANILACAK**

Dîsa hevalê Cîlo jî bi tabûrê ve hat, ji bo wan hevalan xelas bike. Heval Cîlo jî bi hevalên gel xwe re li wê derê şehîd bû. Gelek hevalên leheng di wê şeva tarî de, li wê derê hetanî dawî şer kirin û şehîd bûn. Di gund de hema

bêje cihê ku bombe, guleyên B-7’ê û çek lêneketin neman. Ew hevalên ku her yek ji wan destanek bû, bi vî rengî li wê derê şehîd ketin. Vê li ser pêngava me ewrekî tarî çêkir, bandoreke giran çêkir û hişt ku em pêngavê bisekinînin.

Dîsa di heman şevê de dijmin êrîşê cihekî di navbera benzînxaneyê, Til Hemîs û Til Berak de kir. Li wir jî gelek hevalên me şehîd ketin. Derdorê 30 hevalî şehîd bûn. Me di vê pêngavê de bêplaniyek û xeletiyek mezin jiyan kir. Berdêlê wê pir giran bû! Helbet hemû şehadet jî bi berxwedaneke lehengî çêbûn. Hevalên ku li ser riya Til Hemîs û Til Berak şehîd ketibûn, hêza Qamişlo bûn. Vê berdêlê bandoreke mezin hem li ser gel, hem li ser hêza me çêkir.

Li wê derê nîqaşek pêş ket ku em hêza xwe bikişînin. Ji ber ku pêngav berovajî zivirî. Her yekî ji me pêwîste rexne bide. Bêguman rexnedan têrê nake! Pêwîst e li ser kûr û kûr bihizire, encaman derxîne û bi vê yekê jiyanê ji nû de biafirîne. Bi vî awayî em dikarin bibin bersiv ji wan lehengan re…

Bîryar hate girtin ku em hêza xwe bi şûn de bikişînin. Bi vî rengî em hatin xeta xwe ya berê, yanî cihên ku me di pêngavên beriya vê de girtibûn. Pêngava Til Hemîs û Til Berak, gelek bi êş bû. Dema mirov diaxife, bi rastî nikare îfade bike. Me çawa destpêkê parçe parçe pêngav kirin û me hemû bi ser xistin; divê dîsa me li vê derê jî parçe parçe Til Berak bigirta, me xeta xwe çêbikira, xwe asê bikira. Piştre jî me Til Hemîs bigirta. Yan jî me Til Hemîs bigirta, xeta xwe çêkira. Piştre em biçûna me Til Berak bigirta. Dema ku hêz belav bû, teknîk jî belav bû, nîtelîk jî belav bû û vê yekê bi xwe re bêplanî pêş xist. Ez bawer dikim wek hejmara herî dawî, di wê pêngavê hemûyê de, nêzî 80 heval şehîd ket. Ev ji bo me gelek giran bû.

Di şerê deştê de pêwîst e grûb ji hev qut nebin û li ser araziyê hakimiyetek hebe. Ji ber ku qad gelek fireh bû, hakimiyet lawaz bû. Ev şaşitî bû, ji hêla din qordîne li ser hemû baskan, li ser hemû cebheyan zêde hakîm nebû, nikarîbû hakîmiyetek çêbikira; di danûstandina agahiyan de, di pêwendiyê de pirsgirêk derdiketin. Ji milê bi cîhazê pêwendî çêkirinê de lawazî hatin jiyîn. Ji ber ku nikarîbû bi hemû baskan re pêwendî çêbike.

Ji bo wextê pêngavê jî şaşitî hebû. Zivistan bû, baran dibariya û şilî bû. Maşîneyan nikaribûn di deştê de bi her derê ve tevbigerin. Ya din jî mijeke giran hebû û herêma dijmin bû, dijmin tê de hakîm bû. Ev hemû nehatin hesibandin. Di şer de ev şaşitiyê giran in û dibe sedema ku tu berdêlên giran bidî. Di nava vî şerî de gelek hevalên leheng şehîd ketin. Bê dudilî çûn ser dijmin û gundê Husêyniyê bû cihê lehengan.

Piştî pêngava Ti Hemîs, bi rastî jî li ser hevalan bandorek çebû, li ser gel jî bandorek çêbû. Lewra jî civînên berfireh hatin çêkirin. Bi hemû hêzên ku beşdarî pêngavê bûne re civîn hatin li darxistin. Ev pêngav hate nirxandin. Kêmasî û xeletiyên ku di pêngavê de derketin, ji milê teqtîk û şêwazê ve hatin nîqaş kirin, encam hatin derxistin. Ji bo gel jî civîn hatin çêkirin. Li ser vî esasî kombûneke diyar çêbû.

Ji hêla din ve, ji bo çalakiya tolhildanê nîqaş pêş ketin. Bi berfirehî nîqaş çebûn ku em li ku derê û çawa çalakiyê li dar bixin. Ji bo hedefê gelek nîqaş çêbûn ku kîjan hedef destdayî ye. Di encamê de du cih hatin diyar kirin; ji van yek Cezaa ku wê demê grûbên çete tê de bûn, ya din jî Til Berak bû. Di paşvekişînê de çeteyan bajarokê Cezaa ji Şamariyan girtibûn. Çalakiya tolhildanê jî li ser esasê ku em wendahiyan nedin, diviyabû bihata lidarxistin. Divê çalakî serkeftî be, bilez tevger çêbe û hedef jî bi vî rengî bê girtin.

Li ser wî esasî bîryar hate girtin ku yekem ji bo Cezaa, ya duyemîn jî li ser Til Berak pêngav were kirin. Li gor vê jî desptêkê li Cezaa çêbe. Cezaa ji Til Koçer 35-40 km dûr e. Grûbeke çeteyan li nava bajarokê Cezaa hebû. Grûbeke çete jî li Mefreqa Cezaa heye ku nêzî sînor e. Plansazî li ser wî esasî hate çêkirin û hêz kete tevgerê.

Eşîra Şamar jî dixwest ku em Cezaa bigrin, ji ber ku cihê wan bû lê ew jê hatibûn derxistin. Lewra wan jî hêzeke leşkerî bi navê `Sanadîd` ji xwe re avakirin. Hejmarekî derdora 150-200 kesî bûn. Ew jî weke du tîman beşdarî hemlê bibin. Wan got, “em jî dixwazin tevlê hemlê bibin.” Herêmê jî baş nas dikin.

Lê beriya ez derbasî hemlê bibim, min berê jî anî ser ziman ku di Til Hemîs de êdî çeteyên DAIŞ’ê jî hebûn. Hejmareke kêm bû. Di wan deman de li milê Şedadê, Dêrezorê, Mergeda û wan xetan, di navbera DAIŞ û Cebhet El Nusra de şerê giran çêbûn. DAIŞ li wê derê bi ser ket. Esas hêzên Cebhet El Nusra li hemberî me darbe xwarin û şikestin. Beşê mayî jî, DAIŞ êrîşê wan kir. Piştî wê êdî DAIŞ hat û kete Til Hemîs û Til Berak jî. Di rastiyê de weke ku dewr kirin, teslîm bûn. Jixwe ferqa wan zêde ji hev tune ye, lewra jî gelek çeteyên El Nusra û Ahrar el Şam tevlê DAIŞ bûn. Êdî herêma Til Hemîs û Til Berak, DAIŞ kete tê de.

Eger em vegerin mijara tolhildanê... Disa, çalakiyê destpê kir. Baskên me ji Sawamaya Til Alo bi şiklekî bilez ketin tevgerê. Bi wê lezê di şeva xwe de, heval raste rast çûn Cezaa. Li Cezaa girê Til Sahan heye, hevalan ew gir girtin. Di koşeyekê de navendeke çeteyan hebû. Li wê derê pevçûnan dest pê kir. Dema heval dikevin hewşê, li ser hevalan direşînin û wisa pevçûn derdikeve. 1-2 heval birîndar bûn. Lê hevalan lê dan û ew grûb di wê derê de îmha kirin. Derdora 6-7 cenaze ketin dest. Hevalan çek, malzeme û doçqayeke 12,5 girtin.

Grûbeke destwerdanê ya çeteyan jî ji milê Til Hemîs hat. Ji Mefraqê û vir ve hevalan li wê derê lê dan, erebeyek û doçqayeke 14,5, li gel wê grûbê îmha kirin. Çendek ji wan revîn û yên din jî hemû îmha bûn. Şer hemû

2 seatan ajot. Bi awayekî bilez hevalan Cezaa girtin. Li ser wî esasî xet çêkirin. Di wê pêngavê de tenê 2 birîndarên me çêbûn. Di wê xeta Til Koçer û Cezaa hemû de çete şikestin. Mesafeya 35-40 km hemû ket destê me.

Ji bo çalakiya tolhildanê ya li ser Til Berak; ew çeteyên ku berê di pêngava Til Hemîs û Til Berakê de destên wan di şahadeta hevalan de heyî, gelek ji wan tevlê DAIŞ'ê bûn. Li ser wan plansaziyeke Til Berak'ê hate çêkirin. Me got divê em bi erebeyan neçin heta wê derê. Bi erebeyan hêzê bibin heta bi cihekî danin û piştî wê jî her bask bi meşê û lezgînî bikeve tevgerê. Wekî du cebhe hate plankirin. Cebheyek ji milê rastê, ya din jî ji milê çepê. Cepheyek rasterast dê biçe girê Til Berak bigire. Lewra girê Til Berak cihekî stratejîk e, cihekî bilind e. Ev der, pişta Til Berak e. Dema pişt were girtin, ew cadeya ku ji milê Til Hemîs û ji milê Holê tê, dikeve bin kontrolê. Ew der nêzî gaziyê ye ku berê, heval lê şehîd ketibûn. Heval dê li ser wê derê, li ser cadeyê hakim bibin. Baskek jî ji milê dibistanê ve dê were û navenda wan ya nava bajarok bigre. Ew hatibû plankirin.

Baskê ji bo gir kete tevgerê û çend gund girtin. Heval lê ziviriyan, di heman şevê de çûn gir girtin. Despêkê me got qey tijî ye, lê ew gir vala derket. Hevalan gir girtin û ji wê derê xwe berdan ser cadê. Baskê bajêr jî di wê derê re ket bajêr û pevçûnê dest pê kir. Hinekî li ber xwe dan, hevalan ew şikênandin û ketin tê de. Şer bi roj berdewam kir û heta bi nîvê bajar ket. Bi vî awayî Til Berak hate girtin.

Di bajêr de heval çûne ser nêzî 50 cenazeyên çeteyan, gelek çete jî dîl girtin. Bi giştî 6 heval şehîd bûn. Ew benzînxaneya ku heval di pêngava Til Hemîsê de şehîd ketibûn, hevalan êrîşê wê derê jî kirin û girtin. Qederek çek û kelûpel hate girtin. Çalakiyeke tolhildanê ya bi lez, wisa bi gelek teqtîkên dewlemend ên cûda hate pêkanîn. Heval li piştê zîvirîn û gir girtin, taxa jêr girtin. Êrîşê taxa jor jî kirin û girtin. Piştî vê çalakiya tolhildanê, moralê hevalan pir bilind bû. Heval bi rihekî bilind, tola wan hevalan rakirin.

Jixwe tê zanîn di wê demê de her 3 Kantonên Rojava hatibûn ragihandin. Piştî wan hamleyan li Kantona Cizîrê warê leşkerî jî di ber çavan re hate derbas kirin. Ji bo parastina cihên ku hatine rizgar kirin, sîstemeke parastinê li ser esasî araziyê hate pêşxistin. Li bajaran jî hêzên xweparastinê yên taxan hatin ava kirin. YPG-YPJ jî di aliyê perwerde, çek, teknîk, tanzîm û çepergirtinê de hate nûkirin. Tanzîma berê di ber çavan re hate derbas kirin. Lewra pêşdîtinên me hebûn ku dê êrîşên çeteyan zêdetir bibin. Ji ber ku şûna El Nusra-Ahrar el Şam êdî DAIŞ girtibû.

***Ji bo heman mijarê yanî vê pêvajoya ku ji bo we giran bû, hûn ê çi bêjin?***

**CEMÎL KOBANÊ:** Bi rastî pêvajoya Til Hemîs û Til Berak ji bo me giran bû. Lewma dijmin ew der ji xwe re kiribûn navend û li ser qadên me her weke cihên êrîşê û xeteriyê bûn. Di destpêka 2014'an de, ango di wê zivistanê de pêngava Til Hemîs û Til Berak jî ket rojevê. Di heman demê de DAIŞ ketibû tevgerê û li gelek cihan hêzên mûxalîf tasfiye dikirin û gelek cih bi dest dixistin. Li hemberî vê divê me bi lezgînî pêngava Til Hemîs û Til Berak pêk anîba. Jixwe beriya wê hevalan Cezaa jî girtibûn, ger ew der jî bihatana girtin, dê tevahî herêmên Rojava bi ewle bibana û li gorî wê planeke parastinê ya berfirehî derketa holê.

Li ser esasê vê pêngavê keşif hatin kirin. Plansaziyên pêwîst û arastebûna hêzan çêbû. Bi vî rengî civîneke berfireh hate lidarxistin. Bîryar hate girtin ku pêngav destpê bike. Li gorî plansaziyê hêza Til Hemîs wê li ser esasê 3 hêzan bimeşiya, Til Berak jî wê di nava xwe de bibûya 2 beş. Ji wan hêzan yek wê ji milê Gebekan ve yek jî ji milê Hesekê ve pêş ve biçûya.

Ji ber ku derfetên zivistanê rê nedidan, ji derveyî rêkên asfalt û yên navendî me nedikarî pêş ve biçin. Tesîrên şert û mercên zivistanê jî pir hatin nîqaşkirin û li gorî wê plansazi hate kirin. Her wiha di van şert û mercan de me yê bikara li ser hêzeke ew qesa belava kordîne çêbikira, ew jî hate nîqaşkirin. Diyar bû wê ji milê kordîneyê ve zehmetî bihatana kişandin. Lê li gorî wê jî tedbîr hatin girtin. Bi vî rengî pêngavê destpê kir.

Em ji milê Gebekan ve hatin, di navbera me û Til Berakê de 30 km hebû û gelek gundên di destê çeteyan de hebûn. Di wê şevê de me hemû paqij kirin û me xwe gihand Til Berakê. Hêza ku ji milê bakur ve were jî bi wî rengî pêşiya xwe paqij kir û xwe gihand Til Berakê. Weke me plan kiriye her du hêz jî bi hev re gihiştin Til Berakê. Di şevekê de me xwe gihand Til Berak û di seat 2'yan de pevçûnên dijwar di nava bajêr de rûdan. Li kêleka bajêr girekî stratejîk hebû, me hêzek jî rêkir da ku wir bigre. Lê ji ber ku qad pir zêde nedihat naskirin, pêş ve çûyina hevalan jî bi zehmetî çêdibû. Ji ber vê yekê hevalan êdî di roniya rojê de ew gir girtin. Em dikarin bêjin, di şevekê de Til Berak bi tevahî paqij bibû.

Di heman şevê de hêzên Til Hemîs jî xwe gihandibûn derdora Til Hemîs. Tenê hêza ku ji milê Til Koçer ve tê, hinekî astengî jiyan kiribûn û li hin cihan ketibûn pevçûnên dijwar. Di nava wê hêzê de şehadet jî hatibûn jiyankirin. Ew hêz negihiştibû cihê xwe. Divê wan xwe bigihanda cihekî ku ji wê derê, ji çeteyan re teqwiye nehata. Dê hêza me jî piştî girtina Til Berak xwe bigihanda pişta Til Hemîs, da ku ew her du hêzên xwe nêzikî Til Hemîs

kirine bikevin bajêr. Di roja duyemîn de, me hêza Til Berak wek 2 beş tanzîm kir. Dê 300 heval li Til Berakê bimaya û parastina wir bikira. 300 hevalên din jî operasyon berdewam bikirana û xwe bigihandana Til Hemîs.

Li gundê Ûmiris û benzînxaneyeke li wê derê şerê dijwar çêbûbûn. Hêza me ya operasyonê di wir de ketibû pevçûnan û li wir hevalê Îsa şehîd ketibû. Lê bi awayekî çalak pêngavê berdewam dikir. Derveyî wê şehadetê, heya wê demê tu pirsgirêk derneketin. Jixwe teqwiyeya hevalan û cebilxane bi awayekî rêkûpêk dihate kirin.

Di roja duyemîn de, di plansaziyê de hin guhertin çêbû. Lewma ew hêza ku ji milê Til Koçer ve were, nikarî xwe bigihîne cihê xwe û di pêngavê de nikarî çalak bibe. Hêzên ku xwe nêzikî Til Hemîs kirine jî ketin pevçûnan. Her wiha dijmin êrîşî cihekî hevalan kir, da ku êrîşan bişkîne. Di wê êrîşî de li gel hevalê Argeş komek heval şehîd ketibûn. Hevalê Argeş di hemû şerên Cizîrê de cihê xwe girtibû û xwedî ezmûnên şer bû.

Ji ber vê yekê, plansazi hate kirin ku hêza Til Berak û ya Qamişlo bigihêjin hevûdin, gundê Huseyniyê bigrin û bikevin sawamayê. Bi vî rengî em ê biketana nava bajarokê Til Hemîs. Beriya gundê Huseyniyê heval gihiştin hevûdin û berê xwe dan wî gundî. Lê dijmin di wî gundî de li ber xwe da. Ji ber rewşa hawayê jî hevalan 2 rojan nikarîn wî gundê Huseyniyê bigrin. Hevalan carekê êrîş kirin lê mij û moran ketibû erdê. Diviyabû heval paş ve bikişiyana. Lê hêzekê bi panzêra xwe ve, di nava wê mijê de rêka xwe winda kiribû û ketibû gund. Jixwe bi ketina wan ya gund re pevçûnan destpê kir.

Dijmin bi awayekî hovane êrîşî panzêra hevalan ku ketiye nava gund kiribû. Ji bo rizgarkirina wan hevalên ku ketine nava dijmin jî, gelek hewldanên hevalan çêbûbûn. Dema ku hevalan dîtibûn ku hinek heval di nava dijmin de mane, êdî her hêzekê li gorî înisîyatîfa xwe ji milê xwe ve mûdaxale kiribû, da ku wan hevalan rizgar bikin. Hinek hevalan xwe gihandibûn gund û heya nîvê gund jî çûbûn. Lê 8 heval di wê panzêra ku ketiye nava gund de şehîd ketibûn.

Bi vî rengî heya sibê pevçûnan jî berdewam kir. Ji ber ku deşt bû û dijmin di gund de xwe baş bi cih kiribû, kîjan hêza me bi pêş ve diçû, birîndarî û şahadet çêdibûn. Hevalê Devrîm, hevalê Tolhildan, hevalê Cîlo û gelek hevalên din li wir şehîd ketin. Roja dîtir jî pevçûnan berdewam kir.

Dijmin ew yek fersend dît û êrîşî milên din jî kirin. Sibeha wê rojê, li ser Til Berak jî êrîşan destpê kir. Dijmin bi awayekî veşartî ketibû nava Til Berakê û li wir jî pevçûn çêbûn. Ji Hesekê heya Til Berakê 30 km, ji Til Berakê heya Til Hemîs jî 30 km bû. Bi hêzeke kêm hevalan ew der hemû diparastin û li piraniya wan cihan jî pevçûn hebûn. Bi teqwiyeya hevalan û xwe rêxistinkirinê, êrîşên li ser Til Berak hatin şikenandin. Wan hêzên êrîş dikirin darbe xwarin. Gaziyek di navbera Til Hemîs, Til Berak û Holê de hebû. Li wir hêzeke ji hevalên Qamişlo hebû. Dijmin navbera Til Berak û wî cihî qut kir. Divê her hêzekê li gorî hêza xwe parastina cihê xwe bikira.

Li Til Berak ji sibehê heya êvarê pevçûnan berdewam kir. Lê di encamê de dijmin hat şikandin û bi êrîşan hevalan dijmin dûrî Til Berakê xistin. Di êrîşên dawî yên Til Berakê de 5 heval şehîd ketin. Li wir gelek cenazeyên çeteyan û cebilxaneya wan jî ket destê me. Tenê ji wan hevalên ku li gaziyê mane û ji Til Berakê hatine qutkirin, xeber nedihate girtin. Êvarê 2 heval ji wir hatibûn û agahiya wir dane me. 30 heval li wir hebû. Ji wir 2 hevalan xwe gihandibûn me, 5 heval dîl ketibûn û rewşe yên din jî nediyar bû.

Êvarê careke dîtir êrîşên dijmin li ser Til Berak çêbûn. Bi rastî jî rewş gihiştibû asteke wisa ku qet ne baş bû. Bi ew qesa hêz me pêngav lidarxistibû û ew qesa serkeftin çêkiribûn. Lê plansaziyên xwe yekser pêkneanîn, derfet dida dijmin ku êrîşên xwe jî bidomînin. Gelek şehadet di wê pêngavê de hatin jiyankirin. Ji ber ku li ser moralê hevalan jî tesîra vê çêbû, bîryar hate girtin ku pêngav bê sekinandin. Herî kêm me dikarî em Til Berakê bernedin. Lê bi giştî nêrîn ew bû ku em Til Berakê jî berdin.

Gelek sedemên vê rewşa nebaş hebûn. Ya yekemîn rewşa zivistanê baş nehatibû hesabkirin. Ya duyemîn, lezgîniya pêwîst çênebûbû û derengmayîna hin hêzan çêbûbû. Divê di 4-5 rojan de pêngav bi encam bûbûya. Lê ji hefteyekî zêdetir ajot. Dema ku wisa di pêngavê de tengavbûyin çêbû, dijmin înisîyatîf girt û êrîş kir. Divê me bi wê pêngavê fînal çêbikira, lê di wir de derbe çêbû. Pirsgirêka esasî jî kordîne kirin û ji hevûdin agahîgirtina hêzan bû. Ji ber ku kordîneya giştî jî nikarî kêlî bi kêlî agahî bigre, rewşê bişopîne û perspektîf bide, tengavbûyinek çêbû û pêngav bi ser neket.

Foto: Viyan Amed-Til Berak – fotoğrafı kullanılacak

Ji ber van şahadet û paşvekişînê, li ser moralê hevalan pir bandor kir. Di nava gel de jî tesîreke neyînî çêbû. Sedema yekemîn ya serneketinê me weke bêkordînetî bi nav kir. Sedema duyemîn jî nasnekirina araziyê hebû. Sedema seyemîn jî şert û mercên zivistanê bûn. Piştî vê derbeyê, me xwe dîsa kişand xetên xwe yên berê. Bi nîqaş û civînan me xwest em encama ku derketiye, binirxînin. Divê me kêmasî û şaşitiyên xwe tespît bikirana û ji van tiştên ku hatine jiyîn gelek ders derbixistana, da ku em li ser wê esasê derbasî asteke nû bibûna.

Ji milê rêxistinbûnê ve pêngavekê pêwîst dikir. Hevalên bîryargehê hatin û bi hemû hevalên rêvebir û fermandariyê re nîqaş meşandin. Di encamê de bîryarbûnek derket holê. Divê me dev ji tu cihan berneda, dijberî wê divê em biçûna ser dijmin. Li ser vê esasê amadekariya pêngaveke tolhildanê çêbû. Îcar me Til Berak xist hedefa xwe. Da ku em wê derê bikin navendeke tolhildana şehîdên Til Berak û Til Hemîsê. Bîryarbûna hemû rêveberî û şervanên YPG ew bû. Li ser wê esasê pêngavaTil Berakê hate plankirin. Piştî 2 mehan amadekariyên pêngavê xilas bûn. Naskirineke araziyê jî çêbûbû. Her wiha naskirina gelê wê derê çêbûbû.

Pêngav li ser esasê 3 hêzan pêş ket. Divê hêzek bi awayekî veşartî biçûya û hin cih bigirtana. Heya ku wan ew cih têkûz kirine, dê hêza lêdanê jî bigihişta wan. Bi giştî 400-500 heval tevlî pêngavê bûn. Hêzek wê bi awayekî veşartî ew girê stratejîk yê Til Berakê bigirta, 2 hêzan jî pêşiya xwe paqij bikirana. Di plansazi û pêkanîna pêngavê de hejmareke zêde ya fermandarên YPG jî hebû. Şeva ewil dê hêza yekemîn heya cihekî bi maşîneyan biçûna û mesafeyeke dirêj jî meşiyaba û bi awayekî veşartî biketana wî girî. Piştî ku wê hêzê gir girt, dê hêzên din jî bi çekên giran pêş ve bihatana.

Dema ku wê hêzê gir girt, hevalên din jî ketin tevgerê û navendek di nava bajêr de girtin. Piştî wê heya sibê pevçûnên pir dijwar çêbûn. Pêngaveke tolhildanê bû. Armanca me ne tenê girtina bajêr bû. Divê hemû hêzên dijmin ku di wê derê de hene, bihatana tasfiyekirin û ji hevkarên wan jî hesab bihata xwestin. Cara berê dema ku me Til Berak girt, me ji kesên ku li wir dimînin re pir alîkarî kir û me nehilişt zirar bigihije wan. Me hemû pêdiviyên wan yên civakî pêk anîn. Lê hinekên wan îxanet kirin û hevkariya dijmin kirin.

Li ser esasê hesab pirsîn û tolhildanê me Til Berak dorpêç kiribû û me dixwest em wê hêza di wir de heye bipelçiqînin. Hevalan her du rêkên ku ji Hesekê tên û rêka ku ji Til Hemîs tê jî girtibûn ku çete nikaribin birevin. Lê hinekên wan di araziyê re reviyan. Hinekên wan jî ketin nava kemîna hevalan û piraniya wan hate kuştin. Hinek ketin gundekî, pişt re di wî gundî de jî gelek hatin kuştin.

Di encamê de me Til Berak girt. Hejmareke zêde ya çetayan li wir hate kuştin. Me dest danî ser hemû amûr û cebilxaneyên wan. Em hefteyekî di Til Berakê de man. Ji ber ku weke pêngaveke tolhildanê bû, me tola hevalan girt û me dîsa dev ji Til Berakê berda. Di pêngavê de heya wî cihê gaziyê û cihên dîtir yên ku heval şehîd ketine, em çûn û bîranîna wan hevalan çêbû. Dema ku em li wê derê bûn, car caran dixwestin tacîz bikin û êrîş bikin, lê her derbe dixwarin. Dema ku pêngav bi ser ket, em bi bîryara xwe pişt re zîvirîn û derbasî qadên xwe bûn.

Piştî pêngava tolhildanê em derbasî asteke nû ya şer dibûn. Li hemberî El Nusra, Ahrar el Şam û hin çeteyên ku di bin navê Artêşa Azad de xwe rêxistin dikin, şerê fînalê bû. Ji destpêka 2014'an ve, êdî DAIŞ li herêmê çalak dibû. Ji Reqa heya Helebê, gelek cih bi dest xistibûn. Piraniya Bakurê Helebê; Cerablus, Bab, Minbic û Ezaz jî xistibû destê xwe. Ew hêzên dîtir hinek kuştin, hinek jî radestî DAIŞ'ê bûn. Yên mayî jî bi DAIŞ'ê re di nava şerekî dijwar de bûn.

Ji bo me jî qonaxeke nû destpê dikir. Heya wê demê her çiqasa li hemberî me bin ketibin jî, hêza herî xurt Ahrar El Şam û El Nusra bû. Êrîşên DAIŞ'ê yên li ser wan û tasfiyekirina wan, diyar dikir ku DAIŞ hêzeke ji wan xetertir e. Her wiha li milê Iraqê û bi êrîşên li ser rejîma Sûriye, tesîra xwe li herêmê zêdetir dikirin. Ji bo ku em nekevin kêmasiyên xwe yên berê, divê li hemberî van hêzan ji Hesekê heya Til Koçer me xeteke xurt ya parastinê ava bikira. Ji milekî ve jî me giranî da perwerdeyan.

Ji hêla din ve, her çiqasa me li wan qadên ku me behs kirine şer kir û me ew der negirtin jî, lê li herêma Cizîrê tesîreke xurt çêbû. Bi taybetî gelê Ereb ê herêmê tesîr bû. Lewma êdî em ji hêzeke xwecihî û herêmî derketin. Di pratîkê de jî em bûn hêza parastinê ya hemû Rojava. Ji bo pêşeroja Sûriye jî, êdî em hêzeke diyarker bûn. Jixwe gelek gund û bajarokên ku gelê Ereb tê de dijî, di destê me de bûn û ew jî tevlê me dibûn û parastina xwe dikirin. Gelek hêzên leşkerî yê gelê Ereb jî tevlê me bû. Vê yekê bi wan re jî moralek çêkir û tevlêbûnên Ereban zêde bûn. Her wiha bi awayekî fermî Asûriyan meclîsa xwe ya leşkerî ava kirin û beşdarî me bûn. Eşîra Şamaran jî hêzeke xwe ya leşkerî bi navê `*Sanadîd*` ava kirin û tevlê YPG bûn. Li hêla din eşîra Şerabiyan jî, li milê Hesekê û Qamişlo weke tabûr xwe rêxistin kirin û tevlî YPG bûn. Ji bona wan jî akademî hatin vekirin, dewreyên perwerde hatin lidarxistin.

Ji qadên ku li derveyî cihên me dimînin jî gelek daxwazî hebûn da ku em derbasî qadên wan bibin û wan biparêzin. Lê ji ber ku di wê demê de derfet nebû ku em biçin wan deran, me ew qad negirtin. Lewra jî bi awayekî şênber beşdarbûna wan çênebû.

Bi vî rengî dema ku em ber bi Newroza 2014'an ve diçûn, DAIŞ'ê êrîşî Kobanê kir. Kêmasiya me ya herî esasî, me wê demê di navbera Heleb, Kobanê û Efrînê de hêzeke xwe ya têkûz çênekiribû. Lewma li gorî ferzkirinên wan divê an em radest bibûna, an jî me li ber xwe bida. Ji ber ku hêzeke me ya têkûz jî tune bû, em neçar man ku wan deran berdin û hêzên xwe ji wir bikşînin. Bi wê valatiyê, DAIŞ ket wan deran û ew der hemû girtin. Bi vî rengî di navbera Efrîn û Kobanê de, di navbera Kobanê û Serêkaniyê de serweriya xwe çêkirin. Jixwe DAIŞ'ê Reqa jî girtibû. Her wiha derbasî Til Hemîs û Şedadê jî bûbûn.

Ew herêm hemû ji destê El Nusra û Ahrar El Şam derxistin, kadroyên esasî yên wan herêman an dihatin kuştin, an radest dibûn, an jî direviyan. Li Sûriye tiştekî wisa jî çêbûbû; ji ber ku her herêmek her carê diket destê hêzeke, gelên wir yên xwecihî jî, kî bihata tevlî wan dibû, da ku xwe biparêzin û rastî komkûjiyan neyên. Lê hin derdorên şoven jî hebûn, tu caran serkeftin û hêzbûyina Kurdan nedixwestin. Li hemberî me kîjan hêz hebûya tevlî wan dibûn. Herî dawî jî dema ku dîtin tu hêz nikarin li hemberî me xwe bigrin, dixwestin ku DAIŞ were herêma wan da ku şoveniya Ereb biparêze û li hemberî me şer bike. Bi vî rengî bingeheke DAIŞ'ê jî çêdibû.

## BEŞA ÇAREMÎN
## ÊRÎŞÊN DAIŞ'Ê Û BERXWEDANA HERÊMA CIZÎRÊ

### 1-Komkujiya Şengal'ê, Destwerdana YPG-YPJ û Vekirina Qorîdora Rizgariyê

*Li ser Şengalê pir tişt hatin nivîsand, gelek tişt hatin gotin û gûftogo hatin kirin. Bi awayekî dijwar di mejiyê me de cih girt û bû parçeyekî bedena me. Bi taybetî êşên gelê me yê Êzîdî û lehengiyên ku vê derê hatine jiyîn, bê mînak in. Ne ku li wê derê tenê êrîş û komkûjiyên ku mirov ji mirovahiya xwe şerm bike bûn; her wiha ne ku tenê li dijî DAIŞ'a ku hêza herî faşîst a mirovahiyê ye têkoşîn hate meşandin.*

*Şengal, li dijî vê hovitiyê berxwedaniya gerîllayên Kurdistanê û şervanên azadiyê yên Rojavayê Kurdistanê, ango YPG û YPJ bû. Her wiha divê mirov balê bikşîne ser ku li dijî wê hovitiyê, hêzên ku xwe weke serwerê cîhanê dibînin, hêzên dewlet û arteşên ku xwediyê milyonan leşkerin bêçare û belengaz man. Ev berxwedana ku piştgiriya manewî ya hemû mirovahiyê girt, bi her awayî nehat nîqaşkirin. Li gel fermandarên YPG-YPJ'ê me li ser kîte, nepenîbûn û encamên vê berxwedanê nîqaş kir.*

***Em êdî di şoreşê de dikevin nav pêvajoyên sala 2014`an û em dibînin ku DAIŞ derdikeve ser dikê. Helbet bi derketina DAIŞ`ê re Rojava jî dikeve qonaxeke nû û bin êrîşên hîn girantir. Di heman demê de li Başûrê Kurdistanê û Şengalê jî êrîş û komkujiyê mezin çêbûn û di vir de risteke dîrokî ya YPG-YPJ pêkhat. Em dixwazin hûn vê pêvajoyê bi tevahî ji me re binirxînin?***

**ÇIYA KOBANÊ:** Wek hate diyar kirin, di vê pêvajoyê de DAIŞ derket. Esas hin ketîbeyên Cebhet El Nusra û Ahrar El Şam tevlî DAIŞ'ê bûn, bi navê DAIŞ'ê tevger kirin. Di vê pêvajoyê de DAIŞ wekî hêzekê derket holê. Li ser cihên dewletê yên mezin êrîş pêş xistin. Mînak weke Tabka û Reqa, êrîş kirin baragahên leşkerî xistin destê xwe. Li wê derê hin çekên giran ên wekî tanq bi dest xistin. Di encama pêşketinên bi vî awayî de DAIŞ hêdî hêdî bi hêz dibû. Dîsa êrîşa li ser xeta baregehên leşkerî yên mezin ên Eyn Îsa çêbû. Ev der bi dest xistin. Êrîşê ser Hesekê, serbazgeha Meylebiyê kirin. Li wê derê baregehekî leşkerî ya rejîmê heye, êrîşê vê derê kirin û girtin.

Dîsa li milê Dêrezorê di navbera wan û eşîra Ereb a bi navê Şihêtat de pevçûn çêbûn. Ji ber ku eşîra Şihêtat li hemberê DAIŞ'ê li ber xwe da, gelek ji wan qetil kirin. Yanî derketina DAIŞ'ê bi êrîşên li ser baregehên leşkerî yên rejîmê û di heman demê de bi hin qetlîamên li ser gel û li ser leşkerên Sûriyê hatine kirin çêbû; ev bi xwe re pêvajoyeke nû derxist holê. Esas derketina DAIŞ bi awayekî reşkujî ku tirs û xof bixe dilê mirovan hate organîze kirin û ev di nava gelan de tirsek da çêkirin.

Ew mintiqayên wekî cebheyên li hemberî me ji Hol û Şedadê hetanî Til Hemîs û xeta Til Berak ket destê DAIŞ'ê. Jixwe piştî çalakiya tolhildanê, hevalan xeta Til Berak berdan. Ji ber ku tenê Til Berak girtin bi xwe re rîskek dianî. Eger çeperek, xetek çênebe xeterî derdikevin holê.

Bi vî rengî roj bi roj di Sûriyê de DAIŞ hate xurt kirin. Herî dawî jixwe êrîşê Mûsilê kir. Bi deh hezaran hêzên Iraqê tê de bûn. Ez bawerim di nava Mûsilê de tanzîmeke wan bi hindek fermandarên Iraqê re hebû. Bi carekê li ser Mûsilê êrîş çêbû. Dema êrîş li ser Mûsilê çêbû, mirov dikare bibêje hevsengî hatin guhertin û DAIŞ weke pêlekê ket nava Iraqê. DAIŞ ber bi milê sînor ve xwe nêzî Şengalê kir û xeta bajarokê Kesk girtin. Dîsa hêdî hêdî ber bi Başûrê Kurdistanê ve çûn. Piştî wê DAIŞ'ê xwest êrîşê Şengalê bike.

Jixwe me got dema DAIŞ'ê Mûsil girt, panîkek kete nava artêşa Iraqê. Di carekê de bi hezaran leşkerên Iraqê şikestin, hilweşiyan. Di heman demê de ew leşkerên ku li Şengalê wan jî hemû sînor berdan û reviyan. Di wê demê de ji bo valahî çênebe û DAIŞ pêş de neyê, me sînor girtin. Li Şengalê jî PDK'ê hebû. Me dizanî ku li hêla sînoran valatî çêbibe, di wê valatiyê de, dê DAIŞ êrîş bike. Ji bo ku em hem qada xwe biparêzin û hem jî nehêlin ku DAIŞ zêde pêş de were, me amadekarî kirin.

Di wê navberê de hêzên Iraqê yên li Rebîa yanî sînorê Til Koçer, dest bi revê kirin. Dema wan berdan û revîn hema bêje wekî panîkek ket nava leşkerên Iraqê. Hîn DAIŞ nehatiye û êrîş çênebûye, digotin "*DAIŞ tê*" û direviyan. Ji ber ku Mûsil ket û ew xeta sînor hate valakirin, me jî tedbîrên xwe li wir xurtir kirin.

Jixwe ji ber ku hêzên Iraqî reviyan sînor hilweşiya, sînor nema. Ew baregehên sînoran hemu berdan. YPG-YPJ wek tedbîr çûn ew baregeh û bajarokê Rebîa girtin. Paşî pêşmerge hat, gotin "*em dixwazin bên Rebîa.*" Ji ber ku leşkerên Iraqê reviyabûn hevalan got "*baş e, dikarin werin*." Bi vî awayî pêşmerge jî hatin Rebîa. Bi vî rengî sînorê me yê Iraqê bû Başurê Kurdistanê, bû PDK.

Me jî weke hêzên YPG-YPJ di Rojava de xet çêkir. Xeta me ya pêş milê Cezaa bû û di wê xetê de çepereke me hebû. Li hemberê me xeta her du gundên bi navê Filistîna rojava û rojhilat hebû û di wan xetan de dijmin çeper girtibû. Li hemberê me weke cebheyekê danîbûn. Hin caran pevçûn derdiketin lê zêde bandora xwe çênedibû. Rewş bi vî rengî dewam kir. Piştre DAIŞ hêdî hêdî pêş de hat, ew gundên pêşiya Şengalê, milê Kesk, Til Afer û ew xet hemû girtin.

**Rûpelek Reş û Yek Spî: 3 Tebax 2014**

Heta demekê bi vî rengî dewam kir lê DAIŞ nêzî Şengalê dibû. Li ser vî esasî pêşmergeyan hinek teqwiye kirin û çûn çiyayê Şengalê wan xetan. Lê DAIŞ'ê milê Til Afer, Kesk û wan deran hemû girtin. Berê xwe da baraja Mûsilê û ji wir jî ber bi Zûmar ve çû. Dema gihişte wir, pêşmerge li Zûmar bû. Çeteyan li wir bi erebeyên bombebarkirî xwe di nava pêşmergeyan de teqandin.

Li wê derê "Supayên Barzan" in, pêşmergeyan wisa bi nav dikir. Lê ew tabûra ku digotin herî xurt e, bi nav û deng e, hemû di wê êrîşa çeteyan de şikestin û xwe dan paş. DAIŞ êrîş kir û Zûmar girt. Piştre pevçûn li milê Şengalê dest pê kirin, pêşmerge li wê derê jî reviyan. Çawa panîkek ketibû nava artêşa Iraqê, panîkeke wisa ket nava pêşmergeyan jî. Weki ku hemû cihan jî dît, pêşmergeyên PDK'ê Şengal berdan û revîn.

Me xeteriya mezin dît û hêza YPG-YPJ'ê kete tevgerê da ku qorîdora navbera Cezaa û Şengalê bê vekirin. Hevalên me yên YPG-YPJ'ê bi şiklekî lez û bez ew qorîdor vekirin. Hevalan ew xeta me ya di navbera Cezaa û Şengalê de hetanî Dugura û çiyayê Şengalê girtin. Gelê Şengalê bi rastî jî piştî ku pêşmerge reviyan komkujî jiyan kirin. Di 3 Tebax 2014'an de DAIŞ ket Şengalê û qetlîam destpê kir. Fermaneke din a Êzîdiyan destpê kir! Bi hezaran Şengalî hatin qetilkirin. Bi hezaran zarokên Şengalî, keçên Şengalî girtin û bi xwe re birin.

Helbet heta ku YPG-YPJ qorîdor vekir, gelek windahiyan gelê me yê Êzîdî çêbû. Piştî ku heval gihiştin çiyayê Şengalê bi deh hezaran Kurdên me yên di bin xeteriya komkujiyên din de rizgar kirin û anîn Rojava. Li Rojava wargehek bi navê Newroz hate ava kirin û gelê mê li wir bi cih bû. Bi hezaran mirov jî di ser Rojava re derbasî Başûrê Kurdistanê bûn.

Di dîrokê rûpelên reş û spî hene. Rojeke ku dîsa xwîna Kurdan, xwîna fermana Êzdiyan pijiqî ser rûpelên dîrokê; pêşmergeyan li pey xwe rûpelekî reş, şermeke mezin û komkujiyek hiştin û reviyan. Di heman cihê ku reviyan re keç û xortên Kurd YPG-YPJ bi lezgînî çûn, ew însanên me ji nava agir derandin, anîn û rûpelekî spî ji rûmet û serbilindiyê li dîrokê danîn.

Hêzên HPG jî hatin û derbasî Şengalê bûn da ku DAIŞ derbasî çiyayê Şengalê nebe. Paşî jî hêzên HPG'ê ji çiyê daketin, destwerdanî çiyayê Şengalê kirin û girtin. Li gorî wan mercan gelê Rojavayê Kurdistanê jî bi welatparêziyeke bilind, seferber bû; ji wan însanên me re erzaq, xwarin û hemû pêdivî kom kirin. Tebax bû, kelagerma havînê bû, di wê germahiyê de gel hemû bazdabû wan çiyan. Hêza me ew milet hemû di wê qorîdora mirovahiyê re derbasî Rojavayê Kurdistanê kir û parast.

HPG-YJA Star û hêza YPG-YPJ li hember çeteyan şerekî giran meşandin. Di wan şeran de bi dehan heval şehîd bûn. Ji bo Şengal û gelê Şengalê xwe feda kirin da ku gelê Şengalê neyê qirkirin. Ew miletê ku hatibû jêrî çiyayê Şengalê hevalan hemû derxistin jorê û derbasî milê Rojavayê Kurdistan kirin. Piştî ku hêza me li dijî DAIŞ'ê sekinî, li wir xeta xwe çêkir, çete nikarîbûn pêş de bihatana, bi vî rengî sekinîn. Ji bo derbaskirina miletê Şengalê hema bêje hemû bajarên Rojavayê Kurdistanê seferber bûn. Jixwe hema bi vê pêvajoyê re Yekîneyên Berxwedana Şengalê-YBŞ hatin ava kirin. YBŞ hemû ji keç û xortên Şengalê pêk tê. YBŞ û HPG parastina gelê Şengalê hilgirtin ser milê xwe.

***Dema ku ew pêşketin çêdibûn, rista hêzên peşmerge di nava vê berxwadanê de çawa bû?***

Dema ku DAIŞ hat û nêzî Rebîa bû, pêşmerge û hevalên YPG'ê li gel hev bûn. Hevalan ji bo ku bajarokê Rebîa biparêzin çeperên xwe girtin. Pêşmerge ne di çeperê xwe de bûn, diçûn û dihatin, di hundurê panikekê de bûn. Ji ber ku li milê seda Mûsilê wan êrîşekî dijwar li ser pêşmergeyan kiribûn. Panîkek mezin di nava hêzên

pêşmergeyan de hebû. Dema çeteyan êrîş kirin û nêzî Rebîa bûn, pêşmerge jî dest bi revê kir, digotin "*em ê biçin.*" Ji ber ku di xeta Iraqê de çete hinekê lê ziviriyabûn, pêşmerge nikarîn di aliyê Iraqê re biçûna. Hatin xwe li sînorê Rojava qelibandin, gotin "*em dixwazin biçin.*" Me ew pêşwazî kirin û me got: "*Çima hûn ê biçin? Neçin, em ê bi hev re li dijî çeteyên DAIŞ şer bikin.*" Fermandarê pêşmergeyan ra me careke din got: "*Neçin, em ê li vê derê bi hev re li dijî DAIŞ'ê şer bikin. Em nahêlin pêş de bên. Em nahêlin ew Rebîa bigirin. Eger hûn vê derê berdin, wê demê DAIŞ dê li milê Başûrê Kurdistanê hîn zêdetir pêş de were!*"

***Ma li hemberî ew israrên we qaneh bûn?***

Me nikarîbû ew îkna bikirana, lewra bêhêvî bûn û şikestibûn. Gelek erebe û çekên xwe yên giran li pey xwe hiştin. Rewşeke welê ketibû nava pêşmergeyan ku te nikarîbû pêşiya wan bigirî. Bi vî rengî hezaran pêşmerge di deriyê Til Koçer re, bi qonwoyeke mezin bi alîkariya hevalan derbas bûn û hatin milê Girkêlegê. Hinek jî di Sêmalka re, hinek di hacizê me yê Tawûs re derbasî Başûr bûn û çûn. Trajedî bû, rewşa artêşeke şikestî çawa ye, jixwe tê zanîn. Pêşmerge şûn de kişiyan û hevalên me yên YPG-YPJ'ê di Rebîa da man. Dema DAIŞ'ê êrîşî Rebîa kir, digotin qey yên li hemberê wan pêşmerge ne. Lê dema derbê ewil xwarin fêmkirin ku YPG-YPJ ne.

Hevala sawamaya Rebîa girtibû û çepereke xurt çêkiribûn. Dijmin êrîşeke giran kir, erebeyên bombebarkirî şandin, hevalan li ber xwe dan û şer kirin. Rebîa bernedan û hetanî dawiyê şer kirin. Li wê derê şehîdên me jî çêbûn, derdorê 14 hevalên me li wê derê şehîd ketin. Lê hevalan ev der bernedan. Ji ber ku me ew der berdabûya, dê Til Koçer jî biçûya. Wê demê xeta Cezaa hemû bişikesta. Ji bo wê jî hem ji bo parastina xeta Rojava, hem jî ji bo parastina axa Başûr, berxwedana hevalan a li Rebîa bi mehan berdewam kir.

Di Rebîa de berxwedana ku hevalan kiriye, bi rastî jî mirov nikare pênase bike. Gelek zor u zehmetî hatin kişandin. Çeteyan bi teknîkeke giran êrîş kirin; bi tanqan, bi panzêran, bi erebeyên bombebarkirî gelek ceribandin kirin. Lê hevalan li ber xwe dan û ew der bernedan heta dawiyê. Heta demekê bi vî rengî berdewam kir. Beşeke Rebîa di destê me de, beşek jî di destê DAIŞ'ê de bû.

Êdî Rebîa jî bi vî rengî ma. Jixwe her roj pevçûn bû. Heyvekê zêdetir, her roj wan êrîş dikir û hevalan çalakî dikirin. Dîsa di navbera Rebîa û Cezaa de me xet hemû girt, çeperek hate çêkirin. Li xeta qorîdora Şengalê jî li ser wî esasî çeper hatin çêkirin.

DAIŞ dixwest xeta Cezaa bişkîne. Ji bo xeta Cezaa şevekê êrîş kirin da ku Cezaa û Begara bistînin. Şevekê, ber destê sibê êrîş kirin. Dema êrîş kirin heval pê hesiyan û pêvçûn derket. Pevçûneke giran bû, hevalan li ber xwe dan û Cezaa bernedan. Vêcare çete çûn êrîşî Begara kirin. Grûbeke me 4 hevalên jin û 2 hevalên xort li wê derê bûn. Heval di cihekî weke dibistanê de bi cih bibûn, dema êrîş kirin û derdora hevalan girtin pêvçûneke giran çêbû. Hevalan bi lehengiyeke mezin, li wê derê li ber xwe dan. Çeteyan dixwestin Begara bigirin û ji wir jî Cezaa bixin destê xwe.

Pevçûneke giran çêbû û hevalan li wê derê dijmin şikênand. Lê belê grûbeke me li Begara hatibû dorpêçkirin. Hevalan destwerdan kirin. Heta grûbeke me bi panzerê çû û kete gund. Lê dijmin bi fûzeyan lê dan û panzer derbe kirin. Tiştek ji hevalan nehat, lê ji bo em karibin wê grûbê derxin şerekî giran pêk hat. Hevalan êrîş kir û di xeta Begara de ew dorpêç şikandin. Li wê dibistanê şerekî giran çêbû. Hevalê Fîraz ji derve ji bo mûdaxale çûbû da ku wê grûbê rizgar bike. Ew heval li wê derê şehîd bû.

Hevalan ew dorpêç vekirin û hevalên birîndar û şehîd ji wê derê derxistin. Dijmin li wê derê şikênandin. Gelek çete li wê derê hatin kuştin û hinek çekên wan hatin rakirin. Li wê derê 8 hevalên me şehîd ketin. Lê hevalan li ber xwe dan û dîsa ew der ji destê wan derxistin. Piştî wî şerî hevalan dîsa çeperên xwe xurt kirin.

Di wî şerî de hevalê Dilşêr hebû, ji Bêşebabê bû, hevalekî ciwan bû. Li ser koma çekên giran bû. Dema ew hevalên li Begara di çemberê de man, ew heval bi rihekî fedaî û rihê êrîşê bê dudilî diçe cihê ku dijmin heval xistine dorpêçê, wê dibistanê. Dema dijmin bi fûze li panzêrê dide, ji wê panzerê dadikeve, li panzêra din siwar dibe. Bi wê panzêrê dikeve hewşa dibistanê û hewşê xirab dike, bi doçqayê li derdora dijmin dixe. Li ser vê yekê hevalên din dikevin dibistanê, hevalên birîndar û cenazeyên hevalên şehîd ji wê derê derdixînin. Pişt re ji wê derê heval dikevin êrîşê, gundê Begarayê rizgar dikin.

Dema ew grûb destpêkê li wî gûndî, di wê dibistanê de bi cih bû, gelekî alîkariya gundiyên Begara kirin. Ji ber ku li wan deran ji aliyê avê ve pirsgirêkên mezin têne jiyîn. Dîsa ji aliyê erzaq û pêdiviyên din ve hevalan alîkariya gundiyan dikir. Destpêkê dema heval di gund de bi cih bibûn hevalan gotibû, "*bila gundî li gundê xwe bimînin.*" Hevalan nexwestibû gund vala bikin, gundiyan koçber bikin. Di gund de rewşeke bi vî rengî hebû. Lê DAIŞ'ê ev yek bi kar anî. Bi riya hin gundiyên wir îstixbarat kom kiribû ku heval li ku derê dimînin, çekê wan, hejmara wan û hwd. Dema ku DAIŞ'ê êrîşê hevalan kiribû jî, hin gundiyên ku tevlê DAIŞ'ê bûbûn jî alîkarî dabûn wan û di nava gund de

li dijî hevalan şer kiribun. Lê dema ev dorpêça DAIŞ'ê têk çû, li ser vî esasî ew gundiyên ku wisa tevlê şer bibûn, hatin ceza kirin.

**2-Li Cezaa Destaneke Lehengiyê**

***Piştî komkujiya Şengalê û vekirina qorîdora rizgariyê, diyar bû ku DAIŞ êrîşên xwe zêdetir û girantir kir. Êrîş* zêdetir *li ku çêbûn û we ev pêvajo çawa derbas kir?***

Dijmin nasekine. Jixwe êrîşên dijwar li xeta Cezaa, Til Koçer û Rebîa wan deran zêde zêde hene. Dijmin xwest cara duyemîn bi êrîşeke mezin Cezaa bigire. Ew şer 15 rojan dewam kir. Şerekî gelekî berfireh bû. Lewra ji hemû milan ve bi berfirehî hatibûn. Bi şev bi awayê vedizînê tên, ji ber ku qadeke zehf fireh e, ji hemû milan ve heval welê yekser hakimiyetekê nikarin çêbikin. Dixwestin navbera her du bajarên me yên Girkêlegê û Dêrikê qut bikin.

Di wê navberê de gelek gundan digrin. Sibê zû jî şer di xeta Cezaa de destpê kir. Ji hemû milan ve hatin. Hevalan li ber xwe dan. Li wir hevalê Cemşîd hebû, fermandar bû, bi grûbekê ve dixwaze biçe alîkariya Cezaa. Milê Kaxortê dijmin girtibû, ew cade jî hemû kiribûn mayin, mayin çandibûn. Mayin diteqe û di kemînê de li hevalan didin. Hevalê Cemşîd birîndar dibe. 3 heval şehîd dikevin.

Me ferq kir ku li wê derê hemû der girtine û tenê Cezaa, Begara û xeta piştê, milê Til Sahan dest me de maye. Wekî din cade ya navdewletî û ew xet hemû di destê me de bû. Lê dixwestin di navbera eyaletan de qutbûnekê çêkin. Destwerdana wê pevçûnê hate kirin. Hêzên bi tevger ketin dewreyê, çekên giran ji bo alîkariyê hatin şandin. Şer bi awayekî giran 15 rojan dewam kir. Bi hemû şêweyan êrîş kirin. Panzêr û qemyonên bombebarkirî bi ser hevalan de teqandin da ku wê derê bigirin. Tanq û 57 bi kar dianîn. Hemû teknîk û çekên giran ên ku ji ser rejîma Iraqê û rêjima Sûriye rakiribûn, anîn li dijî hevalan bi kar anîn.

Li wê derê destaneke berxwedanê hate nivîsandin. Hevalan ew der bernedan. Çeteyan bi heta sawamaya Cezaa jî girtin. Dîsa bêşensiyeke mezin hate jiyîn. Grûbek a hevalên jin di dibistana biçûk a Cezaa de bûn. Ew 10 heval li wê derê şehîd ketin. Bi destê sibê re, bi ser hevalan de girtibûn, di encama şerekî giran de heval wisa şehîd ketibûn. 23 Tebax 2014'an wî şerî destpê kir û 15 rojan berdewam kir. Lê hevalan ew der berneda. Heta bi dibistana mezin jî bi tanqan û bi 57`an lê dabûn û tiştek li ser hev nehiştibûn, tenê îskeletê avahiyê mabû. Lê hevalan heya dawî li ber xwe dan û bernedan.

Êrîşê wan ên ji hemû aliyan ve hatin şikênandin. Hevalan bi çekên giran li aliyê piştê wek çeperekê çêkiribûn û li hundur jî pevçûn di mesafeya çend metro de bûn. Şerekî îfadeya wê zehmet bû. DAIŞ'ê xwe wisa didît ku êrîşê kuderê bike divê bistîne. Lê me jî got, em Cezaa bernadin. Ji ber ku eger em berdin, dê xeta Şengalê bişkê. Eger xeta Şengalê şikest, ev dê bibe sedema ku ew qorîdora Şengalê qut bibe.

Ji bo ku em dorpêça çeteyan a li ser Cezaa bişkînin, divê me hin cih bigirtana. Me plansaziyek li ser girê Kaxortê çêkir. Girê Kaxortê çend mal li derdorê bûn. Piştî plansaziyê hevalan êrîşî wî girî kirin û bi êrîşeke nîv seatê ew gir bi dest xistin. Heval çûne ser bi dehan cenazeyê çeteyan. Gele fûze, çek û erebeyên tijî mayin girtin. Dema Kaxortê hate girtin, vêcarê hevalan êrîşî milê gundê Sifanê û Ekreşa kirin û ew der jî girtin. Di heman demê de, me li milê Til Sahan çeper çêkir. Piştî wê me du baskên êrîşê derxistin. Baskek ji bo dibistana biçûk bû ku hevalên jin tê de şehîd ketibûn. Heval vedizîne wir, lê dan û ew der girtin. Pişt re çûn xeta milê sawama jî girtin û di dawiyê de Cezaa ji çeteyan paqij kirin.

Grûbeke me jî di gundê Begara de mabû. Dema me êrîşê Cezaa kir û paqij kir, piştre me êrîşê Begara jî kir. Dîsa, me derdorê Cezaa hemû rizgar kir. Bi pêngaveke mezin DAIŞ li wê derê hate şikênandin. Bi sedan DAIŞ'î hatin kuştin. Şerekî gelekî giran bû. Bi berxwedana hevalan, hevalên şehîd, hevalan ku lehengî kirin, serkeftin çêbû. Ev berxwedan bi nav û deng bû, di raya giştî ya cîhanê de jî ket rojevê. Berxwedana li Cezaa, destaneke lehengiyê ye.

Ev di nava gel û eşîrên wan deran de, di nava gelê Ereb de jî deng veda. Ew eşîrên Şamarî, eşîrên Şerabî, bi vê gelekî bandor bûn. Hîn bêhtir nêzî me bûn. Rizgariya xwe di rastiya YPG-YPJ'ê de dîtin. Şikestina DAIŞ'ê li wê derê, serkeftina gelê Ereb û gelê Kurd bû. YPG-YPJ hêviya gelan bû. Piştî tecrûbeyên li hemberê DAIŞ û Cebhet El Nusra çêbûne, me hêza xwe jî komî ser hev kiribû. Piştre me di navbera xwe de nîqaş kir ku divê em êrîşê xeta Rebîa bikin. Ji derdora Rebîa hemûyê dijmin paqij bikin. Li ser wî esasî amadekarî hate kirin û me bi hev re dest bi êrîşê li ser Rebîa kir.

Jixwe em tê de bûn. Pêşmergeyan jî ji milê Tawûs ve êrîş kirin. Me jî ji milê Til Koçer û xeta Rebîa de êrîş kir. Teqtîk hinek lê zivirandin û bikaranîna teknîkê bû. Balafirên şer ên Koalîsyonê bi me re pêwendî nedanîn, lê li gel PDK'ê pêwendiya wan hebû. Balafirên Koalîsyonê û yên Iraqê jî dişuxiliyan. Ji hemû milan ve li ser Rêbîa êrîş çêbû. Bi vî awayî Rebîa ji destê DAIŞ'ê hate girtin.

**Berxwedana YPG-YPJ`ê bandoreke mezin li ser pêşmergeyan kir...**

Eger alîkariya YPG-YPJ ji pêşmergeyan re nebûna, nedikarîn carekî din xwe komî ser hev bikin û pêngavan li dar bixin. Alîkarî û desteka ku me daye pêşmergeyan ne kêm bû. Eger îro pêşmerge li gelek deran pêngavan li dar dixin, ev ne bi saya çek û teknîka Emerîka û Ewrûpa ye. Berxwedan û rihê ku ji hêla YPG-YPJ`ê ve hate nîşan dan, bandoreke mezin li ser pêşmergeyan kir. Li ser wî esasî Rebîa jî hate rizgar kirin. Di vê pêngavê de tu şehadet nebûn.

Di navbera Şengal û Cezaa de qorîdor hatibû çêkirin. Dijmin êrîşê wê qorîdorê jî kir. Di milê Kenho û Misterîha de êrişek pêşxistin. Pevçûnên gelekî giran çêbûn. Wî şerî 3-4 rojan dewam kir. Lê pêşmergeyan dîsa ew der berdan û xwe dane çiyayê jorî. Heval tenê li wê derê man. DAIŞ'ê jî hêza xwe hemû kom kiribû wê derê. Bi vî awayî qorîdora navbera Şengal û Cezaa de hat qut kirin. Yanî di ev pêvajo timî şer bû. Hin caran me êrîş dikir û hin cih digirtin, hin caran wan êrîş dikirin. Di navbera me û Şengalê de qutbûn çêbû.

Me amadekariya pêngaveke berfireh dikir. Ji bo girtina xeta Kenho, Misterîha; di heman demê de ji bo vekirina qorîdora Şengalê bû. Ji bo li xeta Şengalê DAIŞ were paqijkirin, me li gel PDK'ê nîqaş dikir. Lê PDK'ê xwe neda ber û her tim dereng dixist.

***Em ê dîsa vegerin mijara xeta navbera Rojava û Şengalê, lê li ser şerê giran yê Cezaa û ew 15 rojên ji agir, em dixwazin li we jî guhdarî bikin… Her wiha di şerê van herêman de berxwedana şervanên jin çawa bû?***

**AYTEN SERÊKANIYÊ:** Bêguman di vê demê de êrîşên dijmin bênavber li her derê berdewam dikirin. Li milê Qamişlo, Tirbespiyê û bi taybetî jî li Cezaa êrîşên pir dijwar çêdibûn û li hemberî wê berxwedaneke xurt jî çêdibû. Bi taybetî Cezaa dijmin ji xwe re weke cihekî esas didît û me jî li ser wê esasê nêzikbûnek çêdikir. Şerekî dijwar ku di wê demê de pêş ket jî şerê Cezaa bû. Dijmin bi teqtîkên cur bi cur êrîş dikir. Li hemberî wê ji aliyê me ve jî teqtîkên parastinê bi her awayî pêş diketin.

Li Cezaa jî êrîşên giran çêbûn. Koma hevala Sozdar Goyî wan, di gundekî Cezaa de bûn. Hevalên bi xwestek, moral, bawerî tevdigeriyan. Di nava wî şerê dijwar de vîneke mezin nîşan didan. Bêşansiyeke pir mezin hate jiyankirin, pir bi êş bû. Dema ku hatin, ji bo ku araziyê nas bikin û bi awayekî xurt tevlê şer bibin, vesazbûna wan çêbû û çûne eniyê. Di wê demê de şer pir dijwar bû. Hevalan bi piranî dibistan digirtin, ji bo parastinê cihên stratejîk bûn. Koma wan hevalan jî bi piranî li gel hev disekinîn. Dijmin li wir teqtîkek da şixûlandin. Di xeta pêşiyê de êrîş kiribûn, lê li pişta hevalan ziviriyabûn. Êrîşî wan hevalan kiribûn.

Sibehê pevçûnan destpê kiribû û heya êvarê berdewam kiribû. Her çiqasa dijmin teqtîkeke bi wî rengî dabû şixûlandin jî, wan hevalan berxwedaniyeke pir mezin meşandibûn. Piranî jî hevalên ciwan bûn, lê xwediyê vîneke ew qesa xurt bûn. Digotin, "*heya ku xwîn di canê me de hebe, em vî cihî bernadin û ew dijmin nikare bikeve Cezaayê.*" Bi wî rengî jî kiribûn. Heya guleya xwe ya dawî şer kiribûn. Bi rihekî fedayî, li hemberî ew zîhniyeta paşverû ya DAIŞ'ê, weke hevalên jin lehengîtiyeke pir mezin dan diyarkirin. Heya guleya xwe ya dawî, di nava dibistanê de şer kiribûn. Hevalan pir hewl dan ku xwe bigihînin wir, lê nikarîbûn, heya ku bigihêjinê guleyên wan xilas bûbûn. Ew heval di dibistanê de şehîd ketin. Niha ew dibistan jî bûye, dibistana hevalên jin. Wisa tê naskirin. Ji bo tolhildana wan, piştî sê rojan, li gundekî ku di destê dijmin de bû, hevalan lê dan.

Li heman xetê, gundekî din yê pir mezin hebû. Hevalan plansazîyeke mezin çêkirin, da ku wî gundî bi dest bixin. Ew der jî navendeke çeteyan bû. Hevalan ji 5-6 milan ve êrîş kirin û her cihê gund girtin û ji çeteyan rizgar kirin. Tenê dibistan mabû. Wê demê heval bi piranî bi panzêrê diçûn. Ji ber ku deşt bû, hevalan nedikarî bi peyatî biçin. Dijmin jî nedikarî tevbigere. Ji ber ku deşt bû, kî li ser araziyê hakîm bûya, ew bi ser diket.

**'Şoreşa Rojava wê di şexsê şehîdan de bi ser keve'**

Heval bi panzeran ketin wî gundî, her cih û dibistan jî girtin. Dema ku cara duyem panzêr çûbû ku hevalên şehîd ketine û birîndaran bîne, çeteyan di qanalan de êrîşî dibistanê kiribûn. Panzêr di cihê xwe de sekinî û neşixûlî. Dema ku panzêr di cihê xwe de ma, hevalan gazî kir. Lê deng nehat. Di panzerê de jî hevalên birîndar hebûn. Hema heval ketin tevgerê da ku wan hevalên birîndar rizgar bikin. Dema ku çeteyan êrîşî dibistanê kirin, li her cihê gund jî xwestin careke dîtir êrîş bikin. Êdî diyar bû ku heval nikarin xwe bigihînin wan hevalên birîndar. Hevalên di panzerê de gazî dikirin û digotin, "*heval me meraq nekin, em nakevin destê dijmin û em nahêlin ku hevalên birîndar jî bikevin destê dijmin.*"

Bi awayekî leheng û bi rihekî Apogerî wan hevalan singa xwe dan ber guleyan da ku wan hevalên birîndar biparêzin. Bi vî awayî gelek hevalan bombeyên xwe di xwe de teqandin da ku nekevin destê dijmin. Diruşmaya wan a herî dawî, digotin, "*wê şoreşa Rojava, di şexsê şehîdan de bi ser bikeve, wê ew dijmin bin bikeve.*" Dengê wan wisa li ser cîhazê dihat. Gelek hevalan jî mûdaxale kirin ku wan hevalan xilas bikin. Lê dijmin beriya hevalan xwe gihandibû wê derê û çeper girtibû. Ji bo xilaskirina wan hevalan 20 heval şehîd ketin. Ev rihê hevaltiyê dide diyarkirin. Ew, hêrsa li hemberî dijmin dide diyarkirin. Bi vî awayî berxwedaneke pir mezin çêbû. Rih û serkeftina hevaltiyê di wî şerî de bi awayekî şênber derket holê. Diyar bû ku xwîna hevalan tu caran li erdê namîne.

***Eger em dîsa vegerin xeta Rojava û Şengalê, çi pêşketin li wir çêbûn û di vê navberê de li qadên din kîjan pêngav û şer çêbûn?***

**ÇIYA KOBANÊ:** Di vê navberê de li ser xeta Tirbespiyê pêngav çêbû. Ji ber ku li wê xetê gefên çeteyan hebûn û nêzîk bûn. Li ser wî esasî me hêza xwe kom kir. Divê bi teqtîkeke lez di navbera 3-4 rojan de, me navbera Ebû Qasayib hetanî Til Marûf qut bikira. Divê ew gundên di navbera Til Îd û Ebû Qasayîb de mane hemû bihata paqijkirin. Li ser wî esasî planek hate çêkirin.

Weke du baskan plansazî çêbû. Baskek ji milê Til Marûf ve, baskek jî ji milê Ebû Qasayib ve ketin tevgerê. Ew bask piştre gihîştin hevûdin. Bi şiklekî bi lez hevalan êrîş kirin û ew gund hemû paqij kirin. Bi dehan çeteyên DAIŞ'ê li wan deran hatin kuştin. Hevalan êrîşa dawi li ser Ebû Qasayib kirin. Ew êriş gelekî bi dijwarî dewam kir. Êrîşeke gelekî xurt bû. Êvarê dest pê kir, hetanî destê sibê domiya. Li wê derê 4 hevalên me şehîd ketin. Di dawiyê de, me ew girê Ebû Qasayib û gundek rizgar kir û hevalan xeta xwe çêkir.

Ev ji bo pêngava Til Hemîs jî bû amadekarî. Lewra dema ku me Ebû Qasayib girt di navbera wê derê û Til Hemîs de 15 km dimînin. Li ser wî esasî ew pêngav jî di 4 rojan de hate pêkanîn. Di wê çalakiyê de hevalê herî zêde rola xwe lîstiye hevalê Cîger e. Hevalê Cîger Qamişlo hevalekî fermandarê tabûrê bû. Di şerê xwe de bi rihê xwe yê fedayî û Apoger tevdigeriya. Ew girê Ebu Qasayîb, bi wî rihê êrîşkar ê Apoger û azameta milîtaniya hevalê Cîger Qamişlo hate girtin. Hevalê Cîger paşî di pêngava Çiyayê Kizwana de şehîd ket. Lê li wê derê rola wî hevalî pir bi bandor bû. Dema heval birîndar bûn, wî hevalî mûdaxale kir, ket êrîşê û ew gi girt.

Hevalekî din jî, hevalê şehîd Berxwedan bû ku li wê derê rola xwe lîst. Bi doçqaya 23'ê kete nav gundê Ebû Qasayib. Rola hevalê şehîd Berxwedan, di wê derê de diyarker bû. Mesela di nav wê derê de hin heval bi fikar nêz bûn. Wî hevalî erebeya doçqaya 23'ê girt, raste rast ket êrîşê û lê da. Gelek çete hatin kuştin, çek ketin destê hevalan, Ebu Qasayib rizgar bû. Hevalê Berxwedan jî, di pêngava Holê de şehîd ket.

Pêngava me ya li wê dêre ji milê teqtîk ve ev bû; yekem, agahî hatine girtin. Duyem, hevalan di xeta Til Marûf de 25-30 gund raste rast ji hev qut kirin. Di wir de gelek çeteyên ku ketine çemberê hatin kuştin. Ne ku hevalan gund bi gund êrîş kir; hevalan raste rast xetek çêkirin û ew xet girtin. Jixwe di xeta milê Til Îd de wek cebheyekê heval hebûn. Dema ku di navbera xeta Ebû Qasayib û xeta Til Marûf de qutbûnek çêbû, dijmin neçar ma ku vekişe. Cihek nebû tê re vekişe, hinekan wek mirovên medenî revîn, hinekan di nav xelekê de man û hatin kuştin. Ew pêngav bi vî rengî bi ser ket û gihîşt encamê.

Di vê demê de êrîşên DAIŞ'ê li ser Kobanê hin bi hin zêdetir bûn. Êrîşên DAIŞ'ê ji milê Girêspî, Sirînê û Eyn Îsa ve bi awayekî hovane li ser Kantona Kobanê çêbû. Bi vî awayî li wê derê jî şer dewam dikir.

Ji bo xeta Rojava û Şengal; me bihîst pêşmerge xwe komî ser hev kirine, ew jî dixwazin li ser xeta navbera Zûmar û hetanî tê sînor û xeta di navbera çiyayê Şengalê, Rebîa û wan deran de pêngavekê bikin. Hatin, gotin "*em dixwazin hûn jî ji me re alîkarî û destek bidin.*" Niha pêşmerge ji çi ditirsiyan? Eger ew pêş de biçin û di milê sînor de jî dijmin neşkê, ji milê Sûriyê jî DAIŞ êrîşî wan bike, ev dibû xeterî. Ji bo wê jî dixwestin bi me re têkiliyê çêbikin ku em bi hev re xebatekê bimeşînin. Yanî di bingehê wê de berjewendiya wan hebû. Me jî got, "*baş k, em dikarin alîkar bin*."

Armanca me jî ew bû ku em herêmê rizgar bikin da ku gelê Şengalê bizivire warê xwe. Di heman demê de DAIŞ li milê Iraqê ye, ji ber ku cebheya me jî fireh bûye, me xeta Iraqê jî çeper kiribû. Dîsa xeta li beramberê DAIŞ'ê li Rojava jî çeperek hatibû çêkirin. Hêza me bi hêjmareke mezin çepereke xurt li wê dere çêkirin.

Fermandarê pêşmergeyan hat û me hevdîtin çêkir. Ew nîqaşa me gihişt encamê ku em bi hev re derbasî pêngavê bibin. Me pêngav dest pê kir. Pêşmerge ji xeta Rebîa dixwestin pêş de biçin. Lê piştî me bi wan re nîqaş kir, pêşmergeyan ji me vedişartin ku ew ê çi wext hareket bikin. Ji me her tim vedişartin. Ango her tim em mijûl dikirin, li pey xapandinê bûn û nerast tevdigeriyan. Lê tevî wê jî me bi hev re pêngavek da meşandin.

Pêşmergeyan ji hêla jor ve, ji milê Zûmar wan deran ve dest pê kiribûn. Me ji milê riya navdewletî ve destpê kir û em ketin hereketê. Me baskek derxist, rasterast derbasî Zerayê bû. Gundê Zerayê di destê dijmin de bû, ev gund li ser sînor e, hevalan êrîş kir û ev der girtin. Piştî ew der hate girtin, baskek derbasî hêla sînor bû; ew cadeya

ku ji Rebîa tê xeta Şengalê. Hevalan ew cade girt û bi cadê ve çûn. Dîsa hêza Şengalê YBŞ û HPG xwe berdan bajarokê Dahola girtin. Bi vî awayî hêzên YPG-YPJ û HPG'ê û YBŞ'ê bi hev re ketin tevgerê, ew qorîdora navbera Şengal û Rojava dîsa hate vekirin.

Ev rojeke dîrokî bû. Li milekî Rojava û li milê din Başûr û Şengal. Hêzên Rojava YPG-YPJ û Hêzên Şengalê YBŞ û HPG ji bo Şengala birîndar, ji bo Kurdên me yên Êzîdî gihiştin hev û ew qorîdora ku wek nefesê can dida dîsa vekirin…

Piştî ku hevalan qorîdor vekir û gihîştin çiyayê Şengalê, pêşmerge nûka hatin! Me pêngav berdewam kir û êrîşî wan gundên berê ku qorîdor lê heye kir; li milê jorî xeta Kenho wan deran hebû, me êrîşî wan milan kir, ew xet hemû girtin. Ew gund hemû me dîsa girtin. Hevalan ew paqij kirin, dîsa xeta Kenana, Zerayê, gundê Qureyş, gundê Kenho, gundê Misterîha wan hemû dîsa hatin paqijkirin. Vêcarê ne yek, 2-3 qorîdor ji bo Şengalê hatin vekirin!

Windahiyeke me ya mezin çênebû. Ew pêngaveke serkeftî bi hev re hate meşandin. Di navbera Cezaa û Şengalê de qorîdoreke berfireh hate vekirin û ew gund û bajarokên derdorê Şengalê hatin rizgarkirin. Tenê bajarê Şengalê ma. Di bajarê Şengalê de jî hevalan dixwest bikevin êrîşê lê PDK'ê nehişt, bû asteng. Heta wê demê PDK`ê daxuyanî da û got "*Şengal hatiye rizgarkirin*." Lê tiştekî wisa tunebû. HPG û YBŞ'ê digotin "*em bi hev re biçin Şengalê rizgar bikin.*" Heta hevalan çûn pêngavek jî kirin û taxek jî girtin. Lê pêşmerge nehişt, astengî çêkirin. Digotin, "*eger hûn pêş de biçin wê balafir li we bidin!*" Helbet ev jî mijûlkirinek bû. Ji ber ku Şengal di nav destê çeteyan de hiştibûn, dixwestin îtîbara xwe vegerînin. Lê îtîbar bi van nêzîkatiyan nedihat vegerandin.

Ew pêngav bi vî awayî serkeftî bi encam bû. Di pêngavê de yek-du mayin teqiyan, di wan teqandinan de 3 welatparêzên me şehîd bûn. Ji ber ku dema pêngav çêbû gelê me yê welatparêz ji bo 15 rojan dihat tevlî pêngavê dibûn. Ew jî di demeke wisa de hatibûn wê derê, di wan hevalên me yên welatparêz de mayin teqiyan. Li wê derê ew heval şehîd ketin.

Ew qadên di navbera Şengal û Cezaa de, ku derê çete lê bûn, hemû hatin paqijkirin û hevalan jixwe çeperên xwe çêkirin. Dîsa ji Şengalê heta bi gundê Hedadê, xeta Tirbespiyê, Ebû Qasayib çepereke xurt hate çêkirin û di ber çavan re hate derbas kirin; li ser esasê êrîşeke dijmin eger çêbibe, li beramberê wê parastin û şikênandina êrîşên dijmin bû.

Dîsa di vê pêvajoyê de li qada Qamişlo, Dirbêsiyê û Serêkaniyê wan jî hin çalakî pêş ketin. Dijmin êrîşî Til Xenzîr kiribû. Bi awayekî serkeftî hevalan gundê Til Xenzîr û girê wê girtin. Li wê derê bi lehengiya hevalekî, bi qehremaniyeke bê hempa ya hevalê Zagros, ev gir tê girtin. Di wir de, li ser baskê êrişê bû. Rolekî wî ya sereke hebû. Hevalê Zagros di wê çalakiyê de şehîd ket.

Dîsa di wê pêvajoyê de ji bo ku êrîşên li ser Kobanê sivik bibin, hevalan êrîşî li ser xeta Mebrûka kirin. Beriya wê hevalan li ser Rawiya pêngav kirin. Ew çalakî mixabin bi berdêleke giran bi encam bû; gelek heval şehîd bûn. Di plansaziyê de şaşitî çêbû. Plansaziyeke çawa bû? Heval dikevin êrîşê, mektebê û hemû gund digirin. Rêka ku teqwiye tê, destpêkê digirin lê piştî ku nîvî gund digirin, hema berdidin. Dijmin di wir de mûdaxale dike. Kêmasiya herî mezin qorîdora ku dijmin tê re birîndara xwe derbasdike, teqwiye, cebilxane û pêdiviyên xwe yên din pêktîne, hevalan vekirî hiştibû.

Ev jî bû sedem ku dijmin were û riya me ya teqwiyê jî qut bike. Hevalan nekarîbû mûdaxale bikirana. Hevalan bi hejmareke mezin li wê derê li ber xwe dan û şehîd ketin. Li wê derê, ew tecrûbeya ku di şerê bi salan de, li beramberê Cebhet El Nusra û DAIŞ'ê hatibûn bidestxistin zêde nehatibû berçavgirtin. Şaşitî û kêmasiyên ku di plansaziyê de hatibû çêkirin bû sedem ku hejmareke mezin heval jî şehîd bikevin.

Dîsa ji bo destekdayîna Kobanê, hevalan li ser xeta Mebrûka du cebhe çêkirin. Cebheyek ji bo êrîşa li ser Mebrûka û ya din jî ji bo êrîşa li ser Rawiya û Dehma bû. Baskekî li wê derê zêde rola xwe neleyist û bû sedem ku şahadeta grûbeke heval li milê Mebrûka pêş bikeve. Ji bo ku alîkarî bidin Kobanê û barê Kobanê sivik bikin, heval ji hemû milan ve ketibûn tevgerê. Ji ber kêmasiyên teqtîkî û plansaziyê li wê derê şahadeta hevalan çêbû. Ji bo alîkariyê, ji Cizîrê gelek şervan derbasî Kobanê bûn da ku Kobanê ji destê çeteyan were rizgarkirin. Bi vî awayî seferberbûnek çêbû.

Piştî wê jixwe me hêza li Cizîrê bi şiklekî xurt tanzîm kir, ji hemû milan ve xwe amade kir. YPG hêza xwe ya leşkerî hîn bêhtir di ber çavan re derbas kir. Bi tevlêbûna eşîrên derdorê yên wekî Şamariyan YPG mezintir bû. Hêzên bi tevger hatin çêkirin, hêzên çekên giran hatin avakirin. Ji bo pêngaveke berfireh me hêza xwe amade kir; ji bo pêngava Til Hemîs.

**3-Pêngava Mezin a Tolhildana Til Hemîs û Til Berak**

****Di van pêvajoyan hemûyan de Til Hemîs û Til Berak her tim wek du navendên êrîşê yên Cebhet el Nusra û piştre jî DAIŞ`ê bûn. We ev her du cih kengî û çawa rizgar kirin?***

**ÇIYA KOBANÊ:** Til Hemîs ji bo me weke meseleya namûsê bû.

***Çima?***

Diviyabû me Til Hemîs bigirta. Li Til Hemîs gelek ciwan û gelek lehengên me yê bêhempa şehîd bûn. Diviyabû em Til Hemîs bigirin, bi taybetî jî diviyabû ew gundê Huseyniyê bigirin. Di nava taybetmendiyên Apogerî de heye; li cihekî ku wendahî dane, divê li wê dere tola xwe veke û bi ser bikeve. Tu carî bê tolhildan namîne. Li ku derê wendahî hatiye dayin divê tol, tola wan hevalan were rakirin. Li ser wî esasî ji bo me girtina Til Hemîs gelekî girîng bû. Hemû heval bi helwesteke xurt, bi dilekî germ ji hemû milan û hemû şêweyan ve xwe amade kirin, ji bo ku Til Hemîs bigrin.

Hêza me ket nava perwerdeyeke leşkerî; çawa bi ser de bigirin, dê çawa pêngav bê çêkirin. Li pêşiya me mesafeyek dirêj û araziyeke berfireh, nêzî 360 gundî hebû, divê em plansaziyê çawa çêbikin? Beriya em derbasî pêngava Til Hemîs bibin, me civîneke berfireh li dar xist. Di civînê de nîqaşên bi vî awayî pêş ketin.

Piştî serkeftina Kobanê li milê Cizîrê jî bi hêzên koalîsyona navnetewî re pêwendiyeke me ya giştî çêbû. Wê demê têkiliyên me pir xurt nebûn, lê piştî wê çêbûn. Piştî serkeftina Kobanê wisa peymanek çêbû. Di pêngavaTil Hemîs de gotin, “*em bi balafirên keşfê û balafirên şer dikarin destek bidin*.” Cara yekemîn bû ku li Cizîrê em ê bi alîkariya balafiran pêngavê li dar bixin.

Li ser wî esasî me ji bo pêngava Til Hemîs hinekê hêza xwe perwerde kir, amade kir. Li ser bingehê ku balafir lê bidin û hêza me jî di bêjahiyê re pêş ve biçe amadekarî çêbûn. Hêza me dê çawa êrîş bike? Plansazî bi vî rengî bû; baskekî hêzê dê ji milê Til Marûf û Ebû Qasayib bikeve tevgerê. Ebû Qasayib derdorê 15 km dûrî Til Hemîs e.

Baskekê ji milê xeta petrolê ango gundê Hedadê bikeve tevgerê. Baskek jî dê ji milê başûr ve were. Berê baskek ji milê Til Koçer û riya navdewletî ve dihat. Me got em vêcarê wisa nayên. Singesing em êrîş nakin. Ji şaşitiyên xwe yên berê me ders derxist; ew plana me ya berê, bi xwe re wendahî anîn. Baskek dê ji milê Başur ve jî bihata. Me bi pêşmergeyan re nîqaş kir, lewma pêşmergeyan jî dixwest em xeta Til Hemîs bigirin. Ji ber ku pêşmerge di xeta sînor de bûn û li hemberî wan DAIŞ hebû. Paqijkirina çeteyan bi kêrî wan jî dihat.

Ew baskê Başûr, di nava xwe de dibû du bask; ji wan baskek dê raste rast biçûya Mefraq Xesan bigirta. Baskek jî dê biçûya ew riya giştî qut bikira û xeta Qurtuba wan bigirta. Me bi vî rengî plansazî çêkir. Dibe ku di cebheyên me yên xeta Til Marûf û xeta Hedadê de hinekê singesing şer çêbibûya. Lê di vir de baskê ku rol û rista xwe girîng bû, baskê başûr bû, Lewra ji piştê ve dihat.

***Ew pengav bi hêzeke çawa hate meşandin, hejmar çiqas bû?***

Her cebheyekî nêzî 1200 şervan tê de cih girt. Eniyek 1500, yek 1200, yek jî nêzî 1000 şervan bû. Bi vî rengî hêz hate tanzîmkirin û li ser wî esasî amadekariya pêngava Til Hemîs hate kirin. Mirov dema beriya pêngavê li çavê şervanan, fermandaran dinêrî wek ku agir jê dibarî. Rihê întîqamê, rihê serkeftinê te tê de didît. Ya din jî li Til Hemîs hesabxwestinek, tolhildanek hebû. Hemû heval di zanebûne vê de bûn. Li Til Hemîs hesabekî em bistînin heye, em ê Til Hemîs bigirin, rizgar bikin ku tola wan hevalên şehîdê Til Hemîs rakin. Ji ber wê yekê heval bi rihê serkeftinê, bi dil tevdigeriyan. Me ev di hemû hevalan de dît.

Teqtîka me yek jî ev bû; beriya em pêngav bikin, dijmin dizanî bû, agahî girtibûn. Lê me xwe wisa dida nîşan da ku em ê singesing êriş bikin. Bi vî rengî amadekarî kirin, mayin çandin, jixwe berê bi awayekî berfireh kiribûn. Di wan gundên cebhe de mewzî û çeper çêkirin û çandina mayinan pir zêde kiribûn. Wan amadekarî di cebheya pêş de kiribûn, tedbîrên xwe jî girtibûn.

Piştî hemû amadekariyên me xilas bûn, em ketin tevgerê. Pêngava Til Hemîs 2’yê Sibata 2015’an dest pê kir. Bi awayê ketina tevgerê ya hemû baskan me destpê kir. Baskê me yê milê Til Marûf û milê Hedadê bi şev ketin tevgerê. Li wê derê destpê kir. Baskê me yê başûr jî dê bi roj biketana tevgerê. Hemû hêzan cihê xwe girtibû. Çend gundên destpêkê hevalan girtin. Bi pevçûnên sivik, ew der hatin girtin. Paşî şer û pevçûn destpêkirin. Hevala diçûn, pevçûn derdiket û li cihekî disekinîn. Vêcarê qordînatê dijmin didan balafiran û balafiran jî lê dida. Di bin lêdana balafiran de bask hêdî hêdî pêşve diçûn. Hin çeteyan di hin malan de xwe veşartibûn. Ji xwe re cihok kolandibûn û xwe xistibûn bin axê. Yanî di nava malê de ji xwe re stargeh çêkiribûn. Heval pê hesiyan û ew grûbên wisa di nava gund de îmha kirin.

Baskê milê Til Marûf peş de çû, girê Qerêse ku li pêşiya Til Marûf e û 15-16 km nêzî Til Hemîs e, girtin. Ebû Xezef jî girtin û hin bi hin hêval pêş ve çûn. Pêngaveke berfireh bû û di bin kontrolê de bû. Qordîneya giştî li ser baskan hakîm bû û ew şaşitiyên berê derketî pêş, derneketin.

Bi roj baskê me yê milê başûr kete tevgerê. Gundek li pêşiyê hebû, heval di milê sînor re ketin êrîşê û bi teknîkê lê dan û ew gund girtin. Di wî gundî de hevalan 2 doçqayên 23, doçqeyeke 14,5, 6-7 qilêş, 2 BKC, 2 B-7, 1-2 erebe girtin. Hevalan xwe gihandin ser cadeya giştî. Paşî hevalan gund bi gund dewam kirin û gundê Qurtuba jî girtin.

Dîsa baskê me yê milê Xesan êvarê êrîş kir û şerekî giran derket. Ji êvarê dest pê kir û hetanî ber destê sibê şerekî giran qewimî. Li wê derê hevalekî me yê biyanî jî şehîd ket. Bi giştî 2 hevalên me şehîd ketin. Heval bi wî rengî destwerdana xwe berdewam kirin, şer jî giran didomiya. Xesan biketana, ji bo DAIŞ'ê hinekî giran dihat. Hetanî destê sibê li ber xwe dan. Balafiran lê didan û li aliyekî jî heval pêş de diçûn. Di dawiyê de hevalan gundê Xesan girtin. Gundê Qurtuba jî hate girtin û her du baskên me gihîştin hev. Piştre gundên Zehran û Ukaz jî hatin girtin.

Hevalan êdî bi awayekî bi lêz gund digirtin û pêngava Til Hemîs bi lez berdewam dikir. Bi wê hêza xurt heval ji hêla başûr ve 8 km nêzî Til Hemîs bûn. Girek li derdora Til Hemîs heye, ew jî girtin. Baskên wî milî jî pêş de hatin û bi vî awayî Til Hemîs kete çemberê.

Hêzên mezin, hêzên mezin ji milê psîkolojîk ve jî bandorekê çêdikin. Dema ku dijmin hêza pirhejmar dibîne çok lê dilerizin. Me ji hêla başûr ve bi çend hewanan lê da. Piştre bask hatin diyar kirin û heval ketin tevgerê, ew gund dan ber xwe. Bi rastî ji bi şiklekî wisa bi lez heval gihîştinê; yanî mesafeyekî 40 km heye, hevalan di 5-6 rojan de hemû qut kirin, girtin. Baskên me yên din jî hatin, êdî cih li dijmin teng bû; mînak li hin cihan 3 km mabû, li hin cihan 5, li hin cihan 2 km mabûn ji Til Hemîs re. Hêza eşîra Şamariya bi navê Sanadîd jî tevlê pêngavê bibû û bi rola xwe rabû.

Li pêşiya Til Hemîs navenda elektîrîkê heye. Hevalan berê xwe nêz kiribûn. Piştre yekser ketin tevgerê û cihê elektirîkê girtin. Nesekinîn û bi wê lezê çûn girê di nava Til Hemîs de jî girtin. Me agahî da qordîneya giştî, me got ku hevalan gir girtiye. Heta hevalan em rexne jî kirin û gotin "*çima hûn ewqas dilezînin, dibe ku balafir şaşitî bikin.*" Êdî me nekarîbû pêşiya hevalan bigirtana! Jixwe beriya em êrîş bikin, baskekî me çûbû û li ser rêka di navbera Til Berak û Til Hemîs de hakîmiyetek çêkiribû. Bi doçqayê nedihişt kes mûdaxale bike û kes derkeve. Heval bi lez çûn û ketin Til Hemîs. Bi vî awayî bajarê Til Hemîs hate girtin.

Di bajêr de 5-6 doçqayên 14,5 û 23 ketin destê me de. Dîsa obuseke mezin ya 130'î kete dest. Ji bilî wan gelek çek û cebilxane û bi tonan mayin desteser bûn. Me ew mayinên di nava bajêr de hemû bê bandor kirin. Heval çûn û sawama jî girtin, li ser sawama aleke mezin a YPG vedan. Derdorê Til Hemîs hate paqijkirin û li ser wî esasî serkeftina Til Hemîs çebû. Di 7 rojan de Til Hemîs hate girtin.

Di wê pêngavê de wendahiyeke me ya giran jî çêbû. 20 hevalên me yên leheng gihîştin şahadetê. Li gelek cihan pevçûnên welê giran jî çêbûn. Wan hevalan bi rihê fedaî şer kirin, bê dudilî ji bo Til Hemîs bistînin û tola wan hevalên di pêngava yekemîn de şehîd ketine, rabikin.

Piştre di cih de xeteke parastinê hate çêkirin. Me digot, pêngav dê nêzî 15 rojan bajo, an jî dibe ku dirêjtir jî bike. Me amadekariya xwe li ser wî esasî kir. Lê bi şiklekî lez hate girtin. Ew hêzên hevpeymanê jî mane şaş, digotin, "*hêzeke welê bi lez, bê teredût, wêrek û li bejahiyê bi teqtîkeke nûjen ku tevdigere, me nedîtiye!*"

Hevalan di nava Til Hemîs de, dîlaneke berfireh girtin. Dema Xesan jî hate standin dîlanek hate girtin. Li gel wan hêzên Sanadîd, şêxê Eşîrê jî li gel me bû; tevî me hereket dikir. Strana "Ya Tanaya" digotin, bi dîlaneke bi vî rengî û bi kêfxweşî, bi dîmenên nû hevalan Til Hemîs girtin. Çeteyan, ew hevalên me yên ku di pêngava yekemîn de şehîd ketibûn, anîbûn li Til Hemîs veşartibûn. Hevalan 3-4 çete dîl girtibûn, beriya wê jî qederek dîl girtibûn. Di vê pêngavê de, yên ku bi çeteyan re tevdigeriyan jî hatin girtin. Yên çete bi xwe nêzî 20 kesan bûn. Gelek dîl ketin destê me. Wan kesên dîl bûne, cihên hevalên ku berê şehîd ketine dizanîbûn, me hevalên xwe yên şehîd derxistin û birin. Çeteyên hov bûn, ew hevalên me yên şehîd hemû wisa xistibûn gorên komî.

Bi rastî serkeftina Til Hemîs ne tenê weke pêngaveke serkeftî, weke serkeftina gelê Kurd bû. Ew hesabê me yê li Til Hemîs mayî, ew şehîdên ku me dayî, tola wan rakirin bû. Heval bi şiklekî lez ketin Til Hemîs û çûne ser bi dehan cenazeyê çeteyan de. Li ser wî esasî bajarê Til Hemîs hate rizgar kirin, ji destê çêteyên DAIŞ'ê hate girtin. Li ser wî esasî me çeperên xwe çêkirin û li derdora bajêr hemû xendek çêkirin.

Hesabekî din jî mayî gundê Huseyniyê bû. Diviyabû were rizgar kirin. Di cih de ji bo gundê Huseyniyê baskekî mezin derket. Hevalan êrîş kirin û gund girtin. Ji bo tola wan hevalan ew der hate girtin. Ev gund ji bo me gelekî girîng bû. Ji bo rakirina tola wan hevalan, ev pêwîst bû.

Bi rastî jî her kes şoq bû. Hem eşîrên Ereb yên wan derdoran, weke eşîrên Şerabiya û Şamariyan, eşîrên cûda cûda gelek şaş man ku Til Hemîs hate girtin. Helbet di dewletê de jî tirsek hate çêkirin. Dewletê dixwest were û wan gundên derdorê bigire da ku cebheya xwe fireh bike. Me di cih de xeta xwe çêkir ji bo ku dewlet bi pêş de neyê. Me tedbîrên xwe ji wî milî ve jî girtin.

Piştî wê hevalan êrîş kirin û Til Berak jî di rojekê de girtin. Bi pêngaveke serkeftî, destpêkê Til Hemîs piştre Til Berak hate girtin. Dema Til Hemîs ket, jixwe Til Berak jî şikestibû. Hevalan li wir jî gelek alavên leşkerî bi dest xistin. Dîsa êrîşê li ser gaziya Til Berak hate kirin, tola wan hevalên ji Qamişlo ku li wir şehîd ketine hate girtin. Ew gundên pêşiya Til Hemîs, nêzî 25-30 km hatin paqijkirin. Li wan deran xetek çêbû. Xeta me ya pêş, milê Xizêla bû. Hevalan li pêşiya Xizêla jî xetek çêkirin û êrîş kirin. Lê li wê derê 3 hevalên me şehîd bûn.

***Deskeftiya herî mezin a vê pengavê çibû?***

Di encamê de me xetek çêkir. Ji sînorê Başûr dest pê dike û hetanî tê Xizêla, li Xezêla derbasî milê Ûmrûs dibe. Bi wî rengî xetek derbasî milê Til Berak dibe. Li pêşiya Til Berak û Til Hemîs xeteke berfireh hate çekirin. Jixwe xeta Qamişlo û Til Berak jî vebû. Xeta ji Til Hemîs diçe Rimêlan paqij bû, vebû. Disa xeta ji Xesan û Til Hemîs diçe heya Til koçer û riya giştî vebû. Bi vî awayî sînorê me fireh bû.

Hêzên YPG'ê û YPJ'ê, hêzên Asayîşê tevlî vê pêngavê bûn; hêzên me yên Asayîşê, di hemû pêngavan de tevlê dibûn. Xeta pişta YPG timî Asayişê digirt. Beşeke hêzên Sanadîd, tevlî pêngavê bûn; feydeyeke wan jî çêbû, ji ber ku wan arazî nas dikirin, me ew jî ji bo alîkariyê xistin dewreyê. Di wê derê de gelê Ereb, hîn zêdetir nêzî me bûn. Di encam de DAIŞ, di xeta Til Hemîs û Til Berak de şikest û revîn milê Holê û Şedadê. Di wê pêngavê de hinek belge jî ketin dest me.

***Ew belgeyên ku hûn qala wan dikin li ser çibûn?***

Di wan belgeyan de her tişt diyar bû ku dewleta Tirk çawa di milê cebilxane, tenduristî, lojîstîk û hwd de piştgiriya çeteyan dike. Dîsa hinek ji wan çeteyan Tirk bûn. Hatibûn û tevlê DAIŞ'ê bûbûn, hevalan ew girtin. Belgeyên mijara bazirganiya petrolê di xeta Girêspî û Tirkiyê de hemû ketin destê me. Di nava DAIŞ'ê de hêzên muhacir ên Çeçenî zehf bûn. Ev hêzên muhacir dikevin şer. Jixwe hêviyên wan ên jiyanê nemane. Wekî din ji gelên din weke Îngiliz, Frensî, Afganî, Iraqî, Siûdî, Misrî, Dubaî, Qeterî, Tûnisî û hwd hebûn. Hêzên întîharî gelek ji wan ciwanên temen biçûk in, bin navê Îslamiyetê de ew bi kar dianîn. Me hêzên bi vî rengî di nava van şeran de dîtin.

Piştî rizgarkirinê jî çeteyan êrîşî hin cihan kir; mînak êrîşê milê Xizêla kirin, dîsa êrîşî girekî li wan milan kirin. Lê hevalan ew êrîş hemû şikênandin. Piştî girtina Til Hemîs û Til Berak, di DAIŞ'ê de şikestineke berbiçav çêbû. DAIŞ'ê demekê bi pêngavên xwe, di êrîşê de bû. Li ser gel tirsek çêkiribû û digot, "*ez şer nakim, ala min şer dike!*" Bi rasti jî li ser gel, li ser PDK, li ser artêşa Iraqê û artêşa Suriyê tirsek çêkiribû. Weke gurê ku bikeve nava pez, wan hêzan tirseke mezin jiyan kirin. DAIŞ demekê di êrîşê de bû, lê piştî ku YPG-YPJ kete tevgerê, pişta wan û xofa ku ava kiribûn ji bingeh de şikest.

**'Bila 10-15 metro werin nêzî me, piştre ez ê lê bidim!'**

Piştî rizgarkirina Til Hemîs êrîşek li ser Til Ebû Heyder jî çêbû. Til Ebû Heyder girekî nêzî Xizêla ye. Dijmin bi şev, bi awayekî berfireh êrîş dike. Hevalên me yên YPJ'ê li wê derê bûn. Hemû hevalên jin bûn, ez bawer dikim 2-3 hevalê xort jî li gel wan bûn. Dema ku çete vedizine nava gir, heval ferq dikin. Di cih de heval hemû çeper digrin. Çepera xwe çêdikin û yekser dema dijmin tê, di mesafeya nêz, wek 230 metro de bi awayekî giran lê didin. Heval wisa ji nişka ve lê didin û dijmin tar û mar dikin. DAIŞ şoqekê jiyan dikê. 12 cenaze wan dikevin erdê. Yên din jî direvin, heval dikevin pey wan û wan jî dikujin. Rihê êrîşê yê hevalên YPJ'ê û rola ku ew dilîzin girîng e. Ji ber ku YPJ, bi rastî bi rihê xwe yê têkoşer û berxwedêr moral dide. Di şer de ji milê berxwedanê ve tu carî çepera xwe bernade û hêzeke vîn û moralê ye. Bi vî awayî li hemû cebheyên pêş yekîneyên YPJ'ê xwediyê roleke girîng in.

Ji bo azadiya jinên cîhanê bi giştî mînakek derket holê ku li Kobanê jî mohra xwe li dîrokê da. Bi heman awayî li milê Cizîrê jî ji milê teqtîk û rih ve, ji mile baweriyê ve bi rastî jî roleke girîng û sereke ya YPJ'ê heye. Di wî girê Til Heyder de jî bi rastî destanek çêkirin. Mînak çete dikevin qenalê, hevalekî xort dibêjê, "*de lê de*." Lê hevala jin dibêje, "*na, bila werin mesafeya 10-15 metro, piştre ez ê lê bidim!*" Dijmin dikeve wê mesafeyê, heval lê didin û wan hemûyan dikujin. Diçin ser cenazeyên wan û çekên wan radikin. Piştî serkeftina xwe, hevalên me yên YPJ didin tilîliyên serkeftinê.

Dema me dest bi pêngava Til Hemîs kir, dijmin ji bo ku pêngava me vala derxe û serkeftina xwe li cihekî din nîşan bide, êrîşî bajarê Til Temir kirin. Ji milê Çiyayê Kizwana ve êrîş kiribûn û ew gundên derdora ava Hesekê û Til Temir girtibûn. Di wan gundan de xwe bi cih kiribûn. Dîsa Til Temir xistibûn dorpêçê, da ku bistînin. Mînak girê Tala û girê Mixas girtibûn, jê re dibêjin Til Mixas. Hatibûn Ebû Tîna, Girê Goran û Girê Demîşo girtibûn. Ango Til

Temir xistibûn çemberê da ku pêngava me ya li ser Til Hemîs û Til Berak vala derxin. Bi vî awayî dixwestin barê li ser Til Hemîs sivik bikin.

Lewra jî beşek ji hevalên me, hîn pêngava Til Hemîs yekser dest pê nekiribû, çûn wê derê ji bo dest werdanê bikin. Pevçûneke giran çebû. Hevalan nehiştin çete bikevin Til Temir. Li wê derê berxwedaneke mezin hate jiyankirin. Bajar neket, lê ew gundên derdora bajêr girtin. Dîsa di wê xeta gundê Xerîta de êrîş kirin û hevalan li wê derê li ber xwe da. Di Xerîta de 5 erebeyan xwe teqand, êrîş kirin ji bo ku wê derê ji dest me bigirin. Lê hevalan li ber xwe dan.

***Duyemîn pêngava Til Hemîs û encamên wê, hûn ê ji me re çawa rave bikin?***

**AYTEN SERÊKANIYÊ:** Jixwe wê demê xeta Cezaa bi giştî ji DAIŞ`ê hatibû paqijkirin. Piştî serkeftina wê xetê, ji ber ku enî pir berfireh bibû divê careke dîtir ji bo Til Hemîs û Til Berak pêngavek pêş biketana. Ji ser pêngava yekemîn a Til Hemîs û Til Berak, salek derbas bûbû. Bîryarek ji bo pêngavê hatibû girtin. Di wê navberê de berxwedana Kobanê derket pêş. Bi Koalîsyona Navnetewî re jî têkilî çêbûbûn û wê balafir jî têketana dewrê. Ew şêwaz cara yekemîn li Kobanê pêş ketibû. Ji bo pêngava Til Hemîs û Til Berak jî cara yekem bi vî awayî hate plankirin. Ji her alî ve amadekarî dihatin kirin.

Wek min got cara yekem bû ku li Cizîrê jî bi Koalîsyonê re têkilî dihata danîn. Ya rast, Koalîsyonê bi xwe jî dizanî ku li vê derê li derveyî me kes nikare li hemberî DAIŞ'ê şer bike. Têkiliya li Kobanê, ji ber ku şer û berxwedan di qada navnetewî de olan dabû, çêbû. Lê bi giştî li Sûriye û Rojava, tu hêzeke din ku Koalîsyon bikaribe li gel wan li hemberî DAIŞ'ê şer bike tune bû. Neçar mabûn ku bi me re bikevin têkiliyê. Li ser vê esasê jî me hedef diyar kir û me Til Hemîs û Til Berak hilbijart. Piştî salekê careke dîtir pêngavek pêş xistin, pêwîst dikir. Şahadetên ku di pêngava yekemîn de hatibûn jiyankirin jî, ew yek li ser me ferz dikir û pêwistiya tolhildanê hebû.

Pêngava duyemîn jî, di zivistanê de hate kirin. Şert û mercên hawayî jî ne baş bûn. Ji ber wê yekê fikarên hevalan jî çêdibûn. Her wiha divê amadekariyên hevalan jî bihatana xurtkirin. Ji milê leşkerî ve hemû hêz bihata perwerdekirin, da ku em vê carê pêngavê bi ser bixin. Ji ber van sedeman pêngav hindekî hate paşxistin. Li ser vî esasî li hemû cihan amadekariyên pir xurt hatin kirin. Bi taybetî di xeta Qamişlo û Cezaa de, bîryar hate girtin ku hêz mehekê xwe perwerde bikin û amade bibin. Dema ku amadekarî xilas bûn, rewşa hawayî jî hindekî baş bû. Hemû amadekarî di ber çavan re hatin derbas kirin û bîryar hate girtin ku di 2'yê Sibatê de pêngav destpê bike.

Di pêngavê de divê 3 hêz li ser esasê sê xetan tevbigeriya. Hêzek ji milê başûr ve hêzek ji milê Hedadê ve û hêzek jî di xeta navîn re wê bihata. Ji milê Qamişlo ve jî wê 2 hêz bihatana. Li ser vê esasê plansazî hate kirin. Ji ber vê yekê me qadeke berfireh girtibû û me yê gund bi gund lêbixista û biçûna. Li ser kîjan hêzê wê kî berpirsiyar be, hatibû diyarkirin. Bi vî rengî me dest bi pêngavê kir. Em di nava hêzên Dirbêsiyê û Qamişlo de bûn. Ez, hevalê Şervan û hevala Zinarîn li ser hêzekê bûn. Hevala Adar, hevalê Botan, hevalê Rûbar Qamişlo û Sozdar Qamişlo jî li ser xetekê bûn. Ev hêzên ku ji milê Qamişlo ve diçûn. Dijmin jî hemû amadekariyên xwe kiribûn. Lewra me bi hêzên mezin amadekarî dikirin û keşfên xwe pêkdianîn.

Operasyon destpê kir û ji aliyekî ve balafir lê dida, heval jî ji bejahiyê ve diçûn ser çeperên dijmin. Li Cizîrê cara yekemîn cihê ku balafir lêda, ew der bû. Roja ewilî wisa bi serkeftî derbas bû. Piştî wê heval gund bi gund diketin pevçûnê û pêş ve diçûn. Çeteyan li çend cihan hinekî li ber xwe dan. Li hindek cihan jî pevçûnên dijwar çêbûn. Herî dawî di 6-7 rojan de ji milê Cezaa û Qamişlo ve em gihiştin Til Hemîs. Qadeke pir berfireh me girt ber xwe. Ji ber ku çend gundên nêzikî Til Hemîs mabûn, dizanîn ku ew gund bikevin wê Til Hemîs jî bikeve. Lewra di wir de qederekê li ber xwe dan. Lê li hemberî êrîşên dijwar yên hevalan pir zêde nikarîn xwe bigrin.

Bi rastî jî vêcarê kordîneyeke pir bi rêkûpêk hebû û her pêngavekê encam digirt. Dema ku me ew çeperên derdora Til Hemîs jî şikandin, hêzên me yên ku ji milê başûr ve hatibûn, di piştê re ketin bajêr û ala xwe li ser embarên genim yên Til Hemîs ku berê gelek heval tê de şehîd ketibûn, çikandin. Ev dihat wateya rakirina tola wan lehengên ku di pêngava yekemîn de şehîd ketine. Jixwe di pêngava duyemîn de, hemû heval bi hesteke mezin ya tolhildanê şer dikirin. Digotin, "*çi dibe bila bibe, em ê vê carê tola wan hevalan rakin.*" Di civîn û perwerdehiyên ku di pêvajoya amadekariyê de hatine çêkirin de jî, ew îddîa bi awayekî pir xurt derketibû pêş. Bi taybetî hêzên Qamişlo bi hêrseke pir mezin diçûn ser Til Hemîs. Lewra di pêngava yekemîn de gelek hevalên ji Qamişlo şehîd ketibûn û bandorek pir mezin li ser Qamişlo çêkiribû. Wan hevalan bi awayekî fedaiyane pêş ve diçûn.

Dema ku em gihiştin ber Til Hemîs, plansazîya me ya duyemîn hebû. Divê me destpêkê Til Hemîs bixista, piştre berê xwe bida Til Berak. An na hêza me parçe bibûya, dibe ku xeterî hebana. Vê carê zêdetir bi teqtîk tevgerînek hebû. Tecrûbeyên pêngava yekemîn hebûn, ji wê encam hatibûn derxistin û li gorî wê plansazî hatibûn çêkirin. Li gorî vala derxistina teqtîkên dijmin jî tevgerînek hebû. Dema ku bi vî awayî Til Hemîs hate xistin, piraniya hêza me ya Qamişlo, careke dîtir vegeriyan Qamişlo û em derbasî Til Berak bûn.

Dema ku em derbasî milê Til Berak bûn, dijmin xafil hate girtin, pir zêde ji wî milî ve tedbîr negirtibûn. Dijmin li bendê bû ku em di milê Til Hemîsê re êrîş bikin. Lê em vegeriyan Qamişlo û di wî milî re yekser me berê xwe da Til Berakê. Hevalê Rûbar Qamişlo berpirsiyarê hêza me bû. Bi vî awayî me Til Berak xiste dorpêçê. Li hin cihan pevçûn çêbûn, lê hevalan lêxistin û paqij kirin. Cihên stratejîk yên mayî jî me bi carekê re girtin. Heya bû serê sibehê Til Berak paqij bû. Di wir de jî qederek cenazeyê çeteyan û seyare û cebilxana wan kete dest de. Bi vî rengî pêngava Til Hemîs û Til Berak serkeftî bû.

Dema ku me bi giştî Til Berak rizgar kir û em gihiştin cihê benzînxaneya ku di pêngava yekemîn de heval birîndar ketibûn û dijmin xwestibû hevalan dîl bigre; di wê derê de dijmin teqtîkek nû pêş xist. Dema ku hevalan bi giştî arazî û bajar xistin bin serweriya xwe, tabûrek heval dîsa ketibû benzînxaneyê. Hevalan di wê derê de bêhna xwe vedida, tenê sekvanên xwe danîbûn. Di riya din re dijmin bi motoran hat û derdora hevalan girt. Wê demê ji aliyekî ve li ser hevalan sûîqast şixûlandin, ji binî ve jî êrîşî hevalan kirin. Di wê derê de hevalek şehîd ket.

Di giştî bajarê Til Berak de, li wê derê hevalek şehîd ket. Lê ji ber ku di wê derê de hemû hevalên me û çekên me yên giran jî amade bûn, hevalan careke dîtir êrîş kirin û ew hevalên di dorpêçê de jî xilas kirin. Di wê pêvçûnê de jî 7-8 çete hatin kuştin. Wekî din heya milê Holê jî em bi awayekî serkeftî çûn. Li milê Til Hemîsê gundek hebû, pir li ber xwe da, ji bo ku em derbasî milê Holê nebin. Dema ku ew pêngav serkeftî bû, dijmin careke dîtir êrîşî Serêkaniyê kir. Teqtîkên ku me di vê pêngavê de dane şixûlandin, di êrîşa Serêkaniyê de wan xwest li hemberî me bidin şixûlandin. Lê di pêngava me de heval pir zîrek bûn.

Dema ku me pêngav bi ser xist rejîma Sûriye jî ji milê Hesekê ve hat û xwest ji xwe re xetekê çêbike. Lê me zû tedbîr wergirt, me xeta xwe danî û me nehişt pêş ve werin. Lewra rejîmê dixwest vê fersendê ji bo xwe bi kar bîne.

Dema ku pêngava Til Hemîs û Til Berak berdewam dikir, dijmin li cebheya gundewarên Serêkaniyê ketibû êrîşê û hindek gir girtibûn. Bi vî rengî bi hêzeke mezin diviyabû ku em dîsa derbasî Serêkaniyê bibin.

***Bi rastî jî şer li pey şer, pêngav li pey pêngavê ye. Piştî rizgarkirina Til Hemîs û Til Berak vê carê dîsa li gundewarên Serêkaniyê, Til Temir û Hesekê êrîş û şer hene, em dixwazin hûn wan pêvajoyan jî bînin ziman…***

**AYTEN SERÊKANIYÊ:** Bi vî awayî em dîsa derbasî cebheya gundewarên Serêkaniyê bûn. Dijmin hindek der girtibûn. Me xwest careke dîtir em wan cihan bigrin. Lewra xetek bû û di nava wan de cihê herî stratejîk jî Til Boxa bû. Til Xenzîr jî ji bo parastina Serêkaniyê pir stratejîk bû. Jixwe hevalan di wir de keleheke xurt çêkiribû. Mirov diket kelehê, nedizanî ku çawa derkeve, Lewra pir bi rêkûpêk bû. Lê kêmasiya wê kelehê, ji binî ve derî nehatibû vekirin. Ji bo rewşên awarte divê deriyekî ku ji bo araziyê derkeve bihata çêkirin. Tenê deriyekî bilind di kelehê de hebû.

**4-Berxwedana Keleha Til Xenzîr**

Dema ku dijmin ew cihên dîtir standin, êrîşî Til Xenzîr kir. Heval dibêjin, li derdora Til Xenzîr dijmin heye, lê ji ber ku hevalên me yên li wir pir bi xwe bawer in, cidî nagrin. Jixwe derdora kelehê jî hemû mayin bûn. Lê dijmin bi awayekî veşartî tê û wan mayinan radike. Bi vî rengî heya seat 9’an pevçûn çêbûbûn, heya wê seatê jî hevalan dijmin cîdî negirtibûn. Dema ku tekmîl didin hevalan jî dibêjin, tiştekî pir cidî tune ye. Lê di seat 9’an de dema ku êrîş dijwar dibin, wê demê dikevin cidîyeta şer. Piştî wê nikarin bi hevalan re têkilî jî danin. Lewra di kelehê de cîhaza pêwendiyê nakşîne.

Hevalê Rûbar, weke mûdaxale çû Til Xenzîr. Ji ber ku dijmin ji milê Til Temir ve jî êrîş kiribû. Piştî ku li Til Hemîs dijmin têk çû, teqtîkeke bi vî rengî meşandin û ji milê Serêkaniyê ve êrîşî her cihî kirin. Dema ku dijmin êrîşî van cihan dike, heval berxwedaneke mezin dikin. Her wiha ji her milekî ve ji hevalan re teqwiye jî diçû. Lê dijmin ketibû satirên derdora keleha Til Xenzîr û ew der girtibûn. Çend hevalên jin bi awayekî fedaî diçin û dikevin satiran jî. Her wiha gelek hevalên din ji bo ku wan hevalên di dorpêçê de rizgar bikin, êrîş dikin û birîndar dibin. Lê nikarin dijmin bişkînin. Lewra dijmin ketiye satirên kelehê, heval di kelehê de ne û hatine dorpêçkirin.

Hevalên di hundur de ji milê Rawya ve şer dikin û nahêlin ku dijmin bikeve hundur. Hevalê Birûsk jî xwe diavêje derî, da ku xwe bigihîne hevalan. Lê ji ber ku derî ji milê hundir ve hatiye girtin, nikare veke. Hevalên derve jî nizanin ku di hundurê kelehê de heval hene û hîn keleh neketiye. Dema ku dibînin dijmin satirên kelehê girtine û hevalên derve nikarin wan bişkînin jî, dibêjin qey dijmin ketiye kelehê jî. Li ser cîhazê jî nikarin xwe bigihînin hevalan. Dijmin jî bi hin dîwarên kelehê re hildikişe û ala xwe pê ve didaliqîne. Wê demê heval yekser bawer dikin ku keleh ketiye.

Heya ber êvarê ku tabûr çû wir jî dijmin nikarîbû bikeve kelehê. Hevalan careke dîtir ji du milan ve êrîş kirin, da ku kelehê bigrin, lê ji ber ku cihê wê gir bû û hemû derdorên wê satir bûn, hevalan nikarîbû bigrin. Heval

ketibûn gund û girtibûn, lê eger keleh nehatiba girtin gund bi kêrî tiştekî nedihat. Bi vî rengî dema ku hevalan nikarî bikevin kelehê û gelek birîndar dan û bawer kirin ku keleh jî ketiye, hevalan gotin ku paş ve bikişin.

Dijmin berê sibê re deriyê kelehê vekir. Di hundurê kelehê de jî hevalan pir li ber xwe dabûn. Hevalên di wê derê de heya guleya xwe ya dawî şer kiribûn û herî dawî bombeyên xwe di xwe de teqandibûn. Piştî ku dijmin tevahî keleh girt û derî vekirin, binê hemû kelehê kiribû mayin û teqandibû. Heval jî bi vî rengî di bin de mabûn. Hevalên di kelehê heta kêliyê dawî jî berxwedaneke bêhempa nîşan dan û şehîd ketin.

Kêmasiyên me û biçûk dîtina me ya dijmin, encamek wisa derxist holê. Piştî êrîşên hevalan, ji bilî Til Xenzîr ew cihên ku dijmin girtibûn hemû careke dîtir hatin girtin. Hevalan ji wan deran hemûyan dijmin paqij kir. Ji ber Til Xenzîr pir asê bû, dijmin tê de cihê xwe çêkiribû û dewleta Tirk jî alîkarî dida wan, me nikarî careke dîtir bistînin. Lê xetên din heya Menacîrê careke dîtir hatin girtin.

**'Hevalên jin xwe avêtin çemê Xabûrê!'**

Vê carê me pêngava Til Temir da destpêkirin. Gelek hevalan di wê pêngavê de bi awayekî fedaî şer kirin, da ku derdora Til Temir bê paqij kirin û ew der nekeve. Jixwe dijmin derdora hêzên me yên Til Temirê hemû girtibû. Di wî şerî de giştî 40 heval şehîd ketin. Ji bo ku nekevin destê dijmin, hevalên jin xwe avêtibûn çemê Xabûrê. Cihê wan dijmin girtibû, hevalan jî heya guleya xwe ya dawî şer kiribûn. Ji ber ku av di navberê de ye hevalan jî nikarî bû xwe bigihînin wan. Bi vî rengî di pêşengîtiya hevala Viyan de, hemû hevalên jin xwe avêtibûn avê.

Ez qet ji bîr nakim. Dema ku me hêz amade kir da ku em êrîşî wan gundên derdora Til Temirê bikin û dijmin jê derxin, lehengiyên pir mezin derketin holê. Hevalan ji milê Hesekê ve çeper girtibûn. Divê ji çar milan ve hêzên me êrîş bikirana. Ew her çar baskên êrîşî jî hevalên jin bûn. Li ser hêzekê hevala Melsa hebû û li ser hêzên din hevala Serena, hevala Evîndar û hevala Mîzgîn hebûn. Ew rihê şer yê hevalên jin di wê derê de gihiştibû asteke herî jor. Ew rihê tolhildanê, ew rihê êrîşê yê YPJ gihiştibû lûtkeyê. Mesela hevala Serena di gelek êrîşan de cihê xwe girt û heya dawî jî şer kir.

Ew şerê Til Temirê jî ne şerekî normal bû. Berxwedaniyên pir mezin çêbûn. Lê Til Temir heya meha Gulanê 2015'an wisa ma. Wê demê me plansazîyek mezin çêkir û da ku ji Hesekê heya Çiyayê Kizwana bê girtin. Lewra her ku me li Til Temir êrîş dikir, wan jî êrîşî Hesekê dikirin. Di wê derê de şerên pir mezin hat jiyankirin. Bi taybetî fedaîtiya hevalê Kendal Baz, mirov tu caran nikare ji bîr bike. Heval di dorpêçê de mabûn, bê dudilî lêda û çû da ku hevalan rizgar bike. Bi wî rihî êrîş kir. Hevalan digot, "*cebilxaneya me nemaye.*" Wî jî digot, "*meraq nekin vaye hevalê we tê alîkariya we.*" Çû, ew heval xilas kirin û bi xwe jî şehîd ket. Hevalên bi vî rengî lehengîtî kirin û şehîd ketin hebûn.

Girek hebû, dijmin 20 caran êrîş kir, da ku bigrin. Lê nikarîn bigrin. Hevala Arîn Şirnex digot, "*heya ku ez di vî girî de bim, ez nahêlim ku ev gir bikeve.*" Wî rihî nedihişt ku ew cih bikevin. Bi taybetî jî hinek hevalên jin hebûn, di wî gundê Xerîta de berxwedaniyeke bêmînak nîşan dan û nehiştin ku çeteyek jî bikeve wî gundî. Dijmin di wê derê de 7-8 maşîne teqandin, lê dîsa jî hevalan ew tepe û gund bernedan. Berxwedanên wê derê bêhempa bûn, mirov nikare baş bîne ziman. Dijmin ji bo ku wan deran bigre ji her milî ve êrîş dikir, lê li hemberî hevalan nedikarîn xwe bigrin. Çiqasa bihatana jî hevalan ew dişkandin. Li Hesekê, Til Temir û gundê Xerîta pêvajoyekî wisa yê berxwedanê hate jiyankirin.

**5-Pêla Rihê Apogerî Gihişte Çiyayê Kizwana!**

Dema ku me pêngav destpê kir, da ku em heya Çiyayê Kizwana ango Çiyayê Abdûlezîz biçin; divê me ji Hesekê ve destpê bikira û ew cih hemû bidana ber xwe û wisa biçûna. Di şevekê de ji xeta Hesekê heya rêka giştî ya bin Çiyayê Kizwana, me paqij kir. Dijmin ji bo xwe Çiyayê Kizwana pir stratejîk didît. Ger ew der biketa, binketina DAIŞ'ê çêdibû. Li gorî plansazîyê divê em li derdora Çiyayê Kizwana bizivirîba û ew sêkoşeya Serêkaniyê, Hesekê û Çiyayê Kizwana bi dest xwe bixista. Lê armanca me ya esasî Çiyayê Kizwana bû. Me jî Çiyayê Kizwana weke cihekî esasî digirt dest. Lewra ger me ew der nexista, cihên me yên dîtir jî di nava xeteriyê de bûn. Çiyayê Kizwana li ser cihên di destê me de jî serwer bû. Her wiha hemû perwerdeyên xwe yên leşkerî û amadekariyên maşîneyên teqînê li wir dikirin. Hin cihên dîrokî yên dewletê li wan deran bûn û hemû jî di destê dijmin de bûn. Ji ber vê yekê şerên pir dijwar çêbûn.

Di wê pêngavê de hevala Evîndar hebû, ji Hesekê tevlê bûbû. Endama YPJ bû, zewicî bû û 3 zarokên wê hebûn, lê dema ku YPJ ava bû tevlî bûbû. Ji malbatê re gotibû, "*berê jî xwesteka min ew bû, lê min nikarî pêk bînim, ji bo pêkanîna vê xwesteka min tu kes nikare bibe asteng.*" Şeva ku em pêngavê bidin destpêkirin got: "*Heval ez dixwazim bi vê pêngavê re yekser tevlê têkoşînê bibim. Lê ez dixwazim biçim ew bîryar û kêfxweşiya xwe,*

*ji malbata xwe re parve bikim!"* Dema ku çû malê û hat, ji kêfan difiriya. Dema ku di nava pêngavê de me gundek girt, dijmin careke dîtir êrîşî wî gundî kir. Hevala Evîndar, tevlêbûn û vîna xwe bi rastî jî di wî gundî de da diyarkirin. Rihê hevala Zîlan di wê derê de da diyarkirin.

Dema dijmin êrîş dike, heval nikarin xwe bigrin û hevalên birîndar jî digrin û ji gund derdikevin. Lê hevala Evîndar dernakeve. Dema ku heval derdikevin balafir dixwazin ku li wî gundî bidin, lê dîsa jî hevala Evîndar ji gund dernakeve da ku hevalên din yên birîndar xwe ji wê derê rizgar bikin. Heval jî di destpêkê de nizanin ku hevala Evîndar di wê derê de maye. Lê balafir dibêje ku hinek hevalên we di wê derê de hîn şer dikin, ji ber wê ez lênadim. Dema ku balafir wisa dibêje, hevalên ku li wê derê mane dipirsin. Ew heval jî dibêjin, "*hevala Evîndar birîndar bû, em şandin lê ew bi xwe ma li wir û got ku hun biçin, ezê pişt re werim.*" Pişt re jî heval nizanin ku hatiye, an na. Heya dawiyê şer dike û şehîd dikeve.

Piştî ku ew heval û dijmin bi bombeyan ketin nava hev û pevçûn pir dijwar bûn, hevala Evîndar wisa şehîd ket. Ew rihê Apogerî, rihê Zîlan di wê derê de nîşan da. Bîryara xwe ya tevlêbûnê, di wê derê de da diyarkirin. Tevlêbûnê mirov dikare di şexsê hevala Evîndar de bide diyarkirin. Di wê pêngavê de serkeftin di şexsê hevala Evîndar û hevalê Serhat de derket holê. Hevalê Serhat jî hevalekî fedaî bû. Hevalê Mervan Pîro jî di wê derê de şehîd ket. Hevalê Mervan jî, ji Serhedê tevlî bûbû û ciwanek bû. Fermandar bû. Berxwedaneke wisa kir û nehişt ku dijmin bikeve cihê wî. Di şexsê wan hevalan de fedaîtî gihişt asta herî bilind.

Dema ku dijmin ket nava gund jî, 20 heval bi awayekî fedaî çûn û gund girtin. Ger ew der biketa me nedikarî Çiyayê Kizwana bigirta. Ji bo ku em negihêjin Çiyayê Kizwana, hemû maşîneyên xwe ku tijî teqemenî kiribûn, di nava me de diteqandin. Gelek hevalên ku wisa bi awayekî fedaîtî şer kirin û şehîd ketin hebûn. Mesela hevalê Zerdeşt hebû, hevalê Rûstem hebû. Hevalê Rûstem di hemû şeran de cihê xwe girtibû. Herî dawî beriya ku em bigihêjin Çiyayê Kizwana, di gundê Omero de şehîd ket. Di wê derê de jî berxwedaneke pir mezin hate nîşandan. Li ser esasê wê berxwedaniyê û rihê êrîşê dijmin nikarî xwe bigre.

Me ji du milan ve êrîş kir, hêzek ji milê Til Temirê ve hêzek jî ji milê Hesekê ve çû. Ji cihekî şûn ve her du hêz gihiştin hev û bi vî rengî Çiyayê Kizwana hate rizgarkirin. Di Çiyayê Kizwana de berxwedanî, fedakarî, lehengîtiyeke pir mezin derket holê. Pêla lehengîtiyê, pêla îradeya ji pola, pêla rihê Apogerî gihişte Çiyayê Kizwana!

**'Çiyayê Kizwana, şikestina DAIŞ`ê ya duyemîn'**

Piştî ku Çiyayê Kizwana bi giştî hate rizgarkirin, dijmin êdî nekarî di Til Temirê de jî xwe bigre. Li cihên ku dijmin heye, heval lê dizîvirîn û dorpêç dikirin. Di wê derê de 100 cenazeyê çeteyan kete dest. Ew gundê ku hevala Evîndar tê de şehîd ket de jî, 60 cenaze zêdetir ya çeteyan kete dest. Di wê derê de şikestineke mezin jiyan kirin. Piştî Çiyayê Kizwana, DAIŞ bin ket. Şikestina ewil di Kobanê de jiyan kir, lê di Çiyayê Kizwana de jî şikestineke pir mezin jiyan kir. Li ser vê esasê Til Temir jî hate rizgarkirin.

Di şexsê gelek lehengên gelê me de, di pêşengîtiya hevala Viyan, Serena û Evîndaran de ew serkeftin hate bi dest xistin. Mesela hevala Zîlan, jineke ku rihê êrîşê li ser dijmin bike pê re hebû. Sê caran em çûn ser gundekî û me nikarî em bigrin. Lê hevala Zîlan bi rihekî fedaî çû ser gund û ew gund girt. Hevala Zîlan ji Mêrdînê bû. Her wiha hevalê Mervan Pîro, hevalê Serhad jî bûn lehengê vê pêngavê. Bi rihê van hevalan, me ew der rizgar kirin. Dîsa Hevala Roza hebû, ciwan bû. Nehişt ku dijmin gaveke jî pêş ve biavêje.

Dema ku ew cih hemû hatin rizgarkirin, ji bo ku xeta Girêspî bê vekirin hewldan hat nîşan dan. Jixwe amadekarî hemû ji bo vê bûn. Divê êdî ji milê Çiyayê Kizwana û Til Temir ve êrîş li ser Mebrûka bihata kirin. Berê jî pêngav li ser Mebrûka hatibûn kirin, lê bi ser neketibû. Carekê hevalan Mebrûka girtibû û dîsa ketibû destê dijmin. Bi vî awayî hevalan nikaribû xwe tê de bigirta. Di wê pêngava ewil ya Mebrûkayê de hevalê Mazlûm Çetîn hebû. Hevalê Mazlûm di hêza yekemîn de êrîşî Mebrûka kir, li ser tabûrê bû. Hevalê Zagros jî di wê pêngavê de hebû. Wan hevalan ji ber ku ew qesa berxwedanî di wan deran de kirine, navê xwe li wir nexşandine.

**FOTO: SEMA DERYA VE PEYMAN ELİ – FOTOĞRAFLARI YAN YANA KULLANILACAK**

Hevala Sema hebû, dema ku heval di êrîşê de tengav dibin, bi xwe dikeve êrîşê û li gel hevala Peyman di Mebrûka de şehîd dikeve. Hevalê Zagros ji Serêkaniyê bû. Wî jî di hemû şerê Serêkaniyê de berxwedaniyeke mezin kir. Hevalekî êrîşkar û fedakar bû. Ji bo ku bibe fermandarekî xurtir pir hewldan nîşan didan. Ew hevalên pêşeng hemû di teqîna Mebrûka de şehîd ketibûn.

Dema ku vê carê pêngava Mebrûka ket rojevê, plansazîyeke xurtir hate kirin. Li ser esasê amadekariyên xurt ji bo pêngava Mebrûka destpê kir. Hevalan ji Çiyayê Kizwana û Til Temir dan ber xwe û hatin. Hevala Evîn Şirnex, hevalê Cîger Qamişlo, hevalê Agir Gever û hevala Hêlîn Mêrdîn di vî şerî de risteke pir mezin lîstin. Di destpêkê de

hevalê Cîger, li ser tabûra Şehît Goran di şerê Serêkaniyê de cihê xwe girt. Birîndar bû, çû û careke dîtir hat û ket nava eniya şer. Pişt re vesaziya wî li Qamişlo hate kirin û di şerê Qamişlo de cihê xwe girt. Di şerê Til Koçer û di şerê Cezaa de cihê xwe girt. Di şerê Til Berak û Til Hemîsê de di asta pêşengîtiyê de cihê xwe girt. Piştî van şeran hemûyan, di şerê Mebrûka de şehîd ket. Bi fedakarî, wêrekî, êrîşkariya xwe dihat naskirin. Bi bombeyan diket nava dijmin. Di nava hêzên Qamişlo û Serêkaniyê de cihekî wî yê cûda çêbûbû.

Her ku dijmin di cihekî de fêm dikir ku wê bişkê û bin bikeve, careke dîtir xwe komî ser hev dikir û ji cihekî din re êrîş dikir. Dema ku pêngava Mebrûka çêbû jî, dijmin xwest careke dîtir êrîşî Hesekê bike. Di meha 6'emîn de êrîşî Hesekê kir. Ji xeta Çiyayê Kizwana re nedikarîn êrîşî Hesekê bikin, Lewra me her cih girtibû. Cihên dîtir jî di navbera me û wan de rejîm hebû. Lê di xeta rejîmê de, ji milê Holê ve xwest êrîş bike. Gelek cihên dewletê girtin û êrîşî cihên me kirin. Di şerê Hesekê de hêzên dewleta Sûriyê li ber xwe nedan û reviyan.

Me jî li gorî wê di wê xetê de cihên xwe girtin. Pişt re li hin cihan rejîmê alîkarî ji me xwest, lê em neçûn. Ji ber ku siyaseteke qirêj û bi qomplo dimeşand. Çeteyan pir dijwar êrîş dikir û gelek birîndar û windahiyên rejîmê çêdibûn. Êdî wek peywireke mirovî, gel û hevalan diçûn birîndarên wan xilas dikirin. DAIŞ bi vî rengî ket bajêr. Dema kete nava bajêr me jî dest bi şer kir.

Di wî şerî de jî gelek hevalên weke Derwêş bi lehengîtî şer kirin û şehîd ketin. Lê gelek cihên stratejîk me girtin. Ev cih DAIŞ'ê hat girtin û me jî ji DAIŞ'ê girt. Êdî me hêzên rejîmê jî dane aliyekî û hevalên me hemû cih digirtin. Bi vî rengî gelek cihên di destê dewletê de jî me girtin. Dewlet di cihekî pir teng de ma. Ew ji bo me bû avantajeke xurt. Niha jî di cihekî pir teng de rejîm maye. Lê ji mehekê zêdetir hevalan li ber xwe da. Ji ber ku derdora Hesekê deşt bû, şer bi zehmetî dihata meşandin.

Em li pişta dijmin zîvirîn û me nehişt ku êdî ji wî milî ve DAIŞ were. Bi vî rengî di hundurê Hesekê de me lêxist, heya ku em gihiştin xeta dîtir ya Hesekê. Ji bo çeteyên di hundur de tenê riyeke revê hatibû hiştin û di dawiyê de di wê derê re reviyan. Di wê derê de jî şerên pir dijwar qewimîn, gelek maşîne teqandin û me şahadetên pir hêja dan. Ji bo ku cihên di destê me de nekevin, ji bo ku pêngavên destpê bûye bigihêjin serkeftinê, gelek hevalan li ber xwe didan û şehîd diketin. Serkeftina Hesekê jî bi berxwedana wan hevalan pêk hat.

***Şerên Çiyayê Kizwana, Til Temir, Hesekê û Mebrûka bi kurahiyên cûda, em ji we guhdarî bikin?***

**ÇIYA KOBANÊ:** Piştî ku Til Hemîs hate rizgarkirin, me bi giranî hêza xwe derbasî milê Serêkaniyê û Til Temir kir. Ji ber ku pêngava me ya Çiyayê Kizwana hebû. Me dixwest Çiyayê Kizwana bistînin, ji bo ku ew çeteyên ku li ser Til Temir êriş kirine em dorpêç bikin. Wê demê di navbera Til Temir û Hesekê de hetanî gundê Xerîta dijmin hebû. Mesele li ber çemê Xabûr ew gundên Asûrî hene, ew gund qederek jê girtibûn. Dîsa ji ber çem hetanî Çiyayê Kizwana hemû cihê çeteyan bû. Çeteyan xwe tê de bi cih kiribûn. Li derdorê Til Temir jî ew gundên wan deran girtibûn û li beramberê hevalan çeper girtibûn.

Me hêzên xwe yên operasyonê derbasî Hesekê kirin da ku em dest bi pêngava Çiyayê Kizwana bikin. Hêza me derbasî milê sedê ango barajê bû. Li ser wî esasî nîqaş hatin kirin, plansazî hatin çêkirin. Encama keşfan derket ku dijmin di wê dere de amadekariyeke mezin kiriye. Erebeyên bombebarkirî zêde zêde anîbûn û di wan şeran de diteqandin. Ji aliyê çandina mayinan ve amadekariyeke mezin kiribûn, cebheyê nêzî Hesekê li beramberî rejîma Suriyê çepereke wan hebû. Qismê Tûwêna hetanî cihê wezîr, hetanî nêzî gundê Xerîta û wan deran hêzên YPG'ê li beramberê çeteyan çeper çêkirin. Navbera Til Temir û Hesekê jixwe qut kiribûn. Dijmin tê de bû. Li wî milî cadê çete bûn, vî milî jî heval bûn. Mesafeyeke 500 metro bû. Di wê mesafeyê de çeper di nava hev de hatibû çêkirin. Cih bi cih êrîş dikirin, pevçûn çêdibûn.

Mînak, carekê li Xerîta bi erebayan, êrîşek kirin. Hevalan li we derê lê dan lê di encama teqîna erebeya bombebarkirî de, 5 hevalên me şehîd bûn. Tevî wê jî hevalan cihê xwe berneda. Piştre hevalan êrîş kirin û ew dijmin hemû îmha kirin. Pevçûnên giran û di nava hev de çêdibûn. Hedefa çeteyan ew bû ku werin cihê wezîr bigirin. Piştre jî Til Temir yekser dorpêç bikin û bistînin. Lê li beramberê berxwedana hevalan; berxwedana YPG û YPJ'ê nikarîbûn bigihin armanca xwe. Her êrîş dikirin cenazeyên wan diketin erdê.

Bi vî awayî ew êrîşên ku dijmin ji hemû milan ve dikirin, hemû hatin şikênandin. Li ser wî esasî hêza me li wê derê kom bû da ku pêngava Çiyayê Kizwana li dar bixe. Hinek hêzên Sanadîd jî beşdarî vê pêngavê bûn. Plansazî bi vî awayî bû; baskek ji milê Aliya, ji xeta Serêkaniyê wê bikeve tevgerê û derbasî Çiyayê Kizwana bibe. Baskek jî dê ji milê Hesekê ve bikeve tevgerê, biçe serê Çiyayê Kizwana. Çiyayê Kizwana sîlsîleyeke dirêj e.

Li gor detayên plansaziyê baskekê biçe koşeya Hesekê wî milê bigire, baskek jî dê biçe koşeya milê beramberê Til Temir, milê Aliya wê koşeyê bigire. Li serê çiyê cihê radarê heye, berê rejîm li wê derê dima û cihekî stratejîk e, ew der jî hedefek bû. Baskek jî dê ji milê Til Mejdel re, xeta Rezazê û gundê Aşra bikeve tevgerê; xwe bigihîne koşeya jorê ya çiyê. Baskek din ji milê Aliya ve bikeve tevgerê hetani Cafer, Til Maxar û hetanî digihê ew zîrveya

bilind ku jê re dibêjin Xêyra. Baskek jî wê di navberê de ji xeta Xerîta derkeve û xwe bigihîne çiyê; hetanî Til Nacar û Qala Sikêriyê.

Bîryar hate dayîn ku baskên operasyonê bikevin tevgerê. Di vê pêngavê de, hîn baş dest pê nekiriye, hevalê Rûbar Qamişlo şehîd ket. Heval Rûbar Qamişlo û hinek heval êrîşê cihekî dikin û hinek kelûpelên leşkerî ji ser dijmin radikin. Di nava wan kelûpelan de bombeyek heye, hevalek pê dilîze û ew bombe diteqe. Ew heval bi xwe şehîd dikeve û hevalê Rûbar jî birîndar dibe, lê piştra şehîd dikeve. Ev bûyer li xeta gundê Aliya çêbû. Heval Rûbar di hemû pêngavan de, di serkêşîya pêngavan de, di asta qordîne de roleke girîng dîlîst. Roleke wî ya dîrokî di şoreşa Rojava de heye. Li ser vî esasî jî ew pêngav, weke "*Pêngava Şehîd Rûbar Qamişlo*" hate bi navkirin.

**Tirs çi ye, çi tişt e!**

Pêngava Şehîd Rûbar, li ser esasî plansaziya her sê baskan hate lidarxistin. Armanc ew bû ku baskê milê Aliya û baskên din bigihin hevûdin. Weke qorîdorekê bigirin, hem lê bizîvirin, singesing şer nekin û hem dorpêç bikin. Ew hêza dijmin a li derdora Til Temir bê dorpêç kirin û hemû bêne îmha kirin. Armanc ev bû.

Jixwe bi wî rengî jî çêbû. Hêza nêzî gundê Til Mejdel ket tevgerê. Êrîşî Til Mejdel kirin û girê gund girtin. Di gundê Til Mejdel de hinek pevçûn û şer çêbû. Hevalan ew gund paqij kirin. Li gundê jêrê jî hinekê şer çêbû. Hevalan ew gund jî girtin. Lê li gundê Rezazê êrîşeke dijwar çêbû. Di êrîşa Aşra de jî hevalan hinek kêmasî kirin; zêde lez kirin û xwe zû xistin nav. Dijmin jî xwe li wê derê veşartibû. Dema li hevalan dan, ji me birîndarî û şahadet çêbûn. Panzêreke me jî derbe xwar. Li wê derê hevalan qedemeyekê xwe bi şûn ve kişandin û li wê derê çeper danîn.

Piştre heval li derdora gundê Aşra zîvirîn û gundê Rezazê girtin. Ji êvarê heya sibê li wê derê şerekî giran çêbû. Li wê derê jî kombûneke dijmin hebû. Hevalan ji sê baskan ve êrîş kirin. Li wir hevalê Bahoz Mêrdîn bi rihekî fedaî û bi cesaret, li ser panzêrê kete êrîşê. Hêza wir bi panzêrê xiste nava gund. Destpêka gund girtin. Dema zivirandinê de dijmin bi fûze li panzêre da, heval di panzêrê de bûn. Hevalê Bahoz li wê derê şehîd ket.

Hevalê Bahoz di êrîşa li milê Cezaa û Sefanê jî hebû. Di wê êrîşê de wan gundan li ber xwe da. Hevalan got "*ev gund nakevin.*" Lê Hevalê Bahoz bi panzêrê êrîş kir û gir xistin. Hevalê Bahoz li vê derê jî di hemû çalakiyên me de jî her tim li pêş bû û qet tirs nedizanî. Digot "*tirs çi ye, çi tişt e!*" Dema li kêleke mirov ba, mirov jê hêz digirt. Bi hevaltiya xwe, bi cesareta xwe yek heval jî jê nerehet nedibû. Bi rasti jî di Rezazê de jî roleke wî yê girîng hebû. Piştre heya nîvro hevalan bi şer ew gund hemû paqij kirin. Ji 20`î zêdetir cenaze dijmin ketin erdê. Hevalan gund wisa rizgar kirin. Di encam de gundê Aşra, derdora Til Mejdel hate rizgar kirin. Wekî qorîdor hêdî hêdî vebû û ber bi Çiyayê Kezvanan ve çû.

Baskê milê Serêkaniyê jî kete tevgerê. Ji milê Aliya ve dema ew bask dikeve tevgerê, ew ji bi pevçûn pêşketin, lê teqtîka lêzivirandinê dihat bi kar anîn. Her carê 3 gund, 4 gund wisa bi lê zivirandin û qutkirinê hatin rizgar kirin û qorîdoreke fireh çêbû. Ev qorîdor dirêj dibû hetanî ber Çiyayê Kizwana. Yanî heta ku bask xwe digihîne Til Maxar û Til Cafer û nêzî serê çiyê dike. Baskekî me jî ji milê Til Temir re ket navberê. Bi vê rengî ew hêza çeteyan a li derdora Til Temir hemû ket çemberê. Dema ku dijmin ket çemberê bi şiklekî întîxarî çend erebeyên xwe li hacizê hevala da. Ew grûb dema hatin ku birevin, hevalan lê dan û li wê dere gelek çete kuştin.

Bi vî awayî ew çembera li derdora Til Temir şikest, ji ber ku ew hêza çeteyan hemû ket çemberê. Yên ku di deştê re revîn jî balafirê lê da, nêzî 100 cenazeyên çeteyan li erdê bû. Dîsa li milê din jî 50, bi giştî jî di wê demê de derdora 200 çete li cebheya Til Temir hate kuştin. Ger me singesing êrîş bikira, dê gelek wendahiyên me çêbûna. Lê her baskek ji milekî ve hat û hêza me gihişt hevûdin, ew çete di navberê de man, hatin kuştin û reviyan. Dema reviyan jî hevalan di kemînê de li wan dan û geleke din jî kuştin.

Çeteyan li wê derê şikestineke mezin jiyîn û derdora Til Temir vala bû. Hêza milê Aliya gihîşte Çiyayê Kizwana, ber gundê Til Maxar û Til Cafer wan. Baskê ku di navberê re çû, ew jî gihîşt qala Sikêriyê. Baskê milê Hesekê jî di xeta Rezaziyê, Aşra heta Mefraqa Jorê jî çû û gihîşt hevûdin. Rizgarkirina Çiyayê Kizwana bi vî rengî çêbû. Dijmin yek bi yek, kom bi kom hemû di wan deştan de hatin îmha kirin. Hem çiya hate girtin û hem jî Til Temir hate rizgar kirin. Yanî her du bi hev re hatin pêk anîn.

Piştî wê jixwe paqijkirina wan gundên di navberê de çebû; yek bi yek ew jî hatin paqijkirin. Mayinên ku dijmin çandibûn hatin rakirin. Bi rastî di vê pêngavê de dibe ku bi hezaran mayin di wan gundan û deştan de hatibin danîn. Di pêngavê de ji 300`î zêdetir çete hatin kuştin. Gelek alavên leşkerî, doçqayên 23 û 14,5 û gelek cebilxane kete destê hevalan. Her weha panzêr, 57, hawan û çekên din ketin dest.

Bi vî rengî DAIŞ li derdora Çiyayê Kizwana hate paqijkirin. Êdî xeta me bû Çiyayê Kizwana. Xeta Hesekê û Çiyayê Kizwana bû yek. Navbera Til Temir û Hesekê bi pêngaveke mezin hate paqijkirin. Navbera Aliya û Til Temir bi heman rengî hate paqijkirin. Pêngava Şehîd Rûbar Qamişlo bi vî awayî bi ser ket.

Di vê pêngavê de hevalên me şehîd bûn, birîndarî çêbûn. Bi berxwedaneke xurt, bi rihekî fedaî yê êrîşê, bi tecrûbeyên ku heta niha hatine qezenckirin; roj bi roj, pêngav bi pêngav serfeftin li pey hev hatin. Ev serkeftina YPG û YPJ'ê bû, di heman demê de ya gelê Kurd û gelê welatparêz ê Rojava bû. Gelên li herêmê bi moraleke bilind û bi şahiyan ev serkeftin pîroz kirin. Li Til Temir gel zivirî warê xwe, miletên wan gundan hemû zîvirîn cihê xwe. Xanî û gundên xwe yên ku xirabûne hemû çêkirin û ketinê. Ji bo miletê herêmê jî hevalan gelek alîkarî dan. Dîsa gelê me yê Asûrî jî ji ber êrîşên DAIŞ`ê gelek zor û zehmetî kişand. Heval ji wan re jî bûn alîkar. Gundê wan ji mayinan paqij kirin. Ji bo ku derbasî gundê xwe bibin pêdivî anîn cih. Jiyana wan dîsa zivirî rewşa xwe ya asayî. Niha li Çiyayê Kizwana jî alên YPG û YPJ'ê dihejin.

Pêngava Til Temir, Çiyayê Kizwana û Hesekê gelekî berfireh bû. Hejmareke bi qasî 3 hezar şervan ket tevgerê ango tevlî pêngavê bû. Ji bilî hêzên YPG-YPJ, hêzên Asayişê, Sanadîd û hêzên Asûrî jî tevlî pêngava Şehîd Rûbar Qamişlo bûn. Di pêngavê de mirov dikare bêje her gundek bû cihê destanekê. Li her derê şopa hevalên şehîd û lehengiya wan heye. Qehremanî û şervaniya hevalan li wê derê tu cara nayê ji bîr kirinê.

Piştî pêngavê nirxandin û nîqaş pêşket. Kêmasiyên pêngavê, pratîkên ku hatine jiyan kirin hemû hatin nirxandin, encam û dersên pêwîst hatin derxistin. Dîsa hate gotin ku pêwîste pêngav berdewam bikin, dijmin tu cara nefes negire, lewra şikestiye û derfet ji bo wan neyê dayîn. Ya herî girîng jî parastina cihên ku hatine rizgar kirin bû. Ji bo wê jî komîteyek derket da ku çepera cihê ku hatiye girtin were çêkirin.

Piştre hemû hêzên bi tevger, me derbasî milê Serêkaniyê kirin. Li ser esasê ku em derbasî pêngaveke din bibin, amadekarî hate kirin. Di destpêka Gulanê de mirov dikare bêje Pêngava Çiyayê Kizwana xelas bû. Di 2015'an de ev pêngav pêş ket. Di vê pêngavê de Hevalê Cîger Qamişlo jî hebû. Hevalê Cîger, di wê xeta Aliyan de li ser baskekî pêngavê bû. Ew heval dema dikevin gundekî, şer derdikeve û heval birîndar dibin. Heval Cîger diçe ji bo hevalan xelas bike. Dijmin gule direşîne û hevalê Cîger li wê derê şehîd dibe. Hevalê Cîger, ji Ebû Qasayîb bigire heta Tirbespiyê, ji Rebîa heta pêngavên cûda di gelek şeran de cihê xwe girt. Ango li ku derê şer çêdibû dibezî wê derê. Bê dudilî û fedaiyane bû. Di pêngava Çiyayê Kizwana de tevlê karwanê şehîdan bû.

Piştî wê bi hejmareke mezin çekên giran û erebe, dîsa me hêzeke mezin amade kir û em derbasî milê Serêkaniyê bibin. Nîqaş û plana me jî ew bû ku; divê em biçin xeta Mebrûka, Rawya û Dehma rizgar bikin. Weke berdewama pêngava Aliya û Çiyayê Kizwana, em pêwîst e wan deran jî rizgar bikin. Ya girîng jî em biçin tola hevalên ku li Kobanê, Mebrûka û Rawya şehîd ketine, rakin. Ji bo vê yekê jî divê ewil em li ser Mebrûka pêngavekê pêş bixin.

**6-Ber bi Mebrûka ve…**

Ji bo pêngava me ya li ser Mebrûka û xeta gundê Xirbit Benat, me hêza xwe kom kir û amade kir. Me hêzên bi tevger tevî çekên giran, derbasî wî milî kir. Di xeta Til Xenzîr, Rawya û wê xetê de hevalan êrîş kirin. Lê dijmin bi hezaran mayin danîne û çepereke xurt çekiriye. Li ser vî esasi me niqaş kir. Me got, "*em singesing di cebheyê de êrîş nakin, êrîşa ku em ê bikin dîvê em lê bizîvirin û wisa li dar bixin.*"

Me li ser bingehê 2 baskan plansaziya xwe diyar kir. Baskek dê li xeta Rawya bikeve tevgerê; wê di navbera Mebrûka û Dehma de biçe, li pişt Rawya û Dehma bizivire, wê navberê qut bike û xwe bigihîne sînorê Bakurê Kurdistanê. Baskek jî wê li pişt Mebrûka bizivire û Mebrûka bixe çemberê. Baskên pirhejmar bûn; hêzên Asayîşê û hêzên xweparastinê jî hemû beşdarî vê pêngavê bûn. Wekî destek ji bo cebheyên pişta YPG-YPJ bigirin, xwe amade kirin.

Mirov dikare bibêje hema hema destpêka meha Hezîrana 2015'an vê pêngavê dest pê kir. Ji milê çek û lojîstîk ve amadekarî hate kirin. Li ser wî esasî hemû amadekarî têkûz bûn. Ji cihê ku em tê re biçin, divê balafirên hêzên koalisyona navnetewî jî lê bida. Hêza me 2 baskên mezin bûn. Li gundê Xirbit Fursan û Xirbit Benat wê xetê de kom bûn. Ji milê gundê Fursan de wek 2 baskan ketin tevgerê. Dema ku bi qasî 3-4 km pêş de diçin, baskek dizivire pişt Dehma. Di navbera Dehma û Mebrûka re divê derbasî mîlê sînor bibe. Ew hatibû plankirin.

Baskek jî di xeta Fursan re ket tevgerê, ji bo ku bizivire pişta Mebrûka. Ew bask lê zivirî û gund bi gund paqij kir. Jixwe hin gund vala bûn. Hinek gund jî tijî bûn. Bi awayekî bilez hêz ket tevgerê û hetanî gundê gir Ceneb çû. Hevalan ew der girtin. Dîsa gundên Watal ûTokîl jî girtin. Lê zîvirîn, hinek pevçûn derketin, lê dijmin ji wê derê revî. Esas amadekariya dijmin di cebheya pêş de hebû. Weke ku em ê di cebheya pêş de êrîş bikin, wan xwe li gorî wê derê amade kiribûn, mayin çandibûn, kemîn vedabûn.

Hêza me hemû lê zivirî û raste rast çû girê Ebû Şaxat girt. Girê Ebû Şaxat gundekî mezin e û destpêka gund gir e. Girekî mezin e, li pişt Mebrûka dikeve. Dema hevalan çûn û ew girê Ebû Şaxat girtin, çeteyan di gund de bersiv dan. Erebeyeke bombebarkirî hat û xwe di nava gund de teqand. Hinek gundî kuştin û di çapameniyê de îlan kirin, gotin, "*vaye, balafir li sivîlan dide.*"

Helbet me ya rastî got, “*na erebeyê xwe teqandiye*.” Bi vî rengî li gundê Ebû Şaxat, şerekî giran li ser gir hate kirin. Erebeyeke din anîn û li biniya gir teqandin, çend heval birîndar bûn, hevalek li wê derê şehîd bû. Pişt re dema birin nexweşxaneyê hevalekî din şehîd bû. Lê hevalan di gir de li ber xwe da û çete di gir de şikênandin.

Lê gundê Ebû Şaxat, roja din tabûreke bi tevger bi awayê 2 baskan ketin gund û Ebû Şaxat girtin. Dema ew gund girtin rêka navbera Mebrûka û Silûk jî hate qutkirin. Ji bo ku ji milê piştê ve çi destwerdan nebe, hevalan gundên Rawya, Acila û Bîr Ebû Celûd girtin. Ango ew gundên pişt Mebrûka hemû hatin girtin. Hema bêje Mebrûka kete çemberê. Ew baskê me yê milê ortê jî çû û cadeya di navbera Dehma û Mebrûka de girt. Wê demê amadekariyên hevalan ên berfireh hebûn. Digihîştin kuderê, hema li wir mewziyên xwe çêdikirin, ji xwe re satir çêdikirin. Bendên ji axê datanîn ji bo ku erebe neyên û xwe neteqînin.

Hêz pêş ve çû û qorîdoreke bi pehnayiya 2 km derbasî pişt gundê Dehma bû. Li wir hevalan êrîş kirin û gundê Şara jî girtin. Dema heval ketin gund de, şerekî giran li wê derê çêbû. Ji derve êrîş kirin, bi 2 erebeyan xwe teqandin, bê encam bû. Çend heval wisa bi sivikî birîndar bûn. Lê li wê derê zêde pevçûn çêbûn. Di dawî de hevalan gundê Şara rizgar kirin û berê xwe dane Gir Selac û sînorê Bakur. Li wir sînor jî kete kontrolê. Hema bêje Mebrûka wekî herfa ‘C’ kete çemberê. Tenê jê re rêkek mabû. Di milê piştê de, ji milê Ebû Şaxat ve hevalan gav bi gav êrîş dikir; wisa xanî bi xanî hatin, hetanî xwe gihandinê de. Piştre heval vediziyan nava xaniyên di navbera gundê Ebû Şaxat û Mebrûka de û ew der jî girtin. Li wir hinek pevçûn çêbûn.

Grûba di navbera Dehma û Mebrûka de jî ket tevgerê û bi milê Mebrûka ve hat. Di wê derê de benzînxaneyek heye, ew jî hate girtin û xwe nêzî bajêr kirin. Baskek hat û sawamaya Mebrûka girt. Di nava sawama de 2-3 erebeyên bombebarkirî hebûn, me ji hevalan re got ku zêde xwe nêz nekin. Hevalan bi tedbîr wisa êrîş kirin û sawama êxistin kontrolê.

Dîsa ji milê din ve hevalan êrîş kirin û koşeyeke bajêr jî girtin. Hevalan li wê derê tanqek jî bi dest xistin. Ji bilî wê 4 erebeyên bombebarkirî, 1 jê 23, 3-4 doçqa û 2 panzêr girtin. Ew grûba çeteyan di çemberê de ma û neçar bû tevger kir. Dema tevgeriyan hevalan bi sûîqastan û lêdanê, hêdî hêdî qad li wan teng kirin. Vêcarê neçar man revîn. Dema revîn hevalan di kemînê de lê dan, hinek ji wan kuştin, hinek ji wan jî di deştê de balafirê li wan da.

Mebrûka bi vî rengî ket. Ji bo me girîng bû, lewra tolhildaneke me li vê derê jî hebû. Ji bo tola hevalên şehîd ên Mebrûka û Rawya pêngaveke tolhildanê bû. Bi pêngava tolhildana şoreşgerî Mebrûka hate girtin. Jixwe hamleya berê jî hevalan dîsa Mebrûka girtibûn lê çeteyan erebe teqandibûn. Naxwe eger erebe neteqandana nikaribûn heval şehid bixistana. Wê demê teqînên pir mezin çêkiribûn û hema bêje bajarokê Mebrûka qederekî rûxiya bû.

Vêcarê nikarîbûn wisa bikin. Hevalan ji pêngava berê ders derxistibûn, tarzê çeteyan fêm kiribûn û li gorî wê bi tedbîr tevgeriyan. Bi vî awayî bi şêweyekî lezgîn û di nava 4-5 rojan de Mebrûka hate rizgar kirin. Helbet ev serkeftina YPG û YPJ’ê gelekî girîng bû. Me hem tola hevala hilda, darbeyek giran li çeteyên hov da û hem jî deriyekî girîng ji bo riya Girêspî û Kobanê vekir.

Piştî rizgarkirinê me li derdora Mebrûka û cihên ku hatine rizgar kirin çeperê xwe çêkirin. Di nava Mebrûka û di wê qadê de bi dehan cenazeyên çeteyan li wan erdan bûn. Piştre hevalan gundê Dehma û derdorê hemû kontrol kirin. Ew gundên di navberê de mabûn hatin girtin û kontroleke giştî hate kirin. Ji ber ku bi hezaran mayin hebûn, destpêkê me nehişt kesek bikeve tê de û gundî jî werin cihê xwe. Lewra xeterî hîn hebû. Li ser wî esasî paqijî dest pê kir. Çeteyan li ber xwe nedan, reviyan. Li ber destanên YPG û YPJ’ê xwe negirtin û gelek ji wan hatin kuştin.

***Di Şoreşa Rojava de sala 2015, mirov dikare bêje fînalek e, ango lûtkeyek e û pêşketinên dîrokî pêkhatin. Li ser vê bingehê pêngava gundewarên Serêkaniyê xwe gihande Girêspî û her du kantonên Cizîrê û Kobanê gihiştin hev. Ji aliyê başûr ve jî xwe gihande Holê û bû cîranê Şengalê. We ev pêngav û serkeftin çawa pêk anîn?***

**ÇIYA KOBANÊ:** Helbet bi rizgarkirina Mebrûka re pêngav neqediya. Hevalan çeper çêkirin û berdewam kirin. Destpêkê bîryara ku em derbasî milê Silûk û Girêspî bibin nebû. Piştre hevalan bîryar derxist ku em biçin xeta Silûk û Girêspî bigirin.

Bi serkeftina Kobanê re pêngavên serkeftî yên din jî li pey hev hatin û bi xwe re pêvajoyek tijî serkeftin anî. Ji Til Berak û Til Hemîs destpê kir û hetanî Çiyayê Kizwana, xeta Aliya û Mebrûka berdewam kir. Ev serkeftin divê me berdewam bikira. Serkeftina Kobanê dema çebû, şikestineke mezin di DAIŞ’ê de çêbû. Armanca me ew bû ku Kantona Kobanê û Cizîrê bigihên hevûdin. Xeyala YPG-YPJ jî ev bû. Xeyala hemû hevalan û ya gelê me jî ev bû. Her du Kanton bigihên hevûdin û Kobanê nefes bigre!

Bi vî awayî li Mebrûka hevalan çepera xwe çekirin û hêzê dîsa xwe amade kir. Li ser wî esasî dîsa plansazî û amadekarî pêş ketin. Ji bo em ber bi Silûk ve biçin, amadekarî ber bi dawî bûn û êdî wê pêngav dîsa destpê bike û dewam bike. Yanî pêngav xelas nebû, navbereke biçûk hate dayin, dewama wê jî Silûk û Girêspî ye.

Ji bo ku em bi milê Silûk ve biçin mesafeyeke zehf dirêj hebû, hema bêje nêzî 40 km bû. Ji bo em xwe bigihinîn Silûkê, divê em navberê hemûyê jî bigirin. Me du baskên mezin derxistin. Jixwe baskên berê hebûn; sawamaya Herûbî heye, dê baskek ji wê xetê ve di ber sînor de êrîş bike. Dê di milê Edwaniyê dê êrîş bike û ew bask wê ji wê derê bikeve tevgerê. Hevalê Mahîr berpirsiyarê wî baskî bû. Baskek jî, bi berpirsiyariya hevalê Şaho wê ji milê Acila derkeve. Yanî yek ji milê çepê û yek jî ji milê rastê, dê bikevin tevgerê.

Li ser wî esasî baskên me ketin tevgerê û heval pêş de çûn. Jixwe dema dijmin di Mebrûka de şikest bi awayekî şikestî jî reviyan. Hevalan jî bilez xwe gihandin sawamaya Herûbi. Milê gundê Acila jî heval lê zîvirîn û ketin wan gundan û ew qad girtin. Yanî xeteke derdora 15 km hate girtin; ew gund hemû hate kontrol kirin. Cih bi cih pevçûnên biçûk çêdibûn, lê hevalan ew îmha dikirin.

Hêzê bi wê lez û bezê dewam kir û gihîşt nêzî Silûk. Dema em nêzî Silûk bûn, li wan deran hin pevçûn çêbûn. Her ku em nêzî Silûk bûn, pevçûn jî giran bûn. DAIŞ bi hezaran mayin danîbû û li gundan bi hezaran xefik çêkiribûn. Li ser wî esasî bi şêwazê ji kêlekê re wisa lê zivirandin û parçe jê qut kirin em pêş de çûn; her parçeyeke ku me qut kir, qadeke derdorê 3-5 km bû. Bi vî rengî parçe parçe hate qutkirin, hetanî em gihîştina ber Silûk.

Ji bo Silûk plansaziyeke nû çêbû. Ji ber ku li Silûk pir zêde mayin çandibûn, em raste rast neketin Silûk, li derdorê zîvirîn. Me riya navbera Silûk û Girêspî qut kir. Çeteyan li wan gundan li ber xwe dan û hevalan lê da. Bi dehan kuştiyên wan çêbûn. Hevalan bi awayekî serkeftî ew hemû gund rizgar kirin. Her ku em pêş ve diçûn me xeta xwe çêdikir. Di encam de me Silûk xiste çemberê. Me raste rast xwe li Silûk neda. Ji ber ku mayinkirî bû û amadekariyên dijmin gelek tê de hebûn. Dema me xist çemberê ew mayin û amadekariyên wan vala derketin.

**7-Bîryara Girtina Girêspî**

Piştre me bîryareke girîng girt! Me niqaş kir ku nekevin Silûk û em raste rast biçin Girêspî bistînin! Jixwe Silûk hate çember kirin, ew gundên di navbera wê de hate paqij kirin. Li pêşiya Silûk jî xeta parastinê hate çêkirin. Wekî din baskek jî li derdora Silûk zivirî û ew rêka ku xwe berdide û diçe Reqayê girtin. Dîsa gundê di navbera Silûk û Hemam Tirkmen de jî hate qut kirin û girtin. Hemam Tirkmen bajarok e, wê demê heval neçûn wê dere. Tenê riya navberê qut kirin. Bi vî awayî Silûk ji her çar milan ve ket çemberê.

Baskê me bi vî rengî dewam kir û xwe berdane ser ava ku ji Eyn Arûse xwe berdide tê û bi milê Reqayê ve diçe. Li wir pirek hebû lê çeteyan ew teqandibûn. Me li wê derê bi lez û bez pirek çêkir û panzêr û maşînê xwe derbasî wî milê avê kirin. Bi vî rengî pêngav bi lêza xwe ya dawî dewam kir. Dijmin di nav revekê de bû, her direviyan. Baskê ku ji milê xeta Mebrûka ve tê û yê ku ji Silûkê tê, gihiştin hev û ber bi Girêspî ve herikîn. Dema ku heval gihîştin destpêka Girêspî, li wê derê hinek şer çêbû.

Piştî bêhnvedanekê me êrîşê ser Girêspî kir. Baskek di ber sînor re derbas bû, çû milê din û ew gundên derdorê gir girtin. Dema mirov derbas dibe girek heye, rengê wî spî ye. Jixwe Girêspî navê xwe ji vî girî girtiye. Heval li pişta wî girî zîvirîn û singesing bi çekên giran lê dan. Bi vî rengî gir girtin û destpêka Girêspî kete destê me. Li wê derê me ji hevalan re got, "*hûn li wê derê bisekinin hetanî em rêka di navbera Girêspî û Reqayê de digirin.*"

Wê demê em bi hevalên Kobanê re jî axifîbûn. Jixwe Kobanê piştî rizgar bû, wan jî pêngava xwe berdewam dikir. Gund bi gund rizgar dikirin û dihatin. Ber bi xeta avê ve, di rêka navbera Girêspî û Reqayê de ew jî ji wî milî ve dihatin. Armanc ku em bigihin hev, ya rast her du kanton bigihin hev! Lewra heval ji wî milî ve pê ve dihatin û em jî ji vî milî ve diçûn. Edî kêm mabû, rojên dawî bûn ku her du kanton bigihin hevûdin.

Li wê derê dema baskê me xwe berda ser avê ji bo ku derbas be, di navbera Reqa û Girêspî de gundê Xirbit Riz heye. Dema heval diçin wê derê, plansaziyekê çêdikin. Di navbera Xirbit Riz û gundekî din heye, di wê navberê re baskê xwe yê êrîşê bi panzêrê dikin tevgerê. Lê ew panzêr di wê navberê de dimîne û dijmin lê dide. Li wir 3-4 heval birîndar bûn. Neçar man, panzêr li we derê ma û bask bi şûn ve vekişî. Hêza destwerdanê li Silûk hebû. Hîn li wê derê Xirbit Riz nehatiye girtin, hêzeke destwerdanê me rê şand, bi panzêran û tanqan çûn û mûdaxale kirin.

Li wir plansazî hate guhertin. Me got, ne ku di navbera her du gundan re, divê lê bê zivirandin. Heval jixwe bi panzêran lê zîvirîn, ew gundên kêlekê girtin, xistin çemberê û Xirbit Riz rizgar kirin. Dijminê di nav de jî îmha kirin. Li wê derê jî bi dehan cenazeyên çeteyan ketin erdê. Di vî şerî de şehîdên me çênebûn, bes 4 hevalên me birîndar bûn. Dema Xirbit Riz hate girtin, hêza Kobanê jî gihîştibû cadê!

**Kobanê û Cizîr gihêştin hev**

***Di vegotina we de em hatin kêliyeke dîrokî. Hûn û hêza Kobanê çawa gihiştin hevûdin, çi hate jiyîn li wê derê, we hesteke çawa jiyan kir?***

Kantona Kobanê û Kantona Cizîrê di 15'ê Hezîranê de, dema ku hevalan li Girêspî ew gir girtin gihiştin hev. Heval di wê derê de ketin Girêspî û ji çeteyan hate paqijkirin, gelek ji wan di deriyê Tirkiyê re revîn. Hinek ji wan jî xwestin di qorîdorê re birevin. Di navbera Kobanê û Cizîre de; dema ku Kobanê û Cizîrê gihîştin hevûdin, di wê navberê de biqasî 1,5-2 km valahiyak hebû. Çeteyan dikirin ku di wir re birevin. Lê hevalan kemîn danîbû. Nêzî 200 çeteyî hebûn, hevalan li wan da, ji 100`î zêdetir hate kuştin. Yên din jî reviyan, hinekan cilên sivîl li xwe kirin û wisa reviyan.

Dema Kobanê û Cizîre wek kanton gihîştin hevûdin hesteke pir cuda me jiyan kir. Demeke dirêj êrîşên DAIŞ'ê li ser Kobanê çêbû, bi awayekî hovane hate çêkirin. Gelek qehremanên me li Kobanê şehîd bûn. Bi lehengî şer kirin û şehîd bûn. Piştî wê rizgarkirina Kobanê û gundên derdora Kobanê pêkhat. Ew jî pêş de hatin û em jî gihîştin cadeya Reqa. Hêzên Cizîrê û Kobanê li wir gihîştin hevûdu. Wê demê em çûn pêşiya hevalan. Dema ku Kantonên Kobanê û Cizîrê bûne yek, ew rojek pir girîng bû ku nayê jibîrkirinê. Di xeyala me hemûyan de bû ku Kobanê û Cizîrê bigihine hevûdu. Bi serkeftineke dîrokî, bi coşeke ku mirov nikare bîne ziman, hevalên her du kantonan hevûdin hembêz kirin.

Piştre li cihê ku em mabûn me dewam kir û Girêspî rizgar kir. Li wir jî gelek çek û cebilxane kete destê me. Di nava bajêr de aleke mezin a DAIŞ'ê hatibû daliqandin. Me ew anî xwar û aleke mezin a YPG'ê bilindkir. Serkeftina Girêspî bi vî rengî çêbû. Wê rojê hemû Kurd û Kurdistanî berê wan li Girêspî bû, li Kobanê bû!

Serkeftina Girêspî di heman demê de serkeftina gelên Kurd û Ereb e. Lewra Girêspî deriyekî girîng ê navbera gelê Kurd û Ereb e. Lê Tirkiyê çawa kiribû? Girêspî di navbera xwe û DAIŞ`ê de êxistibû deriyekî bazirgani û pêwendiya herî qirêj û hov. Jixwe dewleta Tirkiye û DAIŞ yek in, tu ferqa wan ji hev tune ye. Bi vî awayî ev rêk ji destê DAIŞ'ê û Tirkiyê hate girtin. Ji ber vê Tirkiyê şoqek jiyan kir.

Ji hêla din ve wê rojê, heval bi şêwazekî ketin Silûk û ew der jî paqij kirin. Ji ber ku dema me Silûk xist çemberê û heval derbasî cadeya navbera Girêspî û Reqayê bûn, çeteyên di Silûk de jî neçar man ku birevin, xwe li wan gundan belav kirin. Hevalan di kontrolan de hinek kuştin, hinek jî xelas bûn. DAIŞ li wê derê tar û mar bû.

Serkeftina Silûk û Girêspî di heman demê de û di çarçoveya planekê de çêbû. Dorpêçkirin, xistina çemberê û destpêkê neketina Silûk; raste rast bingehgirtina Girêspî, qutkirin rêka di navbera Reqa û Girêspî, ev hemû plansaziyeke xurt bû. Bi vî awayî pêngav gihîşt armanca xwe. Serkeftina Silûk û Girêspî, bû serkeftina yekbûna Kantonên Kobanê û Cizîrê. Ew encam bi xwe re derxist. Dijmin neçar ma û revî. Dîsa hêza Kobanê hat, me hevûdin dît û serkeftina hevbeş pîroz kir. Baskekî me yê hevalên Kantona Cizîrê ku di pêngavan de bi rola xwe rabûne, me derbasî milê Kobanê kirin û ew heval çûn nava Kobanê.

Bi rasti jî rojeke kêfxweşiyê bû, roja şadiyê bû. Di dîroka gelê Kurd de, di dîroka Rojava de rojeke nû bû, pêvajoyeke nû bû. Gihandina hev a her du kantonan ji bo gelê Rojava bû moral, coş û şahî. Vê serkeftinê di raya giştî de jî deng veda. Gelê me gelekî kêfxweş bû û pê serbilind bû. Di hemû pêngavên Şoreşa Rojava de me gelek şehîd dan; li her gundekî, her xaniyekî, her bihosteke axa Rojava, li derdora her bajarekî me şehîd dan. Ev şahadet, ev ked û têkoşîn hemû ji bo rizgariya xaka Rojava, ji bo ku şoreşa Rojava bilind bibe û ala şoreşa Rojava timî bilind bimîne ye. Ji bo serkeftina vê şoreşê keda gelê meyê welatparêz jî pir girîng e.

Ji hêla din ve, ev pêvajoya şikestina DAIŞ'ê bû, binkeftina wan bi xwe re anî. Çete êdî direviyan, xwe vedişartin. Jixwe piştre ew gundên ku di navberê de man jî yek bi yek hatin kontrolkirin û paqijkirin. Wekî din di gelek navendên Girêspî de, gelek belge ketin destê me. Gelek nasname û pasaportên Tirkan, belgeyê ku têkiliyên Tirkan û DAIŞ'ê zelal dike û derdixîne holê, me dîtin. Dîmenên bi vî rengî jî hebûn. Gelek ji van bi raya giştiya cîhanê re hatin parve kirin.

Pêngava Girêspî di 15'ê Pûşpera 2015'an de bi dawî bû. Dema Kanton gihîştin hev, xet hat çêkirin. Hinek cih mabûn ku bên paqijkirin. Ji bo wê civînek pewist bû. Rêveberiya her du Kantonan diviyabû di navbera xwe de civînek li dar bixistana da ku çepereke xurt bihata çêkirin. Ji bo ku DAIŞ di navberê re venedize û çalakî li ser herême neyê kirin. Lewra di van mijaran de gelek tedbîr hatin girtin.

Piştî wê heval çûn gundê Hemam Tirkmen jî paqijkirin. Dîsa heta bi rêka giştî ya navnetewî pêngavê berdewam kir, beldeya Şer Girad hate rizgar kirin. Li xeta Şer Girad û xeta rêka giştî hinek pevçunên giran çêbûn. Di wan pevçûnan de hevalê Dilşêr bi rastî ji roleke xwe ya girîng hebû. Li kuderê şer çêdibû, hevalê Dilşêr dibeziya wê derê; li kuderê pêngav çêdibû hevalê Dilşêr di nav de bû, li kuderê êrîşên dijmin çêdibûn di nav berxwedanê de bû. Rojekê biserdegirtineke dijwar li ser wan cebheyan çêbû. Li derdora riya giştî, di navbera me û Kobanê de wek xet me çêkiribû. Ji Şer Girad bigire hetanî jêrê, hetanî Tirwaziyê vê xetê berdewam dikir.

Rojekê êrîş çêbû û derdora tabûreke me dijmin xist çemberê. Ji bo çemberê biqetîne û xilas bike dîsa hevalê Dilşêr tabûra xwe girt, bi xwe li panzêrê siwar bû û mûdaxale kir. Ew tabûr hemû ji çemberê derxist. Yanî çawa derxist? Ew dijmin li wê derê hemû îmha kir; li cihekî 15 cenaze, li cihekî 8 cenaze ketin erdê. Dema dijmin jî êrîş kir, erebeyek teqand û li wê derê 4 heval şehîd ketin.

Di wir de dema hevalê Dilşêr ji panzêrê dadikeve, çend çeteyên ku xwe di pişt axê de veşartî sûîqast dikin. Guleyek li serê hevalê Dilşêr dikeve û bi giranî birîndar dibe. Heval radikin nexweşxaneyê. Dema digihînin nexweşxaneyê, li wê dêrê şehîd dikeve. Bi rastî em gelekî pê êşiyan. Hevalê Dilşêr û hemû hevalên me yên şehîd welê di eniyên pêş de bê fikar, bi lehengî şer dikin û tevlî karwanê şehîdan dibin. Vaye hevalê Dilşêr jî yek ji wan hevalan e. Bi fedakariya xwe, bi tecrûbeya xwe, bi rihê xwe yê êrîşê, bê dudilî tevdigeriya.

Hevalê Dilşêr di wan hemû pêngavan de fermandarê tabûra çekên giran bû. Ji pêngava Mebrûka bigire heta Silûk, Girêspî û gundê Xirbit Riz, bi rasti jî hevalê Dilşêr bi qehremanî her tim li pêş bû. Li panzêrê siwar dibû û diçû, li ku derê cihekî tengav hebe, di cih de destwerdan dikir, bi ser dixist û ew cih ji tengaviyê xelas dikir. Hevalê Dilşêr roleke wî ya bi vî awayî hebû. Hevalekê temen ciwan bû û pir jîr û jêhatî bû. Zû tecrûbe girt û xwe pêş xist. Di hemû pêngavên me de xwe da pêş û her tim diçû kuderê bi ser dixist.

Taybetmendiyeke hevalê Dilşêr jî; bi rastî hemû hevalan gelek jê hez dikir. Hêzên me yê bi tevger, hêza me ya din, kê hevalê Dilşêr nas dikir, gelek pê ve dihate girêdan û jê hez dikir. Yanî rehet dikarîbû pê re bida û bistanda. Ji ber ku hevaltiya Apogerî, hevaltiya rast bi wî hevalî re hebû. Şehîdbûna wî, ji bo me gelekî giran bû.

Piştî van pêngavan û rizgarkirinên dîrokî êdî me girîngî da parastinê. Li ser vî esasî jixwe xeta parastinê hate çêkirin. Ji bo xendek û mewziyan bagir û trêks hatin. Hevalan dest bi xebatê kirin. Cih bi cih pevçûn jî çêbûn. Lê di wan şeran de dijmin nikarîbû bi ser biketa. Gelek êrîş kirin ji bo ku wê xetê bişkînin, lê nikarîbûn. Berxwedana YPG-YPJ û hevalên ku şehîd ketin, rolekî mezin lîstin. Di wê xetê de, em 35-40 km nêzî Reqayê bûn. Hevalan li pêşiya Girêspî û Silûk cebhe danîn. Cebhe çêkirin, xeta parastinê çêkirin. Piştî wê jî bi tanqan û panzêran gelek êrîşên dijmin çêbûn lê ew bi xwe îmha bûn. Mînak di wan êrîşan de carekê 2 tanq îmha bûn. Me tanqek ji wan girt û anî. Wekî din 3 panzêr jî îmha bûn. Dîsa gelek çek û cebilxane ket destê hevalan.

Ji hêla din ve ji milê rêxistinî ve jî hindek gav hatin avêtin. Diviyabû rêxistina Kurd û Erebên wê derê bi hev re bibûya, bi hev re jiyan bikin. Ji bo xebatên rêxistinî, meclîs hatin avakirin, komîn hatin avakirin. Dîsa sîstema Asayişê hate rûnandin. Di heman demê de li Siluk jî sîstema Asayişê hate ava kirin.

Piştî rizgarkirina Girêspî dewleta Tirk di wê gavê de deriyê sînor girt. Heta ku DAIŞ li wir bû, derî vekirîbû û di her du aliyan re danûstandineke herî bi qirêj bi rê ve diçû. Jixwe dema ku me ala DAIŞ anî xware û ya YPG bilind kir, berteka dewleta Tirk çêbû û gelekî bi xwe nexweş kirin. Wan dixwest ku her tim ew ala çeteyan a hovîtiyê li tenişta wan be.

Dîsa me gotibû ku piştî rizgarkirinan hindek civîn hatin lidarxistin. Di civînê de bîryareke din jî hate wergirtin ku divê Eyn Îsa û Sirîn werin standin. Xebateke bi vî rengî hate meşandin. Hevalan plansaziyeke Kobanê çêkirin û hevalên Kobanê hinekî alikarî xwestin. Jixwe êdi her du Kanton bûne yek, ferq tune ye. Hinek hêz derbasî Kobanê bûn û tevlê pêngava Eyn Îsa bûn. Bi awayekî serkeftî hevalan Eyn Îsa jî girtin kontrolê.

Dîsa plansaziyê de girtina Sirînê jî hebû. Ji bo destekdayina pêngava Sirînê jî hin hêzên Cizîrê derbasî milê Kobanê bûn. Bi awayekî serkeftî Sirîn jî hate girtin. Jixwe beriya girtina Sirînê, qetlîama DAIŞ'ê li Kobanê pêk hat; bi rengekî hovane bi sedan însanê me hate qetilkirin. Çeteyên întiharî yên DAIŞ'ê derbasî Kobanê bûn û milet qetil kirin.

Bi rastî di van pêngavên sala 2015`an de me qadek ango cografyake gelekî berfireh rizgar kir û girt bin kontrolê. Lê çete jî û hêzên li pişta van çeteyan jî kêliyekê tenê jî nesekinîn. Hema bêje her roj êrîş kirin, her roj qomplo lidarxistin. Erebeyên bombebarkirî rêkirin û li bajar û bajarokên Rojava teqandin hwd. Jiyan û ax li me teng kiribûn. Lê bi ser neketin. Li berxwedana şehîdên şoreşa Rojava qelibîn, li rastî berxwedana lehengan hatin û têk çûn. Di van êrîşan de gelek kêm û kurtahî jî derketin. Gelek kêmasî û şaşitiyên ku di pêngavan de derketin, bûne sedema ku şahadet bêne jiyîn. Her çiqas li ser van hatibe sekinandin jî lê berdêla wan giran bû.

Ya din tecrûbeyên ku di van pêngavan de hatine girtin ne kêm bûn. Şerê bajaran, şerê kolanan, dîsa şerê gundan; mînak gund çawa tê girtin, parastina gund bi çi şewazî dibe? Ji bo ku tu gundekî bigirî çi pêwîst e, divê tu çi bikî? Di vî milî de gelek tecrûbe derketin holê. Teqtîkên cur bi cur hatin meşandin û serkeftin bi xwe re anî. Dîsa di şerê deştê de eger mirov ne hosta be, şaşitiyeke biçûk jî dibe ku felaketekê bi xwe re bîne, bibe sedem ku grûbên mezin îmha bibin. Şerê deştê, hem ji bo dijmin û hem jî ji bo me wisa ye. Destpêkê weke dijmin, Cebhet El Nusra di êrîşê de bû, em jî di xeta parastinê de bûn. Di wê xetê de, parastinek xurt çêbû, ew êrîşên dijmin hate şikênandin. Bi demê re me hevsengî çêkir û êdî em ketin êrîşê. Me dest bi êrîşê kir, pêngav li pey pêngavê kir. Serkeftin li pey serkeftinê çêbû.

Piştî wê jixwe êrîşên DAIŞ'ê çêbûn. Gelek baregehên artêşa Sûriyê û artêşa Iraqê xistin dest xwe de. Digot, "*ez biçim kuderê ez ê bistînim, kes nikare li ber min xwe bigire.*" Êrîşên wan rastî berxwedana YPG-YPJ'ê hat. Nikarîbû berxwedanê bişkênanda. Destpêkê êrîşên DAIŞ'ê hatin şikênandin û li hemberê wê vê carê em ketin pêngavan. Me pêngav li ser pêngavê kirin. Me bi Til Hemîs dest pê kir heta bi Girêspî ku her du kanton bûn yek û serkeftin bi xwe re anî. Ev jî keda şehîdan e û keda hevalên birîndar e. Ev hemû wekî tecrûbe çêbûn.

Niha rewşa gelê Rojavayê Kurdistanê ji berê gelek baştir e. Berê li Serêkaniyê, Dêrikê û wan bajar û bajarokên me yên Rojava gelek kes diçûne derveyî welat. Yên ku dudilî jiyankirin, yên ku yekser wate nedane berxwedanê û welatparêziyê, çûne derve.

Jixwe di vî milî de siyaseteke rojane ya dijber û şerê taybet a PDK`ê jî her hebû. Piştî ku ev bajar, bajarok û gund hatin rizgar kirin û erdnîgariyeke mezin hate girtin, gelek însanên me dîsa vegeriyane welatê xwe. Lewra destpêkê tirs û xof hebû, siyasetên qirêj hebûn. Lê dema ku berxwedan çêbû, fedayîtî û lehengî axa welat rizgar kir; kesên ku çûbûn dîtin ku tiştê ku ji wan re têne gotin ne rast in. Rastî cuda ye, keç û xortên hêja li axa xwe û rûmeta xwedî derdikevin; can û xwîna xwe didin, ala serfirazî û rûmetê bilind dikin. Her kesî rastî dît û careke din li xwe û welatê xwe vegeriya.

Ji hêla din ve bi van serkeftinan, tevlêbûnên nava YPG-YPJ zêde bûn. Kêfxweşiya gel zêde bû, baweriya wan xurt bû. Wekî din hêzen Asayîşê hatin tanzîm kirin. Sîstema Asayişe di nava bajaran de bi şiklekî xurt hatiye rûnandin. Tevlêbûna wan jî gelekî xurt bû. Di hemû pêngavan de hêzên Asayîşê jî tevlêbûn.

Xebateke din a girîng ji bo parastinê jî `*Erka Xweparastinê*` bû. Hemu ciwanên Rojavayê Kurdistanê tên û 6 heyvan erka xwe ya parastinê dikin. Bi awayekî sîstematîk perwerdeyên wan tên dayîn û tên bi rêxistinkirin. Ew jî tevlî pêngavan dibin. Di xetên parastinê de cihê xwe digrin. Niha bi hêjmareke zêde tevlêbûn çêbûye û hêzeke xweparastinê hatiye tanzîmkirin.

**8-Têkçûyina Rejîma BAAS li Hesekê**

***Şerê nav bajarê Hesekê bi çi rengî destpê kir û çawa bi encam bû?***

Dema ku li ser xetên Girêspî û Silûk pêngav dihate çêkirin wê demê dijmin jî êrîşê Hesekê kir. Jixwe hêza rejîmê li wê derê hebû. Rejîmê ji xwe re çeperek çêkiribû; li derveyî bajêr xeta çiyaye Kewkeb, li nava bajêr jî di navêndê de jê re digotin `*çarkoşeya ewlekariyê*`, ji xwe re wek xet diyar kiribû. Ji bo taxên Kurdan û cihê ku Kurd lê jiyan dikin jî hêzên YPG-YPJ'ê û hêzên Asayîşê ji bo parastinê amade bûn. Wê demê hevalan çeper çêkiribûn.

Ew êrîşa li ser Hesekê bi rasti jî gelekî dijwar bû. DAIŞ'ê hemû hêza xwe kom kiribû û êrîşê Hesekê kir. Hêza xwe ji milê Şedadê anî bû û li hember cihên rejîmê bi teqînan, bi erebeyên bombebarkirî êrîş pêk anî. Li hember êrîşan rejîm neçar ma û şikest. Gelek cihên di destê rejîmê de DAIŞ'ê girt û kete bajêr de. Gelek taxên Hesekê xistin destê xwe.

Rejîm neçar ma gelek cih berdan û paş de kişiya. Eger gotin di cih de be, bû hawara rejîmê! Gelek alavên leşkerî, tanq, panzêr, çekên cûda yên rejîmê, ketin destê DAIŞ'ê. Bi êrîşeke întiharî êrîşî cihê partiya Baas kirin û di nava rêjîmê de panîkek mezin hate jiyîn. Rêjîmê bi hemû top û balafirên xwe dest bi lêdanê kir, lê nikarîbû çeteyan bişkîne.

Piştî ku cihên di destê rejîmê de ketin, çete hema hatin û gihîştin ber xetên ku YPG'ê diparast, ango cihên Kurdan. Me nîqaş kir ji bo ku Hesekê biparêzin û em ketin tevgerê. Ya rast di destpêkê de me nexwest em bikevin rewşeke ku em rejîmê biparêzin, û ma naparast jî. Lê dema rejîm li wir hilweşiya vêcarê çete hatin gihiştin ber xetê me yên parastinê, taxê Kurd û Ereban. Lewra jî ji bo ku em gelê Kurd û Ereb biparêzin em ketin tevgerê. Bîryar hate girtin ku divê berxwedan pêş bikeve û Hesekê ji destê DAIŞ bê rizgarkirin.

Li wê derê careke din derket holê ku ew hêza berxwedanê ya dewletê tune. Hêz zehf e, lê ew rihê berxwedanê, rihê şerkirinê tune ye. Dîsa bar kete ser milê YPG û YPJ'ê. Her wiha bi vî rengî hêzên YPG û YPJ ketin tevgerê. Hevalan di milê Çiyayê Kizwana re weke baskekî xwe berdane navbera Meylebiyê û Hesekê, di wê derê de êrîş kirin.

Dîsa hevalan êrîşî ser xeta Vîlayên Sor ên Hesekê kirin. Êrîş bi vî rengî dewam kir. Demeke dirêj nêzî 15 rojan bi vî rengî şer û pevçûn bi dijwarî dewam kirin. Gelek teqînên întiharî kirin ji bo Hesekê bistînin. Lê li beramberê berxwedana YPG û YPJ'ê neçar man, nikarîbûn xwe bigirtana. Hevalan Vîlayên Sor girtin. Dîsa di xeta pirê de, ji wê xeta di navbera Meylebiyê û Hesekê de êrîş kirin. Ji ber ku arazî jî hinekî çol bû hevalan gelek zehmetî li wê derê dîtin. Lê israr kirin û ew xet girtin. Baskekî hevalan ji milê çiyayê Kewkeb ve jî lê zîvirîn. Çiyayê Kewkeb nêzî Hesekê

ye. Her wiha di nava bajêr de kolan bi kolan, xanî bi xanî şer hate kirin. Di encama berxwedaneke mezin de Hesekê ji destê çeteyan hate rizgarkirin.

Piştî ku Hesekê ket, ew cihên ku DAIŞ'ê ji rejîmê girtî, hevalan hemû girtin û xwe bi cih kirin. Rejîmê dixwest bikeve wan derên ku hevalan girtiye, hevalan gotin, "*em qebûl nakin, we berda, ji bo ku em ji destê DAIŞ'ê derxin me gelek şehîd dan.*" Bi vî rengî me ew der girtin. Gelek şehîdên leheng, li we derê rola xwe lîstin. Dema êrîşa çeteyan panîkek ketibû nava gel, êdî gel koçber dibû. Dema DAIŞ kete nava taxên destpêkê ku di dil xwe de di parastina rejîmê de bûn, gelek jin, zarok û zilam hema kî diket ber wan lê didan, dikuştin û qetlîameke hov li ser taxan dikirin. Dîsa ketibûn wan taxan û talan dikirin.

Li ser vî esasî dîsa çare ew bû YPG-YPJ bikeve dewrê. Bi berxwedana xurt, bi teqtîkeke nûjen di xeta cebheyê de xeteke parastinê çêkir, da ku DAIŞ pêş de neyê. Lê bi plan û teqtîk, bask lê zîvirîn, navbera xeta Îmdadê ya ku ji Şedadê tê, hevalan ew der qut kir, wekî çember danîn, piştî wê heval ketin wî milê bajêr û şerê kolanan çêbû. Parçe bi parçe, xanî bi xanî, tax bi tax hevalan ji destê DAIŞ'ê derxist.

Li wê derê gelek çete hatin kuştin. Bi vî rengî hevalan rizgar kirin. Piştî rizgariya Hesekê li derdora bajêr bi şiklê parastinê xet hat çêkirin. Dîsa çeper hatin danîn. Li derdora bajêr xendek jî hatin çêkirin. Di encam de dijmin li wê derê şikest. Gelek çek, cebilxane, tanq û hwd hevalan ji destê DAIŞ'ê girt. Bi vî rengî êrîşa DAIŞ'ê li ser Hesekê şikest. Li şûna ku DAIŞ, ew pêngava me ya li ser Silûk û Girêspî vala derxe; hem hevalan xeta Girêspî û Silûk girtin û her du kanton gihandin hev û hem jî êrîşên DAIŞ'ê li ser Hesekê têk çûn, şikestin.

Bi vî awayî gelê ku derketibû dîsa vegeriya bajêr. Jiyana xwe dewam kir. Ew gelê Ereb ku li wê derê gelek zor û zehmetî dît, bi YPG-YPJ'ê baweriyeke xurt anî û rizgariya xwe di rastiya YPG-YPJ`ê de dît. Li ser wî esasî gelek eşîrên li wê derê bi me re ketin têkiliyê. Gotin: "*Em dixwazin li gel we tevbigerin. Ji ber ku hêza ku niha li bejahiyê li dijî DAIŞ'ê şer dike YPG-YPJ ye. Tu hêzên din nikarin me biparêzin. Gewdeya rejîmê heye, lê rihê wê tune ye.*"

Gelê Ereb hîn zêde xwe nêzî YPG-YPJ'ê kir û bi moraleke xurt, şahiyeke bi coş serkeftina Hesekê pîroz kir. Li wê derê jî bi vî awayî destanek hate nivîsîn. Yê ku ev destan nivîsî hevalên şehîd, hevalên birîndar bûn. Vê serkeftinê nav û deng veda. Her serkeftina YPG-YPJ`ê deng vedide, her serkeftin mezintir dike û piştî her serkeftinê gelên herêmê li derdora YPG-YPJ`ê hîn zêdetir dibin xelek, kom dibin.

Mijareke din jî nêzîkatiyên Dewleta Sûriyê ne. Rejîma Sûriyê tevî van hemû pêşketinan, hîn jî naxwaze rastiya gelê Kurd û Rojava bibîne. Wekî ku serê xwe êxistiye nava axê de û xwe kor dike. Li hember şerê me yê parastinê jî bi fersend tevdigere. Dema ku keysê dibîne qomployan li dar dixe, êrîş dike. Lê dema dît ku parastineke xurt hate çêkirin û hêmû qad hatin rizgarkirin, vêcarê kete nava tirsekê. Ev ji bo xwe wek xeterî dît. Niha xilmaşî bûye û di halê xwe de maye. Ji ber ku hêzeke wê ya welê jî nemaye. Hemû dewlet û desthilatdariyên Rojhilata Navîn, di şexsê gelê Kurd de eger vîn û rastiya gelan nas nekin, wê bi encamên gelekî xerab re rû bi rû bimînin. Ev encam jî encamên pratîka wan in, bi destê wan çêdibin.

**9-QSD Hêza Parastinê ya Netewa Demokratîk e**

***Em werin ser mijara HSD`ê ango Hêzên Sûriye ya Demokratîk. Ev hêz li ser çi bingehî û çawa hate ava kirin?***

Jixwe piştî wê pêvajoyê HSD hate avakirin. HSD an jî kurtenavê Erebî QSD Hêza Sûriye ya Demokratîk e ango hêza parastinê ya netewa demokratîk e. Ew hêz ji kê pêk tê? Ji YPG, YPJ, hêzên eşîran, hin ketîbeyên Artêşa Azad û ji hin hêzên parastinê yên herêmî pêk tê. Hemû ketîbeyên Ereb ên ku li gel me, li hemberê DAIŞ'ê şer dikirin tevlê HSD bûn. Hêza Sanadîd ya eşîra Şamariyan jî tevlê bû. Wekî din Tirkmen, Sûryan, Asûr û ji pêkhateyên din jî tevlêbûn çêbû. Li ser wî esasî rêveberiya wê hate çêkirin.

Bêguman parastin têgeheke xwezayî û civakî ye. Karekî komûnal û hevbeş e. Di destpêka êrîşên dijmin de YPG-YPJ bi tenê ma. Lê piştre hemû pêkhateyên Rojavayê Kurdistanê û Sûriyê dîtin ku ev parastina rewa ye, berxwedan e û parastina rûmetê ye. Helbet ev bi berxwedana şehîdan çêbû. Piştî van berdêlan, rastî hîn zelaltir diyar bû. Her kesî ev yek dît û tevlê vê xeta parastina rewa û parastina cewherî bûn. HSD li ser vê bingehê hate ava kirin. Jixwe di nav demê de, di pêngavan de ev hêz bi pratîkî hatibûn gel hev, bi hev re parastin kiribûn. Rihekî parastina netewa demokratîk çêbûbû. Tenê ya mayî îlana wê bû. Ew jî hate kirin.

Li ser vê bingehê hêzên YPG û hêzên HSD'ê cara yekemîn wê pêngava xwe ya şoreşgerî li ser xeta Holê û gola Xatûniyê li dar bixistana. Xeta Şengal û Holê nêzî hev e. Li milê Rojava xeta Xatûniyê û Xeta Holê ye; li aliyê hemberê li milê Başûr jî xeta gundê Barê tê û raste rast derbasî milê Şengalê dibe. Yanî eger Şengal bikeve raste rast Hol dikeve û eger Hol û Xatûniyê bikevin raste rast Şengal dikeve. Lewra me xwest em bi hêzên Şengalê re operasyoneke hevbeş pêkbînin. Lê PDK nakokî derxistin. Çima? Ji ber ku hêzên HPG û YBŞ Şengalê diparêzin, gelê

Şengalê hatiye rizgarkirin. PDK'ê jî di wê derê de şikestibû û dixwest îtîbara xwe vegerîne. Lewra jî pirsgirêk derxistin. Lê tevî van nêzîkatiyên PDK'ê jî hêzên HPG û YBŞ'ê amadekariya xwe kirin.

**10-Rizgarkirina Holê û Xatûniyê**

Piştre ji bo pêngava li ser Holê û Xatûniyê keşif û amadekariyên din hate kirin. Hêz derbasî milê Holê û Xatûniyê bû. Li wê dere jî amadekariyeke berfireh hate kirin. Dîsa xeta Til Hemîs hevalan amadekarî kirin ku wê bi çi şêwazî li ser Holê êrîş bikin. Jixwe eger Hol biketa, DAIŞ tenê li Şedadê dima. Li ser wî esasî heval ketin liv û tevgerê û bask hatin avakirin. Hêzên HSD'ê jî li ser wî esasî weke hêzekê wê tevlê bibûya.

Hevalan baskek di milê Barê de amade kiribûn ku di wê derê re were û raste rast bikeve xeta Xatûniyê. Baskek jî di milê Xizêla re dê bikeve tevgerê. Baskek di milê Til Hemîs de û baskek jî di milê Hesekê de bikeve tevgerê. Yanî bi şêwazê 4 baskan hatibû rêkûpêk kirin. Helbet baskên mezin bûn. Li ser wî esasî amadekarî hatin kirin, çekên giran li ser baskan hatin belavkirin û cihên ku bikaribin rista xwe bilîzîn hatin diyarkirin. Bi vî awayî tevgerê destpê kir. Baskên Başûr heta cihekî hat sekinî. Baskên milê Xizêla kete tevgerê. Hevalan êrîş kirin û gund bi gund şer kirin. Du baskan jixwe di xeta Xizêla de tevger kirin. Du bask jî ji bo di milê piştê de qutkirin bê çêkirin, lê zîvirîn.

Li hemberê DAIŞ'ê li wê derê şerekî dijwar hate meşandin. Di vê pêngavê de DAIŞ'ê weke hêviyên xwe yên dawî, 30-40 erebeyên bombebarkirî teqandin. Ji bo ku hêzên YPG û HSD'ê pêş de neçe, hemû hêza xwe xistin dewreyê û êrîş kirin. Lê ji ber ku di nava hêzên HSD'ê de hêzên xwediyê tecrûbe yên YPG-YPJ'ê hebûn, yên ku rola xwe leyîstin û herî li pêş tevgeriyan dîsa ew bûn.

Ji hêla din ve di vê pêngava HSD'ê de gelek hêzên me yên bê tecrûbe jî hebûn. Ew hêzên me yên eşîra Şamar bi navê Sanadîd, Artêşa Azad û hindek hêzên din tecrûbeyê wan ên pêngavê tune bû. Her çiqas hatibûn perwerde kirin jî lê ew hêza wan a ku xwe bidin ser dijmin, êrîşî dijmin bikin tune bû. Di wan milan de hinek kêm û kurtî hebûn. Dîsa bar ket ser milê YPG-YPJ'ê.

Di vê pêngavê de hevalan ji milê sînorê Başûr ve jî êrîş kir û ew gundên di navbera xeta Başûr û Rojava de girtin. Gelek gundên wê derdorê rizgar kirin. Baskêk ji milê sînor ve ket tevgerê û dijmin xist dorpêçê. Baskekî dijmin jî di gundê Fao de ketibû dorpêçê. Hevalan ji vî milî de lê dan, ew tengav kirin. Ji wan gelek kuştin, hemû di nava Fao de man, nikarîbû derketana. Çeteyan di cîhazê de digotin "*bila hêzên întiharî werin.*"Hêzên întiharî çi ye? Erebeyên teqînê ne!

Erebeya teqinê hat ji bo xwe biteqîne û hevalan qorîdorek jê re vekir! Çû xwe li cihêkî vala teqand! Nikarîbû encam bigirta. Dîsa erebeyeke din hat ji bo xwe biteqîne, li wir kete çalekê de. Qordîneya dijmin qîr dikir û digot, "*tu çima çalakiya întiharî nakî, divê tu çalakî bikî, xwe biteqînî?*" Yê din jî digot, "*erebeya min ketiye çalekê, ez nikarim derkevim!*" Weke pezeke li ber kêrê ango qurban, nêzîkatî ji wan ên ku çalakiyên întîxarî dikin re raber dikirin.

Grûba wan a din jî li Fao di çemberê de bûn. Dîsa di cîhaza wan de, qordîneya wan ji grûbê re digot, "*ma hûn dikarin ji wir derkevin?*" Yê din digot, "*em nikarin derkevin ji ber ku her du milên me girtine.*" Wan nedizanî ku baskê milê Barê jî em in. Qordîneya wan digot: "*Bi milê Sûriyê ve neçin, yên li wî milî Apogerî ne, ew gelek şer dikin. Hûn ê nikaribin di wê derê re xwe xelas bikin. Dê we hemûyan îmha bikin. Ew bihêz in, xwe bi wî milî ve nedin*." Dîsa digot: "*Hûn eger birevin bi milê pêşmergeyan ve birevin. Ew zêde nikarin şer bikin, hûn ê karibin di wê derê re xwe xelas bikin.*" Lê ew ne hêza PDK'ê bû, hêza me bû. Dema di milê Barê ve revîn, hevalan lê da û gelek ji wan kuştin. Dema direviyan, bi cîhazê digotin: "*Ev ne karê pêşmergeyan e. Te ji me re got, 'ew pêşmerge ne', ev ne pêşmerge ne, ev jî Apogerî ne!*"

Li wê derê heval bi rengekî bilez çûn, lê dan û gund girtin. Erebeyên xwe yên bombebarkirî hiştibûn, hevalan girtin û ew bêbandor kirin. Di wê grûba ku hate îmha kirin de gelek biyanî jî derketin, piranî Efgan û Çeçen bûn. Roj bi roj me ew di Xatûniyê de dorpêç kirin. Heval ji milê rast û çepê ve hatin, hemû gundên derdorê paqij kirin. Dîsa, li wê derê kargeheke gazê, yanî kargeheke petrolê heye, me ew der jî girt. Ew kargeh petrolê wan dida şixulandin. Ji ber ku dema hevalan girt, berê xwe danê û dîtin ku hatiye bikaranîn. Di wê xetê re petrol difirotin.

Ji hêla din ve di milê rastê de baskên me hêdî hêdî pêşketin. Baskekî me ji bo ku li Xatuniyê bizivire tevgeriya. Ew rêka di navbera Xatûniyê û Holê de girtin. Baskê me yê milê Hesekê û milê Kewkebê jî hêdî hêdî pêş de hatin û bajarokê Xatûniyê xistin dorpêçê û girtin. Hinek çete di nava Xatûniyê de mabûn. Xwestibûn di tenişta avê re birevin û di nava qamişan de xwe veşartibûn. Hevalan di wir de jî gelek ji wan kuştin. Yê di araziyê de man jî balafiran lê dan.

Hevalan di wir de teqtîkeke bi vî rengî bi kar anîn; Xatûniyê xistin çemberê û hêdî hêdî teng kirin, bajar girtin. Berdewama wê jî hevalan bajarê Holê girtin. Dîsa hevalan li wê xeta Holê û Şeddadê lê zîvirîn. Li wir kargeha bi navê \`Heqil Tişrîn\` girtin. Ew jî şîrketeke mezin a kargeha petrolê ye. Piştî ku Xatûniyê şikest di nava Xatûniyê de

gelek pevçûnên giran çêbûn Dema li wê derê li ber xwe dan, li Holê zêde li ber xwe nedan. Şer nêzî 15 rojan dewam kir. Di dawiyê de Hol jî hate rizgar kirin. Dîsa hevalan xeta parastinê çêkir. Vêcarê hîn bi tedbîr û bi kûrahî hate çêkirin. Ji ber ku cebheya piştê Şedadê û Dêrezorê ye. Hevalan Hol û Xatûniyê bi vî awayî bi hêza HSD'ê girtin û piştî wê rizgariya wê dere hate îlankirin.

Piştre li wî milê sînor pêngava Şengalê destpê kir. Bi lêdana balafiran hêz ketin tevgerê. PDK hêzên xwe anîn û êrîş kir. Esas jixwe çeteyan derbe xwaribûn. Lewra dema Hol û Xatûniyê ket, milê Şengal jixwe ketiye. Ji ber ku çeteyên DAIŞ`ê li her du aliyan hev diparastin. Di wî şerê Hol û Xatûniyê de me fêm kir ku hêza DAIŞ'ê gelekî lawaz bûye. Tenê li ser esasê întîhariyan û bi mayînên zêde şer dikirin. Dixwestin hêzên HSD`ê bi vî rengî bidin sekinandin. Lê nikarîbûn, berxwedana hêzên HSD`ê ya bi bandor û dijwar ew her du bajarok xistin destê xwe û îradeya DAIŞ'ê şikest.

Her wiha li milê me Xatûniyê û Hol, li milê Başûr jî Şengal hate rizgarkirin. Xeta Başûr û Rojava li wir bûne yek. Li xeta milê Barê jixwe hêza HPG û YBŞ'ê li wê derê bûn. Milê Rojava jî jixwe xeta Xatûniyê û Holê hevalan çeperek çêkirin. Ev pêngav bi rengekî bi serkefti derbas bû. Di vê êrîşê de gelek heval li ser axa Rojava bi xwîna xwe, bi cesareta xwe destan nivîsîn.

Di van pêngavan hemûyan de heval Berxwedan Mêrdîn jî hebû. Hevalê Berxwedan di hemû êrîş û çalakiyên xwe de, di hemû pêngavan de bi lehengî, bi cesareta xwe, bi hevaltiya xwe û bi rihdayina şervanan, rolekî xwe yê girîng hebû. Her tim di pêngavan de dibeziya, hem şoforê panzêrê bû, hem şoforê erebê bû. Li tanqê siwar dibû, dîsa panzer diajot û heval dibirin. Di êrîşan de jî tim li pêş bû. Di tabûra çekên giran ê bi tevger de fermandar bû. Di tabûrê de bi roleke girîng radibû. Heval Berxwedan di bajarokê Xatûnîyê de şehîd bû. Dîsa hevalê Eşref di destpêka pêngavê de bi mayinekê şehîd bû. Ew jî hevalekî fermandarê tabûrê bû. Bi rastî jî roleke wî ya girîng hebû. Tim di êrîşê de bû; di her pêngavê û çûna ser her gundekî de li pêş bû. Weke pêşeng roleke wî ya girîng di van pêngavan de hebû.

Piştî rizgariya Holê û Xatûniyê, serkeftinên hêzên HSD gelekî deng veda. Gelek ketîbeyên gelê Ereb tevlê nava refên HSD bûn. HSD hinek tecrûbe girt, moral girt. Di van pêngavan de şehîd û birîndarên me yên Ereb jî çêbûn. Ew, şehîdên şoreşa Rojavayê Kurdistanê ne.

Piştî vê pêngava serkeftî li xeta Hesekê, navbera navenda elektrîk û Meylebiyê yekser nehatibû paqijkirin. Dîsa navbera Çiyayê Kizwana û Holê jî mabû. Hevalan wek operasyonekê li wê derê jî pêş xistin, Meylebiyê girtin û paqijkirin. Li wê derê jî hinek çete hatin kuştin û hinek çek û panzêr ji ser wan hate rakirin. Bi vî awayî ji Meylebiyê û Çiyayê Kizwana heta sînorê Başûr wek xeteke parastinê hate çêkirin.

Di van pêngavên derdora Hesekê de hevalê Rustem şehîd ket. Hevalekî fermandarê tabûrê bû. Timî di êrîşan de bû, pêşeng bû. Li kuderê xeteriyek hebû, ew heval dibezî. Di şerê xwe de xwediyê tecrûbe bû. Şahadeta wî hevalî, bi me pir giran hat. Ji ber ku hevalan gelekî jê hez dikir. Tevlê nava refên şehîdên azadiyê bû.

Bi awayekî giştî di kesayeta hevalê Ronî, hevala Dîcle û Nûjiyan de, hemû hevalên ku di van pêngavan de şehîd bûne, her tim pêşeng û ronahiya şoreşa Rojava ne. Bi taybetî di kesayeta şehîd Dîcle û Nûjiyan de, jin wekî hêzeke pêşeng û her tim herî li pêş tevlî pêngavan bûne. Bêguman di vê pêvajoya tijî şer û pevçûnan de, gelek hevalên bêhempa gihîştine şahadetê lê di aliyê dem û mekan de ji ber ku giranbûnek hebûye hemû nayên bîra me.

Di kesayetiya van hevalan de gelek hevalên ku di van pêngavan de şehîd bûn, afirênerê van serkeftinan in. Ev bi keda hevalên şehîd û hevalan birîndar çêbûn. Her yek ji wan lehengek bû. Mirov nikare şehîdên têkoşîna azadiyê bi îfade, bi axaftin bîne ser ziman û heqê wan bide. Encax û encax em hewl bidin riya wan bişopînin. Rêka ku wan nîşanî me daye, cesareta wan nîşanî me daye: rêka rihê fedayîtiyê, rihê Apogerî, rihê ku Serok Apo çêkirî, di kesayetiya van hevalan de em dibînin û em bejna xwe li ber wan ditewînin.

***Em di vê mijarê de herî dawî peyama we jî bigrin…***

**CEMÎL KOBANÊ:** Ji bo herêma Cizîrê bi awayekî giştî ez dikarim van tiştan bibêjim. Ez dixwazim hin lehengên li wir şehîd ketine jî bi bîr tînim. Di şexsê hevalê Bawer de pêngava rizgarkirina Dêrikê çêbû. Di şexsê hevalê Devrîm, hevalê Cîlo, hevalê Îsa de berxwedana Til Berak û Til Hemîs pêş ket. Asta tolhildanê di asta hevalê Serdar de pêş ket. Di şexsê hevala Jiyan, hevala Nûjiyan, hevalê Çeko û hevala Azadî de rihê pêngava ku me li hemberî El Nusra û Ahrar El Şam li dar xistiye derket holê.

Di şexsê hevalê Delîl de, pêngava yekemîn ya rizgarkirina Hesekê li dijberî dewletê çêbû. Di şexsê hevalê Cesûr de, lehengiyên pêngava gundê Xerîta çêbûn. Li milê Serêkaniyê di şerê ewil yê li hemberî Artêşa Azad de, di şexsê hevalê Serhat, Lewent, Zerdeşt de rihekî êrîşê çêbû. Di parastina Tirbespiyê û Dêrikê de rihê fermandariyê yê hevalê Çekjîn derket holê. Her wiha di pêngava Til Hemîs û sînorê Iraqê de, hevalê Argeş û Adil rihek ava kirin.

Hê jî bi sedan hevalên me ku bi lehengîtî şer kirine û li ber xwe dane hene. Lê ne gengaze ku em bikaribin heqê rastî û heqîqeta wan bidin û hemû taybetmendiyên wan îfade bikin. Lê wan hevalan rihek da çêkirin, xeteke lehengîtiyê çêkirin. Li hemberî dagirkeran, rihekî Apogerî, rihekî fedayî yê berxwedanê dan avakirin. Nîşan dan ku vîna gelê Kurd, li hemberî tu kes serî natewîne. Van hevalan bîr û bawerî dan gel. Di şexsê van hevalan de me gelek berdêlên giran dan, lê wan hevalan serkeftinek jî çêkirin û gelê me gihandin asteke mezin. Ji bo vîn û azadiyê gelê Kurd, ew heval bûn sîperên berxwedanê. Em jî di kesayeta van hevalan de li ber hemû şehîdên têkoşîna azadiyê bejna xwe ditewînin.